



K.T.

Zanîngeha Mardin Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

TOPONÎMÎ DI VEGOTINÊN GELÊRÎ DA

(Li Herêmên Hezex û Nisêbînê)

Cahit BENEK

(17711012)

Şêwirmend

Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK

Mêrdîn 2021

K.T.

Zanîngeha Mardin Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî Yê Li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

TOPONÎMÎ DI VEGOTINÊN GELÊRÎ DA

(Li Herêmen Hezex û Nisêbînê)

Cahit BENEK

(17711012)

Şêwirmend

Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK

Mêrdîn 2021

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Toponîmî di Vegotinên Gelêrî da (Li Herêmên Hezex û Nisêbînê)” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- ☐ Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- ☐ Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- ☐ Tezimin/Projemin ... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

..../..../.....

Cahit BENEK

KABUL VE ONAY

Cahit BENEK tarafından hazırlanan “**Toponîmî di Vegotinên Gelêrî da (Li Herêmên Hezex û Nisêbînê)**” adındaki çalışma, .../.../... tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oybirliği / oyçokluğu ile kabul edilmiştir.

[İ m z a]

[Unvanı, Adı ve Soyadı] (Başkan)

PÊŞGOTIN

Ev xebat navên wan cih û waran vedikole ku têkildarî wan vegotineka gelêrî heye. Xebat li ser sê beşan hatîye pêşkêşkirin û li gel van beşan destpêk, encam, beşa çavkanîyan û pêvek jî heye. Di destpêkê da mijar, armanc, çarçove, rêbaz û pirsgerêkên xebatê; di pêvekê da jî kunyenameyên vebêjeran û hinek wêne cih digirin.

Beşa yekem wek şaxeka onomastîkê li ser toponîmî û têkilîya wê ya bi zanistên din ra, şaxên toponîmîyê û cureyên toponîman bi awayekî berfireh disekine. Her wiha di vê beşê da bi giştî navlêkirin bûye mijar ku pratîkek di çarçoveya zanista onomastîkê da ye û ji bo civaka kurdan jî tradîsyona navlêkirinê hatîye şênberkirin. Li gel van, guhertina navên cih û waran û polîtîkayên di vê çarçoveyê da hatine nirxandin. Lewra encamên vê guhertina di warê toponîmîyê da bandoreka xwe ya cidî li ser civakê heye.

Beşa duyem ji bo cureyên vegotinên gelêrî û bi giştî çarçoveya wan hatîye veqetandin. Di vê beşê da bêtir ew cure vegotinên gelêrî bûne mijar ku mînakên berhevkirî têkildarî wan in. Çiku her mînaka ku ji sehayê hatîye berhevkirin li gel analîza toponîmîk, di çarçoveya teorîk a van cureyan da jî hatîye analîzkirin.

Di beşa sêyem da li gel yeka ji çavkanîyeka nivîskî ew vegotinên gelêrî hatine bicihkirin ku ji sehaya xebatê hatine berhevkirin û têkildarî toponîmîya vê herêmê ne. Berîya neqilkirina her vegotinê ew gund/bजारok bi kurtasî hatîyê nasandin ku toponîma mijara vegotinê lê ye yan jî di aqarê wî da ye. Piştî neqilkirina her vegotinê jî ji alîyê toponîmî û edebîyata gelêrî ve der barê wê vegotinê da kurteanalîzek hatîye kirin. Vegotinên ku hatine berhevkirin bi devoka vebêjer, ya ji çavkanîya nivîskî jî bi kurdîya standard hatîye neqilkirin. Ji bo xatirê herikbarîya tekstê têk neçe, hin gotinên ku vebêjeran wek agahîyên navberê dane û hin gotinên ku qurpandine/kêm hiştine ji alîyê me ve li tekstê hatine zêdekirin. Tiştên ku wek agahîyên navberê gotine di nava kevanekê da; yên ku me lê zêdekirine jî di nava koşebendê da û dîsa bi devoka vebêjer lê hatine zêdekirin. Ji ber ku di gelek cihan da derdikeve, dengê (خ eyn) jî bi dabirê (‘) hatîye nîşandan da ku bilêvkirina wan bêjeyan were fêmkirin. Hin caran jî daçek bi bêjeya berî xwe yan jî ya pişt xwe ra kelijandine û bi vî awayî dengê qurpandine. Her wiha ev yek jî bi dabirê (‘) hatîye nîşandan.

Di dawîyê da li gel hinek pêşniyaran ew encam hene ku ji vê xebatê derketine. Çavkanîyên ku ji wan sûd hatîye wergirtin jî wek çavkanîyên kurdî, çavkanîyên tirkî, malperên înternetê û kesên çavkanî hatine dabeşkirin.

Di serî da spasdarê şêwirmendê xwe mamoste Mustafa Öztürk û mamoste Necat Keskin im ku heta demekê bi awayê fermî şêwirmendîya min kir û piştra jî bi dilxwazî dirêje da vê alîkarîyê. Wan bi zanîn û tecrûbeyên xwe her rê nîşanî min dan û ez li xebatê germ kirim. Lewma gelek spasîyên xwe pêşkêşî cenabê wan dikim. Li gel vê gelek vebêjerên ji herêma xebatê, derî û dilê xwe yê germ li min vekirin, ez kirim mêvan û tûrikê xwe ji bo min vala kirin. Gelek kesan jî dan pêşîya min û di navbera min û vebêjêran da bûne referans. Ji bo alîkarî û dilgermîya wan spasîya wan jî dikim û xwe deyndarê wan dibînim.

Hevalê min Ozan Polat kurteya xebatê ji kurdî wergerand bo inglîzî, hevalê min Eyyup Subaşi jî ji alîyê rastnivîsê ve lê nêrî û tecrûbeyên xwe bi min ra parve kirin. Ji bo keda wan ez gelek spasîya wan jî dikim.

Divê hevjiîna xwe Dilxwaz jî ji van spasîyan bêpar nehêlim ku ji serî heta dawîyê sebir û hedan nîşan da. Wê li gel piştgirî, dilxweşkirin û hebûna xwe her demê dilê min şad kir û bû stûna konê min û barhîlgira min.

Wergera jêgirtinên ji çavkanîyên tirkî ji alîyê min ve hatîye kirin, lewma berpîrsîyarîya jêdûrketinên wateyî û çewtîyên rêzimanî jî aîdî min e.

Cahit BENEK

Mêrdîn, 2021

KURTE

Onomastîk navê wê zanistê ye ku ji her alîyê ve li ser navên taybet disekine. Toponîmî jî şaxeka vê zanistê ye ku bi heman teknîkan navên cih û waran ji xwe ra dike mijar. Bêguman ji bo her cihekî, warekî û heta her xalekê navek hatîye danîn ku bêtîr hebûna van navan anku vê navlêkirinê têkilîya mirov û xwezayê, heta têkilîya di navbera mirovan da dê felc bibe. Di vê çarçoveyê da her cihekî xwedînav dibe kereste bo zanista toponîmîyê lê belê mijara vê xebatê navên wan cih û waran in ku der barê wan da vegotîneka gelêrî heye. Bi vê sîordarkirinê hem mijar hatîye bertengkirin, pêşî li belavbûne hatîye girtin hem têkilîya di navbera folklor û toponîmîyê da hatîye şênberkirin ku jixwe ne du zanistên ji hev bêtîr ne.

Ev xebat, zelal dike bêtîr ka navê hin cih û warên di sehayeka dîyar da çawa çêbûne û çêbûna van navan di wêjeya devkî da roleka çawa pêk anîye. Di vê xebatê da ku ji sê beşên sereke pêk dihe di beşa pêşî da çarçoveya teorîk ya zanista toponîmîyê, di beşa din da ya vegotinên gelêrî bûye mijar. Di beşa dawîyê da jî toponîmî û folklor bi awayekî senkronîze hatine xebitandin û di encama vê plankirinê da jî ew vegotinên gelêrî hatine berhevkirin û pêşkêşkirin ku nav yan jî awayê navlêkirina cih û warekî vedibêjin.

Peyvên Sereke: Toponîmî, nav, cih û war, vegotinên gelêrî, vebêjer.

ÖZET

Onomastik, her açıdan özel isimler üzerinde duran bilimin adıdır. Toponimi de bu bilimin bir dalı olup aynı teknikler ile yer ve mekan isimlerini konu edinir. Şüphesiz her yer ve mekan için hatta her nokta için verilmiş bir isim vardır ki bu isimler yani bu isimlendirme olmadan insan ve doğa ilişkisi, hatta insanlar arasındaki ilişki felç olur. Bu kapsamda isim sahibi olan her yer toponimi bilimi için malzeme olurken bu çalışmanın konusu, hakkında bir sözlü anlatım biçimi olan yer ve mekan isimleri olmuştur. Bu sınırlandırma ile hem konu daraltılmış, dağılmanın önü alınmış hem de zaten birbirinden bağımsız olmayan folklor ve toponimi bilimleri arasındaki ilişki somutlaştırılmıştır.

Bu çalışma, belirli bir sahadaki bazı yer ve mekanların nasıl isim aldığını ve bu isim almanın sözlü edebiyatta nasıl bir rol oynadığını açıklığa kavuşturuyor. Üç temel bölümden oluşan bu çalışmada ilk bölümde toponimi biliminin, diğer bölümde sözlü anlatım biçimlerinin teorik çerçevesi konu olmuştur. Son bölümde de toponimi ve folklor senkronize bir şekilde işletilmiş ve bu planlama neticesinde de bir yer ve mekan ismini ya da isimlendirme şeklini anlatan sözlü anlatımlar derlenip sunulmuştur.

Anahtar Kelimeler: Toponimi, isim, yer ve mekan, sözlü anlatım biçimleri, anlatıcı.

ABSTRACT

Onomastic is the name of the science that focuses on special names in all respects. Toponymy is a branch of this science as well and it discusses the names of places and spaces with the same techniques. Undoubtedly, there is a name given for every place and space. Without these names, the relationship between human and nature, even between people, would be paralyzed. In this context, every place that has a name is a material for toponymy science. The names of places and spaces which have a verbal form of expression have become the subjects of toponymy studies. With this limitation, both the subject is narrowed and the relationship between the folklore and toponymy, which are not independent from each other, has been concretized.

This study clarifies how certain places and spaces in a particular field are named and what role this naming plays in oral literature. This study consists of three main parts. The first part is the theoretical framework of the science of toponymy, and the second part is about the oral expression styles. In the last part, the toponym and folklore are operated synchronously, thus, the name of a place or space or the way of naming them are presented in oral narratives.

Keywords: Toponymy, name, place and space, oral narrative forms, narrator.

NAVEROK

<i>PÊŞGOTIN</i>	<i>iii</i>
<i>KURTE</i>	<i>v</i>
<i>ÖZET</i>	<i>vi</i>
<i>ABSTRACT</i>	<i>vii</i>
<i>NAVEROK</i>	<i>viii</i>
<i>LÎSTEYA TABLOYAN</i>	<i>xi</i>
<i>LÎSTEYA ŞEKILAN</i>	<i>xii</i>
<i>KURTEBÊJE</i>	<i>xiii</i>
<i>DESTPÊK</i>	<i>1</i>

BÊŞA YEKEM

ONOMASTÎK Ê BINBÊŞA WÊ TOPONÎMÎ

1.1. WEK ZANISTEKÊ ONOMASTÎK	5
1.2. ŞAXÊN ONOMASTÎKÊ	6
1.3. WEK ZANISTEKÊ TOPONÎMÎ	8
1.3.1. Şaxên Toponîmîyê û Cureyên Toponîman.....	12
1.3.1.1. Oykonîmî û Oykonîm	12
1.3.1.2. Oronîmî û Oronîm	13
1.3.1.3. Hîdronîmî û Hîdronîm	13
1.3.1.4. Urbonîmî û Urbonîm	14
1.3.1.5. Horonîmî û Horonîm	14
1.3.1.6. Drîmonîmî û Drîmonîm	14
1.3.1.7. Agroonîmî û Agroonîm	15
1.3.1.8. Dromonîmî û Dromonîm	15
1.3.2. Sehayên Toponîmîyê	17
1.4. WEK KEVNEŞOPÎYEKÊ NAVLÊKIRIN	18
1.4.1. Navlêkirina Şexsan	19
1.4.2. Navlêkirina Cih û Waran	22
1.4.3. Guhertina Navê Cih û Waran û Sedemên Wê.....	26

BESA DUYEM

VEGOTINÊN GELÊRÎ Û ÇARÇOVEYA WAN

2.1. VEGOTINÊN GELÊRÎ	33
2.1.1. Cureyên Vegotinên Gelêrî	36
2.1.1.1. Mît	37
2.1.1.2. Efsane	38
2.1.1.3. Çîrok	40
2.1.1.4. Destan (Epos)	42
2.1.1.5. Hîkayeyên Gelêrî	44
2.1.1.6. Memorat	45
2.1.1.7. Cureyekî Din “Mesele”	49

BESA SÊYEM

TOPONÎMÎ DI VEGOTINÊN GELÊRÎ DA

3.1. BAFE.....	52
3.1.1. Elo Dîno	52
3.2. BARIM	56
3.2.1. Bahremê Birim	57
3.3. DELAVÊ QESRÊ	58
3.3.1. Ebû Delav	59
3.3.2. Kevirê Şîrîn	64
3.3.3. Şêx Şerîf	67
3.4. EVDIKA	72
3.4.1. Keçika Bikezî	72
3.5. GUNDIKÊ HINDO.....	74
3.5.1. Gundikê Hindo	74
3.6. HACÎKASAN.....	76
3.6.1. Gelîyê Piling	76
3.6.2. Mextela Evlê Saro	77
3.7. MARÎN	79
3.7.1. Kîzên/Kêzîn	79
3.7.2. Şikefta Şoxirdîn	80
3.7.3. Dêrmarok (Mor Evgîn)	82

3.8. MEZRA SEYÎDA	83
3.8.1. Kelha Hêtim	83
3.9. NISÊBÎN.....	86
3.9.1. Mizgefta Selmanê Faris/Selmanê Pak.....	87
3.10. QESIRBELEK	88
3.10.1. Qesirbelek	89
3.11. RÎZOK	91
3.11.1. ‘Elî ‘Alim (Êlim).....	91
3.11.2. Darê Hacî Bekirê.....	93
3.12. TILDÎB.....	94
3.12.1. Til Dîyab (Tildîb).....	94
3.13. XIRABÊ MIŞKÊ.....	95
3.13.1. Xirabê Mişkê.....	96
ENCAM.....	99
ÇAVKANÎ	103
PÊVEK.....	111

LÎSTEYA TABLOYAN

	Rûpel.
Tablo 1: Berawirdkirina mît, efsane û çîrokan	42
Tablo 2: Kategorîzekina mînakên berhevkirî ji alîyê toponîmîyê ve	99
Tablo 3: Kategorîzekirina awayê navên cihan	101



LÎSTEYA ŞEKILAN

	Rûpel.
Şekil 1: Şaxên toponîmîyê û cureyên toponîman	16
Şekil 2: Cihên ku navê wan hatîye guhertin	28



KURTEBÊJE

bnr : Binêre

ç : Çap

dnv : Di nav (da)

ed : Edîtor

h.b. : Heman berhem

hwd: Her wekî din

km: Kîlometre

r : Rûpel

tr: Tirkî

veb: Vebêjer

vgh: Veguhêzer

wer: Wergêr

yew: Yewnan

DESTPÊK

Çi zindî çî ne zindî; çî afirîner çî aferîde, her hebûnek navekî xwe heye û bi vî navê ku ji alîyê mirovan ve hatîye danîn dihê naskirin û zanîn. Ne mimkun e tiştek bêyî navê xwe bibe xwedîyê wateyekê. Ji ber vê yekê nav hêmaneka gelekî girîng e bo mirovahîyê. Helbet ev nav jî jixweber derneketine holê anku her navek di çarçoveya disîplînekê da hatîye danîn. Her wiha ev navlêkirin jî li gorî hin edet û nêrîtan pêk hatîye. Navên cih û waran jî di vê çarçoveyê da ne ku pêşî ji bo zanista onomastîkê û piştra jî ji bo binbeşeka wê toponîmîyê dibine mijar.

Mijara Lêkolîne

Ev xebat li ser navê cih û waran hatîye kirin. Mijara xebatê ne tenê navê hin cih û waran û awayê çêbûna wan, di heman demê da awayê cihgirtina wan a di edebîyata gelêrî da ye. Anku rengvedana van navan a di edebîyata gelêrî da mijareka bingeîn e bo vê xebatê. Di çarçoveya vê xebatê da ew vegotinên gelêrî ji sehayê hatine berhevkirin ku navê cih û warekî yan jî awayê navlêkirina wî cih û warî vedibêjin. Bi saya van vegotinên gelêrî mirov dibîne bê ka cihek çawa nav digire, çima vî navî digire û bi vî awayî jî navê van cihan watedartir dibe.

Ji ber têkilîya xurt a di navbera her du zanistan da, çarçoveya teorîk a zanista toponîmîyê û ya cureyên vegotinên gelêrî ji bo beşên cuda yên vê xebatê bûne mijar. Bi vî awayî bingeha têkelkirina keresteyên her du zanistan hatîye danîn.

Armanc û Girîngîya Lêkolînê

Armanca vê lêkolînê ew e ku têkilîya di navbera toponîmî û edebîyata gelêrî da raxe ber çavan. Bi vê boneyê li ser navê hin cih û waran sekinîye û vegotinên gelêrî yên der barê navê van cihan da pêşkêş kirine. Bi neqilkirina van vegotinan, tradîsyona navlêkirinê jî zelaltir kirîye lewra her vegotina gelêrî ku li ser toponîmîya cihekî ye di heman demê da awayê navlêkirinê jî vedibêje. Bê çawa her cihek navê xwe heye, her navlêkirin jî sedemeka xwe heye. Yanî dema ku cihek bi nav dibe, bêguman di wê navlêkirinê da rola rûdanekê heye. Her wiha mimkun e ji vê rûdanê der barê vî navî da vegotinek jî hatibe honan. Dîsa mimkun e ev vegotin bi heman formê hatibe neqilkirin yan jî di neqilkirinê da kirasê xwe guhertibe. Helbet îhtîmal heye ku rewş berovajîyê vê yekê jî be. Yanî dibe ku halê hazir vegotinek hebe û li gorî vê vegotinê nav li cihekî were danîn. Li gorî kîjan pîvanê dibe bila bibe dema ku ew vegotina gelêrî ya der barê navê cih û warekî da hat pêşkêşkirin, di heman demê da têkilîya toponîmîyê û edebîyata gelêrî

jî dihê vegotin. Armanca vê xebatê jî ew e ku bi pêşkêşkirina van vegotinên gelêrî têkilîya di navbera her du zanistan da were şênerkirin.

Onomastîk û bi taybetî jî binbeşa wê toponîmî, ji ber têkilîya xwe ya bi gelek zanistan ra, dibe qadeka gelekî girîng bo her civakê. Çiku navên cihan di nav xwe da gelek kodan li ser wê civakê vedihewînin ku ji bo zanistên din dibin daneyên girîng. Ev zanista ku li Ewropayê têra xwe bi pêş ketîye li gel gurzek xebat û lêkolînan jî li Tirkîyeyê hê negihaya asteka têrker. Di akademîya kurdî ya li Tirkîyeyê da rewş hê jî li paştir e lewra di vê qadê da ji bilî tezekê em li tu xebatan rast nehatin. Her wiha mijara wê teze jî bi awayê berfireh onomastîk e û li ser nav û navlêkirina kesan e. Ji ber vê yekê jî em di wê bawerîyê da ne ku ev xebat dê cihekî xwe di warê toponîmîyê da bigire û sîdewer be. Li gel vê yekê me hewil daye ku hin vegotinên gelêrî entegreyî toponîmîyê bikin û bi pêşkêşkirina wan, têkilîya her du zanistan hinekî şêner bikin. Girîngîya vê xebatê jî ji van her du xalan tê. Helbet divê li ber çavan were girtin ku ev xebat di asta destpêkê da ye lewma kêmanîyên xwe jî dê hebin. Her wiha dê bibe gavek ji bo pêşxistina xebatên di vî warê da û berfirehkirina vê babetê.

Sînor û Çarçoveya Lêkolînê

Her xebateka akademîk, divê di nav sînoren teorîk, têgehî û erdnîgarî da bihê birêvebirin. Wek prensîp divê hin tişt li derve werin hiştin, anku sînorek were danîn da lêkoler tûşî gengeşîyekê nebe û bikare lêkolîna xwe bimeşîne. Lewra Umberto Eco jî dibêje “hûn çendî qadê berteng bikin hûn ê ew çendî baştir bixebitin û bi gavên ewletir ber bi pêş biçin. Tercîhkirina tezeke monografîk çêtir e ji tercîhkirina yeka panoramîk.” (Eco, 2018: 45). Me jî ev yek li ber çavan girt û sînorekî mijarî destnîşan kir bo vê xebatê.

Çawa ku her cih û warekî navekî xwe heye bêguman der barê navlêkirina wir da jî behsek heye. Anku wateyeka wî navî heye û di encama rûdanekê da derketîye holê. Îhtîmal e ku tenê ji ber layîqdîtînekê jî nav li cihekî hatibe kirin û der barê wî navî da vegotînek çenebûbe. Lê dîsa jî ew nav ji vê wateyê ne bêrî ye.

Her çend li gorî xwezayîya ziman û axaftinê gelek nav deforme bûbin û bi halê xwe yê dawî tiştêkî nehînin bîra mirov¹ jî dema mirov pey koka wan dikeve ev wateya ku em behs dikin gelek caran derdikeve holê. Em dikarin bêjin ku heke navek hebe, bi çend hevokan be jî

¹ Her çend di vir da bêjeya “mîrov” raveker be jî me wek “nêr” netewandîye. Çiku me xwestîye hem wateya “nêr” hem wateya “mê” lê bar bikin. Ev yek di temamê xebatê da hatîye kirin.

der barê wî navî da wek sedema navlêkirinê/wateya navî behsek jî heye û tecrûbeyên me yê sehayî jî bûn palpişt bo vê angaştê. Helbet ev behs her demê nagihîjê wê astê ku bikeve formata vegotîneka gelêrî da. Lewma em jî di ser wan ra qevistin û me tenê ew behs kirin mijar bo vê xebatê ku di formata vegotinê gelêrî da ne û der barê navê cih û warekî yan jî navlêkirina wir da ne. Ev vegotin her demê rasterast wateya navê cih û warî nadin anku ne li ser etîmolojîya navî ne. Carinan der barê wê rûdanê da ne ku di encamê da cih bi nav bûye; carinan der barê wî kesî/ê/tiştî da ne ku cih pê bi nav bûye. Lê dîsa jî her du derdikevin heman cihê û navê wî cih û warî watedar dikin.

Ji alîyê cografîk ve jî ji bo vê xebatê sînorek hatîye danîn. Di dîyarkirina vî sînore cografîk da jî îsoglossek bûye dîyarker. Îsogloss ew xet in ku herêmên axaftina wan ji hev cuda ye, li ser nexşeyan ji hev vediqetînin (www.nedirnedemek.com)². Bi vê pêkanê, li rojavayê Nisêbînê heta bi wî cihê ku devoka Omerî dest pê dike û li alîyê rojhilat jî heta bi wî cihê ku devoka Botî dest pê dike bûyê sehaya vê xebatê. Li gel vê yekê li hêla başûr xeta sînore siyasî û li hêla bakur jî sînore îdarî sehaya vê xebatê dîyar kirîye. Helbet li seranserê vê herêma ku sînor jê ra hatî danîn berhevkarî nehatîye kirin, lewra ne pêkan e mirov li her xalê kereste yan jî vebêjêran peyda bike.

Rêbaz û Metodên Lêkolînê

Wek hemû xebatên zanistî di vê xebatê da jî di lêkolînê da hin rêbaz û teknîk hatine bikarînan. Hemwextî karê berhevkarîyê, ji çavkanîyên nivîskî ku bi piranî gotar û pirtûk bûn xwendinê teorîyê hatine kirin. Me karê berhevkarîyê nehişt piştî xwendinê teorîk lewra ji ber ku me ev herêm nas dikir jixwe haya me ji hinek wan vegotinê hebû ku fikrê mijara lêkolînê vesazkirine. Yanî ji ber ku me dizanî em li çî digerin û em ê çî li derve bihêlin me karê berhevkarîyê û yê xwendinê bi hev ra meşand. Piştî berhevkarî û xwendina gotar, pirtûk û çavkanîyên bi vî awayî şablonek bo xetên giştî hate danîn. Bi vê nêrînê em li ser wan çavkanîyan hûrtir bûn ku me dizanî dê sîdewertir bin. Her wiha bi armanca ku hin fikir û raman werin spartin bo jêgirtinan, ji çavkanîyan nîşe hatin girtin.

Di karê berhevkarîyê da jî ji mekîneya wêneyan û cîhazê dengtomarkirinê sîd hat wergirtin. Piştî hevdîtinan dosyayên dangan hatin deşîfrekirin û di cihên hewce da nivîs jî hatin xirirtandin û redaktekirin.

² <https://www.nedirnedemek.com/isogloss-ne-demek> (Dîroka gihiştinê: 26/03/2021).

Di çarçoveya berhevkarîyê da li vê herêmê me berê xwe da navenda du navçe û sêzdeh gundan. Piştra li Stenbolê jî me bi hin kesên vê herêmê ra hevdiştin pêk îna ku bi giştî hejmara wan ji sê kesî borî. Di vê gerê da me der barê hîjdeh toponîman da vegotinên gelêrî berhev kirin. Me yek jî ji çavkanîyên nivîskî lê zêde kir ku ew bi kurdîya nivîskî, yên berhevkirî jî bi devoka herêmê hatine pêşkêşkirin.

Tengasîyên Lêkolînê

Peydakirina çavkanîyên teorîk ên di vî warî da wek tengasîya herî cidî derket pêşberî me. Gurzek çavkanîyên ku hene jî bi piranî hev dubare dikin. Ji ber ku di warê kurdî da lêkolîn li ser toponîmîyê nehatine kirin (yan jî me nekarîye xwe bigihînin wan) hema bêje qet çavkanî bi destê me neketin. Her wiha ji ber ku di warê tirkî da jî mijareka nû ye gelekî kêr çavkanî peyda dibin. Gotarên di vî warî da jî bi piranî li ser toponîmîya cihekî/sehayeka berteng in ku tenê wek rênîşandan dibin mînak û beşa wan ya teorîk jî her dubareya yê din e. Wergerandina jêgirtinên ji van çavkanîyan jî bi serê xwe pirsgerêkeka din e.

Di warê berhevkarîyê da jî em bi hinek tengasîyan ra ri bi rû man ku gelek caran rê li ber lêkolînê dibirîn. Di serî da peydakirina vegotinên gelêrî ku toponîmîyekê vedibêjin diwar bû. Jê wêdetir peydakirina vebêjeran tengasîyeka cidî bû ji bo vê xebatê. Her çend ji bo her vebêjerekî/a ku me xwe gihandîyê referansek hatibe peyda kirin jî gelek caran vebêjer li me ewle nedibûn û nedixwestin bi axivin. Sedema herî beloq jî atmosfera sîyasî ya vê serdemê bû ku gelek caran ji ber vê yekê em ji gundan destvala vegerîyan. Helbet pêkan nebû ku em herin her cihê me berhevkarî li ser toponîmîya wî kirîye. Hem ji bo vê yekê budceya me ne guncan bû hem me nedikarî wê zêdegavîyê bikin ku der barê cihekî da vegotinek peyda bû em qîma xwe pê nehînin. Lewra hem peydakirina vebêjer û referansan diwar bû hem peydakirina wan vegotinên ku dibûn kereste bo vê xebatê. Ji ber vê yekê jî dema ku me keresteyek peyda dikir, mê li wê nedipirsî bê ka vebêjer ji wî gundî ye yan na. Her wiha ew îhtîmal jî hebû ku em li pey wê vegotinê biçin wî cihî lê vebêjerekî/ê peyda nekin.

BEŞA YEKEM

ONOMASTÎK Û BINBEŞA WÊ TOPONÎMÎ

Navlêkirin ji bo mirovan kevneşopîyeka jênegar e. Mirovan, herdem nav li kes û tiştan kirine û xuya ye li gorî van navan wate dane tiştan. Anku navê tiştên şênber, razber, zindî, nezindî, mirov û her cure heyberan bi vî awayî bûne xwedîyê wateyekê û hatine naskirin. Mirovan; mirov jî di nav da ji bo her tiştî pêdivî pê birine ku navekî dîyar bikin û wî/wê tiştî/kesî/kesê bi vî navî nas bikin û bidine naskirin. Lewra dema ku mirov bifikire, ne mimkun e ku bêtî navan jîyan bimeşe û mirov têkilîyê bi hev ra danin. Li gorî Platon, ji bo her heybera ku heye divê mirov der heqê wê heyberê da sê tiştan bizane û ev nav, pênase û nima (imge) ne (Poyraz, 2004: 236). Dîyar e ku ev çanda navlêkirinê ya jênegar dê her bidome. Her wiha dema em bala xwe bidine dora xwe em ê bibînin ku cihê nîqaşê ji vê gotinê ra nîn e. Çawa dema pitikek dibe, malbata wî/wê navekî lê dike di nav geşedanên teknolojîk da jî her tiştê ku dihe afirandin wek gava yekem navek ji bo dihe dîyarkirin. Lewra ji bo ku qala wî/wê were kirin divê navek hebe da ku ev behs were cih.

Hemû zanist bi pêla “rewşenbîrîyê” re derketine meydana. Ji bo gelek mijarên curbicur, ev zanist li gel qaîde û çarçoveya xwe hatine afirandin ku her yek ji wan li ser mijareka dîyar hûr dibe, lêkolînan dike û digihîje encamê. Her wiha armanc ji afirandina zanistê bixwe jî ev e. Xebatên di çarçoveya navlêkirinê da jî bûne mijara “onomastîk”ê ku mirov dikare wek “navnasî” kurdîze bike. Loma ev qad jî bi demê ra wek zanistekê derketîye meydana.

1.1. WEK ZANISTEKÊ ONOMASTÎK

Îbrahim Şahin di çarçoveya onomastîkê da navan wek “onîm (navê taybet)” û “apelyatîf (navê cureyî/cinsî)” dabeş dike. Onîm dihe wateya navê taybet û di têgeha onomastîkê da, di navlêkirina şaxên wê da û di vesazkirina gelek têgehên têkildarî onomastîkê da peywirê digire. Ji “*ονομα, ονυμα*” ya grekî pêk hatiye (Şahin, 2018: 11). Apelyatîf ji alîyê wateyê ve dijî onîmê ye lê dîsa jî ew di çarçoveya onomastîkê da pênase kirîye. Bi bêtî ya latînî “apellere” çêbûye ku di frensî da wek appellatîf, di rûsî da wek “appellyatîv, di almanî da wek appellatîvum derbas dibe û dihe wateya navlêkirinê (Şahin, h.b.: 12).

Ger mirov têgeha navî wek “peyva ku kesek yan jî tiştek pê dihe naskirin” pênase bike û onomastîk jî zanista navî be mirov dikare bêtî onomastîk ew zanist e ku li ser navan û navên

kesan lêkolînan dike; ji alîyê kokê, geşedana dîrokî û pîrsgirêkên çand û zimanî ve li ser wan disekine (TDK, 2005: 21). Berfirehtirîn pênaseya onomastîkê ji alîyê Dilek Keleş ve hatiye kirin. Li gorî vê pênaseyê;

Onomastîk ew zanist e ku li ser wate, kok û awayê dayîna navî lêkolînan dike, bi vî awayî pêşketin û çanda civakan destnîşan dike; bi zimannasî, dîrok, cografya, civaknasî, derûnnasî, folklor û arkeolojîyê ra di nava têkilîyeka xurt da ye; li welatên rojava wek dîsîplîneka serbixwe kar dike lê li welatê me [Tirkîye] di nava zanistên din da dihê meşandin (Keleş, 1996: 1).

Helbet divê were destnîşankirin ku ev zanist li ser navên taybet anku serenavan disekine. “Ev zanist, li ser awayê lêkirina navên taybet yên wek navê mirovan, navê cihan, navê kuçe, kolan û taxan, navê gel û netewan, navê beşên erdnîgarî, navê lehengên di berhemên wêjeyî de, navê berhem û merqeyan û hwd dixebite” (Öçal, 2016: 2).

Lêkolînen li ser navlêkirinê bi awayekî rêk û pêk di bin banê zanista têkildar onomastîkê da hatine kirin. Bi gotineka din xebatên li ser navan bi afirandina zanista onomastîkê ra sistematîze bûne û ketine çarçoveya dîsîplînekê da. Ev yek jî gelekî ne dîr e lewra onomastîk zanisteka nû ye. Sala 1949ê li Parîsê konseyek ji bo xebatên di vî warî da dihê avakirin ku heta niha jî xebatên xwe didomîne. Ev konsey kovareka bi navê “onoma” diweşîne û civînên navnetewî li dar dixê. 1951ê jî li Emerîkayê bi navê “The American Name Society” komeleyek dihê damezrandin ku li gel navên Emerîkî li ser hemû navên cîhanê dixebite (Öçal, h.b.: 9).

1.2. ŞAXÊN ONOMASTÎKÊ

Onomastîk wek sehayeka zanistê, xwedî gelek binbeşan e. Di vê zanistê da dîsa li gel binbeşên xwe sê şaxên sereke hene:

Zanista navên cih û waran (toponymie, toponomy)

Zanista navên cografîk: Navên çeman: (1: hdyronymie, hydronymy, hydronymie; navên çîyayan: (2: oronymie, oronymy)

Zanista navên kesan (anthroponymie, anthroponymy, antroponymie) (Yavuz & Şenel, 2013: 2241).

Li gorî kategorîzekirina Şahinî di vê kategorîzekirinê da pîrsgirêk heye lewra ew hîdronîmî û oronîmîyê wek şaxên toponîmîyê destnîşan dike. Weke dîyar dibe zanista onomastîkê di çarçoveya xebata xwe da li gorî hin taybetmendîyan navan kategorîze dike, ji bo

her kategorîyekê binbeşeka xwe heye û li ser her cure navekî di bin beşa têkildar da li gorî qaîdeyên taybet hûr dibe. Di nav van da navên cih û waran anku toponîm û navên kesan anku antroponîm bêtir li kar in. Çiku herî zêde navên kesan û navê cihê ku lê dijîn dihêne bikarînan. Piştra jî navê çiyayan anku oronîm û navê avan anku hîdronîm dihên ku wek navên cografîk hatine kategorîzekirin (Yavuz & Şenel, h.b.: 2241). Li gorî agahîyên ku Serdar Öçal neqil dike, li gel antroponîm û toponîmê beşeka din a bingeşîn a onomastîkê “etnonîm (ethnonym)” e û ev beş jî li ser navê komên mirovan ên wek malbat, eşîr, gel û miletan disekine (Öçal, h.b.: 7).

Yavuz û Şenel li gorî vê kategorîzekirinê hîdronîm û oronîman rasterast wek binbeşên zanista onomastîkê nîşan didin lê Şahin wan wek cureyên toponîmîyê destnîşan dike ku ew jî binbeşeka onomastîkê ye. Şahin li ser têgehên toponîmîyê bi awayekî berfireh xebitîye û ji bo her yekê ji wan têgehan navên tirkî pêşniyar kirine. Em ê jî di vê beşê da bêtir li ser cure û binbeşên toponîmîyê bisekinin lewra mijara vê xebatê ji onomastîkê wêdetir toponîmî ye. Di vê çarçoveyê da em ê bêtir senifandina Îbrahim Şahin referans bigirin.

Şahin 17 şaxan ji bo zanista onomastîkê destnîşan dike. Ji ber ku ji onomastîkê wêdetir mijara vê xebatê toponîmî ye em van şaxên onomastîkê û zanista têkildarî wan tenê wek nav destnîşan bikin. Aneonîm navê bayî, aneonîmî jî zanista têkildar; antroponîm navê kesan, antroponîmî jî zanista têkildar; astronîm navê stêran, astronîmî jî zanista têkildar; dokumantonîm navê belgeyan, dokumantonîmî jî zanista têkildar; ergonîm navê rêxistinên, ergonîmî jî zanista têkildar; etnonîm navê kokan (ji bo mirovan), etnonîmî jî zanista têkildar; fîtonîm navê nebatan, fîtonîmî jî zanista têkildar; hrematonîm navê berhemên, hrematonîmî jî zanista têkildar; hrononîm navê deman, hrononîmî jî zanista têkildar; kozmonîm navê fezayê, kozmonîmî jî zanista têkildar; mîtonîm navê mîtan, mîtonîmî jî zanista têkildar; poreyonîm navê siwareyan, poreyonîmî jî zanista têkildar; pragmatonîm navê beran (mehsûl), pragmatonîmî jî zanista têkildar; planetonîm navê asîman, planetonîmî jî zanista têkildar; toponîm navê cih-waran, toponîmî jî zanista têkildar; urbonîm navê bajaran, urbonîmî jî zanista têkildar; zoonîm navê ajalan, zoonîmî jî zanista têkildar îfade dike (Şahin, 2018: 29-89).

Şahin di pirtûka “navnasî” da urbonîm wek şaxeka onomastîkê destnîşan dike lê di gotara xwe da ku bi navê “Pirsgirêkên Senifandina Têgeh û Cureyan di Navwarnasiya (toponîmî) Tirkîyeyê da” weşandiye, urbonîm wek cureyekî toponîmîyê destnîşan dike. Ew êdî di wê bawerîyê da ye ku divê urbonîm ne wek cureyekî onîman yan jî toponîman were nirxandin. Divê mîna mîkrotoponîmî û makrotoponîmîyê wek sehayekê were nirxandin ku toponîm lê dihêne berhevkirin (Şahin, 2018: 87).

1.3. WEK ZANISTEKÊ TOPONÎMÎ

Toponîm cureyekî onîmê (navê taybet) ye ku dihê wateya her cure navlêkirinên cografîk ên weke oronîm (navê çîyayan), hîdronîm (navê avan), urbonîm (navê bajaran) û agroonîman (navê zevîyan) (Şahin, 2013: 48). Hemû navên cografîk ên welatekî yan jî erdeka dîyar wek toponîmîya wî welatî/wê erdê dihê binavkirin (Yusifov & Kerimov, 2017: 17). Têgeha toponîmê koka xwe grekî ye ku wek “topos” anku cih û “onoma” anku nav ji du hêmanan pêk dihê û dihê wateya “navên cografîk”, “navê cih û waran” (Albayrak, 2004: 15).

Toponîmî jî navê wê zanistê ye ku li ser toponîman disekine. Anku wek binbeşa sereka ya onomastîkê û wek zantistekê toponîmî li ser navê cih û waran disekine, wan disenifîne û li ser wateya wan hûr dibe. Toponîmîya cihekî hemû navên cografîk ên li wî cihî di nav xwe da dihevwîne. Yediyıldız jî dibêje toponîmî di wateya teng da şaxeka zimannasîyê û bi giştî jî şaxeka onomastîkê ye ku bi gelemperî li navên taybet dikole (Yediyıldız, 1984: 25). Zanista ku ji alîyê wate, kok, rastnivîsîn, gramer, çêbûn û geşedanê ve behsa toponîman dike wek toponîmî dihê binavkirin (Yusifov & Kerimov, h.b.: 17). Li gorî Şahin jî toponîmî binbeşeka onomastîkê ye ku lê digere bê ka navên cih û waran çawa derketine holê, ew cih çawa avabûne û li ser geşedanên wan ên dîrokî lêkolînan dike (Şahin, 2013: 49).

Mirov dikare zanista toponîmîyê wek “navwarnasî” kurdîze bike. Li gorî Hasan Eren toponîmî zanisteka serbixwe ye û şaxeka rêzimanê ye ku hewil dide navên cihan ji alîyê avanî, wate û rayekê ve rave bike (Eren, 2018: 11).

Şahin dibêje toponîmî, xebatên zimanî yê li ser navên taybet ên weke oykonîm, oronîm û hîdronîman vedihewîne ku li gund, bajar, welat yan jî herêmekê dihêne kirin û toponîmîyê wek du şaxan vediqetîne:

Toponîmîya Nivîskî (Yazıneradbilim): Li ser lêkolînên navên wan cihan disekine ku di berhemên edebî yê weke roman, hîkayet, destan, çîrok û tiştanokan da derbas dibin. Vê têgehê ji toponimika poetičeskaya ya rûsî pêşniyar dike. Her wiha dibêje, dibe ku ev cih cihên rasteqîn bin yan jî ji alîyê nivîskar ve hatibine afirandin û xeyalî bin.

Toponîmîya Heşîfî (Sılikeradbilim): Ew şaxa toponîmîyê ye ku li ser navê heyberên wek çîya, gir, til, mer’a, zevî, ziving, şûn (cih), kanî, best, qelişteken şapeyê, bîr û hwd lêkolînan dike. Ev cih tenê ji alîyê şênîyên wir ve dihêne zanîn lê şênîyên cihên din nizanin lewma di nexşeyan da cih nagirin û bi rêya neqilkirina nîş bi nîş xwe digihînin îro (Şahin, 2013: 49).

Şahin ev têgeh di cihê mîkrotoponîmîka ya rûsî da pêşnîyar kirîye ku em ê jî bêtir têgeha mîkrotoponîm bi kar bînin.

Li gorî vê nêrînê dikare bê gotin ku toponîmên biçûk hene û yên mezin hene û li gorî berfirehbûna erda xwe wek makrotoponîm û mîkrotoponîm dibine du kom. Makrotoponîm beranberî erdên berfireh; mîkrotoponîm beranberî erdên berteng dihê (Albayrak, h.b.: 35). Bi gotineka din mîkrotoponîm navê cihên teng û xwezayî ku dihên zanîn îfade dike (Yavuz & Şenel, h.b.: 2248). Minkun e mirov li her cihê li yên mezin rast were lê yên biçûk di herêmeka teng da veşartî mane. Mîkrotoponîm weke oronîm, hîdronîm, oykonîm, horonîm, dromonîm, agronîm, urbonîm û drîmonîm her cure navên cihan in ku tenê ji alîyê şênîyên wî cihî ve dihêne bikarînan, di nexşeyeka çapa xwe 1/100.000 da jî cih nagirin û nifş bi nifş xwe digihînin roja me (Şahin, 2011: 1749). Pênaseyeka ji van cuda ji alîyê H. Hilmi Karaboran ve dihê kirin ku dibêje toponomastîk di heman demê da wek mîkrotoponomastîk jî dihê binavkirin û mîkrotoponomastîk lêkolîna li ser navê mevkîyan îfade dike (Karaboran, 1984: 97).

Mimkun e ku di cihekî teng da bi hezaran mîkrotoponîm hebin. Dema li gundekî û derdora wî were nêrîn dê were dîtin ku navê her bestikê, her rezî, her tilî anku her niqtêyê heye û gelek caran hemû jî ji alîyên şênîyan ve nahên zanîn. Dibe ku navê wan bihîstibin û zanibin jî lê cihê wan nizanibin. Ji ber ku rewş ev e û mîkrotoponîm jî jixwe nehatine nivîsîn, ev yek jibîrkirin û her wiha windabûna wan jî bileztir û hêsantir dike. Valakirina gundan, koçkirin, karesatên xwezayî, êş, komkujî, mirin û tiştên bi vî awayî jî dibine sedema windabûna mîkrotoponîman (Şahin, 2011: 1751).

Gelek caran ne pêkan e di berhemên edebî da yan jî di xebatên teorîk da mîkrotoponîm bihên dîtin lê di vegotinên gelêrî yên li herêmeka teng da xuya dibin. Lewra ew lokal in û di nexşeyan da jî cih nabînin. Mesela mextel³ ji bo mîkrotoponîman dibine mînakên baş. Ji ber ku ev mîkrotoponîm bêtir di hişê mirovan da xwe diparêzin divê lêkolêrên ku li ser toponîmîyê dixebitin bi rêya berhevkarîya li herêmê, xwe bigihînin wan (Murzayev, vgh: Şahin, 2013: 49). Helbet bo mîkrotoponîman çavkanî tenê ne kes in. Lêkoler ji bo xwe bigihînin wan dikarin serî li hin çavkanîyên nivîskî jî bidin ku rola wan jî girîng e ji bo mîkrotoponîman. Kîtabet (tahrir defterleri), sîcîlên şerîyeyî, lîstîkên weqfan û salname jî dibine çavkanî bo lêgerînên mîkrotoponîman (Şahin & Köse, 2014: 173).

³ Mextel ew cih e ku kesek lê hatîye kuştin û êdî ew niqte bi wî kesî dihê binavkirin.

Ji alîyê din ve Yusifov û Kerimov bi giştî ji bo toponîman (û her wiha xebatên toponîmîk) wek “çavkanîyên toponîmîk” sê çavkanîyan destnîşan dikin:

Çavkanîyên Nîvîskî: Di nivîsên Şîmur-Akkad, Asur û Urartuyan da li ser erdnîgarîya Azerbeycanê⁴ hin toponîm û etnonîm hatine tomarkirin. Di sedsala destpêkê û ya navîn da hin nivîskarên ermen hin navên cografîk dane û dîsa di çavkanîyên edebî da, di nivîsên gerokan da hin navên cografîk derbas dibin.

Bîrdariyên Epîgrafîk: Ev kîtabeyên kevirîn wek çavkanîyên toponîmîk gelekî girîng in.

Nimûneyên Afirînerîya Gel (Folklor): Hin destanên qehremanî û evînê ku bi sedsalan bi awayekî bihîzbarî nîfş bi nîfş hatine veguhastin navê gelek bajar, çîya, bestan di xwe da vehewandine (Yusifov & Kerimov, h.b.: 69-72).

Mîkrotoponîm ji bo vê xebatê têgeheka girîng e lewra gelek mînakên ku me berhev kirine, dikevîne vê kategorîyê da. Ev mînakên ku me berhev kirine ji alîyê ziman û çandê ve jî daneyên girîng di nav xwe da vedihewînin. Çîku “lêkolînên mîkrotoponîmîyê ji bo dîyarkirina çanda navlêkirinê ya miletekî û tespîtkirina dewlemendîya zimanê wî miletî gelekî girîng in” (Şahin, 2011: 1748).

Eren jî dibêje di xebatên toponîmîyê da navên hemû cihan, navên gund û bajaran û wek çîya, best, til û hwd navên cihên xwezayî li ber çavan dihêne girtin. Şaxa toponîmîyê ku li ser navên çîya, gir, til û hwd disekine wek *oronymie*; şaxa ku li ser navên best, rûbar, gol û hwd jî disekine wek *hydronymie* dihê binavkirin (Eren, h.b.: 11).

Zanista toponîmîyê her çend ji dawîya sedsala 19em û pê ve hatibe bikarînan jî cihgirtina meseleyên toponîmîk ji berhemên zanyarên yewnana antîk dest pê dikin û heta weke îro di berhemên hinek dîroknas, zimanzan û zemînnasan da cihê xwe girtine (Albayrak, h.b.: 16). Lewma dikare bê gotin ku toponîmî bi dîrok, ziman, cografya û çandê ra di nava têkilîyeka xurt da ye. Wek mînak bi encama xebatên di vî warî da zimannasek dikare li ser ziman, zarave, devoka wî cihî bibe xwedîyê fikrekî û lêkolînên xwe li ser van bidestxistinan bimeşîne. Li gorî pênaseya toponîmîyê ku Yediyıldız dike jixwe toponîmî di wateya teng da şaxeka zimannasîyê ye (Yediyıldız, h.b.: 25). Ji alîyê din ve arkeologeg dikare li ser navê tilekî, çîyayekî bibe xwedîyê fikrekî lewra dibe ku wî cihî ji cihekî berîya xwe nav girtibe. Etnologeg yan jî dîroknasek dikare li gorî navê wî cihî fêma bike bê ka berê kîjan millet li wir jîyaye û têkilîya şênîyên îro bi wî miletî ra çî ye, çawa bûye û hwd. Bi gotinên Murzayev, ger zimannasek bixwaze di sehaya toponîmîyê da serkeftû bibe divê dîrok û cografyayê bizane, divê dîroknas li

⁴ Ji ber ku ev kes li ser toponîmîya Azerbeycanê xebitîne wek mînak wê didin.

ser ziman û cografyayê xwedîyê agahîyan be, cografyanas jî qet nebe agahî û metodên ziman û dîrokê bizane ku ji bo tehlîlên toponîmîyê hewce ne (Yusifov & Kerimov, h.b.: 73). Her wiha mirov dikare vê têkilîyê berovajî jî şîrove bike çiku zanista toponîmîyê di heman demê da bi xebatên xwe ji bo van zanistan jî xizmetê dike.

“Berî her tiştî lêkolînên toponîmîk bi serkeftinên dîrok, ziman û cografyayê ra eleqedar in û divê toponîm bi awayekî berfireh cih bide metodên lêkolînê yên van zanistan” (Yusifov & Kerimov, h.b.: 73). Dema ku toponîmî li ser navê cih û waran lêkolînan dike, rêbazên van zanistan bi kar dihîne û di encamê da li gel gelek zanistên civakî xizmetekê ji bo van zanistan dike (Şahin, 2007: 2). Helbet mirov nikare têkilîya toponîmîyê tenê bi van zanistan ra sînordar bike lewra mijara navê cih û waran mijareka berfireh û girîng e û hemû zanistan eleqedar dike. Toponîmî herî zêde pêdivîyê bi zimannasî, cografya, dîrok, arkeolojî, folklor, antropolojî, civaknasî, etnografya û hwd dibe û ev zanist weke çav, guh û destê toponîmîyê ne (Yavuz & Şenel, h.b.: 2242).

Fonksîyona navlêkirinê û navên cografîk di jîyana sosyal da roleka xwe ya pir girîng heye. Dema mirov li pirsên weke “tu ji ku yî?”, “tu ji ku dihêyî?”, “tu diçî ku?”, “ev der ku der e?” û hwd bifikire, ev fonksîyon dê baştir bihê fêmkirin. Ji alîyê din ve Kerimov û Yusifov behsa pênc fonksîyonên zanista toponîmîyê dikin ku ji toponîmîstê navdar E. M. Murzayez neqil kirine:

1. Agahker,
2. Pedagojî,
3. Sazkirina navlêkirin û navguhertinê,
4. Fonksîyona navên cografîk,
5. Rastnîvîsîna navên cografîk, wergerandina wan bo zimanekî din (Yusifov & Kerimov, h.b.: 20).

Di warê toponîmîyê da li Frensayê gelek kes xebitîne û sala 1938ê li Parîsê Yekemîn Kongreya Toponîmî (Toponymie) û Antroponîmîyê (Anthroponymie) ya Navnetewî hatîye lidarxistin ku nêzî bîst welatan (dewlet) beşdar bûne. Di dawîya vê kongreyê da li Frensayê komîsyonek bi navê Komîsyona Toponîmî (Toponimie) û Antroponîmîyê (Anthroponymie) dihê damezrandin (Eren, h.b.: 11). Li gel Frensayê li Belçîka, Swîsre, Îtalya, Îspanya, Portûgal, Almanya, Welatên Slavî, Mekaristan û Romanyayê jî di warê toponîmîyê da gelek xebatên girîng hatine kirin. Nivîsa Fuad Köprülü ku sala 1925ê di *Türkiyat Mecmuası* da bi sernivîsa

Oğuz Etnolojisine Dair Tarihi Notlar derketîye jî li nav tirkan wek yekem xebata toponîmîk dihê qebûlkin. Lê Eren dîsa jî dibêje “em hê li serê rêyê ne” (Eren, h.b.: 13). Dema me berê xwe da xebatên akademîk ên kurmancî, li ser vê zanistê em li tezekê rast hatin ku bi navê *Awayê Lêkirina Navan li Herêma Dêrikê (Lêkolîneke Onomastîk-Sosyolojîk)* li Zanîngeha Artukluyê hatîye qebûlkin. Her çend toponîmî tê da hebe jî weke ku ji navê wê jî dîyar dibe ev xebat bêtir li ser onomastîkê ye.

1.3.1. Şaxên Toponîmîyê û Cureyên Toponîman

Weke li jor jî hatî behskirin, zanista toponîmîyê navan li gorî taybetmendîyan kategorîze dike û ji bo navê her cihekî/tiştêkî şaxeka xwe li gel binbeşên xwe heye ku ev şax navê zanistê îfade dikin. Binbeş cureyên toponîman îfade dikin ku dîsa di nav xwe da vediqetin. Îbrahim Şahin wek *oykonîmî (orunadibilim)*, *oronîmî (dağadibilim)*, *hîdronîmî (suadibilim)*, *urbonîmî (kentlikadibilim)*, *hironîmî (eladibilim)*, *drîmonîmî (ormanadibilim)*, *dromonîmî (yoladibilim)* û *agroonîmî (bağadibilim)* heşt şaxan ji toponîmîyê dibe (Şahin, 2013: 56).⁵

Şahin toponîman jî wek heşt cureyan destnîşan dike û wiha rêz dike: *Oykonîm (orunadî)*, *oronîm (dağadî)*, *hîdronîm (suadî)*, *urbonîm (kentlikadî)*, *hironîm (eladî)*, *drîmonîm (ormanadî)*, *dromonîm (yoladî)*, *agroonîm (bağadî)* (Şahin, 2013: 48).

Anku *oykonîmî* wek şaxeka toponîmîyê navê zanistê be *oykonîm* jî wek navê cihan (toponîm) dibine keresteyên vê zanistê. Ji ber ku rasterast yan jî ne rasterast bi mijara vê xebatê ve girêdayî ye, em ê li vir bi kurtasî behsa van şax û binbeşan bikin.

1.3.1.1. Oykonîmî û Oykonîm

Oykonîmî şaxeka toponîmîyê ye ku li ser navên meskenan disekine. Ev mesken wek mal, avahî û hwd warê rûniştinê îfade dike. Ev zanist derketina holê ya meskenan, geşedana wan, teşegirtina wan û rola wan dike mijara lêkolînê (Şahin, 2013: 52).

“Oykos” bi grekî dihê wateya mesken, war, mal û “onîm” jî dihê wateya navî (Yavuz & Şenel, h.b.: 2249). Bi gotineka din ew cure toponîm in ku navê mintiqeyên jîyanê îfade dikin (Albayrak, h.b.: 32).⁶ Navên cihên ku mirov lê dijîn wek bajar, bajarok, gund, gundik, çewlikên ku ketine vî teşeyî da û hwd dibine *oykonîm*. Ev cure wek *komonîm* ku li navê gund, gundik

⁵ Em dikarin navê hin şaxan ji van kurdîze bikin ku ev tenê pêşniyar in. Mînak *oykonîmî* wek *navmeskenasî*; *oronîmî* wek *navçîyanasî*; *hîdronîmî* wek *navavnasî*; *urbonîmî* wek *navbajarnasî*; *dromonîmî* wek *navrênasî* û *agroonîmî* wek *navzevînasî*.

⁶ Receb Albayrak ne wek *oykonîm* lê wek *okonîm* bi nav dike.

(mezra) û çewlikan dikole û wek *astîonîm* ku li navê bajaran dikole dibe du beş (podol'skaya, vgh: Şahin, 2013: 52). Ji ber ku zozan ji alîyê çawanîyê ve ji gund û bajaran vediqetin Şahin beşeka din li van zêde dike. “Orpedya”ya grekî û “onîma” dikelijîne û vê beşê wek “orpedyonîm” bi nav dike ku li ser navê zozanan dikole (Şahin, 2013: 52). Di xebatên toponîmîyê da mijara giringtirîn navên bajar û gundan e. Çiku dema ku mirov li jîyana sosyal difikire, ewilîn gund û bajar dihêne hişê mirov. Navlêkirina van cihan jî ji bo dîrok, zimannasî, etnolojî, arkeolojî û gelek zanistan xwedîyê girîngîyê ye. Lewra pêkan e ku navê gund û bajaran ji bo van zanistan daneyên bêhempa vehewînin.

1.3.1.2. Oronîmî û Oronîm

Oronîmî ew şaxa toponîmîyê ye ku li ser navên çîyayan, derketina wan, geşedana wan, teşegirtina wan û peywira wan lêkolînan dike (Şahin, 2013: 52).

Oronîm ji “oros” anku çîya ku bi zimanê grekî ye û “onîma” anku nav hatîye dariştin. Cureyekî toponîman e ku navên çîya, gir, til, gelî, kendal, bor, deşt û hwd îfade dike (Murzayev; podol'skaya; Ahmedov, vgh: Şahin, 2013:52). Speleonîm beşa oronîman e. Ji “spelon (yew: şikeft)” û “onîm”ê pêk dihê û navên şikeft, zinar, kendal, bestik û hwd ên ku bi awayekî xwezayî di binê erdê da çêbûne îfade dike (Yavuz & Şenel, h.b.: 2251).

1.3.1.3. Hîdronîmî û Hîdronîm

Hîdronîmî şaxa toponîmîyê ye ku li ser koka avan, derketina wan, geşedana wan, teşegirtina wan û rola wan lêkolînan dike (Şahin, 2013: 53). Bi kurtasî ew zanist e ku bi giştî li ser navê avan disekine û lêkolînan dike.

Cureyekî toponîman e ku hem navên avên xwezayî hem navên avên çêkirî îfade dike. Ji “hîdro”ya grekî û “onîma” pêk dihê ku di rûsî da wek *gîdronîm* û di almanî da wek *hydronym* dihê zanîn (Podol'skaya; Ahmedov, vgh: Şahin, 2013: 53). Em dikarin Behra Wanê wek *mînak* bidin. Helbet têgeha “av”ê li gel behran; zerya, gol, çem, best û hwd jî îfade dike. Her wiha hîdronîm jî wek *potamonîm* (navê bestan), *lîmnomonîm* (navê golan), *okyeanonîm* (navê zeryayan) û *helonîm* (navê çiravan) dibe çar beş û *pelagonîm* (navê behran) jî beşa *okyeanonîman* e (Şahin, 2013: 53). Weke dîyar dibe hîdronîmî her cureyê avan ji hev vediqetîne û ji bo her yekê beşeka xwe heye ku ev yek ji sîstematîzebûna vê zanistê ye. Lewra ev zanist di nava xwe da xwedîyê dîsîplînekê ye û di çarçoveya vê dîsîplînê da dixebite ku ev cudakirin nûansan jî li ber çavan digire.

1.3.1.4. Urbonîmî û Urbonîm

Urbonîmî ew zanist e ku li ser derketin, geşedan, teşegirtin û rola urbonîman disekine û urbonîm jî bi bi zimanê rûsî ye ku di latînî da wek “urbanus” derbas dibe û tiştên aîdî bajarî îfade dike (Şahin, 2013: 53). Albayrak vê têgehê wek “urbanonîm” dîyar dike û dibêje ew toponîm in ku navên rez, bexçe, park, keleh, pir, avahî, meydan, rê, kuçe û hwd didine zanîn (Albayrak, h.b.: 32). Jixwe dema em bala xwe bidine van, em ê bibînin ku hemû di nava bajaran da dibin anku aîdî bajarî ne. Em dikarin *Koprîya Alaman*⁷ wek mînak bidin.

Urbonîm wek agoronîm (navê meydanan), godonîm (navê şiverêyan), gorodskoy horonîm (navê semt, mehele, zîyaret û hwd ên li bajarî) û ktemtonîm (navê sazîyan) vediqete binbeşan (Şahin, 2013: 54).

1.3.1.5. Horonîmî û Horonîm

Horonîmî şaxeka toponîmîyê ye ku koka horonîman, derketina wan, geşedana wan, teşegirtina wan û rola wan dikole (Şahin, 2013: 54). Horonîm cureyê toponîman e û ji “horo”ya grekî ku dihê wateya welat, êl, sînor û onîm pêk hatîye (Şahin, 2013: 54). Ew toponîm in ku navê erdên niştimanî-îdarî-cografî didine zanîn (Albayrak, h.b.: 32). Ji horo (yew: welat) û onîma pêk dihê û wek welat, vîlayet, herêm, bajar û hwd navên taybet ên her erda îdarî û xwezayî dîyar dike (Yavuz & Şenel, h.b.: 246). Serhad, Botan, Behdînan, Tor ji bo vî cureyî mînak in.

Horonîm dibine du beş: Admînstratîvniy horonîm ku sînorên welat, herêm, bajar û hwd îfade dikin û di belgeyên fermî da dihêne qebûlkin; prîrodnîy horonîm jî wan cihan îfade dike ku sînorên wan ê fermî nîn in lê sînorên xwezayî hene (Podol'skaya; vgh: Şahin, 2013: 54-55). Bajarê Amedê ji bo admînstratîvniy horonîm û Deşta Mêrdînê jî ji bo prîrodnîy horonîm dibine mînak.

1.3.1.6. Drîmonîmî û Drîmonîm

Drîmonîmî li ser koka drîmonîman, derketina wan, geşedana wan, teşegirtina wan û rola wan disekine (Şahin, 2013: 55). Têgeha drîmonîm wek drîmos (yew = daristan) + onîm anku nav hatîye dariştin (Yusifov & Kerimov, h.b.: 191). Anku drîmonîm dehl jî di nav da navên

⁷ Koprîya Alaman li Nisêbinê ye û beşek ji rêhesinî ye. Ji ber ku almanan çêkirîye ev nav lê bûye.

daristanan îfade dike û drîmonîmî jî ew zanist e ku li ser van nava lêkolînan dike. Mirov dikare Çîyayê Bagokê û Bexçeyên Hevselê wek mînak bide.

1.3.1.7. Agroonîmî û Agroonîm

Bi grekî “agros” dihê wateya “alan, erd, zevî”yê. Agroonîm bi bestina agros û onîma pêk hatîye û agroonîmî jî şaxa toponîmîyê ye ku li ser navên wan disekine (Şahin, 2013: 55). Agroonîm navê taybet ên erd, zevî û alanan e ku çandinî li ser wan dihê kirin.

1.3.1.8. Dromonîmî û Dromonîm

Dromonîm cureyekî toponîman e û navê taybet ê xet û rêyan îfade dike. Ev rê û xet avî, hewayî, di bin erdê da û li ser erdê dibin. Her wiha dromonîm ku rûsî ye ji “dromos” anku “rê”ya grekî û onîma pêk hatîye (Şahin, 2013: 55). Dromonîmî jî dibe navê zanistê ku şaxeka toponîmîyê ye. Em dikarin Rêya Hevrîşîm, Qenala Suveysê, xeta petrolê ya Baku-Tiflîs-Ceyhanê wek mînak bidin.

Yavuz û Şenel di Ferhenga Têgehên Toponîman da “dromonîm” wek navê rê û kuçeyan destnîşan dikin (Yavuz & Şenel, h.b: 2244) lê Şahin dibêje divê navê rê, kuçe, rêyên otobus, ferîbot û vapuran ku di nava bajarî da ne, ne di çarçoveya dromonîman lê di çarçoveya urbonîman da werine bicihkirin (Şahin, 2013: 55). Her wiha em dikarin van nakokîyan berfirehtir jî bikin lewra li ser kategorîzekirina toponîman di nav zanyaran da konsensusek pêk nehatîye. Yusif Yusifov û Serraf Kerimov di pirtûka xwe da nakokîyên di vê mijarê da li ser fikrê çend toponîmîstan nîşan didin:

A. Gurbanov navên cografîk wek toponîm û hîdronîm dike du beş. Her wiha navên cografîk ku bi erdê ra eleqedar in wek toponîm; navên ku bi avê ra eleqedar in jî wek hîdronîm bi nav dike.


V. A. Nikonov dibêje toponîmî ji çar beşan pêk dihê: Oykonîm, hîdronîm, oronîm, mîkrotoponîmî.

R. Yuzbaşov toponîmîyê dike heşt şax û van şaxan wek antrotoponîmî, etnotoponîmî, fitotoponîmîka, zootoponîmî, paleotoponîmî, hîdronomîka, oronîmîka û oykonomîka rêz dike.

N. V. Podolskaya wek oykonîmîka, urbonîmîka (navê bajar û herêman), horonîmîka (navê welat, vîlayet û herêman), dromonîmîka (navê rêyan), oronîmîka, mîkrotoponîmî û hîdronîmîka dike beş. Di heman demê da oykonîmîkayê wek komonîmîka (navê bajarên mezin), polîsonîmîka (navê bajaran), hîdronîmîka patonîmîka (navê bestan), lîmnonîmîka (navê golan), palegonîmîka (navê behran), gelanîmîka (navê çiravan) vediqetîne binbeşan. (Yusifov & Kerimov, h.b.: 79-80).

Weke xuya dike li ser kategorîzekirina toponîman, di hin cihan da toponîmîst ji hev cuda difikirin lê ger em li gorî kategorîzekirina jor şemayekê çêbikin tiştekî bi vî rengî dê derkeve pêşberî me:

Şekil 1: Şaxên toponîmîyê û cureyên toponîman



Helbet fikrên Yusifov û Kerimov jî li ser vê yekê hene. Ew di berhema xwe ya bi navê “Lêkolînek li Ser Esasên Toponîmîyê (Toponiminin Esasları Üzerine Bir İnceleme)” da wiha tevî van nîqaşan dibin:

Divê oronîmîka, hîdronîmîka, urbonîmîka, horonîmîka, dromonîmîka û drîmonîmîka wek beşên [cure] toponîmîyê werine binavkirin lê ne guncan e mirov mîkrotoponîmîyê bixe nav van beşan da. Çiku mîkrotoponîmî (û makrotoponîmî) beşên hundirîn ên toponîmîyê ne lê belê mîkrotoponîmî ew beş e ku ne li gorî cureyê herêma lêkolînê, li gorî hecîmê [ber] dihê kirin û makrotoponîmî jî navên herêmên cografîk ên mezin îfade dike. Kategorîzekirina ku Yuzbaşov dike û antrotoponîmî, etnotoponîmîka, fitotoponîmî, zooztoponîmî û paleotoponîmîyê wek şaxên toponîmîyê destnîşan dike ne di cih da ye. Çiku antrotoponîmî, etnotoponîmî, fitotoponîmî û zootoponîmî ji bo wê veqetandinê guncan e ku li ser çêbûna toponîman dihê kirin (Yusifov & Kerimov, h.b.: 80).

1.3.2. Sehayên Toponîmîyê

Ji bilî van sehayên ku me li jor behsa wan kirî di wateyaka berfirehtir da hin sehayên toponîmîyê jî hene. Yusifov û Kerimov wek “toponîmîya giştî” “toponîmîya taybet” “toponîmîya sazûmanî” û “toponîmîya sepanî” çar sehayên destnîşan dikin ku dibêjin ev seha ji bo sehayên zimannasîyê guncav in. Ji bo girîngîya wan me jî xwest wan neqil bikin.

Toponîmîya Giştî: Li ser alîyên giştî yên bi navên cografîk ra têkildar disekine. Ji bo hemû welatan tecrûbeyê hînbûna toponîman giştî dike. Ji bo van welatan tesnîfkirina toponîman, têkilîya toponîmîyê ya bi zanistên din ra û hwd dibine mijarên toponîmîya giştî.

Toponîmîya Taybet: Bi wan toponîman ra eleqedar dibe ku mîletên cuda cuda çêdikin. Taybetîyên ziman û dîroka mîletekî di çêkirina navên cografîk da roleka girîng dilîze. Bi vê yekê ra têkildar di xususîyetên xwecihî da xwe dide nîşan.

Toponîmîya Sazûmanî: Li ser meseleyên sazûmanî ku bi navên cografîk ra têkildar in, qanûn û kategorîya toponîmîyê, çêbûna toponîman, geşedan û sedemên guherîna wan lêkolînan dike. Ji ber ku toponîmî zanisteka nû ye ev seha gelekî bi pêş neketîye.

Toponîmîya Sepanî: Li ser agahîyên pêşî yên li ser navên cografîk lêkolînan dike. Ev seha berfireh e. Problemên ku di guhertina navên cihan da derdikevinê holê, rastnivîsa navên cihan û wergerandina navên cihan ji zimanekî bo zimanekî din mijarên vê sehayê ne (Yusifov & Kerimov, h.b.: 81-82).

Îbrahîm Şahin di pirtûka xwe ya bi navê *Adbilim* da wek “navnasîya giştî” û “navnasîya taybet” du sehayên giştî destnîşan dike. Divê em dîyar bikin ku ew van ne wek sehayên toponîmîyê wek sehayên onomastîkê (navnasî) dinirxîne. Jixwe ji navê wan jî ev cudahî dîyar dibe lê dema mirov bala xwe bide ravekirina wan, dîyar dibe ku mebesta wan heman tişt e. Tenê Şahin di bin onomastîkê da li ser vê mijarê sekinîyê lê Yusifov û Kerimov di bin toponîmîyê da li ser sekinîne ku binbeşeka onomastîkê ye. Ji alîyê din ve Şahin “navnasîya teorîk (sazûmanî)” û “navnasîya sepanî” wek du alîyên “navnasîya giştî” û “navnasîya teorîk (sazûmanî)” dinirxîne û wiha rave dike:

Navnasîya Giştî: Bêtir zimannasên giştî di vê qadê da dixebitin. Pênase, çerçove, şax, têgehên giştî yên navnasîyê û têkilîya wê ya bi zanistên din ra dibin mijarên vê

sehayê. Ne ku di çarçoveya zimanekî taybet da bi giştî di çarçoveya zimanan da li ser onîman disekine. Gerdûnbûnên ku di çêbûna navên taybet da derdikevine holê dîyar dike.

Di nava hemû zimanên cîhanê da meseleyên wek pênase, çarçove û senifandina onîmekê yan jî cureyekî onîman, alîyê teorîk (sazûmanî); zelalkirina çêbûna onîman yan jî cureyên onîman ku ji hemû zimanên cîhanê hatine berhevkirin û dîyarkirina guherîna wan jî alîyê pratîk (sepanî) ê navnasîya giştî îfade dike.

Navnasîya Taybet: Berovajî toponîmîya giştî zimanzanên ku li ser zimanekî hûr dibin di vê sehayê da dixebitin. Pênaseyên ku zimanzanên giştî di warê navnasî û şaxên wê da dikin, çarçove û têgehên ku bi pêş dixin, di vê sehayê da bi kar dihînin û di vê çarçoveyê da dixebitin.

Mijarên weke guncandina bo zimanekî dîyar a xebatên teorîk ku di çarçoveya navnasîya giştî da hatine kirin û weke mehelîkirina van têgehên, çarçoveya teorîk a navnasîya taybet pêk dihînin. Ji alîyê din ve vokolana keresteya dîrokî yan jî hemdem a cureyekî onîma ku bi wî zimanî ye, dîyarkirina wateya wan û mijarên bi vî rengî jî alîyê sepanî yê navnasîya taybet îfade dikin (Şahin, 2018: 18).

1.4. WEK KEVNEŞOPÎYEKÊ NAVLÊKIRIN

Navlêkirin, xîmekî girîng e di têkilîya mirovan da û xuya ye û ev rol ji berê heta niha her hatîye pratîzekirin. Ev navlêkirin ji bo hemû hebûnan derbasdar e. Mirovan nav hem li tiştan hem li cihan kirine. Heta berî mirovan Xwedê nav li cih û tiştan kirine. Navên cihan ew hêman in ku çand, ziman û nasname tê da bi cih dibin, îdeolojî pê dihêne şayesandin, bi rêya wan navên şexsan nemir dibin û di sêrî da Xwedê piştra jî mirovan çêkirine (Yavuz & Şenel, h.b.: 2239). Li gorî dînên semavî Xwedê nav li her tiştî kirîye û piştra ew bi mirovê yekem Adem dane zanîn. Anku berî melaîketan Adem hînî navê her tiştî bûye piştra wî ev nav hînî melaîketan kirine. Di Qur'ana pîroz da ev yek di “baqara” da wiha derbas dibe: Xwedê, Adem hînî hemû navan kir piştra ew ji melaîketan pirsîn (baqara/31) lê melaîketan got zanîna me bi qasî hinkirina te ye, jê zêdetir em tiştekî nizanin (baqara/32). Piştra Xwedê ji Adem xwest ku navên tiştan hînî melaîketan bike (baqara/33) (Karaman & yê din, 2009: 5).

Di Încîlê da, di beşa “afirandin”ê da jî behs ji navlêkirinê heye lê vê carê ne Xwedê nav dane heyberan, pêşî Adem nav dane wan û li ser daxwaza Xwedê ji Xwedê ra jî gotine.

Xwedê, hemûya heywanên li û hemûya civîkên li ezmanan ji axê ve afirandibû. Û bona ku bibîne, ka Adem çi navî dide wan, hemûya anî cem Adem. Adem her çi navî dabe her yekî, ew afir, bi wî navî hate bîranîn (19). Û Adem navê hemû heywanên hov û kedî û civîkên li ezman in danîn...⁸ (20) (Kitêba Pîroz, 2008: 5).

⁸ Ev jêgirtin bêyî sererastkirina çewtîyên rêzimanî hatîyê neqilkin.

Li gorî olên yekxwedayî jî Xwedê nav li tişt û gîyandaran kirine û ew hînî Ademî kirine. Bi heman awayî li gorî gelek bawerîyên pîrxwedayî, navlêkirin di pêvajoya afirandinê da bûye û nav ji alîyê pêşîyan ve hatine dayîn (Emiroğlu & Aydın, 2003: 8).

Em tiştên li derdora xwe li gorî navên ku me dane wan vesaz dikin, li gorî van navan em wan tesnîf dikin û agahîyên xwe yê der barê wan da bi navê wan îfade dikin. Bi rêya navlêkirinê wateyek li wî tiştî dihê barkirin û bi vî awayî ew tişt jî dibê xwedîyê wateyekê (Poyraz, h.b.: 227). Çi ji bo tiştan, çi ji bo kesan, çi ji bo cihan di navbera nav û tişt, kes, yan jî cihê ku nav lê dihê kirin têkilîyeka xurt heye. Lêwra her heyber li gorî taybetmendîyên xwe navî digire. Ê ku navan bizane heyberan jî dizane, tişteke bê nav nabe, xweda jî di nav da her tişt bi navlêkirinê/bi navê xwe dibe hebûnek (Poyraz, h.b.: 229). Ji bo hemû heyberan navlêkirin jî di çarçoveya hin qaîdeyan da pêk dihê û di vê navlêkirinê da tiştên dîyarker û sereke hene.

1.4.1. Navlêkirina Şexsan

Dema mirovek dihê dinyayê yekem tişt ku dê û bavê wî/wê pêdivîyê pê dibin ew e ku navekî lê bikin. Wek amrazeka ku nasnameya civakî nîşan didin nav, ji bo dinyaya civakî û nasnameyê dibine referans (Çelik, 2007: 6). Lewma navlêkirin ne bi awayekî çawalêhato, di çarçoveya hinek qaîdeyên xwezayî da pêk dihê. Heta hin caran navlêkirin dikeve rengê rîtûeleke da. Mînak di nav civaka sunî da bangdana (ezan) di guhê zarokî/ê da û di pey da gotina navê wî/wê ji alîyê dînî ve girîng û hewce dihê dîtin. Ger li gorî tecrûbe û şahdebûnên xwe em vê yekê ji bo civaka kurd şîrove bikin em dikarin çend xalan destnîşan bikin.

- Her çend îro paralelî geşedanên teknolojîk û tibî roja ku zarok dibe, heta berî ku bibe nav lê were kirin jî berê demeka dîyar nav li zarokî/ê nedihat kirin. Ji bo ku nav lê were kirin çil rojî disekinîn û ev yek wek “çil/çêl” bi nav dikirin. Anku digotin heta çil/çêlê wî/wê neçe em navî lê nakin û ev tradîsyonel bû ku îro hema bêje nemaye.
- Yan ji alîyê kalik, pîrik, dê û bavî ve yan jî wek şêx û melayan (ji bo kurdên sunî) ji alîyê serwerên olî ve nav li zarokan dihê kirin. Roja îroyîn ev rola şêx û melayan kêmtir bûye. Çiku guherîna ku bandorê li struktura sosyo-çandî dike, di çanda navlêkirinê da jî paradîgmaya tradîsyonel, koden çandî û dîrokî jî qels dike heta carcaran wan ji merîyetê jî derdixe (Çelik, 2007: 7).
- Watedarî, estetîk û fonetîka navî li ber çavan dihê girtin.

- Navê kesekî/kesaka mezinê/mezina malbatê li zarokî/ê dikin ku ev yek trasdîsyoneka berdewam e û wek “navrakirin” dihê binavkirin. Kesê/kesa ku navê wî/wê dihê rakirin mirî yan jî sax dibe.
- Navê lehengên berhemên edebî li zarokan dihêne kirin. Dijberî vê navê dijlehangen nahên tercîhkirin. Mînak ne mimkun e mirov li Cizîra Botan li navê “Beko” rast were ku dijlehangê Mem û Zîna Ehmedê Xanî ye.
- Ger di dema jidayîkbûnê da bûyereka girîng qewimî be di bin bandora wê bûyerê da nav li zarokan dihê kirin. Li gel vê roj û dema jidayîkbûnê jî li ser navî bandorê dike.
- (Ji bo civaka sunî) îslamîbûna navî ku di nav civakê da wek “navê axretî” dihê binavkirin di navlêkirinê da girîng dihê qebûlkirin û wek bawerîyekê berbelav e. Li gorî vê nêrînê navê pêxember, melaîket, cihên pîroz û hwd wek nav derdikevine pêşberî mirov. Ji ber sedema girîngîya ku bi navan hatîye dayîn, wek heram-mekroh-xêr kategorîzasyonek derketîye holê (Çelik, 2006: 46). Ev bawerî dike ku di nav kurdên sunî da hejmara navên erebî û farisî zêdetir bibe. Li gorî encamên ku Öçal di çarçoveya teza xwe da bi anketan bi dest xistine li dibistaneka Dêrika Mêrdînê ji 278 kesan navê 145 kesan erebî ye ku wek rêje dike % 52,1 (Öçal, h.b.: 55). Helbet ev yek bi xwe ra hin neyînîyan jî dihîne lewra hin caran navên bêwate derdikevine holê. Dê û bav bêtî ku wateya wê bizanin her bêtîya ku di qur’anê da derbas dibe wek pîroz qebûl dikin û dikarin wek nav (navê axretî) li zarokên xwe bikin. Mînak “Kezban/kezîban” di qur’anê da derbas dibe û wek navekî qîzikan berbelav e. Lê Kezban/kezîban bêtîyek erebî ye û dihê wateya derewkar yan jî yê/ya ku derewîn derdixe (Seydi & Gewranî, 1985: 138).
- Fikrê sîyasî yên dê û bavan di navlêkirinê da roleka xwe ya dîyarker heye. Lewra bi pêşketina fikrê netewî di nav civaka kurd da navên kurdî zêdetir bûne. Malbatan li gorî atmosfera sîyasî navên serok û endamên rêxistinên sîyasî (ji bo yên dînî jî derbasdar e) gelek caran dane zarokên xwe. Dîsa li gorî lêkolîna Öçal li heman dibistanê, ji 278 kesan navê 65 kesan bi kurdî ye ku wek rêje dike % 23,4 (Öçal, h.b.: 55). Navlêkirina bi vê xalê ra eleqedar bi awayekî sistematîk nemeşîye, li gorî atmosfera sîyasî guherbar bûye. Lewra nav jî wek hêmanên din ên çandî di bin bandora guherînên civakî da dimînin (Çelik, 2007: 6).

Alîyekî vê xalê yê girîng heye ku divê mirov hinekî şîrove bike. Hinek navên kurdî heta weke îro jî qedexa ne û di nasnameya fermî da nahên nivîsîn. Lewma ev yek gelek caran wek “navê fermî” û “navê ne fermî (navê malê)” dunavîyekê jî bi xwe

ra dihîne. Ji alîyê din ve qedexekirina tîpên “w, x” û “q” li Tirkîyeyê, bûye sedem ku navên kurdî di nasnameyan da xelet werin nivîsîn. Mînak Xebat wek Ğebat; Dilxwaz wek Dılgaz; Bawer wek Baver hatîye nivîsîn.

Helbet mirov karê hin xalên din li van zêde bike û tespîtan berfirehtir bike lê li gorî çavdêrîyên xwe em dikarin bêjin ku di nav kurdan da ji bo navlêkirina şexsan berbiçavtir krîter ev in. Krîterên îslamî ne tenê ji bo kurdan ji bo hemû misilmanan derbasdar in lewra di vê xalê da tiştê dîyarker motif û rêçên dînî ne. Jê wêdetir dîn di hemû civakan da di navlêkirinê da dîyarker e. Weke ku Celalettin Çelik jî dîyar dike tiştên ku navan dikine faktoreka nasname û cudabûnê û wan dikine hêmanên sembolîk; bawerîyên dînî, fikrên çandî û îdeolojîk in. Her wiha di bingeha hemû pratîkên navlêkirinê da dîn wek faktoreka sereke derdikeve pêş (Çelik, 2006: 40).

Weke me li jor jî dîyar kirî navlêkirin ne bi awayekî çawalêhato dibe. Lewra weke ku Örnek jî dibêje wateya navî li ber çavan dihê girtin çiku ew wate dê kesayet, karakter, dahatû û cihê zarokî/ê yê di civakê da dîyar bike. Yanî bawerî ew e ku wateya navî dê rengê xwe bide zarokê/î jî (Örnek, 1975: 103). Ev yek di destanan da jî bi vî rengî derdikeve pêşberî mirov. Wek mînak lehengekî girîng ê şahnameya Firdewsî Key Xusrew mînaka insanê pak û azad e. Ew zana ye û xwedîyê dilekî safî ye, sembola insanê niwaze û azad e (Valî, 2018: 167). Lewma ji bilî wî tu kesek ne layîqî vî navî ye ku berî jidayîkbûna wî hatîye hilbijartin. Anku hemû taybetmendîyên wî di navê wî yê pîroz da veşartî ne. Li gorî hîkayetê “Sîyaweş ji jina xwe Ferengîs ra dibêje: Tu yê zarokekî navdar bînî dinyayê, dara esîl a bedena te dê fêkî bigire û padîshekî bide dinayayê. Navê wî zarokê serbilind bike Key Xusrew (Valî, h.b.: 168). Key Xusrew ew kes e ku tola bavê xwe Sîyaweşê pîroz û ya hemû şehîdên din hildide û li ser riwê cîhanê edaletê belav dike. Her wiha di varyantên Herêma Torê da jî navê wî wek “Key Xusranê Bimbarek” derbas dibe.

Celalettin Çelik ji bo çanda tirkan a navlêkirinê, wek çavkanî çend xalan destnîşan dike ku ev ji bo kurdan û jê wêdetir ji bo hemû civakan jî derbasdar in:

- Navên dînî
 - Sîfetên Xwedê, pêxember û navên xizmên pêxemberî
 - Bêjeyeka ku di qur'anê da derbas dibe
 - Navên ku wateya xwe ya dînî heye
- Navên bi serokên dîrokî û sîyasî ra têkildar
- Navên pêşîyan
- Ji bo xatiran navê cîran, dost û hevalan
- Navên bi roj û dema jidayîkbûnê ra eleqedar

- Navên bi cih û warê jidayîkbûnê ra eleqedar
- Navên bi karesatên xwezayî, taybetmendîyên cografîk û bûyerên asmanî ra eleqedar
- Navên ku bi mebesta mirazdîtinê dihêne lêkirin
- Navên ku bi mebesta parastinê dihêne lêkirin
- Navê ajal, nebat û rengan
- Navên aktuel û mode
- Navên ku îdeolojîk in û mezheb û etnîsîteyê derdixine pêş
- Navên ku bi rêya guhertina bêjeyan dihêne çêkirin (Çelik, 2006: 47).

1.4.2. Navlêkirina Cih û Waran

Weke her tiştê din her cihek jî navekî xwe heye û her cih bi navê xwe dihê zanîn. Çawa ku ji bo naskirina tişt û kesan nav fonksîyonel e ji bo naskirina cihan jî ev derbasdar e. Şahin û Köse wek “têgeha cografî ya mehelî” pênaseyekê ji Murzayev û Podolskayayî neqil dikin ku dibêjin cure û xuyanga teşeyekî cografîk îfade dike û bi piranî di afirandina navên cihan da dihê bikarînan û di rûsî da wek goeografîçeskîy û mestniy geografiçeskîy; di inglîzî da jî wek generic term derbas dibe (Şahin & Köse, h.b.: 174). Ev têgeh di navên cih û waran da wek îndîkator peywirê digirine ser xwe û hinek roja îroyîn ji alîyê her kesî ve dihêne zanîn (wek çîya, newal, av, deşt, girav û hwd) lê hinek bûne arkaîk, lewma jî ji bo ku çawanî û wateya navên cih û waran were vegotin divê toponîmîst li ser wan lêkolînan bikin (Şahin, 2015: 184). Ev bandora teşeyên cografîk di navlêkirinê da hem pratîk e hem kartêker e û ji ber van taybetmendîyên xwe ji alîyê mirovan ve her hatîne bikarînan. Çiku dema ku mirov tişteki salox bide, her demê bi awayekî xwezayî ji taybetmendîya herî xuya dest pê dike. Ji ber vê yekê di çanda navlêkirina cihan da rêbaza herî berbelav ew e ku ew cih navê xwe, wek kaş, zinar, çem û hwd ji objeyên cografîk ên derdora xwe bigire (Şahin, 2015: 186). Wê demê bi du awayan mirov dikare behsa navên cihan bike; navek bi awayê xwezayî pêk hatîye navê din jî ji alîyê mirovan ve hatîye lêkirin. Navê xwezayî li gorî taybetmendîyên wî cihî yê cografîk pêk dihê, navê taybet jî li gorî hin qaîdeyan çêdibe û xwe dispêre sedemekê. Bo nimûne Deşta Mêrdînê navê cihekî ye, deşt teşeyê vî cihî yê xwezayî ye û ji ber ku ev deşt li binîya bajarê Mêrdînê ye bi Mêrdînê bi nav bûye.

Navên ku ji alîyê mirovan ve li cihan dihêne kirin dîsa weke navê şexsan ne bi awayekî çawalêhato dibin lê sedemeka xwe ya mentiqî heye. Hakan Poyraz ku di çarçoveyeka felsefîk da û li gorî nêrînên feylesofan navlêkirinê dinirxîne dibêje kesê ku navî dide (onomatos) tişteki, li gorî xwezayîya wî tiştî navî dide û bi vî awayî nav wek navên dirust dihêne qebûlîkirin. Alîgirên Demokrîtos dibêjin erê nav ji alîyê mirovan ve li tiştan dihêne kirin lê ev navlêkirin ne

bi awayekî kêfî ye, ew xwe dispêre bingehka dîyar. Ger di navbera bêje û tiştê ku ew bêje nîşan dide da hevsengîyek nebe mirov nikare qala “wate”yê bike (Poyraz, h.b.: 230).

Di zêdetirî 400 ayetên Qur’anê da jî bi wateya ser riwê dinyayê bêjeya “erz” derbas dibe. Bi mebesta ku girîngîya navên cihan ji bo jîyana mirovan were nîşandan; bala mirovan biçe ser navendên mirovahîyê yên pêşî û têkilîya di navbera ziman-dîrok û mirovahîyê da her zindî bimîne, navên cihan di qur’anê da hatine zikirkirin (Kök & Ünlü, 2016: 45).

Navên cihan ne nav yan jî bêjeyên ji rêzê ne, her yek wateyeka xwe heye û têkilîyeka xwe bi kesek, tiştek yan jî bûyerekê ra heye ku paralelî vê têkilîyê ew nav çêbûye. Ev wateya ku hin caran aşkere û hin caran veşartî ye di nava xwe da hin daneyan jî vedihewîne ku ji bo ziman, sîyaset, dîrok, jîyana berê ya mirov û ajalan, kes û civakên girîng ku li wir jîyane, bûyerên girîng ku li wir rû dane û hwd dikarin roleka fonksiyonel pêk bînin. Her wiha di çarçoveya zimannasîyê da li Ewropayê li ser navê cih û waran lêkolîn hatine kirin û di encama van lêkolînan da ji bo etnîsîte, ziman û dîroka van cihan daneyên girîng hatine bidestxistin (Yağmur, 2014: 244). Ji bo lêkolînên di van waran da mîkrotoponîm ji makrotoponîman kartêkertir in. Çiku wek Şahin û Köse jî dîyar dikin her mîkrotoponîmek wek navnîşaneka kurt e, gelek ji wan bi hezaran salan rabirdûya wan heye û ji ber ku bi awayekî devkî hatine veguhastin di bin bandora derveyî da namînin. Lewma jî ev cure navên cihan di dîyarkirina çanda navlêkirinê û dewlemendîya zimanê da dibine keresteyên bikêr (Şahin & Köse, h.b.: 172). Li gel van navê cihekî dikare der barê bawerîya kesên ku li wî cihê jîyane yan jî dijîn agahîyên girîng bide lêkoleran. Çiku weke navlêkirina şexsan di navlêkirina cihan da jî bawerî/ol dîyarker e. Mînak gundekî Hezexa navçeya Şirnexê navê xwe “Girberaz” e lê belê ji ber ku li gorî dînê îslamê beraz ajalekî necis e, navê vî gundî ji alîyê şêxekî vê derdorê ve wek “Girşêran” hatiye guhertin. Helbet ev navê nû di nav civakê da rûnenîştîye ku mirov dikare vê yekê jî bi wetedarbûna navê cihan rave bike.

“Kes” û “navê cihan” du têgeh in ku têkilîyeka xurt di navbera wan da heye. Çiku “ji navên kesan navên cihan; ji navên cihan navên kesan dihêne lêkirin û bi vî awayî heyberên zindî û nezindî dihêne binavkirin (Gülensoy, 1998: 41). Anku her çend cografya di bin bandora mirov da be ji alîyê din ve mirov jî di bin bandora cografyayê da ye ku nikare ji vê yekê bireve.

Başkan li gorî lêkolînên xwe navlêkirina cihan wek “navên ku xwe dispêrin mercên xwezayî û fizîkî” û “navên ku xwe dispêrin civak û mirovan di bin du serenavan da dinirxînê (Başkan, 1971: 241).

Di navlêkirina cihan da hin tiştên serekê ku li derdorê hene xwedîyê bandoreke xuya ne û di navlêkirinê da bikarînan van tiştan wek rêbazekê derdikeve pêş. Yılmaz Kurt di gotara xwe da ku bi navê *Diyarbakir Sancağı Yer Adları* da weşîyaye, van xalan destnîşan dike:

Navê millet û eşîran di navlêkirina cihan da rêbazeka berbelav e.

Dema gund û taxek nû ava dibe navê serokeşîrê ku ew gund yan jî tax ava kirîye wek navê cihê derdikeve pêş.

Teşeyê cografîk ê wê derdorê di navlêkirina wî cihê da girîng e.

Navê ajalan di navlêkirina cihekê da dihê bikarînan.

Xan, qesir, şikeft yan jî ziyaretê li wir dibe navê gund yan jî gundikan.

Dema navek li herêmekê dihê kirin, rengê serdest ê wê herêmê jî bibandor e. Mînak Soran, Girê Spî û hwd (Kurt, 2008: 410-414).

Hasan Eren du xalan li van zêde dike. Ew dîyar dike ku di navlêkirina cihekê da navên nebatên wê derdorê dihên bikarînan û dibêje cihên ku bi navê pîşeyan jî hatine binavkirin hene (Eren, h.b.: 16-17). Cemal Arif Alagöz di *Türk Yer Adları Sempozyumu Bildirileri* da li ser vê mijarê disekine. Alagöz di vê sempozyumê da di gotara *Türkiye Yer Adları Üzerine Bazı Düşünceler* da pênc xalan destnîşan dike:

Bi mebesta ku tûşî tiştên xirab û tirsnaq nebin, keşifkeran navên dînî li cihên kirine ku nû dihêne keşifkirin.

Kesên ku koç kirine navên li welatê xwe yê berê bi xwe ra îname û li cihên nû kirine.

Navên keşifkeran li cihên ku nû keşif bûne hatine kirin.

Navên paşa (padîşah) û hikumdarên welatê kaşîfî li cihên nû hatîye kirin.

Navên wan kesan xwe dane navên cihan jî ku di warê ilim, huner û hwd da dihêne naskirin (Alagöz, 1984: 17-18).

Evlîya Çelebî jî wek bêje li navê gelek cihan kolaye û sedema ku ew nav li wî cihê hatîye kirin vegotîye. Li gel van xalên jor wî dîyar kirîye ku hin cih bi fetihkarê xwe bi nav dibin û hin cih jî bi têkçûyîyên xwe (tr: mağlup) bi nav dibin. Ji alîyê din ve cihin hene bi kesekî/a ku li wir çêbûye bi nav bûne (Cunbur, 1984: 206-207). Helbet navên cihan ne tenê li gorî tiştek yan jî taybetmendîyeka li derdorê dibin, hin caran jî xwe dispêrine bûyer û efsaneyan jî. Evlîya Çelebî hin navên cihan dispêre gotinek û hevokeka ku di dema fetihê da hatî gotin yan jî guherînên ku di wan da pêk hatin (Cunbur, h.b.: 209). Ev guhertina ku ji alîyê kesê sêyem ve dihê kirin jî bêguman dê bi awayekî were pirrolekirin ku êdî ev jî vê yekê dike efsaneyek. Hin navên cihan bi demê ra dihêne guhertin, teşeyê xwe yê berê winda dîkin û di teşeyê nû da dibine

navê wî cihî. Hin nav hene ji bo tiştekî li wir ku êdî hatîye xirakirin wek bîranîn dihê bikarînan, hin nav jî bi taybetî ji bo wir û bi mebesteka dîyar dihêne lêkirin (Sakaoğlu, 1984: 260).

Di vê mijarê da senifandina herî berfireh ji alîyê Tuncer Gülensoy ve dihê kirin. Ew senifandina van kesên din kêr dibîne û tasnîfa xwe ya berfirehkirî bi vî awayî pêşkêş dike:

A) Navên bi derdorê ra eleqedar ku xwe dispêrine xweza û mercên fîzîkî

1. Navên bi derdorê ra eleqedar
 - a- Hêl/alî (Doğrultu)
 - b- Navên cografîk (best, deşt, newal, til û hwd)
 - c- Maden (kevir, zinar, qûm, ax û hwd)
 - d- Kevirên biqîmet
 - e- Demsal
 - f- Roj
 - g- Hejmar
 - h- Reng
 - i- Navên berekî/hêlan (Yön Adları)
 - j- Navên dîyarker
 - k- Terikandin, xwedînekirin, destjêberdan (xirab, xirbe)
 - l- Rengdêrên ku derdorê eleqedar dikin (kevin, nû, bilind, jor û hwd)
 - m- Navên girêdayî rewşa ax û keviran (latesor, kevirreş û hwd)
 - n- Navên eleqedarî awayê bikarînana erdê (rêya kerwanan û hwd)
 - o- Navên bi awayîyên derdorê ra eleqedar
2. Navên bi nebatan ra eleqedar
 - a- Dar (cureyên daran)
 - b- Fêkî
 - c- Şînkati (sebze)
 - d- Dexil û baqil
 - e- Çîçek
 - f- Perçeyên nebatan (çiqil, gulî û hwd)
 - g- Rûberka riwêkî (bitki örtüsü)
3. Navên bi ajalan ra eleqedar
 - a- Ajalên berî
 - b- Teyrikên revînok (qertel, baz, başok û hwd)
 - c- Teyrikên kedî
 - d- Ajalên Kedî
 - e- Xijende (sürüngenler)
 - f- Kêzik
 - g- Ajalên avî
 - h- Kurmûkêzên bizerar

B) Navên ku xwe dispêrine civak û mirovan

1. Navên bi jîyana fîzîkî ra têkildar
 - a- Xwerek
 - b- Vexwarî
 - c- Firaxên xwarinê
 - d- Alavên birekî
 - e- Navên bi şerî ra têkildar
 - f- Taximê bezê
 - g- Madeyên qumaşan (eba, kulav, mafûr û hwd)
 - h- Beşên avayîyan
2. Navên bi jîyana hestîyarî ra têkildar
 - a- Sehek (Duyular)

- b- Şexsên malbatê
- c- Navên têkildarî dîn
- 3. Navên bi heyîna şexsan ra têkildar
 - a- Beşên laşî (ser, çav û hwd)
 - b- Paye (inwan), meqam
 - c- Sîfetên ku mirovan eleqedar dikin
 - d- Pîşe
 - e- Navên kesan
 - f- Navên ku di nav da taybetmendîyên mirov hene (keçk, kor û hwd.)
 - Navên kesên dîrokî
 - Navên kesên efsaneyî
 - Navên kesên ku dijîn
 - g- Navên qewm, qebîle, êl, bavik û cimetan (Gülensoy, h.b.: 45-48).

Tuncer Gülensoy li ser navên cihan ên li anatolyayê xebitîye û ev senifandin jî di vê çarçoveyê da kirîye. Lewma li gorî tespîtên xwe yên li ser navên cih û waran ên tirkî ev senifandin kirîye lê helbet em dikarin bêjin ku ev senifandin bi berfirehiya xwe giştîbûnekê jî îfade dike. Ger li ser navên cih û waran ên kurdî xebatek were kirin îhtîmal e ku hinek ji van xalan kêmbibin yan jî hinek lê zêde bibin lê kêmbibin zêde çarçove dê dîsa ev be. Çiku navlêkirin ji heman pêdivîyê nizîlîye û wek çandekê heta roja îro li gel nuansan paralelî vê pêdivîyê berdewam e.

1.4.3. Guhertina Navê Cih û Waran û Sedemên Wê

Weke zimanan bêje jî çêdibin, dijîn û piştî demekê dihêne jibîrkirin, winda dibin anku dimirin. Çi ji bo cihan, çi ji bo kesan, çi ji bo tiştan; “nav” jî ji bêjeyan pêk dihên û ev pêvajoyên ji bo wan jî derbasdar e. Helbet bi demê ra deforme dibin, dihêne guhertin û teşeyên nû jî digirin. Mirov dikare guherîna di ziman, devok û zaravayan da, serdestîya çand, bawerî û îdeolojîyan wek sedemên vî yekê nîşan bide. Mesela cihên ku di encamên koç, şerî û hwd da şênîyên wan diguherin, navên wan jî diguherin çiku xwedîyên wir ên nû li gorî ziman, çand û bawerîya xwe navêkî nû li wir dikin. Bi gotineka din navên cihan, hin caran bi awayekî xwezayî û jixweber hin caran jî di demeka kurttir da bi rêyên fermî diguherin (Tamtamış, 2019: 65). Weke İbrahim Altunışık jî dîyar dike navên cihan ku bi bandora derdora fîzîkî çêdibin, bi zimanên cuda bin jî ji alîyê taybetmendî û wateyê ve dişibine hev. Çiku ger niştecihên cihekî biguherin dema yên nû hatin dê li heman taybetmendîyên fîzîkî rast werin û li gorî van taybetmendîyan navî li wî cihî bikin ku îhtîmal e her du nav bişibine hev û ev jî guherîneka xwezayî ye. Ger ne bi vî awayê xwezayî lê bi otorîteyeka sîyasî yan ji alîyê rêveberîyekê ve navê cihî were guhertin, taybetmendî û wateya xwe dê winda bike. Ji ber vê yekê jî guhertina navên cihan ji alîyê zanistî û çandî ve fikaredar e (Altunışık, 2009: 11).

Helbet sedemên guhertina navên cihan curbicur in lê ji bo guhertina navên kurdî (û yên ermenî, grekî, suryankî û bulgarî) bêtir sedemên sîyasî derdikevine pêş. Ji ber ku sehaya vê xebatê herêmekê li Kurdistanê ye em ê hewil bidin ku li gorî guhertina navên kurdî yên cihan, van sedeman şîrove bikin. Lewra her çend tu deverên Tirkîyeyê ji vê guhertinê bêpar nemabin jî guhertina navan, bi awayekî berfireh li ser bajarên kurdan pêk hatîye.⁹ Guhertina navên cihan ji salên pêşî yên cumhurîyetê dest pê dike û heta sala 1981ê navê 11931 gundî dihê guhertin. Piştî 1981ê 280 gundên din jî li vê hejmarê zêde dibin (Tunçel, 2000: 25). Li gorî Tamtamiş neqil dike jî guhertina navên cihan hê di navbera salên 1913 û 1916an da bi pêşengtiya Enver Paşayî pêk dihê ku navên cihan dihêne tirkîzekirin (Tamtamiş, h.b.: 68). Abdulkadir Gül û Ali Rıza Özdemir ji bo *21. Yüzyıl Türkiye Enstitüsü (Enstituya Tirkîyeyê ya Sedsala 21emîn)* raporteke taybet amade kirine ku guhertina navan wek pêvajoyê veqetandine çar qonaxan. Ew jî destnîşan dikin ku qonaxa yekem di sala 1915an da bi fermana Enver Paşayî pêk hatîye. Gelekî balkêş e ku dibêje “bi sûdwergirtina ji rewşa şerî ya erenî, divê navên bajar, navçe, gund, çîya û çeman ên ermenî, rûmkî, bulgarî û zimanên din werine guhertin bo navên tirkî” (Hür, vgh: Gül & Özdemir, 2013: 4). Ev raport li ser navan gelek agahîyan berovajî pêşkêş dike ku hin xalên wê gelekî balkêş in. Bo nimûne, li gorî îdîaya van ragihîneran, pêvajoya lêvegerandina navên cihan ên kurdî ku di “pêvajoya çareseriyê” da hinekî pêk hat di bingeha xwe da ne daxwaza “lêvegerandina navan” lê îcadkirina navên cihan ên kurdî bû. Bi vê yekê armanc ew bû ku rêça tirkîtiyê bi giştî ji vê herêmê were jêbirin û kurd wek neteweyeka cuda werin vezaskirin (Gül & Özdemir, h.b.: 13).


Pêvajoya guhertina navan heta ku zirara wê berbiçav dibe didome. Her wiha bi giştînameyeka ku di sala 1940î da bi hejmara 8589ê ji aliyê wezareta karên hundirîn ve dihê derxistin, guhertina navên cihan fermî dibe. Di sala 1957ê da jî bi navê *Ad Değiştirme İhtisas Kurulu* lîjneyek dihê damezrandin ku komîsyona wê li ser navên 75000 cihan lêkolînan dike û navê 28000 cihan diguhere (Tunçel, h.b.: 27). Tamtamiş, peywira sereke ya vê lîjneyê li gel standardkirina wan, wek tirkîzekirina navên cihan şîrove dike (Tamtamiş, h.b.: 69). Orcan jî dibêje di sala 1873yê da di yekem civîna navnetewî da biryar hatîye dayîn ku bikarînan navnetewî (ji bo navên cihan) û bikarînan netewî hev bigirin û şertê bingehe ew e ku di navên cografîk da standardek pêk were. Her wiha derfet çêdibe ku ji bo polîtîkaya standardkirinê komîsyonek were avakirin. Li gorî agahiyên ku dide ev komîsyon navên cihan tirkîze dike û hewil dide ku vegotina bifikare ya “navên bîyanî” û “navên din” ên li Tirkîyeyê were

⁹ Bnr: Şekil 2: Cihên ku navên wan hatine guhertin.

sererastkirin (Orcan, 1984:58-62). Anku navên kurdî, erebî û hwd xetere dihêne qebûlkirin û divê di bin navê “standardkirin”ê da werine tirkîzekirin. Ji ber ku nivîskarê vê gotarê serleşkerek e ev nêrîn û helwest fikrekî zelaltir dide mirov. Lewra navên gundan ên ku di nav wan da bêjeyên kurd, gurgî, tatar, çerkes, laz, ereb, mihacir û hwd hene divê werin guhertin da li herêma xwe fikrê “dabeşkerîyê” belav nekin (Tunçel, h.b.: 28).

Li ser guhertina navên cihan ku li seranserê Tirkîyeyê pêk hatîye, Harun Tunçel nexşeyek amade kirîye (li jêr) û dibêje her çend weke ku li Behra Reş bûye, li Rojhilat û Başûrê Rojhilat hin navên cihan ên tirkî hatibin guhertin jî bi giştî ji ber ku navên cihan ermenkî, kurdî û erebî ne hatine guhertin (Tunçel, h.b.: 30). Jixwe weke ku ji nexşeyê jî diyar dibe herî zêde guhertin li Kurdistanê bûye. Bo nimûne li bajarê Mêrdînê ji navê 702 cihan, navê 561 cihî hatîye guhertin (Tamtamış, h.b.: 65). Li gorî agahîyeka din li Erziromê navê 653 gundan û li Mêrdînê navê 647 gundan hatîye guhertin (Köylerimiz, 1968) ku her du jî bajarên Kurdistanê ne û di serê lîsteyê da ne. Yılmaz Kurt îdîa dike ku ji 869 gund û gundikên Amedê navên 438an (% 50) bi zimanê tirkî ne û ger “Davud, Derviş û Kale” jî bi tirkî werine qebûlkirin ev rêje derdikeve % 60î. Her wiha vê yekê jî dispêre niştecihbûna Akkoyun û Karakoyunan a li vê herêmê (Kurt, h.b.: 9). Di vir da berovajîkirinek heye lewra xuya ye ew vê nirxandinê li ser navên fermî dike ku piştra hatine lêkirin û çêkirî ne. Li gorî agahîyên ku Mecdi Emiroğlu jî dide di sala 1977ê da hejmara gundewaran 35917 e, navê %64ê wan hatîye parastin û %36 jî hatîye guhertin û guhertin herî zêde (%91) li Mêrdînê pêk hatîye. Lê li gorî îdîayên wî cihên ku navên wan hatine guhertin ji nîvî zêdetir jixwe bi tirkî ne û armanc ji guhertinê guncandina li tirkîya îroyîn e (Emiroğlu M. , 1984: 191).

Şekil 2: Cihên ku navê wan hatîye guhertin



Ji sehaya vê xebatê wêdetir li hemû deverên kurdan ku di nav sînoren sîyasî yê Komara Tirkîyeyê da dimînin, mirov gelek caran ji bo cihekî li du navan rast dihê. Hema bêje ev dunavî ji bo hemû bajar, bajarok, gund, til, çîya, newal û hwd ên kurdan derbasdar e û di encama vê guhertinê da peyda bûye. Navek çêkirî û navêk resen e ku navê resen kurdî yan jî zimanekî din, navê çêkirî jî her bi tirkî ye. Li gorî çavdêrîyên me navên tirkî anku navên çêkirî ji alîyên îxtîyaran ve nahên zanîn, ew navên kurdî dizanin û bi kar dihînin; jenerasyona nû jî her du navan dizane. Ji alîyê din ve navê resen di belgenameyên kevin da cih digirin lê belê di rewşên aktuel da nahên bikarînan yan jî wek “navê kevin” li gel navê çêkirî cih digirin.¹⁰ Ger navê heyî anku navê resen di çarçoveya vê guhertina îdeolojîk da nebûbe sedema problemekê jixwe nehatîye guhertin. Wek mînak “li Mêrdînê navên ku nehatine guhertin bi piranî tirkî ne” (Tamtamış, h.b.: 77). Bêguman sedema vê yekê dîsa sîyasî ye. Çiku weke Ağaoğlu û Uzun ji T. Hall neqil dikin bajar ne tenê ew cih in ku bi destê mirovan çêbûne û berhemên madî li wan hatine komkirin. Di heman demê da îdeolojî li wan dihêne sêwirandin, nîrxên çandî li wan dihêne îfadekirin û îqtidar bi rêya wan li ser mekanaan dibine xwedîyê kontrola şanasî (semiyolojîk) (Hall, vgh: Ağaoğlu & Uzun, 2011: 124). Dema ku mirov di vê çarçoveyê da binêre, sedemên guhertina navên cihan dê baştir werin fêmkirin.

Ji ber ku wek gund, bajar, tax, kolan, newal, deşt û hwd her cihek mekanekî hafizeyê ye divê mirov ji alîyê hafizeyê ve jî li vê meseleyê binêre. Çiku di navên kevnare yê cihan da têkilîya hafizeya mirov û mekanî heye û manevîyata civakê bi rabirdûyê ra bi rêya navên cihan pêkan dibe (Tamtamış, h.b.: 78). Hinekî jî bi mebesta ku bandorek li ser vê hafizeyê were kirin guhertin pêk dihê. Çiku dema ev guhertin pêk dihê girêdayî vê guhertinê, binê vegotinên gelêrî jî dihê valakirin ku ji alîyekî ve jî sazkerên vê hafizeyê ne. Her wiha li gorî destguhertina hêza sîyasî, berê vê guhertinê jî diguhere. Wek mînak dema ku li bajarê Êlihê şaredarî ketîye destê partîyeka muhafizekar da, cihên nû yê li bajêr hatine binavkirin û van navan jî bi piranî nasnameya dînî derxistine pêş (Günel, 2012: 176). Di vê helwestê da afirandina hafizeyeka civakî û nîşandana serdestîya mekanî heye û pêkan e bi heman armancê guhertineka li dijî vê pêk were. Jixwe dema ku şaredarîyê dest guhertîye rewşeka bereksî vê rû daye û hemû kolan ji nû ve hatine binavkirin (Günel, h.b.: 184). Weke ku Aktay jî dîyar dike bêguman ev yek ji bo her welatî derbasdar e. Her wiha piştî şoreşa oktoberê li Rûsyayê jî di toponîmîyê da guhertinên berbiçav pêk hatine. Piştî şoreşê navên cihan di bin bandora fikrên îdeolojîk da çêbûne û di bêjeyan da her rengê sosyalîzm, teknolojî, pişesazî û nûjenîyê derketîye pêş. Navên ku rejîma

¹⁰ Di nasnameya dêya min da wek cihê jidayîkbûnê “Delavikasır” û di nasnameya bavê min da “Hevindi” dinivîse ku gundê me yê kevin e û ji şikeftan pêk dihê. Navê gund ê tirkî jî Oyalı ye.

kevin simbolîze dîkin hatine guhertin û di cihê wan da navên bi ser rejîma nû ve li cihan hatine kirin (Aktay, 2017: 2687). Di beşeka girîng a sehaya vê xebatê da jî piştî ku şaredarî ketine destê kurdan da navên gundan ên resen li ser tabelayan hatine nivîsîn.¹¹



¹¹ Piranîya navên gundan li ser tabelayan bi halê tewandî hatine nivîsîn. Mînak: Kertwên wek Kertwênê, Stilîl wek Stilîlê û hwd.

BEŞA DUYEM

VEGOTINÊN GELÊRÎ Û ÇARÇOVEYA WAN

Her civak, rabûn û rûniştina xwe, edetên xwe, zimanê xwe, çanda xwe û bi giştî folkora xwe di vegotinên xwe da bi cih dike ku ev vegotinên gelerî di heman demê da bo zanistên weke dîrok, zimannasî, antropolojî, folklornasî û hwd dibine kereste û bo van zanistan daneyên girîng vedihewînin der barê wê civakê da. Taybetmendîya sereke ya vegotinên gelêrî ew e ku bi rêya vebêjêran nîfş bi nîfş dihêne veguhastin çiku her çend demên dawî derbasî nivîsê bûbin jî ew ne nivîskî lê devkî ne. Veguhastin jî li ser esasê dubarekirinê pêk dihê ku helbet ev dubarekirin jî di wan da hinek guherînan pêk dihîne. Ji alîyê din ve bo ku ew werine parastin û berdewamî hebe dubarekirin esas e û ev berdewamî bi netew û netewbûnê ve jî têkildar dihê dîtin. Anthony D. Smith dibêje ji ber ku “*em*” bi rêya binemalîya malbatên xwe û nîfşên dahatûyê dijîn divê dîroka wan aîdî me be û hîkayetên me yên hevpar vebêje. Lewma ji bo ku em mayîndetîya xwe teqez bikin divê mît, bîranîn û sembolên me her werine nûkirin û ji nû ve werine gotin (Smith, 2002: 265). Smith vê “*em*”ê wek netewbûnê bi kar dihîne û netewbûnê jî bi vê nûkirin û dubarekirinê ve girê dide. “Dihê gotin ku mît; kok û nasnameya dîrokî ya miletekî diselmînin, lewma hebûna mîtan û veguhastina wan bo mayîndetîya miletekî gelekî girîng e” (Işıkhan, 2008: 90).

Vegotinên gelêrî bo miletekî hafizeyeka kollektîf jî diafirînin ku tiştê wan bi hev ve girêdide û aîdbûna wî miletî dide hîskirin jî ev hafize bixwe ye. Lewma dema ku mirov folklorê xwe di vegotinên xwe da bi cih dikan, li gel hafizeya civakî nasnameyekê jî diafirînin yan jî nasnameya xwe diparêzin. Di vir da dîsa rola dubarekirinê ya di afirandin û parastinê da derdikeve pêş. Weke ku Assmann jî dîyar dike rêgeza bingeîn a struktûra girêker (tr: bağlayıcı yapı) dubarekirin e. Bi vî awayî pêşî li windabûna rêzebûyeran dihê girtin û dibine hêmanên çandê hepar ku dihêne bîrê û dihêne naskirin (Assmann, 2015: 23). Helbet tiştêk çiqas were dubarekirin ewqasî qayîm dibe, jibîrkirina wê zehmet dibe, di hişê civakê da watedartir dibe. Her diçe mirov bêtir wî tiştî aîdî xwe û xwe jî aîdî civaka xwedîyê wî tiştî hîs dike, anku kes û civakê bi hev ve girêdide. Ev alîyê çandê bi rêya vegotin û efsaneyan pêk dihê û wek beralîkirin û neqilkirin du alîyên çandê derfetê didin kesan ku bêjin “*em*” û bi vî awayî bingeha nasnameyeka netewî ava bikin (Assmann, h.b.: 23).

Roleka girîng jî ya vebêjeran e ku bi saya wan veguhastin û dubarekirin pêkan dibe. Ev vebêjer wek “veguhêzerên kevneşopîyan” dihêne binavkirin û agahî, serpêhatî, bîranîn û heta çand bixwe ku ew ji nîfşekî vediguhêzin bo nîfşê din, bi saya hafizeyê bi çanda devkî ra dihê neqilkin. Ev karê veguhastinê bi xwe ra dubarekirinê dihêne û ev jî jibîrkirinê berband dîke (Işıkhan, h.b.: 91).

Navlêkirina cih û waran/navê cih û waran jî hêmenaka folklorê ye lewma girêdayî folklor, edebîyata gelêrî û her wiha vegotinên gelêrî ye. Em ê jî di vê beşê da li ser wan vegotinên gelêrî bisekinin ku rasterast bi navlêkirina cih û waran ra têkildar in. Di sehayê vê xebatê da gelek vegotinên gelêrî wek “mesele” dihêne binavkirin ku ev yek wek tradîsyonekê derdikeve pêş. Çiku dema endamên civakê yan jî vebêjer cureyekî vegotinên gelêrî bi nav dîkin, bêtir ku xwe bispêrine çarçoveyê zanistî vê navlêkirinê dîkin. Di nav hin civakan da jî navê “efsane” di cihê “mesele”yê da bi heman awayî derdikeve pêş. Bo nimûne, Seyfullah Yıldırım di gotara xwe ya bi navê “efsaneyên toponomîk¹² ên tirkên kazak” da behsa “efsaneyên toponomîk” dîke û wiha pênase dîke: “Ger bûyereka ku li cihekî rû bide, bêtir têkildarkirina têgehên derasayî û efsûnî were vegotin, ev vegotin wek ‘efsaneyên toponomîk’ dihê binavkirin” (Yıldırım, 2012: 2104). Yıldırım hin taybetmendîyên van efsaneyan jî Qasqabasov wiha neqil dîke:

Taybetmendîya bingeîn a van vegotinên ne ew e ku vebêjin bêtir ka navê wî mekanî çawa derketîye holê; jî bûyera ku li wî mekanî qewimî xeber didin. Lê belê dema mirov jî dîr ve lê dinêre, wisa xuya dîke ku vebêjer navê mekanî vedibêje. Efsaneyên toponomîk, jî efsaneyên dîrokî yê rastîn bêtir xwedîyê vegotineka hunerî ne. Di vir da fonksîyona xebardana jî dîrokê ya vegotina hunerî û xeyalî hatîye guhertin û taybetmendîya dersdar derketîye pêş (Qasqabasov, vgh: Yıldırım, h.b.: 2104).

Her çend Yıldırım ev pênase li ser cureyekî vegotinên devkî (efsane) kiribe jî dema mirov cureyekî din li şûna “efsane”yê bi cih bike, dê were dîtin ku ev pênase di vê çarçoveyê da jî bo hemû vegotinên gelêrî derbasdar e. Lê me bi mînakên xwe yê berhevkerî piştrast kirîye ku ev çarçove kêmtir dimîne. Lewra di afirandina van vegotinên têkildarî toponîmîyê da du pîvan (parametre) derdikevine pêş:

- 1- Cureyê vegotinê (efsane, çîrok, hîkayet, mesele û hwd) li ser navê cihî hatîye afirandin,

¹² Yıldırım navê zanistê wek “toponomî” nivîsiye lewma di jêgirtinan da me jî bi heman awayî neqil kir.

2- Bûyerek qewimîye (yan jî wisa hatîye bawerkirin) ku li ser wê bûyerê vegotîneka gelêrî hatîye afirandin û wî cihî navê xwe ji vê vegotinê girtîye.

Weke ku Önder jî dîyar dike dema mirov di wateya navê cihekî negihîje, ji bo ku wateyeka guncan bo wî cihî biselmîne belkî jî dûr û kûr difikire û hêza wî/wê ya nîgaşkirinê dike ku ew hîkayetekê biafirîne yan jî wî diajo ber bi bûyereka derasayî (Önder, 1984: 70). Îfadeya “bûyerên derasayî” rasterast “efsaneyan” dihîne bîra mirov û em ji vê tespîta Önderî jî fêhm dikin ku pêkan e li ser navên cihan efsane yan jî hîkayet werine afirandin. Her wiha Önder mînakên bajarê Tirkîyeyê Kastamonu dide û dibêje dîroknas dibêjin navê berê yê vî bajarî Gastumanna ye lê ji ber ku her du jî di tirkî da bêtewate ne efsane û hîkayet gihîştine hawarê û efaneya tîkildar neqil dike (Önder, h.b.: 71). Hasilî di her du pîvanan da jî tiştên mirov bi awayekî teqez karibe biparêze ew e ku di navbera navê wî cih/warî û vegotinê da tîkilîyeka xurt heye.

Em ê di vê beşê da cihê bidine mînakên vegotinên gelêrî ku me li sehayê berhev kirine û bi toponîmîyê ra tîkildar in. Meyla vebêjêran bêtir li ser wê be ku vegotinên xwe wek “mesele” bi nav bikin jî vebêjerekî ku em pê ra xebitîn, hin vegotinên xwe wek “serhatî” bi nav kirin. Li gorî çavdêrîyên me, wî jî bi vê navlêkirinê dixwest nîşan bide ku ew ji rasteqînîya wan bêguman e. Hin caran jî cihê vê tegehê, “çîrok” digire ku ev yek jî tîkildarî bawerkirina vebêjêran e. Kemal Fewzî jî “dema ku zaravayên wek ‘masal’ (çîrok), ‘efsane’, ‘esatir’ (mîtolojî), ‘hurafe’ (xurafe), ‘hikaye’ bi kar anîne, cudahiya di navbera wan de rave nekiriye. Yanî wî ew zarave, gelek caran di şûna hev de bi kar anîne. Lê belê wî sernavê xebata xwe kiriye ‘Kürd Masalları’” (Pertev, 2018: 251).

Berîya ku em van mînakên berhevkîrî yên tîkildarî toponîmîyê bidin hewce ye em li gel pênase, taybetmendî û çarçoveya wan li ser “vegotinên gelêrî” bisekinin. Bi vî awayî em ê baştir karibin analîza wan bikin. Lewra em ê van mînakên hem ji aliyê edebîyata gelêrî ve hem ji aliyê toponîmîyê ve analîz bikin. Anku em ê binêrin bê ka mînakên me dibine çi cure vegotinên gelêrî û cih/warên ku qala wan dihê kirin dibine çi cure toponîm.

2.1. VEGOTINÊN GELÊRÎ

Vegotinên gelêrî beşeka edebîyata gelêrî ne ku ew jî beşeka folklorê ye. Celadet Elî Bedirxan di kovara *Hawarê* da wiha pênaseya folklorê dike: “Ev bêje di eslê xwe de ingilîzî ye... Folklor tevayîya adet, çîrok û stranên miletekî ye. Ew adet, çîrok û stranên ko ji nav xelkê bi derketine û di dora nîfşan de bi ser ve ketine û gihaştine nîfşên nû” (Ferhengvan, 1941: 759). “Folklor ew zanist e ku çanda maddî û manewî ya gelêrî li gorî rêbazên xwe yên taybet lêdikole,

berhev dike, disenifîne, tehlîl dike û dinirxîne” (Gennep, vgh: Yıldırım, Pertev & Aslan, 2013: 11). Ev zanist hêmanên çandî yên madî û manewî ku aîdî civakeka welatekî yan jî herêmekê diyar in, li gorî rêbazên xwe yên taybet berhev dike, disenifîne, analîz dike, şîrove dike û di encamê da arşîv dike (Örnek, 2000: 15). Gotina “hêmanên madî û manewî” sînorekî berfireh nîşan dide ku hemû tiştên aîdî wê civakê di hîne bîra mirov. Her wiha ev agahîyên ku Keskin ji Dorson neqil dike vî sînorî fambartir dîkin:

Li gorî Dorson folklor di bin çar binbeşan de tê dabeşkirin.

Edebiyata devkî/gelêrî (Oral Literature): Berhemên ku nivîskarê wan ne diyar û bi awayekî devkî belav bûne. Hemû cureyên edebiyata gelêrî di nav vê beşê de tên tomarkirin.

Çanda madî: Ev ji teknik, bikêrî (skill), formûl û tarîfên ku ji nîşan bo yên din hatine veguhastin.

Adetên gel ên civakî: Rîtûelên derbasbûnê (initiation rites), adetên têkildarî jidayikbûn, zewac, mirin di nav vê beşê de tên tomar kirin.

Bicihanîna (performing) hunerên gelêrî wek muzîka gelêrî, dans û şanoya gelêrî cureyên vê beşê ne. (Dorson, vgh: Keskin, 2015: 52).

Zanista folklorê jî weke hemû zanistên din pêdivî bi çavkanîyan dibe lewra ji bo ku mirov karibe qala zanistekê bike divê berî her tiştî li ber destan hin dane hebin. Helbet ev dane ji bo zanistê dibine kereste. Her wiha zanist xwe bi wan keresteyan xwedî dike anku wan ji xwe ra dike çavkanî û bi lêkolîna li ser wan geşe dide û dibe dîsîplînek. “Berhemên ku folklor berê xwe dide wan jî bi gelemperî ew berhem in ku di nav tradîsyona çanda devkî de hatine afirandin û dîsa di nav wê tradîsyonê de hatine veguhastin. Di nav wan de jî cureyên edebîyata gelêrî cihekî sereke û girîng digirin” (Keskin, 2018: 9).

Edebîyata gelêrî jî ku seheyeka berfireh di folklorê da digire, binbeşeka girîng a folklorê ye û ji hin çavkanîyan dize. Edebîyata gelêrî, edebîyata gelekî ye ku di nav salên dûr û dirêj da li ser qaliban hatîye afirandin û bi rêya gotin û vegotinan bi têkilîyeka rûbirû dihê veguhastin (Keskin, 2019: 145). Berhemên devkî bi rêya çîrokbêj, meselebêj, destanbêj û hwd, anku bi rêya kesên zindî dihên neqilkirin. Berhemên ku ev kes neqil dîkin destan, mît, çîrok, xeberoşk, lawîj, gotinên pêşîyan, hîkayed, mesele, serhatî (serpêhatî) û hwd in û anonîm in.

Li gorî Boratav jî mirov dikare çavkanîyên folklorê wek 1) tekst û 2) berhemên ku berawirdkirina van tekstan hêsan dîkin tesnîf bike lê ev çavkanî ji belgenomeyên nivîskî pêk nahên. Heta dikare were gotin ku belgenomeyên nivîskî ji bo folklorê di pileya duyem da ne.

Lewma divê çavkanîyên folklorê wek “çavkanîyên nivîskî” û “çavkanîyên devkî” werine senifandin (Boratav, 2011: 38).

Nivîskarên pirtûka *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî* beşên folklorê kurdî wek 1) edebîyata gelêrî, 2) adet û tore, 3) bîr û bawerîyên gelêrî û 4) zanyarîyên gelêrî destnîşan dikin (Yıldırım, Pertev & Aslan, h.b.: 143-144). Mirov dikare edebîyata gelêrî jî wek vegotinên gelêrî û şîra gelêrî (gotinên stranên gelêrî û dûrik di vê beşê da ne) di bin du beşên sereke da dabeş bike (Keskin, 2015: 53). Keskin, di xebata xwe ya bi navê “folklor û edebîyata gelêrî” da ku xebateka nûtir e, wek xala sêyem “yên derveyî van” li vê dabeşkirinê zêde dike (Keskin, 2019: 150).

Tiştê ku edebîyata gelêrî (devkî) û edebîyata nivîskî ji hev cuda dike ne tenê “nivîs” e. Keskin taybetmendiyên ku wan ji hev vediqetîne wiha destnîşan dike:

Di berhemên edebîyata gelêrî da dahêner ne dîyar in anku ev berhem anonîm in.

Ji ber ku dahêner ne dîyar in bi demê ra teşe girtine, her wiha varyantên wan derketine.

Edebîyata gelêrî têkilîya rûbirû dixwaze û peyama bi jest û mimîkan dihê dayîn (Keskin, 2019: 142-143).

Vegotinên gelêrî dibine beşên edebîyata gelêrî ku ew jî bi rêya gotinê hatine veguhastin. Anku vegotinên gelêrî ne nivîskî ne, ji alîyê vebêjerên wek çîrokbêj, meselbêj, destanbêj ve dihêne îcrakirin. Bi rêya wan bo nîfşên nû dihêne veguhastin û bi vê dubarekirinê di *bîra* civakê da cih digirin ku bi vî awayî ji windabûnê rizgar dibin. Her çend ev berhem anonîm bin jî ji ber ku ji vî alîyê xwe ve girêdayî performansê ne her vebêjerek di heman demê da afirînerê wê ye jî. Li gel vê yekê vebêjer li gorî ziman, devok, çanda xwe guhertinan dike û bi vî awayî adapteyî civaka xwe dike. Li gel vê adaptekirinê di vegotinê da hin caran anokranîzm jî pêk dihê. Yanî kesekî ku dîyar e bê kengî jîyaye, heçko demeka din jîyabe; yan jî bûyereka dîrokî ku dîyar e bê kengî qewimîye, heçko demeka din qewimî be dihê nîşandan (Sarpkaya, 2016: 147). Li gorî fikrê me adaptekirin bi zanîn were kirin jî anokranîzm bi piranî ji kêmtanî yan jî xeletzanîne ye çiku di adaptekirinê da mebest hinekî be jî xwemalîkirin e.

2.1.1. Cureyên Vegotinên Gelêrî

Li gorî Necat Keskin, vegotinên gelêrî ji *mît, efsane, çîrok, destan, hîkayeyên gelêrî, menqibe û memoratan* pêk dihên (Keskin, 2019: 155). Ev vegotin bi rêya vebêjê anku îcrakeran dihêne veguhastin ku her vebêjê jî li gorî cureyê vegotinê dihê binavkirin.

Îsmail Güleç senifandinên edebîyata gelêrî ku heta niha hatîne kirin rexne dike û bi sîdwergirtina ji yê kevin pêşniyazekê nû li ser senifandinê dike. Ew vê senifandinê ji bo edebîyata gelêrî ya tirkî pêşniyaz dike. Lewma helbet ne diyarker lê bi berfirehîya xwe alîkar e ji bo edebîyata gelêrî ya kurdî jî. Li gorî Güleç ev senifandin bi vî awayî ye (Güleç, 2007: 56-57):

- 1) Yên pexşankî
 - a) Çîrok [mesele]
 - b) Hîkayetên gelêrî
 - c) Efsane
 - d) Pêkenok
- 2) Yên menzûm
 - a) Li gorî teşeyê
 - i) Dûrik
 - ii) Stran
 - b) Li gorî cureyî
 - i) Lorîk
 - ii) Zêmar
 - iii) Helbestên evînî (tr: Güzelleme)
 - iv) Helbestên Mêrxasîyê (tr: Koçaklama)
 - v) Hicîw (tr: Taşlama)
- 3) Yên têkel (pexşankî-menzûm)
 - a) Mamik
 - b) Zûgotinok
 - c) Gotinên pêşîyan
 - d) Biwêj
 - e) Gotinên qalibgirtî
 - i. Pesin – nifir

- ii. Yên ku di jiyana rojane da dihêne gotin: Pêşabûna bi zarokan, argo-dijûn, daxwazên dilpak û hwd.

Em ê niha li ser ravekirina cureyên vegotinên gelêrî rawestin lê belê em ê bêtir li ser wan cureyan bisekinin ku bi mînakên me yên berhevkirî ra têkildar in.

2.1.1.1. Mît

Mît kevintirîn cureyên vegotinên gelêrî ne ji bo dîroka mirovahîyê. Ji ber vê yekê jî gelek zanist ên wek etnolojî, antropolojî, dîrok, felsefe, teolojî û hwd elaqeyeka mezin bo mîtan nîşan didin. Her wiha zanisteka ku bi mîtan bi xwe ra jî eleqedar dibe peyda bûye û wek “mîtolojî” di nav zanistan da cihê xwe girtîye. “Mît, ji peyva mythos ya zimanê grekî yê kevin tê ku tê wateya peyv, çîrok, gotina ku tê bihîstin an tê gotin, gotina ku ji dev derdikeve” (Keskin, 2019: 157). Zanista mîtolojîyê bo afirandina vegotinên gelêrî jî dibe çavkanîya yekemîn. Azra Erhat di pêşgotina *Mitoloji Sözlüğü* da wiha dibêje:

Di zimanê kevin ê grekî da bo ku têgeha “peyv”ê were nîşandan, ne yek lê wek “mythos”, “epos” û “logos” sê bêje hebûn. Mythos ew gotin e ku dihê gotin yan jî dihê bihîstin û dihê wateya çîrok, hîkaye û efsaneyê. Lê bawerî bi mîtosê nabe çiku mirov, tiştên ku dibîne bi derewan dixemilîne û vedibêje. Epos jî dihê wateya destan, helbest û newa anku awazê. Logos jî ew tişt e ku “rastî” bi gotinên mirov were zimanî û wek logos-logia dibe qertaf bo navê gelek zanistan.

Heyama berê wek “mythologeîn” lêkerê hebû û dihate wateya vegotina çîrokan û nîfş bi nîfş veguhastina efsaneyan bi awayê devkî. Têgeha mîtologîa jî dihê heman wateyê anku hem ji bo pirtûka ku çîrok û efsanê tê da hatine berhevkarin hem ji bo karê ku berhevkar dikin dihê bikarînan (Erhat, 1996: 3-4).

Ji alîyê din ve Fuzuli Bayat dibêje hin kes mîtan û helbest, ziman, mûsîqî û ahengê wek heman tiştan qebûl dikin. Hin lêkoler hewil didin ku koka mînakên folklorê, hunerên ciwan, dîn û edebîyatê bi mîtan ve girê bidin (Bayat, 2005: 6-7).

Mît çîrokeka pîroz vedibêje; bûyerekê vedibêje ku di kevintirîn demê da, di destpêkê da bûye û qedîyaye. Li gorî ku mît vedibêje bê ka “destpêkek” çawa pêk dihê naxwe ew her demê çîroka “afirandinekê” ye (Eliade, 2001: 16).

Weke em di van şîroveyan da jî dibînin mît û her wiha mîtolojî di vegotinên gelêrî da wek cure û çavkanî cihekî girîng û sereke digirin. Çiku mît der barê afirandin û pêkhatinê da agahîyan vedihewînin anku der barê “destpêkê” da ne û her bi rêya “vegotinê” hatine neqîlkin. Lewma eger vegotin hebe afirandineka edebî jî dê hebe ku bi vî awayî mît jî di nav cureyên vegotinên gelêrî da dibîne cureyekî serbixwe.

Li gorî naveroka xwe mît wek a) mîten kozmogonîyê ku behsa afirandina gerdûnê dikin; b) mîten kokê ku der barê koka miletekî, kesekî an tişteki da agahîyan didin; c) mîten eskatolojîyê ku behsa dawîya mirov, dinya û kaînatê dikin; d) mîten teogonî ku der barê xwedayan da agahîyan didin û e) mîten antropogonîyê ku behsa afirandina mirov dikin dihêne senifandin (Keskin, 2019: 160). Metin Karadağ mîtan di bin sê komên bingeîn da disenifîne: Mîten ku bûyerên xwezayî, koka ajalan, ayîn, edet û nêrîtan vedibêjin; mîten ku bûyerên dîrokî zelal dikin û mîten ku tenê serencaman vedibêjin û kêfxweşker in.

Karadağ senifandina S.H. Hooke jî wiha neqil dike: Mîten ayînî, mîten etîolojîk (sedemî), mîten kult, mîten navdarîyê (prestîj) û mîten eskatolojîk (Karadağ, 2004: 26).

Mirov dikare li gorî Eliade hin taybetmendîyên mîtan wiha rêz bike:

- Mît her demê çîrokekê vedibêjin
- Lehengên mîtan bi piranî xweda/xwedawend û bûnewerin derasayî ne
- Tiştên ku di mîtan da dihê vegotin, rasterast mirovan eleqedar dike
- Mît ne tenê afirandina dinyayê, koka mirov û tiştên din vedibêjin, di heman demê da bûyerên girîng ên ji destpêkê heta îro jî vedibêjin
- Mît li gel tiştên ku di destpêkê da rû daye, kokena (sedema) mirina mirov jî vedibêjin (Eliade, h.b.: 20-21).

2.1.1.2. Efsane

Efsane di nav cureyên vegotinên gelêrî da ya herî berbelav e. Gelek cureyên vegotinên gelêrî wek efsanê dihêne binavkirin. Sedema vê yekê jî nêzîkbûn û di gelek xalan da wekhevîya cureyên vegotinên gelêrî ye. “Hemû cureyên gelêrî bi awayekî têkildarî hev in û bingeha xwe ji ‘gotin’ û ‘vegotin’ê digirin, loma têkildariya wan û têkilhevbûna wan jî tişteki asayî ye” (Keskin, 2019: 167). Lê helbet wek cureyekî vegotinên gelêrî “efsane” jî di nava çarçoveya zanistê da pênasê, çarçove û taybetmendîyên xwe yên dîyar hene. Li gorî Birayên Grîmm efsane hîkayeyek e ku rast yan xeyalî, der barê kes, bûyer yan jî cihekî da dihê gotin (Karadağ, h.b.: 205). “Efsane ji peyva afsana ya farisî tê û ew jî bingeha xwe apasahna ya zimanê awestayî digire ku wateya wê behsa tişteki kirin; behskirin e. Di zimanê rojavayî da legend, legende, saga tê bikarînan ku ji latînî legendus derbasî wan zimanan bûye” (Keskin, 2019: 168). Li gorî Max Luthiyî wek têgeheka nû efsane, di bingeha xwe da bûyerên ku bi rastî rû dane vedibêje lê belê ew bi du awayan ji rastîyê dûr ketîye: Dema devkî dihê veguhastin û dema helbestvan

bi awayê edebî li ser dixebitin, dibe sedem ku biguhere. Efsane pêşkêşkirina bûyerên derasayî ye (Sakaoğlu, 1980: 5).

Taybetmendîya sereka ya efsaneyan ew e ku ji wan dihê bawerkirin anku tiştê ew vedibêjin rast û weke ku qewimîye dihê qebûlkirin. Bi vî alîyê xwe ew ji çîrokan vediqetin û nêzî hîkaye û destanan dibin lê taybetmendîya hevpar a efsane, çîrok û destanan ew e ku qala bûyer û mirovên derasayî dikin (Boratav, 1969: 106). Hin caran pêkan e ku cureyek bi rêya awayê vegotina vebêjer yan jî hin sedemên wek vê biguhere û bikeve teşeyekî nû da anku bibe cureyekî din. Bo nimûne dema ku parçeyekî destanê ji vegotina dirêj û tevlihev qût bibe, şewaz û vegotina xwe ya hunerî winda bike, tenê kesek yan jî bûyereka derasayî vebêje wê demê dibe efsaneyek (Boratav, 1969: 106).

Sê taybetmendîyên sereke yê efsaneyan hene: Li gorî vebêjer di wextekî dîrokî da derketîye. Anku, rast yan jî xeyalî bi kesek/bûyerekê ve dihêne girêdan; bi cihekî dîyar ve dihêne girêdan û hîkayeyeka rast vedibêjin (Sakaoğlu, 2013: 21).

Weke hemû vegotinên gelêrî efsane jî di nav civakan da belav dibin. Dema ku belav dibin li gel adaptekirin û anokranîzmê mijar û motîfên hevpar jî di efsaneyên civakên cuda da derdikevin. Mînak; di efsane, mît, destan û çîrokan da “derasayîbûn” hêmaneka hevpar e lê mekan, wext û karakter jî hev cuda dibin (Keskin, 2019: 176). Sakaoğlu di mijara belavbûnê da fikrên Raoul Rosière neqil dike ku li ser sê qaîdeyan disekine.

Qaîdeya kokê: Ji ber ku mirov hemû di afirandinê da xwedîyê heman qabîlîyetê ne efsaneyên weke hev diafirînin

Qaîdeya cihguhertinê: Dema ku bîranîna lehengekî/ê qels dibe, efsaneya li ser wî/wê hatî afirandin wî/wê diterikîne û lehengekî/lehengeka din dixê cihê wî/wê da

Qaîdeya adaptebûnê: Her efsaneya ku cih diguhere xwe adapte dike bo şert û mercên sosyal û etnografîk yê cihê nû (Sakaoğlu, 2013: 24).

Efsane, têkilîya mirov ya bi xwezayê ra vedibêjin. Di nav kurdan da li ser her dar, kevir, lat, gund, rûbar û hwd efsane peyda dibin ku ev yek vê têkilîya mirov û xwezayê nîşan dide (Keskin, 2019: 177). Ji vê berfirehtir li gorî ku Sakoglu dîyar dike di sala 1963yan da li Budapeşteya Macerîstanê kongreyek pêk dihê û di vê kongreyê da pênase û polînkirina efsaneyan dibe mijar. Di encama vê kongreyê da efsane di bin çar koman da dihê dabeşkirin (Sakaoğlu, 2013: 33):

1. Efsaneyên li ser afirandina dinyayê û qîyametê

2. Efsaneyên dîrokî û yên li ser dîroka şaristanîyê
 - a) Koka cih û alavên têkildarî şaristanîyê
 - b) Efsaneyên li ser hin cih û waran
 - c) Efsaneyên li ser prehîstorya (berî dîrokê) û heyamên berê
 - d) Şer û karesat
 - e) Kesên xuyayî
 - f) Têkçûna pergalekê
3. Hêz û heyberên derasayî / efsaneyên mîfîk
 - a) Qeder
 - b) Mirin û mirî
 - c) Cihên bêqidoş û spêle (xeyalet)
 - d) Şerên spêleyan û rê û resmên wan
 - e) Îkameta dinyaya din
 - f) Cin, perî, rih
 - g) Xeyaletên li deverên têkildarî şaristanîyê
 - h) Heyberên guherî (mutant)
 - i) Şeytan
 - j) Rihên xirab (cin) ku nexweş dikin û nexweşîyên wan
 - k) Kesên sihêrbaz
 - l) Ajal û nebatên efsaneyî (mîfîk)
 - m) Gencîne
4. Efsaneyên dînî / Efsaneyên li ser xweda û lehengan.

2.1.1.3. Çîrok

Cureyê ku herî zêde derdikeve pêş çîrok e lewra pêkan e mirov li her deverê li çîrokan rast were. Di civatên mezinan da yan jî ji bo zarokan her demê hatine vegotin. Li Kurdistanê bi taybetî di şevên dirêj ên zivistanê da, di şevbiwêrkan da wek mijûlahî hatine gotin ku vebêjer bi rêya wan hestên xwe jî neqlî civatê dike. Çîrok anonîm in û pêkan e ji aliyê her kesî ve werine vegotin. Bi vî awayî jî paralelî hestên vebêjer, guhertin di wan da pêk dihên û adapteyî her cih û çandê dibin.

Di kurmancî da wek çîrok, çîrvanok, çîrçîrok, kurteçîrok, xeberoşk, mesel, meselok, metelok, serborî, serpêhatî, serhatî, hikaye, hikyat bûne nav bo vî cureyî (Keskin, 2019: 204-205). Dema bo cureyekî gelek navlêkirin hebin, bi taybetî jî dema ku hin nav ji van bo gelek

cureyên cuda werine bikarînan wê demê ji alîyê zanistî ve pirsgirêk jî derdikevin. Lewra divê navek û pênaseya vî navî hebe da ku çarçoveyek were danîn û analîz li ser werine kirin.

Çîrok vegotinên pexşanî ne ku çêkirî tî qebûlkin. Dibe ku bûbin yan nebûbin lê ew rast nahên qebûlkin û bo wan cîdîyetek nayê nîşandan. Dibe ku di cih û dema nedîyar da hatibine honandin anku bê cih û bê dem in (Boscom, vgh: Keskin, 2019: 206). Çîrok di tirkî da wek *masal* dihê binavkirin û Sakaoğlu wiha pênasê dike: Hin lehengên wan ajal û heyberên derasayî ne, bûyer li welatê çîrokan derbas dibin, li gel ku ji xeyalan dizin dîsa jî guhdaran didine bawerkirin (Sakaoğlu, 2012: 2). Çîrok, dihê wateya hîkayeya tevgerên şexsên nenas ku li cihekî nenas, di demeka nenas da rû dane (Bayrı, vgh: Karadağ, h.b: 171). Dîsa Sakaoğlu ji Bilge Seyidoglu pênaseya çîrokê wiha neqil dike ku ev pênasê hema bêje hemû taybetmendiyên çîrokê vedihewîne: Ew cure vegotinên gelêrî ne ku ne girêdayî dem û mekanekî ne, bi sedsalan di nav civakê da dihêne vegotin û di wan da kes û bûyerên derasayî hene, bi “hebû tune bû” dest pê dikin, xwedîyê dirêjahîyeka dîyar in û bi gotinên qalibgirtî yê wek *ew gihan miradê xwe; em hilkişine ser sekoyê (tr: kerevet)* û hwd diqedin (Sakaoğlu, 2012: 2). Li gorî fikrê me di vê pênaseyê da pirsgirêk heye lewra mirov nikare bêje dirêjahîya wan dîyar e. Ji ber ku dirêjbûn/kurtbûna wan dimîne li ser vebêjer. Çiku pêkan e ku her vebêjer li gorî zewqa xwe, çanda xwe şewazeka cuda bi kar bîne û ev yek jî çîrokê kurt yan dirêjtir bike. Her wiha ji ber ku teksteka nivîskî bo çîrokan nîn e, pêkan e vebêjer hin navên cih yan jî kesan lê zêde bike yan jî bi mebesta xweşkirina vegotinê tiştinan lê zêde bike (Abozaid, 2018: 26).

Ante Aarne çîrokan wek çîrokên ajalan, çîrokên ji rêzê û henek û pêkenok dike sê beş (Keskin, 2019: 215) lê Thompson vê berfireh dike û li gorî wî cureyên çîrokan wek çîrokên ajalan, çîrokên eslî (wek çîrokên rasteqîn û çîrokên derasayî), pêkenok û çîrokên zincîrîn dikarin werin destnîşankirin (Boratav, 1969: 84). Di sala 2004an da Hans-Jorg Uther halê dawî dide vê senifandinê. Li gorî Uther ev senifandin bi vî awayî ye: Çîrokên ajalan, çîrokên sehrê, çîrokên olî, çîrokên rasteqîn, çîrokên dêwên bêaqil (hût, şeytan), henek û anekdot (pêkenok) û çîrokên formuleyî (zincîreyî) (Keskin, 2019: 216-218).

Hemû vegotinên gelêrî bi awayekî têkildarî hev in heta ji hev dixuliqin. Weke ku Abozaid ji Mesud Cemîl Reşîd neqil dike çîroka folklorî ya kurdî ji efsane û destanên kevin dest pê kirîye (Reşîd; vgh: Abozaid, h.b.: 25) ku ev yek jî vi fikrî piştrast dike. Lê li gel vê wekhevîyê taybetmendiyên sereke ku wan bi awayekî beloq ji hev vediqetînin hene. Bascom vê yekê bi berawirdkirina mît, efsane û çîrokê wiha dike ku em dikarin bi rêya tabloyekê nîşan bidin (Bascom; vgh: Keskin, 2019:159).

Tablo 1: Berawirdkirina mît, efsane û çîrokan

Form	Bawerî	Dem	Cih	Helwest	Karakterên Bingehîn
Mît	Rast	Dema dûr	Dinyaya cuda: ya din an ya kevintir	Pîroz	Ne-mirov Xweda/Nîvwxweda
Efsane	Rast	Dema nêzîk	Dinyaya niha	Pîroz/nepîroz	Mirov-jîndar
Çîrok	Çêkirî	Her dem	Her cih	Derveyî olê	Mirov/ne mirov

2.1.1.4. Destan (Epos)

Ev cure bi dirêjbûna xwe dihê zanîn. Li gorî lêkolera hîkayetên aîdî kesên ku di dîrokê da jîyane wek destan dihêne binavkirin (Karadağ, h.b.: 44). Ya rast bi rêya vegotina hîkayeta kesan di bingeha xwe da dîrok, hest û ramanên civakakê vedibêjin. Bi gotineka din ew “kes” di heman demê da temsîlkarê civaka xwe ye çiku lehengê civakê ye heta ku bûye lehengê destanê jî. Li gorî vê yekê mirov dikare bêje ku destan der barê edet, rabûn û rûniştin, dîroka civakekê û bi taybetî jî têkilîya wê li gel civakên din agahîyan didin. Destan, ne ku nakokîyên di nava civakê da, têkilîyên çin yan jî şexsan vedibêjin; ew bêtir têkilîyên kesên “serekê” û îdeal ku rêvebirên civakê ne û şerên wan ên bi afirîdeyên derasayî ra vedibêjin (Boratav, 1969: 38).

Wateya bêjeya “destan”ê peyv, hîkaye, helbesta lehengî ye ku ji bo vê têgehê di ingilîzî da bêjeya epic, epos, epope, epic poem dihê bikarînan (Keskin, 2019: 178). Azem Sevindik li gorî teşe û li gorî vegotinê du pênaseyên destanê neqil dike. Li gorî teşe destan menzûm yan jî têkel (menzûm+pexşan) in, gelek beşên (epîzot) wê hene û sehneyên şexsan bi hûrgulî vedibêjin. Ji alîyê din ve li gorî vegotinê; ew cure vegotin in ku ji alîyê destanbêjekî hosta ve bi teşeyekî taybet û li gel enstrûmanekê diheve vegotin (Reichl; vgh: Sevindik, 2017: 92). Anku di destanan da vebêjer dibe xwedîyê roleka girîng û ew bi afirînerî û vebêjerîyeka serkeftî dikare di vî warî da rengêkî cîyawaz bide destanê. Çiku di destanê da şêwaz xwedîyê cihekî taybet e ku ji alîyê vebêjeran (di vegotina destanên kurdî da ev vebêjer “dengbêj” in) ve dihê tayînkirin. Ji bo jiberkirinê, vebêjeran ew bi qaliban gotine û bi vî awayî destan bûne xwedîyê pergalekê (Çalışıran, 2015: 222). Destan jî ji cureyên din ên vegotinê gelêrî ne dûr e. Her wiha destan,

ji bermahîyên mît û efsaneyan teşe digirin û çêdibin û hîkayetên bûyerên lehengî yên heyama berê ne (Sevindik, h.b.: 92).

Destan di demên kevin da çêbûne lewma di wan deman da hem der barê afirandin û veguherîna xwedayan û heyberên derasayî da hem der barê rabirdûya civakan da agahî di destanan da peyda dibûn. Bi vî awayî jî mijarên wan wek “kozmogonî û mîtolojî” û “bûyerên girîng ên di dîroka neteweyan da” dibine du kom (Boratav, 1969: 38).

Destan bi giştî wek “destanên xwezayî” û “destanên çêkirî” dibine du cure. Yên xwezayî wan bûyerên kevin û mezin vedibêjin ku bandor li ser civakê kirine; yên çêkirî jî ji alîyê helbestvanan ve bi forma destanê hatine nivîsîn (Çalıştiran, h.b.: 222). Li gorî vê mirov dikare bêje ku hinek destan xwedî nivîskar, hinek jî anonîm in. Lê belê hemû destan ji hîkayeyên gelêrî hatine berhevkirin û hatine nivîsîn. Ew kesên ku ev hîkayeyên gelêrî ku jixwe di nav civakê da hene berhev kirine û derbasî nivîsê kirine wek nivîskarê wê destanê dihêne qebûlîkirin (Keskin, 2019: 181). Helbet ew kes ne ku afirînerê destanê ne lê wan derbasî nivîsê kirine û bi saya wan destan gihîştine roja me. Li gorî Öcal Oğuz ji bo ku destan çêbibe û xwe bigihîne roja me jî divê di hin şert pêk werin û hin merheleyan ra derbas bibe. Ew van şert û merheleyan wek pênc serenavan destnîşan dike (Oğuz, 2004: 7):

Serdema destanê: Divê civaka ku destanê diafirîne di serdemaka wilo da bijî ku mirov bikare wek “serdema destanê” bi nav bike. Di vê serdemê da hêmanên mîtolojîk bandoreka girîng li jîyanê dikan.

Vegotinên devkî: Bo ku civakêk destanê biafirîne divê xwedîyê wê qebûlîyeta afirîner be di warê çand û edebîyatê da.

Bûyer: Divê bûyerekê rû dabe ku bandoreka mezin li civakê kiribe û bibe sedema afirandina destanê. Dibe ku ev bûyer serkeftinek, karêstek be; yan jî mijarek be ku ji civakên din hatibe wergirtin yan jî ji alîyê hozanan ve hatibe honan.

Hozan: Divê ev bûyer ji alîyê hozanekî ve hatibe veguherandin bo metneka edebî. Yanî divê hozanek wê bike destan û îcra bike û hozanên din veguhêzin bo nîfşên nû.

Tespît: Divê berî ku serdema destanê xilas bibe ev metna devkî derbasî nivîsê bibe. Lewra ger piştî vê serdemê metn were tespîtîkirin dê taybetmendîya xwe ya destanî winda bike. Anku divê metn di wextê xwe da were tespîtîkirin.

Têkildariya vegotinên gelêrî her xuya ye û ku şert û mercên civakê diguherin, bi demê ra destan jî winda dibin û vediguherin bo hîkayeyên gelêrî (Keskin, 2019: 188).

2.1.1.5. Hîkayeyên Gelêrî

Ev cureyê vegotinên gelêrî wek teşe vegotineka têkel e anku hin beş menzûm hin beş pexşan in û di nav edebîyata gelêrî ya kurdî, tirkî û ya ewropayê da jî peyda dibin (Keskin, 2019: 191). Li gorî Alptekin jêdera wan tirk, ereb-îslam û hînd-îran e; evîn, qehremanî û hwd dibine mijarên wan; ew hem menzûm hem pexşan in û bi piranî ji alîyê aşiq û meddahan ve dihêne vegotin (Alptekin; vgh: Oğuz, 2008: 3) Bûyerên di hîkayeyê da bi awayê pexşanî dihêne vegotin û di vê beşê da teşe ji alîyê vebêjer ve dihê dîyarkirin û vebêjer serbest e lê di veguhastina hestan da divê beşên menzûm werine parastin anku bi halê xwe yê pêşî bin (Karadağ, h.b.: 155).

Ji bo mînakên vî cureyî di kurdî da gelek caran bêjeya “destan” dihê bikarînan ku ev yek jî dibe sedema tevlihevîyê di navlêkirina cureyan da. Michael L. Chyet jî ji bo Mem û Zînê li herêmen cuda li navên cuda rast dihê lê ew vê berhemê wek “folk romancê” dinirxîne ku “romancê” jixwe dihê wateya hîkayeyê. Lewma jî dibêje her çend ev cure bişibe destanê jî cureyekî cuda ye (Keskin, 2019: 195-196). Ev cure di tirkî da wek “halk hikayesi” dihê binavkirin. İlhan Başgöz jî vî cureyî wek “halk hikayesi” bi nav dike û beramberî vê têgehê “folk romance”ya îngilîzî bi kar dihêne (Başgöz; vgh: Keskin, 2019: 192).

Pertev Naili Boratav di destpêka pirtûka xwe ya bi navê “Destana Koroglu” da li ser vê tevlihevîkirinê disekine û bi awayekî zelal cudabûna hîkayeya gelêrî û cureyên din rave dike. Li gorî Boratav gelek hêmanên çîrokan di hîkayeyên gelêrî da hene lê belê li dijî çîrokê lehengên wan kesên dîyar in û li cihên dîyar derbas dibin. Ji alîyê din ve ew ji destanan dûr ketine çûku hêmanên destanan di wan da ketine asta herî kêr da û bi hin hîkayeyan hatine bertengkirin (Boratav, 1984: 18). Anku her çend hîkayeyên gelêrî bişibine çîrok û destanan jî, lehengên wan kesên rasteqîn in û ew bêtir li ser bûyeraka teng disekinin. Bi vî awayî li gorî destanê têra xwe kurt dibin û ji çîrokê jî vediqetin. Jixwe Boratav jî pêşdetir dibêje em dikarin bêjin hîkayeyên gelêrî ew çîrok in ku destanî bûne yan jî ew destan in ku ji destanîbûna xwe dûr ketine û bi çîrokan ra gelekî tevlihev bûne (Boratav, 1984: 19).

Senifandina hîkayeyên gelêrî ji alîyê qebare û mijarê ve dihê kirin. Ji alîyê qebare anku dirêjbûna xwe ve dibine du kom: 1) Hîkayeyên kin ku ji efsane, çîrok yan jî ji jîyana rasteqîn hatine wergirtin. Ev hîkaye li dora yek bûyerê hatine honan, kin û sade (ji rêzê) ne; 2) hikayeyên

dirêj ku gelek lehengan, bûyerên cuda têkilî hev dikin û di encama vê da jî hinekî li hev digelicin û du-sê şevan didomin. Ji alîyê mijarê ve jî wek hîkayeyên evînê (heskirinê) û hîkayeyên qehremanîyê dibine du kom (Boratav, 1969: 57-58).

Ji bilî vê di edebîyata kurdî ya gelêrî da cureyekî hikayeyên gelêrî heye ku wek “şer” dihê binavkirin. “Mijarên şeran bêhtir rûdanên dîroka nêzik in û wek ji nav jî dîyar e li ser pevçûnekê hatine gotin. Ev şerê ku tê gotin dibe ku di navbera du eşîran de be an jî di navbera eşîrekê û hêzên dewletê de bê” (Keskin, 2019: 200). Vêbêjerên van şeran bêtir wan li gel amûrekê vedibêjin û van demên dawî dema ku bi civatî vegotine, di heman demê da tomar jî kirine û bi vî awayî belav bûne. Ev amûr hin caran tembûr lê bêtir kemaçe ye û îcraker jî mitirp yan dengbêj in.

2.1.1.6. Memorat

Memorat cureyekî din ên vegotinên gelêrî ye ku di pênasekirina vî cureyî da lihevkirinek nîn e. Her çend bi zêdebûna xebatên der barê vî cureyî da pêşkêşkirina nêrînên li ser têgeha memoratê zêde bûbin jî li ser pênaseya wê konsensusek pêk nehatîye (Hallaç, 2018 b: 149). Li gorî Von Sydow ku wek afirînerê vê têgehê dihê qebûlkin memorat ew cure vegotin in ku mirov bi rêya wan tecrûbeyên xwe yê şexsî vedibêjin, li ser alîyên balkêş û nejbîr yê van tecrûbeyan û ravekirina tecrûbekirina wan dihêne şayesandin (Hallaç, 2018 a: 186).

Memorat ji alîyê teşeyê ve pexşan û ji alîyê dirêjahîyê ve jî vegotinên kurt in. Helbet kurtbûn-dirêjbûn tiştekî relatîv e lewma divê mirov ji bîr neke ku ev gotin di vê wateyê da çarçoveyeka mitelq bo memoratan naafirîne. Her wiha ev yek rasterast bi performansa îcraker ra jî têkildar e. Li gel cudahîyên di navbera îcrakirinê îcraker ên li mekanên derveyî û mekanên hundirîn; bandora taybetmendîyên fîzîkî yê van mekanan; şêwaza îcraker; temen, zayend û pîşeyê guhdaran dikare dirêjahî û kurtîya teksta memoratê biguhêre (Hallaç, 2018 b: 158). Ji alîyê din ve îcraker di memoratan da xwedîyê rolekê ye ku ev rol xîmê bingeîn yê vî cureyî jî datîne.

Li gorî teza ku bingeha xwe ji nêrîna Sydow werdigire ‘tecrûbeya takekesî’ hêmaneka girîng e di memoratan da û ev yek tenê bi yek awayî dikare bê ravekirin: Hîkayeya mijara lêkolînê tenê ji alîyê wî/wê kesî/ê ve dihê neqilkin bo kesên din. Heke kesê/a duyem ji kesê/a sêyem ra vebêje ne wek tecrûbeya xwe wek tecrûbeya kesê/a ku ev bûyer jîyaye vedibêje. Lewma pênaseya klasîk a memoratê xwe dispêre şîroveyeka berteng ku dibêje ev qewimîn ji alîyê yek kesî/ê ve yan jî kesên ku ji wî/wê bihîstîne ve dihê zanîn. Ev pênase wisa qebûl dike ku kesê/a duyem memoratê venabêje, heke vegotina wî/wê bi teksta resen ra peyv bi peyv hev bigire jî êdî mirov nikare wê wek memoratê bin nav bike (Dégh & Vázsonyi, 2015: 132).

Heke memorat jî cureyekî vegotinên gelêrî be û hêmanên folklorik bin wê demê ev rastî li ber çavan e ku ev angaşt sînorekî neyînî datîne û ev yek nakeve kirasê zanista folklorê. Lewra hêmanên folklorik li ser neqilkirin û veguhastina nifşan zindî dimînin û xwe digihînin roja me ku çendî di vê pêvajoyê da bo van keresteyan guhertin, deformebûn û adaptasyon jê neger be jî. Jixwe piştî demekê ev şertê “destê yekem” hinekî sist dibe û Christiansen wan memoratan keşf dike ku ji tecrûbeyên rasteqîn ên destê yekem yan jî duyem dizên (Dégh & Vázsonyi, h.b.: 132). Li gel vê hin mînakên ku me li sehayê berhev kirine û mirov dikare di nav memoratan da nîşan bide jî ne ji destê yekem anku xwedîyê tecrûbeyê lê ji kesê/a duyem hatine wergirtin. Anku ev tecrûbeya me ya sehayî jî dibe palpişt bo vê sistbûna mecbûrî. Lê belê di vir da problemeka din derdikeve: Gelo ev zincîr tenê ji du kesan divê pêk were û heke bi du kesan sînordarkirî be di encamê da veguhastin di niqteyekê da naxitime? Piştî demekê lêkoler Pentikäinen tê derdixe ku ev şîroveya Christiansen jî berteng dimîne. Tê digihîje ku di navbera xwedîyê/a tecrûbeyê û vebêjerî/ê da zincîreka duxelekî heye. Ev jî dihê wê wateyê ku ev zincîra vegotinê bi awayekî îdeal ji çar kesan pêk dihê (Dégh & Vázsonyi, h.b.: 134). Lê belê piştî ku ev hejmar bu pênc û şeş û zêdetir jî divê memorat ji holê ranebe. Li gorî Dégh û Vázsonyi dema ku vê hejmarê çar kes derbas kir, memorat êdî dibe fabulat lê dema ku vebêjerê sêyem bûyerê wek serpêhatîya xwe neqil dike, gelek fabulat jî dibine memorat (Dégh & Vázsonyi, h.b.: 134). “Bi vî awayî jî ‘memoratên sexte’ û ‘memoratên qaşoyî’ derdikevine holê (Čistov; vgh: Dégh & Vázsonyi, h.b.: 134).

“Di kurdî da ji bo vê cureyê serborî an jî serpêhatî jî dikare bê bikaranîn¹³” (Keskin, 2019: 200). Memorat ew cure bîranîn in ku di encama tecrûbeyên şexsî da dihêne vegotin û hestên civakî û exlaqî di nav xwe da vedihewînin û bi vî awayî jî der barê jîyanê da dersekê vedibêjin (Ataizi & Sözer, 2016: 382). “Ev tecrube ne tecrûbeyên ji rêzê ne û di nav van tecrûbeyan de rûdanên derasayî hene” (Keskin, 2019: 200). Girêdayî vê derasayîbûnê, rewş û bûnewerên wek cin, şeytan, perî, hinkur-munkur, reşê şevê, erkebî, Xoce Xizir û hwd dibine temayên memoratên Anatolyayê (Kızıloğlu, 2014: 43). Li gorî tecrûbeyên xwe yên sehayî û naskirina çandê em dikarin temayên memoratên kurdî dîsa wek cin, şeytan, Xocê Xizir, dewlet, Eloezîza û hwd destnîşan bikin. Memorat di hemû çandan da hene û dê her hebin lê belê di civakên post-modern û post-senayî da êdî evên gundewarî ji holê radibin û êdî motîf jî dibin

¹³ Vebêjer Xelilê Mexso ku em li sehayê pê ra xebitîne vê bêjeyê wek “serhatî” bi nav dike.

“otostopkerê ku winda bû” yan jî “ufo” (Çetinkaya, 2013: 9)¹⁴. Bi gotineka din motîfên memoratan jî adapteyî şert û mercên demê, mekanî û jîyana aktûel dibin.

Derasayîbûna ku di memoratan da peyda dibe di heman demê da dibe sedem ku ev cure bi zehmetî bikeve qada zanistê da. Lewra li gorî vê şîrovekirina Çobanoglu xuya dibe ku ji ber ve derasayîbûnê ew demekê wek xurafeyan jî hatine qebûlkin: Ji ber ku di naveroka wan da tiştên derasayî hene ji ber hin sedeman qada zanistê hewil daye ku wan dûr bigire. Sedema sereke jî daxwaza hiştina li derve ya xurafeyan e di sazkirina civaka nûjen da (Çobanoğlu; vgh: Hallaç, 2018 a: 184). Dîsa jî dema ku hatine vegotin, civakê ji wan bawer kirîye û bi demê ra wek cureyekî vegotinên gelêrî cihê xwe girtîne. Lewra mimkun e memorat wek hikayeyên jîyana rasteqîn werin nirxandin çiku dema ev cure dihên vegotin, rêzdarîyek bo wan dihê nîşandan û li ser rîwayetên wan kesan ava bûne ku bawerî bi wan dihê (Ataizi & Sözer, h.b.: 383).

Memorat heta demekê weke bincureyekî efsaneyan dihate nirxandin (Keskin, 2019: 201). Li gorî Balaban memorat ew vegotin in ku der barê tecrûbeyên metafîzîkî yên şexsan da ne û di nav kadroya efsaneyan da cih digirin (Balaban, 2015: 89). Weke xuya dibe memorat, pêşî rasterast wek cureyekî efsaneyan hatîye qebûlkinin lê îfadeya “tecrûbeyên şexsî” bi tena serê xwe cîyawazîyeka dijwar vedibêje di navbera memorat û efsaneyê da. Von Sydow di wê bawerîyê da ye ku her çend ji alîyekî ve bigihe efsaneyê jî divê memorat ji efsaneyê were veqetandin çiku ne taybetmendîyên wê yên edebî hene ne jî ew deng û rengê tradîsyonê dide (Dégh & Vázsonyi, h.b.: 131). Çawa ku gelek cureyên vegotinên gelêrî hin taybetmendîyên hevpar nîşan bidin jî xalên girîng ên ku wan ji hev vediqetînin hene, memorat jî bi awayekî ji cureyên din dihêne veqetandin. Her çend me bal kişandibe ser îfadeya “tecrûbeyên şexsî” jî li gorî Dégh û Vázsonyi ev cudahiya memorat û efsaneyê ne beloq e. Lewma jî lêkolera di destpêkê da memorat ji fabulatan veqetandin û li gel vê ew ji efsaneyan cîyawaz kirin. Jê wêdetir gotin ku wesfekî folklorîk ê memoratan nîn e lewma jî ew ne aîdî folklorê ne (Dégh & Vázsonyi, h.b.: 131). Ya rastî dema tiştekan bi alîyekî xwe (çi erenî, çi neyînî) hate veqetandin, ev yek dihê wê wateyê ku ew cîyawaz e lê bo memoratê pirs ev e ku ka gelo ev dibe hêmaneka folklorîk yan na.

Li gel hebûna taybetmendîyên memoratan yên ku wan ji mît, efsane û çîrokan vediqetînin jî ew bi van cureyan ve hatîne girêdan ku ev jî di warê zanista gel da yekem

¹⁴ https://www.academia.edu/7097249/Memorat_Fatih_%C3%87etinkaya (Dîroka gihiştinê: 13/11/2020).

pirsgirêk e bo memoratan (Hallaç, 2018 a: 187). Helbet hin xal, taybetmendî û motîfên hevpar yên memorat û efsaneyan hene lê belê memorat bi serê xwe cureyek ji vegotinên gelêrî ye ku Necat Keskin taybetmendiyên vî cureyî wiha destnîşan dike:

“- Neqilkirina tecrubeyên şexsî ku derasayîbûn an jî nejrêzêbûnekê vedihewînin

- Hebûna qalibgotinên ku di van vegotinên de cih digirin” (Keskin, 2019: 202).

Ji alîyê din ve Tacettin Hallaç senifandinên Brynjulf Alver û Richard Sweterlitsch neqil dike û di encamê da dîyar dike ku di van senifandinan da du pirsgirêk hene. Lewra memorat ne bi serê xwe lê bi cureyên din ra hatine nirxandin û ev senifandin ne li gorî pîvaneka hevpar hatine kirin (Hallaç, 2018 b: 154). Li gorî neqilkirina Hallaçî, Alver mamoratan vediqetîne sê beşan:

Efsaneya tecrubeyan; di forma memoratan da ye lê naverok ji efsaneyan hatîye wergirtin

Memorata kolektîf; li ser bawerîyên cuda yên kolektîf û hêmanên efsaneyan hatîye saz kirin

Memorata takekesî; bi giştî ne tradîsyonel e lê bi awayekî ji rêzê hîkayeya tecrûbeyên derasayî ye (Hallaç, 2018 b: 152).

Richard jî wek efsaneyên ku dihêne zanîn yan jî yên ku li ser motîfên efsaneyan saz dibin; ên ku helwest, nêrît yan jî bawerîya civakê aşkere dikin û didine ber çavan; ên ku motîfên efsaneyeka dîrokî yan jî çîrokên dirêj vedihewînin memoratan disenîfîne (Hallaç, 2018 b: 154).

Her çend ji ber derasayîbûna memoratan bawer kirina bi wan dijwar xuya bike jî xwe didine guhdarkirin û guhdar peyama di wan da bi hin rêyan qebûl dikin ku Çetinkaya şertên vê qebûl kirinê wek pênc xalan destnîşan dike (Çetinkaya, h.b.: 12)¹⁵:

Li gorî fikrê guhdaran li vê dinyayê gelek tişt hene ku hîn ew bi wan nizanin,

Ravekirineka giştî ya derasayî li ber çavan digire ku hîkayeyê jî digire nav xwe,

Guhdar, tiştê dibihîze têkildarî wan bûyeran dihesibîne ku berîya niha jîyane,

¹⁵ https://www.academia.edu/7097249/Memorat_Fatih_%C3%87etinkaya (Dîroka gihiştinê: 13/11/2020).

Guhdar, li hêmanên belgeyî digere der barê wî tiştî da ku dibihîze,

Guhdar, dixwaze vebêjer sond bixwe li ser rastîya tiştên ku dibêje.

2.1.1.7. Cureyekî Din “Mesele”

Têgeha “mesele” gelek caran di cihê hin vegotinên gelêrî yên ji hev cuda da hatîye bikarînan. Qet nebe li sehayê vê xebatê ev pêşqebûl derbasdar e. Vebêjer vegotinên ku neqil dikin heke rast qebûl bikin wek mesele; heke ne rast qebûl bikin wek çîrok bi nav dikin. Rewşeka ji rêzê ye ku li sehayê û di teorîyê da navlêkirina vegotinên gelêrî hev negire û vebêjer gelek vegotinên ku neqil dikin wek “mesele” bi nav bikin. Lê ev pirsgerêk di teorîyê da jî derdikeve pêşberî lêkolanan. Em jî li vê kêmanîyê rast hatin û bi mebesta ku em rêyekê li ber vê nîqaşê vekin, me “mesele” di nav cureyên vegotinên gelêrî da bicih kir. Çiku di karê berhevkarîyê da me dît ku vebêjer gelek caran vê têgehê bi kar dihinin lê dema me berê xwe da lîteratûrê, em li çavkanîyekê rast nehatin ku têna me pê bişike. Hin çavkanîyên ku me berê xwe da wan jî me dît ku bêtir wek têgeh derbas dibe lê.

Heyder Omer di pêşeka pirtûka Fettah Timar da vê pênaseyê dike:

Mesele û metelok beşekî kelepûrê ne, hevokine kurt in, wek hemû cureyên zargotinê, ji serdemekê ta ya din, ji nîfşekî ta yê din li ser zimanan digrin. Ewana encama ezmûnên pêşîyan in, wateyên civakî û çandî, yên girêdayî diyardeyên jiyana gelemperî ya civakê hildigirin. Hukarîya (bandora) demê li ser wan kêma e. Guhertinên mezin tê da peyda nabin, eger bibin jî digihên peyvan, lê wate wek berê dimîne (Omer, 2018: 7).

Wek ku ji vê pênaseyê jî dihe fêmkirin Omer jî “mesele” di cihê gotinên pêşîyan da bi kar îname yan jî fokus bêtir daye ser vê beşa wan. Çiku pêşdetir dibêje “hin caran mesele û metelok ji ber çîrokekê, wek encama wê, peyda dibin... Lê pirê caran çîrok têne ji bîr kirin, metelok dimîne” (Omer, h.b.: 8). Her wiha Birayên Celîl jî di berhema xwe da ku bi navê “Zargotina Kurda” weşandine, gotinên pêşîyan di bin “mesele û met’elok”an da senifandine.¹⁶

Mebesta me ji vê nîqaşê e ew ku lêgerînek bo bersiva van pirsan dest pê bike: “Mesele çi ye? Ew bi serê xwe cureyekî vegotinên gelêrî ye yan navekî duyem e bo cureyên din? Heke bi serê xwe cureyek be çarçoveya wî çi ye û bi çi taybetmendîyan ji cureyên din vediqete?”

¹⁶ Bnr: Celîl, O. & Celîl, C. (2013). *Zargotina Kurda* (Cild 2). Diyarbakir: Aram Yayıncılık.

Dema ku ev pirs hatin bersivandin ev nakokî jî dê ji holê rabe û bi vî awayî hevsengîyek dê di navbera lîteratûr û sehayê da saz bibe. Li gorî fikrê me ev yek girîng e çiku têgeha “mesele”yê ewqasî berbelav dihê bikarînan ku ji alternatîfekê wêdetir xuya dike.



BEŞA SÊYEM

TOPONÎMÎ DI VEGOTINÊN GELÊRÎ DA

Pêkan e ku her zanist ji bo zanistên din daneyan vehewîne û bi danûstandina li ser van daneyan, têkilîyek di navbera zanistan saz bibe. Bi taybetî jî têkilîyeka xurt di navbera toponîmî û folklorê da heye ku sehaya hilberîna folklorê civak bixwe ye. Bi nêrîneka din ji ber ku navlêkirina cih û waran (ku mijara toponîmîyê ye) rasterast afirandinên civakê ne, têkilîya toponîmî û folklorê têra xwe xurt e. Yanî her tişta ku dibe kereste bo toponîmîyê berîya wê jixwe keresteya folklorê ye. Wek mînak; pêşî civak nav li çîyayekî dike piştra toponîmî di çarçoveya xwe da li ser wî navî disekine û lê dikole. Bi vî awayî bixwaze nexwaze xebata li ser toponîmîyê tûşî zanista folklorê dibe. Her çend wêne bi giştî bi vî awayî be jî çarçoveya vê beşê ew e ku têkilîya di navbera toponîmî û wek beşeka folklorê vegotinên gelêrî da raxe ber çavan. Jixwe Yusifov û Kerimov wek çavkanîyên toponîmîk sê çavkanî dîyar kirine ku yek ji van jî “nimûneyên afirînerîya gel” in. Ev çavkanî ji destanên qehremanî û evîne pêk dihên ku navên toponîman vedihewînin (Yusifov & Kerimov, h.b.: 69-72).

Di vê xebatê da jî bi giştî fokûs li ser wan vegotinên gelêrî ye ku çavkanîyên toponîman in. Lewma divê bersiv ji wan pirsan ra were dîtin bê ka toponîmî û vegotinên gelêrî li ku digihine hev, têkilîyeka çawa di navbera wan da derdikeve holê û çî pev dibêjin. Tam di vê xalê da dîsa du parametre derdikevine pêşberî me ku xwe dispêrin tecrûbe û çavdêrîyên me yên sehayî.

- 1- Yan navê cihekî jixwe heye (helbet em behsa dîroka vî navî nakin) û vegotineka gelêrî li ser vî navî hatîye afirandin,
- 2- Yan jî vegotineka gelêrî heye/hatîye afirandin û ew cih jî li gorî vê vegotina gelêrî bi nav bûye.

Anku yan vegotineka navê cihî heye yan jî ji navê cihî vegotinek heye. Ji ku alîyî ve lê were nêrîn dîsa heman encam derdikeve holê: têkilîyeka xurt di navbera toponîmî û vegotinên gelêrî da heye heta jê wêdetir her du ji hev dizên.

Di vê beşê da ew vegotinên gelêrî dê werin pêşkêşkirin ku di çarçoveya van her du pîvanan da hatine berhevkirin. Rêzkirina wan dê li gorî rêza alfabeyê ya navê gundan be û di destpêkê da bi kurtasî danasîna wî gundî dê were kirin. Her wiha piştî pêşkêşkirina her vegotina

gelêrî analîza wê dê were kirin. Di vê kurtenirxandinê da çarçove dê ew be bê ka ji bo kîjan cureyê toponîman dibe mînak, di nav da çi cureyên toponîman hene û ji vî alîyî ve dikeve kîjan kategorîyê da; di navlêkirina vegotina gelêrî da çi problem hene û taybetmendîyên kîjan vegotinên gelêrî vedihewîne.

3.1. BAFE

Ev gund di navbera Hezex û Cizîrê da ye û ji alîyê fermî ve li ser Hezexê ye. Gundê Bafeyê di ber Çemê Dicleyê da ye ku li vê herêmê wek Şetê Cizîrê dihê binavkirin. Li gorî 2020an serhejmara Bafeyê 1350 kes in (TÜİK, 2020) û gundî ji eşîra Harûna ne. Pîranîya şênîyên gund debara xwe bi sewalkarî û cotkarîyê dikin û ciwanên wan karkerîya însaatê dikin.

Piştî vî gundî êdî devoka Botanê¹⁷ dest pê dike ku bi vî awayî îsoglossekê çêdike û bi vî alîyê xwe dibe sînore sehaya me ya xebatê jî. Li vî gundî li binîya Kelha Bafê qesrek heye. Qesir di ber çem da ye û wek Qesra Elo Dîno dihê binavkirin. Li ser Elo Dîno hîkayetek dihê gotin ku ne tenê li vê herêmê li gelek herêmên kurdan belav bûye û dihê zanîn. Vebêjer Qudbedîn vê hîkayeta ku ji Deham Acar wergirtî wiha neqil dike:

3.1.1. Elo Dîno

Demekî ticareta Bexda û Mûsil, ya vî cihê me hemû qompile ser Şetê Bota¹⁸ ra diçû. Yanî ser Şetê Cizîrê¹⁹ ra derbas dibû. Tabî wê demê jî weke niha ti derfetê 'îş nebûn go kes 'îş bikê. Elo Dîno jî qesra xwe li ber avê çêdikê, çîqa kelekvanê di wê derê ra derbas dibin jî xercekê ji wa distênê ji bona ku malbata xwe pê xweyî bikê, li ser pîya bisekinê. Ji vî alîyê şet zincîrekê tavêjê wî alîyê şet, tavêjê kevîrê mezî. Çîqa keleka tê, tê li ber qesra wî disekinê, xeraca xwe ji wa distênê û wa dişîyênê. Carek, di car, sê car, ev diçê ber guhê Mîrê Bota. Mîrê Bota jî qebûl nakê, yanî dibêjê di bolga mi da kî ji bêyî mi dikarê xeracê ji mîletî bistênê, vê ewkê bikê! Çend cara wezîrê xwe dişîyênê ji Elo Dîno ra, dibêjê Mîrê Bota bakirye te, îşte divê werê. Xeber jê ra diçê, [Elo Dîno] naçê. Belkî [wezîr] xwe lê diqewimênê ku bibê jî, belkî nikarê yan jî belkî çarê jê nakê. Bi wî miqamî dêhn didîyê ku nikarê bibê wê dê, radibê dibêjê [e]z ê çawa kim? Dibêjê [e]z ê xwarineke mezî, mewlûdeke mezî dim [e]z ê 'ezimênime mala xwe, bi wî miqamî [e]z ê ênime koçka xwe û ez ê Elo Dîno li wê derê girim û kime zîndanê da. Radibê xeberê jê ra dişîyênê. Dibêjê Mîrê Bota gotîye bila Elo Dîno werê, em û ew ê lev ên. Yanî dibê ez dixwazim vî mîrxasî bibînim. Elo Dîno jî wextê ku kar dikê herê (di pîrekê Elo Dîno hene) pîrekeke wî dibêjîyê da, dibêjê neçe. Dibêjê Mîrê Bota wê te xê xefkekê da. Pîreka wî ya dî dibêjê here xem nakê, wê bi te ra lev ê, heta dibêjê here ji mi ra fîstaneke jî bêne. Werhasil ew jî difikirê, bi ya pîreka xwe ya ku dibêjê neçe nakê. Biryarê distênê dibêjê ez ê çim. Tabî Mîr jî li wê derê hazîrîyê xwe kirine. Em bêjin weke kortekî tiştekî çêdikê û merşekî dideynê ser, dibêjê ku Elo Dîno hat hûn ê bêjin ev der cihê te ye. Wextê ku rûnişt zaten wê kevê tê da, em ê girin avêjine zîndanê da.

¹⁷ Di kurmançî da weke devoka Torê, devoka Hekarîyê, devoka Serhedê devok hene. Devoka Botanê jî yek ji van devokan e ku li Herêma Botanê dihê axaftin. Ji bo Herêma Botanê bnr: "Bedlîsî, Ş. (2014). Şerefname. (wer: Z. Avcı). Mersin: Weşanên Azad."

¹⁸ Ew jî şaxeke şetî ye ku ji Sêrtê dihê û dîsa dihê ser Şetê Cizîrê.

¹⁹ Çemê Dîjleyê li vê herêmê weke Şetê Cizîrê dihê binavkirin.

Diçê wê derê, îşte Mîr ew dibêjinê cihê te ev der e. Dirûnihê, çawa wextê ku dirûnihê jî zaten dikevê kortê da, tûzaqa ku jê ra hazir kirine. Dibin tavêjine zîndanê da. Wextê tavêjine zîndanê da, kortikê navmilê wî dikolin, finda tê da diçênin, agir tê da dikin. Agir digirîyê da, ew agir zemanla xwe dîberdê ser kezeba wî. Pîreka Mîrê Bota dengê wî bihîstîye, yanî navê wî bihîstîye. Gelekî meraq dikê, dibêjê dixwazim Elo Dîno bibînim [bê] mîrxasekî çawa ye. Iznê ji mihafîza dixwazê diçê di zîndanê da lê dimeyzênê. Elo Dîno di wî halî da wextê ku ça'v li jina mîr dikevê, ewkê wî, yanî zîlamtîya wî tê bîra wî, tehrîk dibê. Di wî halê ku wê mirê da li hemberî jina wî tehrîk dibê. Piştra jî gotina pîreka wî tê bîra wî ku gotî neçe wê te kujê filan. Û pîreka wî ya dî ku gotî fîstaneke jî mi ra ji Cizîrê bêne, yanî diçê mirinê vê jê dixwazê. Piştra Mîr diçê cem. Mîr diçê cem dikenê dibêjê Elo ka vêca ji mi ra bêje, ev hal xweş e an halê ku te mîlet dişeland? Tabî mîr nîzanê ku ji bo malbata xwe xweyî bikê vê tişta hanê dikê. Ew dibêjê qey ji xwe ra kirîye gelenek mîlet dişelênê. [Elo Dîno] dibêjê mîrê mi ev hal ji wî halî sed qet xweştir e. Mîr şaş dibê. Dibêjê çawa xweştir e? Halekî ji vî halî nexweştir nîn e. Yanî ti dimirinê da yî, tê mirê! Kortikê navmilê te agir tê da dişuxilin. Dibêjê mîrê mi! Tiştek ji wî halî nexweştir nîn e ku mîhvanek werê mala miho û zîlam li pîreka xwe meyzênê, pîrek li zîlêm meyzênê, tiştek nebê deynê ber mîhvanê xwe. Ew hal ji vî halî gelekî nexweştir e. Wextê wîlo dibêjê, mîr fêhm dikê ku Elo Dîno ji boy ku xwe xweyî bikê, ji boy ku malbata xwe xweyî bikê vê tişta hanê dikê. Dibêjê Elo Dîno ne mîrê kuştinê ye wî vekin. Tabî 'îş ji 'îş derbas bûye zaten. Yanî êgir xwe berdaye heta ser kezeba wî. Elo Dîno lê dimeyzênê dikenê, dibêjê mîrê mi aqilê te, aqilê jina mi û haşa aqilê sitrê mi²⁰ yek e. [Mîr] dibêjê çîmanê? Dibêjê te ez anîme vê derê, sorgusuz sualsiz te ez kirme zîndanê da, te ser milê mi kola û agir berdayê da, e[z] li ber mirinê me ti nûka dibêjê xilas bikin kî ez xilas nabim. Ez dihatime cem te, belkî dawîya 'emrê mi bû, jina mi digote mi fîstaneke jî mi ra bêne. Û jina te hat li mi meyza, di vî halî da zîlamtîya mi hate bîra mi. Ji ber wê jî aqilê we her sêka yek e.

Vêca hinek dibêjin pîreka wî ya diduwê (ya ku gotî neçe) bi halekî ye, pîreka wî ya dî [ya pêşî] zarokê wê çênabin. Ew jî wextê ku pê dihesêhê Elo Dîno nayê direvê (berîya hingî weke wextekî ji xwe ra dîyar kirine). Diçê gundekî dora Gabar²¹ wa dera. Li gundekî ji wa dimênê xwe li wî gundî digirê. Pîreka wî ya dî jî hinek dibêjin zîlamine wî [Elo Dîno], wezîrê wî filan, li xwe mehr kirine. Piştî demekê ti kes nîzanê ya li halekî pîreka Elo Dîno ye. Zaroka wê tê dinyayê li wê derê. Zaroka xwe mezin dikê dibê dozdeh-sêzdeh-çardeh-pazdeh salî. Tabî xencera Elo Dîno jî bi pîrekê ra ye. Bi xwe ra birîye veşartîye ku rojekî bidê kurê xwe jê ra ewk bikê. Te dî zarok dileyîzin, li hev didin filan dikin, kurikekî zahf î nehîs e, nesekînî ye. Zarok xebera dikinê da, dibêjinê ti bîjî yî, ti bêbav î, bavê te nîn e. Her wextê wîlo gotinê nebaş dibêjin kurik jî piştî demekê pê da va gotina hew radigirê. Yanî mezin dibê êdî hew radigirê, diçê dibêjê dîya xwe dibê yadê qîma mi nayê, êdî divê ti ji mi ra bêjê bavê mi kî ye. Her kes dibêjê ti pîç î henekê xwe bi min dikin û ez nîka herime nav hevalê xwe da. Dîya wî dibêjê kurê mi heta wextê wê werê [e]z ê ji te ra bêjim. Armanca cîya wî ew e ku 'emrê wî mezin bibê, xencera bavê wî bidîyê da û bêje Wele hal û meseletê bavê te ev e, bavê te ev mîrxasê hanê bû, ev insanê hanê bû, mîr bavê te bi vî şeklî kuşt. Tê hêfa bavê xwe hilênê. Dibêjê na! Tê niha ji mi ra bêjê, ti niha nebêjê qîma mi nayê, vê sa'etê tê ji mi rast bêjê. Dîya wî çar[e] jê nakê. Dibêjê temam [e]z ê ji te ra bêjim. Radibê sindoqa xwe vedikê, xencera bavê wî derdixê, xencerê didîyê da. Dibêjê ev çi xencer e? Dibêjê ev xencera bavê te ye. Hal û meseletê bavê te ev bûn, bavê te ev tişta hanê dikir, Mîrê Bota bi vî miqamî bavê te xwestîye û bi vî miqamî bavê te bi îşkencê kuştîye. Dibêjê temam ka xencerê bide mi [e]z ê çim heyfa bavê xwe hilênim. Pîrek jî şahreza ye, dibêjê na, bi vî miqamî no. Ti nikarê herê heyfa bavê xwe hilênê, ti nikarê tenê herê. Dibêjê ez ê te bîm teslîmî wa kim, ez ê êm. Êdî vêca ku ti mîr bê heyfa bavê xwe hilênê. Pîrek radibê destê kurik digirê diçê ber serayê. Dibêjin xêr e? Dibêjê Wele ez dixwazim bi mîr ra hevdişînê pêk bînim. Dirabin dibine dîwana mîr, kurik jî pê ra. Dibêjê kerem ke. Dibêjê mîrê min zîlamê mi ev çend sal e emrê Xwidê kirî, ne sax e û ev kurkê hanê jê maye. Ez hew karim êdî vî kurî xweyî bikim. Yanî ez di ber ra nakime der û her wextî pevçûna dikê û e[z] nikarim serê wî bigirim. E[z] jî pê hîsehama ti insanekî bi merhamet î. Werhasil wêşfê wî divedê, filan dikê ji bona ku bigirê. Ez ê dime te bila li cem te, di seraya te da bê, 'îşekî bidîyê da, xweyî bike û bela wî ji mi veke. Bi vî miqamî wî dibê. Radibê mîr lê dimeyzênê dibêjê temam bilanê. 'Îşekî di serayê da, di derekê ji wa da didîyê da. Bi jêhatîbûna xwe û bi jîrbûna xwe [kurik] dikevê ça'vê mîr da. Heta ew kurik mezin dibê, dibê sax qolê

²⁰ Mebesta vebêjer penîs e. Ji ber ku divê ev organ were stran anku nixumandin, vebêjer bi vî awayî gotinê nerm dike ku civat tûşî şermê nebe.

²¹ Çîyayekî navdar e li herêma Şîrnexê.

wî [yê mîr]. Nêhta wî jî ew e ku bikevê ça 'vê mîr da û keysa xwe jê bënë heyfa bavê xwe hilênê. Vêca di vir da yê ku ji me ra gotî jî bi vî miqamî gotîye, dibêjê demekê piştî dikevê ça 'vê mîr da radibê xencera xwe ji ber xwe derdixê û kar dikê mîr bikujê. Mîr halo lê dimeyzenê, dibêjê çawa tê mi kujê, ti sax qolê min î, ev qasî mi bawerî bi te anîye! Xêncera xwe nîşê dikê dibêjê ez kurê filankes im. Ez kurê Elo Dîno me, ez hatime heyfa bavê xwe hilênim. Li wê derê mîr dikujê heyfa bavê xwe dihilênê.

Vêce hinek bi miqamine dî jî dibêjin. Tabî mesele ne li vir xilas dibê. Dîsa dewama wê heye lê tiştê ku ji me ra hatî gotin ev e. Yê ku ji me ra gotî dibê em ji soya wî kurikî hatine, em nevîyê wî kurikê ku mîr kuştî ne.

Her çend ev cih di hin vegotinan da wek kelehê were binavkirin jî li gorî agahîyên ku vebêjer Qudbedîn û vebêjerê din Êsivê Emerokê didin ew ne keleh lê qesr e. Ya rastî li vî cihî ne tenê qesir di heman demê da kelehê jî heye ku ji Qesra Elo Dîno kevintir e û wek Keleha Bafê dihê binavkirin. Ew li wê niqteyê ne ku Çemê Dicleyê û Şetê Bota dibine yek û cihêkî stratejîk e.

Li gorî texmîna Êsivê Emerokê, Elo Dîno berîya niha bi 400-500 salî jîyaye. Varyanta ku Êsivê Emerokê ji Sofî Bihemedê Birho û Mele Xelefê Bafeyî wergirtî û neqil dike bi vî awayî ye:

Yextîyarekî Bafê, emrê wî sed û heft sal bû çû rehmêtê; wî hikayeta 'Elo Dîno ji me ra digot. Çend rîwayet tene ser hikayeta 'Elo Dîno. Min dît ji lêkolînavanekî ra diştexilî, lêkolînav Melke Xelilê Bafeyî bû. Û di gel wî Evdîlreqîp Yûsif hebû niha li başûrê Kurdistanê ye, edîbekî gelekî mezin e, kurê seydayê Mele Êsiv Zivingî bû. E[z] jî devê wa diştexilim. 'Eynî zemandê ji ber xatirê ku Kelha 'Elo Dîno di gundê me da ye em jî pê ra haşir neşir in, hero dibînin û hikayetê wê tene gotin. Vêca mezrakka Bafê ya heyî navê wê Dînowa ye... Hin dibêjin 'Elo Dînwanî, hin dibêjin 'Eloyê Dîn û hin jî dibêjin 'Elo Dîno. Ev rîwayet li ser [navê wî] tene gotin. Feqet li gorî mantiqa min ya esas kîjan e? Ew 'Elo li hemberê deshîlatdarîya mîrantîya Botanê insanekî serhildêr bû. Ez wilo fêhm dikim ji kirinê wî. Ji ber ku mesela zincîrek li ser ava şet girêdaye û kelekê ku hatin ew zincîr berdaye pêşîya wa dane sekinandin, nedihîşt xeracê wa keleka bigihê Mîrê Bota, xerac wî distand nedida Mîrê Bota. 'Elo Dîno li gorî va kirinê xwe insanekî îsyankar e, serhildêr e li hemberê Mîrantîya Botanê.

Qudbedîn behsa kurekî wî kir vêca ez bi keçeke wî hisihame. Vêce ev kur kurê keçe bê mimkun e. Nevê keçe jî Seyrê bû ez vê jî zanim. Stran jî li ser 'Elo tê gotin, di stranê da dibêjê bavê Seyrê. Elo bi keça wî jî tê wesifdan û binavkirin.

Vêca cihê ku 'Elo tê da asêgeheke mezin e. Bi xapandike mezin Mîrê Bota zîlamê xwe gihandine 'Elo. Yanî her wextî dek û dolab û faqê axa û bega û mîra û desthilatdara hene. Niha jî hene hingî jî hebûn. Vêca 'Elo kesek e ku ev tiştê hanê xweşik nîyasîye yanî nas kirîye û ev serhildartîya hanê li hemberî wê daye kirin. Yanî serê xwe jî mîra ra nimz nekirîye, çokê xwe jî mîra ra, ji bega ra nedanîne 'erdê. Gotîye e[z] jî insanîm ez ê xerac nedim we, ez ê nehêlim xelk xerac jî bidê we. Feqet dîsanê hin tişt, serhildanê bêwext û bêpişt ti carî bi ser neketine. Divê pêşî ti rêxistinê bikê, piştê te çêbibê, alîgirê te çêbibin û hê ji nûka ti karibê ew dera ku ti dixwazê li hemberê wê îsyân bikê bidê 'erdê. Vêca 'Elo yek ji va ye, gelek tişt kirine 'Elo lê belê orgutlemekke berferêh, rêxistineke berferêh çenekirîye ku xwe li ser bilind bikê. Feqet cesaretekî bêdawî li ser 'Elo we, ez karim halo bêjim. Mîrê Bota tê bi xapandike mezin 'Elo digirê, hinek zîlamê xwe dişîyênê ba 'Elo, 'Elo digirin destê wî girêdidin, dideynine ser hevdu. Dideynine ser kelekê û bi vî miqamî derbasî Cizîrê dikin û [ji wir jî] derbasî Mûsilê dikin. 'Elo dibine Mûsilê. (heke vêca wî çaxî siltanê Mûsilê hene, heke mûsqalê Mûsilê hene heke çi ne) Feqet Mîrêkê Cizîrê bi mutasarrufîyeta Mûsilê ve ye, girêdana wa bi wê dê ve ye. Lewma di strana 'Elo da dibêjê:

Bi til e qesra bavê Seyrê bi til e

Xwidê kulekê berdê mala Mîrekê Cizîrê walîyê Mûsil e

Destê bavê Seyrê girtin danîne ser kelekê birne bajarê Mûsilê

Li wê dê dohnê gazê berdane ser herdû mila

Hingî mîr ji ‘Elo pirs dikê dibêjê ‘Elo ev hal çawa ye? Kîjan hal xweş e ‘Elo? Ew halê eşkîyatîya te (kî li cem min ‘Elo qehremanek e) yan ev hal? [‘Elo] dibê bi Xwidê e’²² te ra nabêjim ev hal an ew hal ema halkî dî ji va hala nexweştir heye. Kîjan hal e ew jî: Wexta mêr bikevêt halê tengî da nikaribê daxwazîyê dilê xwe pêk bînê. Mîsaled dibêjê heme mêhvanek ji mî ra hat mî li pîreka xwe meyzand û pîreka mî li mî meyzand. Ne tişt hebû em di bin da deynin ne tişt hebû em bidînê vexwê. Ma ew hal xweştir e an ev hal? Elbette kî halê ji vî halî pîstir hene. Ew hal pîstir e. Ema ‘Elo ber bi mirinê çiwe, kê mî bûye, taqet li ‘Elo nemaye. Ne mimkun e ‘Elo werê xilaskirin jî ema jev ra dibêjin dibê Wele ‘Elo ne yê kuştinê bû lê Wele çû, ji dest me derket. Weke poşmanîya xwe li wê derê dibêjin feqet ‘Elo çû.

Mirov dikare li ser vegotina Elo Dîno van nirxandinan bike:

Ji ber ku ew keleh û qesir di heman demê da wek mala Elo Dîno dihê zanîn, mirov dikare bêje ku ew warekî rûniştinê ye û dibe oykonîmek. Navê keleha bixwe cureyekî urbonîman dihê hesibandin lê belê şert ew e ku aîdî bajaran bin. Di vê mînakê da dihê dîtin ku ew der ne aîdî bajarekî lê cihekî xweser e lewma mirov nikare bêje urbonîm e.

Ne teqez e bê ka kelehê/qesrê navê xwe ji navê şexsî wergirtîye yan şexsî navê xwe ji navê kelehê/qesrê wergirtîye lê belê wisa xuya dike ku keleh/qesir bi navê Elo Dîno bi nav bûye. Lewra li gorî bawerîyê Elo Dîno ew der ava kirîye ji bo armanceka dîyar. Lewma ya lojîk ew e ku mirov bêje keleh bi şexsî bi nav bûye.

Her çend vebêjêr vê wek hîkayeyê bi nav bikin jî ji bilî hîkayeyê hin taybetmendîyên efsaneyan jî vedihewîne. Lewra ji ber ku çî rast çî xeyalî, ew der barê cih û kesekî da ye û bi cihekî dîyar ve dihê girêdan, di dema nêzîk da ye, aîdî vê dinyayê ye û leheng mirov in. Alîyê serleheng ên efsaneyî nîn in lê belê ew bi tevgera xwe di nav civakê da bûye kesekî efsaneyî ku wek Robîn Hoodê kurdan jî dihê binavkirin. Lewra wî ji dewlemandan distand û dida gelê Botanê.

Ji ber ku mijar qehremanî ye û hem pexşanî û hem beşeka biçûk be jî menzûm tê da heye mirov dikare bike nav hîkayeyên gelêrî da. Li gel vê yekê vebêjer jî li gel navê rîwayetê wek hîkaye jî nav lê dîkin.

²²Vebêjerî cînavka “ez” û daçeka “ji” bi hev ve kelijandîye ku ev awayê bilêvkirinê gelek caran derdikeve.

Strana gelêrî “Elo Dîno” jî li ser vî kesî ye û dema ku vebêjer wê di nav hîkayeyê da bi cî bike, mirov dikare wek beşa menzûm qebûl bike. Lewra di gotinên stranê da serwa heye ku bi vî awayî ne:

Elo Dîno

Elo Dîno, Elo Dîno, Elo Dîno, Elî Axayo

Simbêl reş û xwînşêrîno, Elo Dîno, Elî Axayo

Qesra Elê mermer gişte

Birca Elê mermer gişte

Ew şûrê beran pişte

Jaro Elo, Elî Axoyo

Qesra Elê nava rêyo

Birca Elê nava rêyo

Dengê du şêra wê têyo

Jaro Elo bi şûr çûyêyo

Dengê du şêra xweş tê

Jaro Elo bi şûr geheştê

Jaro Elo navda kuştê (www.sarkisozlerihd.com)²³.

3.2. BARIM

Barim gundekî Hezexê ye ku dikeve başûrrojhatê navçeyê û nêzî 10 km'yan jê dûr e (mesafe.hesaplama.net). Gundî debara xwe bi cotkarî û sewalkarîyê dikin, li gel vê ji bo karên curbicur diçine xurbetê. Li gorî daneyên 2020an serhejmara gundî 920 kes e (TÜİK, 2020).

²³ <http://www.sarkisozlerihd.com/sarki-sozu/kardes-turkuler-elo-dino/> (Dîroka gihiştinê: 16/06/2021).

Li gorî vegotina ku derbarê wî gundî da hatîye berhevkerin ev gund navê xwe ji kesekî bi navê Bahrem digire. Bahrem berê malikê Barimê bûye ku wek Bahremê Birim²⁴ dihê binavkerin û bi demê ra navê wî deforme bûye. Ya rastî li gorî ku xuya dike ne ku navê şexsî deforme bûye piştra navê gundî deforme bûye û bûye Barim. Li gorî agahîyên ku vebêjer Hecî Sebrî dide berê mamikên paleyîyê diavêtine ser û digotin:

“wê li meydanê û wê li meydanê,

Îmamê Hiseyn kete şerê meydanê”²⁵

3.2.1. Bahremê Birim

Li gorî neqilkirina vebêjerî, ev gund navê xwe ji Bahremê Birim digire lewra ew xwedîyê gund e û vebêjer Hecî Sebrî serpêhatîya wî û keça wî wiha neqil dike:

Wextê Bazirgan ji Mekihê ve, ji Berîyê ve dihatin li Rîwanê²⁶ qonaqlamîş dibûn. Wextê ji zozana ve dihatin dîsa li wir qonaqlamîş dibûn. Xana Qurê²⁷ jî heye, karwanseray e. Vêca sikaka Rîwanê aha di vê Kurika²⁸ me ra diçê û di Mişarê²⁹ ra diçê heta ji çîyayê me derdikevê, heta ber bi Temerzê³⁰ wa îde nîza heta bi kû diçê. Vêca dibê neqlekê bazirganê eshabîya ji vir ve çû dibê hatine Rîwanê go çadirekî li serê Girê Rîwanê. Hin dibê Îmamê Hiseyn bû hin dibê Xalitî Bin Welîd bû, dibê go [e]z ê çime çadirê, meyzênim bê ev çî çadir e. Karwan dimeşê, ma 'lûm e ticaretî heta bi Wanê wa diçê, dibê rêya Wanê.³¹ Dibê hate serê gir go keçikka di çadirê da û cêrîkka li ber destê wê. Go ti çî kesekî [keçik dipirse]? Go ez tî me. Av danê, qûnçûçika rûnişt ava xwe vexwar. Go ma win çî kesek in? Carîyê go ev dergîstîya Bahremê Birim e. (Bahremê Birim kî ye? Î Barimî bû, melikê welêt bû, ne misirman bû.) Go Wele îro gorişma wî ye wê ê bi darî dergîstîya xwe kevê. Go ti çî kesek î [keçik dipirse]? Go ez Hiseynî me. Go rabê here, [Bahrem] werê wê te kujê. Go wê mi kujê? Go a. Rabû xwe gêr kir li wê dê, go Wele e[z] naçim heta newê. Kuro rabe hera, here, wê te kujê. Go bi serê bavê te nalebitim heta ew dergîstîyê te newê. Rabû ma. Jinikê kir û nekir neçû, ma li wê dê. Ha meyza wextekî go va bi wî ve û bi mihafîzê wî ve, ka çi qas in, hatin. Gote jinekê go ma ev çî kesek e? Go yekî Hiseynî ye. Ma 'lûm e weke îro ev bêbextî nebûn, go rabe da em xwe jê ra berdine meydanê. Xwe berdena mêrga Rîwanê lev dan. Li wî dîyarî lev dan û kirin û nekirin ti jê çenekirin. Go heyra? Go erê. Go ev der kevir in, da em herine meydana wî alî. Dibê hatine wê derê. Dibê heta Îmamê Hiseyn heke Îmamê Xalit e, Bahrem kuşt. Bahrem kuşt û 'eskerê wî jî şikest, ka çî ji wa kuştin û çî hiştin. Dibê rabû çû herdu keçik bi xwe ra birin û çû. Çû giha hevalê xwe, ma 'lûm e karwanê wî [yê Hiseyn yan jî Xalit] bihûrtîye diçê.

Wek xuya dibe ev vegotin têkildarî navê gundekî ye. Her çend rasterast ne awayê navlêkirina gundî vebêje jî der barê wî kesî da ye ku gund pê bi nav bûye. Bi saya vê vegotinê

²⁴ Vebêjer derbarê vê yekê da agahîyekê nade lê li gorî qenaeta me, Bahrem kesekî rimbaz e û bi vê yekê navdar bûye, lewma navê wî wiha hatîye.

²⁵ Mixabin dewama vê mamikê di hişê vebêjerî da nemaye.

²⁶ Tilekî di navbera Delavê Qesrê û Xirabê Mişkê da ye ku îro weke zîyareta Şêx Şerîfê Mekihê dihê zanîn.

²⁷ Di çîyayê Delavê Qesrê da gundekî kaval û kevnare ye.

²⁸ Tilekî ser Delavê Qesrê ra ye.

²⁹ Cihekî li destpêka çîyayê Delavê Qesrê ye.

³⁰ Gundekî di navbera Hezex û Midyadê da ye.

³¹ Rêya Wanê deforme bûye û bûye Rîwan. Anku “Rîwan” ji wir tê.

têkilîya di navbera toponîmî û folklorê da careka din şênber dibe. Ji ber ku der barê navê gundekî da ye dibe vegotineka li ser komonîman ku cureyekî oykonîman e.

Li gorî bawerîya vebêjer ev bûyer qewimîye. Taybetmendîya efsaneyan ku wan ji çîrok û hîkayetan vediqetîne bawerîya bi wan e. Ji alîyê din ve der barê cih û kesekî dîyar da ye. Lewma dema mirov ji van alîyan ve lê binêre mirov dikare vê vegotinê di nav efsaneyê da kategorîze bike. Lê belê ji ber ku bûyer yan jî bûnewerên derasayî venahevwîne nabe efsane lewra taybetmendîya sereka ya efsaneyan derasayîbûn e.

Vebêjer jî wek “mesele” bi nav dike ku ev yek jî problemeka giştî ye. Li sehayê vê xebatê hin caran têgeha “mesele” jî wek navekî çîrokan derdikeve pêşberî mirov. Li gorî vê nêrînê ev vegotin bikeve kategorîya çîrokê da jî ew taybetmendîyên sereke yên çîrokan venahevwîne û ji ber vê yekê jî nabe mînak bo çîrokan.

3.3. DELAVÊ QESRÊ

Delavê Qesrê gundekî Hezexê ye ku di navbera Hezex û Nisêbînê da cih digire û gundê eşîra Hemika ye. Ev gund mezintirîn gundê eşîra Hemika ye ku wek navenda vê eşîrê jî dihê qebûlkin. Hemikî wek Alîyan jî dihên naskirin ku Altan Tan jî ev nav bi kar îname³². Her wiha ev gund heta sala 1980yî bi tirkî wek Alyan dihat binavkirin. Cegerxwîn jî di helbesta xwe ya bi navê *Pîra Torê* da ku behsa bûyereka li vê herêmê dike dibêje “li gundekî Alîyan, em li pîrê civîyan” (Cegerxwîn, 2011: 82).

Gund dikeve başûrrojavayê Hezexê da û 23 km’yan ji navçeyê dûr e. Li gorî daneyên 2020an serhejmara gundî 2333 ye (TÜİK, 2020). Ev gund mezintirîn gundê eşîra Hemikîyan e û wek navenda wan dihê qebûlkin.

Berê gundê suryanîyan bûye lê niha şênîyên gundî kurdên misilman in. Şênîyên gundî bi cotkarî, karkerîya însaat û bax û bexçeyan û kêmbê jî bi sewalkarîyê debara xwe dikin.

Der barê toponîmên li vî gundî sê vegotinên gelêrî hatine berhevkin. Yek jê der barê navê gundî da, yek li ser navê zîyaretekê û ya din jî li ser mextelekê ye.

³² Bnr: Tan, A. (2015). *Turabidin'den Berriyê'ye* (ç. 5). İstanbul: Nûbihar Yayinlari.

Gund navê xwe ji kesekî bi navê Ebû Delav digire. Ebû Delav serfermandarekî Helenî bûye û li vî gundî qesreka wî hebûye ku niha jî bermahîyên wê dimînin. Li gorî gotinên gundîyan ew qesra wî bi sûrhên ji kevir û nikarî pêçayî bû û hinek pîrên gund dibêjin em gihane sûka di nav sûrhan da. Niha jî cihê wê qesrê wek “sûrhê” dihê binavkirin. Heta niha jî firşek jê dimînê û niha li mala (hewşa) gundîyekî bi navê Hesenê Ûsiv e. Siwarekî li ser hespê û şûr di dest da li ser wî firşî hatîye neqîşkirin.

Ebû Delav xwedîyê qesrê ye û navê gund bûye Delavê Qesrê lê bi halê kurt Delav jî dihê gotin. Anku gund navê xwe ji qesrê û xwedîyê qesrê digire. Vebêjer Hecî Sarîyê Mala Madê hîkayeta Ebû Delav wiha neqil dike ku ji Mele Mihemedê Mala Qudo yê Bêzikî³³ wergirtîye:

3.3.1. Ebû Delav

Kurê Harûn Reşîd, Ebû Delav digirê û dikê hepsê da. Ebû Delav ji Bexdayê ye. Miletê Bexdayê li ser dihezinê. Kurê Harûn Reşîd dibêjê go win di navbera di îna da vî cêrî ji zêra dagirin ez ê wî berdim. Milet bêşê dikê û cêr tişî zêr dikê. Kurê Harûn Reşîd jî va zêra didê dêkke bi sêwî [zarokên wê sêwî]. Go zêra didinê ew jî dibêjê "xwezîya mi bi berdana Ebû Delav."

Kurê Harûn Reşîd qani' dibê go millet gelekî hij Ebû Delav dikê. Dibêjîyê ez te nakujim lê divê ti ji axa Îraqê derkevê. Alim dibêjin Ebû Delav hatîye û ava Cizîrê jî derbas kirîye û tê li vî gundî bicih dibê. Qesrekê çêdikê û dibê milûkê vî welatî. Navê gund ji vir tê.

Dibêjin hingî merd bû û malê xwe hemû telef dikir, ji bo vê jê ra Ebû Telef jî gotine. Piştî go gelekî zengîn dibê kurê Harûn Reşîd êrişî gund dikê. Gund bi topa talan dikê, êla wî diqelênê û gund xira dikê.

Vebêjerekî din Xelîlê Mexso jî hîkayetekê li ser Ebû Delav neqil dike ku di navbera wî û dostekî wî da rû dide. Ev hîkayet dersekê vedihewîne ku hinekî jî li ser aqilmendî û merdîya Ebû Delav e. Helbet ev hîkayet rasterast ne li ser çêbûna navê Delavê Qesrê ye lê belê li ser Ebû Delav e ku navê xwe daye gundî. Bi vê boneyê ew jî digunce ku di vê xebatê da were bicihkirin. Wiha neqil dike Xelîlê Mexso:

Abû Delav li vir [Delavê Qesrê] melik bû. Dibê ew û esnafekî Dîyarbekrê destûbirayê hev bûn, dostê hev bûn. Havîn e, dexilhilandin e, di bendera da ye, dextê dihilênin. Vêca rabû rojekê evê Dîyarbekrî serekî hate cem Abû Delav. Go Abû Delav cilê tozê wa li xwe kirine; weke niha û 'emela mesela go dişixulîn cilê kevin li xwe dikin. Go ew cil î lê ne, terkê 'erdê wilo bi darika divekê, libê gênim jê dineqênê û tavêjê ser koma dextê. Go vî zilamê Dîyarbekrî go bira ti karê her libekê bi insanekî bavêjê 'embarê, ti melik î te xwe kirîye nav vê tozê da. [Abû Delav] ne go ne xebera te ye, ne ne xeberê te ye, dey nekir. Ka heke êvarekê dowa ma li wê dê yê Dîyarbekrî, çû mal. Piştî go havîn çû, dexil hatine hilandin Xwidê Ti'ela xelakke wilo çêkir heft sala bû xela. Vêca te dî salê go [xela] wilo dewam dikê sê sala, çar sala tine lê go bû heft û heşt dibê "Wele xenî" yanî tişteke namênê. Vêca ma 'lûm e go dexla te bi vî xanîyî hebê wexta wilo xelayê dewam kir ti nabê li cem mi heye. Ne ti didê û wê rihê te ji te stênin heta ti bi perê xwe bidê.

³³ Bêzikir gundekî Hezexê ye.

Vêca evê Dîyarbekrê dipirsê, dikê û nakê dexil peyde nabê. Hingî malê wî û perê wî zahf in bi lib û zêr peyde nabê. Bi navî şev û rojê qey heqa nan³⁴ bi dest wî û kufletê wî bikevê. Xela ye, tiştêk nîn e ma wê çi kê. Rabû ser xwe dipirsê bi vir da dexil, bi wê da dexil, dibê Wele li cem Abû Delav heye difiroşê. Go Wele go li cem wî hebê, destûbirayê min e wê dê mi, bi perê xwe bê wê dê mi. Rabû lê da hate cem [Abû Delav]. Go bira xêr e? Go Welle kufletê mi hemû ji nêza neliv e di nav ciha da ye, em hemû tewîfî ne. Vêca ez hatime dexilnê go ti destê mi bigirê, bi heqê xwe. [Abû Delav] go nîn e. Û [yê Dîyarbekrî] bi ça 'vê xwe dibînê go bazîrgan û karwan jê dibine rêz, difiroşê. Go ne va ye ti difiroşê! Go dibêjime te nîn e. Go hera lib û zêr bide mi. [Abû Delav] go ez ê şîretekê li te kim. Go çi ye? Go here wa perê xwe li êş ke wê bine ard û bixwe. Go malava ti weke kê dikê, hêsinê heşrî, kaxezkke sar! Ez ê bi kû ve çim wê çilo bê ard Xwidê ji te razî, dibêjime te dextê bide mi ti dibê... Go hera nîn e nikarim bidim. Rabû lê da çû. Nedayê. Ji ber çi nedayê? Ji wê ya go gotî te xwe kirîye nav vê tozê, ti libê dextê dineqênê.

Pîreka wî go te çi kir? Go Wele neda mi. Go ma hebû? [Go] erê Wele hebû difîrot. Gote pîreka xwe go here xwe bavêje pişt dergûşa wî belkî heme destê me bigirê bidê me. Pîrekê ji wê dê (hemû ji nêza tewahane bi ser hev da, ka li çi dewara siwar dibin û diçin û tên) rabû hate vê dê xwe avête ser dergûşa wî. [Abû Delav] go te xêr e? Go Wele zarokê mi neliv in em hemû ji nêza tewehana ez hatime me divê ti destê me bigirê, bi perê xwe. Go here go zîlamê te, te bidê min ez ê destê wî girim. Go malava ne e[z] jî di bin destê xelkê da me... Rabû çû. [Mêrê wê] go ma çi gote te? Go Wele halo gote mi. Go wextê em hemû wê ji nêza mirin go me xwidî bikê heta xela rabê, mi izna te dayîye here. [Pîrek] rabû hat. [Abû Delav] go te çi kir? Go zîlamê mi izna mi daye. Dibê cilê bûkanîyê (hingî wî zemanî ka çi cil li wa dikirin) lê kirin weke bûkkê xemila. Wilo xemila û kire odekkê da. [Pîrek] dibê nûka sera pîra şixwe bûkanî ji mi kêma e û ez halo navserî xwe bûme, cîya komek kuflet... [Abû Delav] di bin şevê da dirabê çi dikê? Barê dewarekê savarê kelandî û barê dewarekê nanê pahtî û barê dewarekê rûn û barê dewarekê ard û barê dewarekê genim ev hemû kar kirin û dewareke vala jî jê ra kar kir. Sibihî çû devê odê go xwiham derkeve. Bakire çend xorta Abû Delav, go win ê bi va dewara û vê hermetê ra çin heta win bibine nava Dîyarbekrê û win ê vegezin. (Ma 'lûm e melik e ma kes karê bê em naçin!) Pek kuro wî hatî dibê xwiha mi! Rabû ser xwe, hêdîka li wê dewara vala jî siwar kir û xwarina hazir jî pê ra kar kir go heme bigihê mal û bidê kuflet. Go here, ti xwiha min î û ez birayê te me. Heta go xela rabê [xilas bibê] go ev neqil xilas bû were careke dî bibe.

Her ji wa ra dewêr bar dikê heta xela rabû.³⁵ Destê wê girt heta xela rabû. Evê Dîyarbekrî hate cem go bira ma te çima wilo li mi kir? Go bira zanê go te digo ti libê gênim dineqênê tavêjê ser komê. Go alema Xwidê mi berdabana heta libek çûbana deviwa, pazdeh î çine nava bajêr. Go ha ji ber wilo li mi ta 'n hat mi neda te. Go vêca [e]z ê şîretekê li te kim (Abû Delav gotîyê). Go go xela çêbû pere nabine nan, goşt nabê nan, zêr nabine nan. Go xela rabû dextê xwe winda kir tiştêk cihê wê nagirê. Ti çi bixwê ti pê îdare nakê, yalaniz go milk di destê te da hebê li dora Dîyarbekrê kedê bike. Kedê bike û hew, tiştêk ne hemberê kedê ye. Go meyzê te namûsa xwe da bi nan. Go Wele xeberê te ye. Ew çû li wê dê vêca dest bi kedê kir û dîsa mexazê wî ew hene.

Dema ku kes xuya bin û serek bin helbet der barê wan da gelek hîkayet dihêne afirandin. Dema ku ev berhem di cihekî lokal da hatibine afirandin jî gelekî nêzî hev dibin ku nuansên heyî wan nakine kategoriya varyantan da. Lewma li gorî fikrê me ew nabine varyant.

Vebêjer Hecî Sebrîyê Mala Eyşo jî li ser Ebû Delav vê vegotinekê neqil dike. Vegotina wî jî rasterast ne der barê navê gundî da ye lê belê têkildar e. Wiha vedibêje Hecî Sebrî:

Dibê Delavê Qesrê bi vê qesra ha bi nav kirine. Dibê di zemanê qesrê da, Ebû Delav tê da bû, melik bû. Ma 'na Ebû Delav bi 'erebî dibê bavê telefkirinê, yanî bavê merdîyê. Dibê çil cohtê wî bû. Kurekî wî û keçeke wî [he]bûn, dibê gote kurê xwe rojekê, go kurê'm. Go ha. Go ez ê îşev ne li mal bim.

³⁴ Vebêjer bi destê xwe hesabê gepekê nîşan dide.

³⁵ Di vir da mebest rabûna ji holê anku bidawîbûn e.

Go bila. Êvarî çû gundekî ji va yê dora xwe, xwe nependî gund kir û ma sekinî heya bû derengî şevê hat, her çil şirayê³⁶ cohtë wa qeta. Sibihî cohtarî çûne ser 'erda, wî go şira min a qetehayî, wî go şira min a qetehayî... Kurê wî [kurê Ebû Delav] rabû çî kir? Go de vî devihî bigurênin. Devih gurandin û pê ketin hina rist û hina bada û hina kire şira. Yê go şira xwe çêkir çû cohtë xwe dewam kir. Dibê heta sona coht çû dibê cohtek lê çû, weke cohtekî tenê bimênê yê dî hemû hal bû. Dibê vêca berîya hingî wextê kurê wî û keça wî [yên Ebû Delav] zarok bûn pîrekik ma bî, kurîkkî wê bû, ew jî anî nav mala xwe ji boy Xwidê. Pîrê jî xwidî kir û kurê wê jî xwidî kir. Gote pîrê go were nav malê da ti xwe jî xwidî kê û kurê xwe jî xwidî kê.

Gel zeman gît zeman, gihane xwendinê li ber xwendina danîn heta her sêya îcaze stendin. Îcaze stendin, bûne xort, dibê kurê pîrê bi dilketineke wilo dilkete keça Ebû Delav da, tiştî xerîb bû. Her keçik dibê gidî, bela xwe ji mi veke, di bextê te da. Na, dikê û nakê bela wî ji xwe navekê. Dibê Ebû Delav rojekê go Wele ez ê çime hecê. Kurê wî yî heqîqî go yabo e[z] jî yê êm. Keçê go bi Xwidê bavê mi û birayê mi herin ev bêbavê flîmina ji mi çêkê. Go keçikê go yabo e[z] jî yê êm. Go kurê pîrê go yabo e[z] jî yê êm (ma'lûm e dibêjîyê yabo). Go bila. Dibê lê dan qûnaxekê çûn, dibê keçikê go Wele bi Xwidê ev bi rê ket wê li wa da jî flîmina zîvirênê, ya qenc ew e ez vegeime malê. Go yabo! Go ha. Go ê me her çara ji mal qereha ma kî yê mala me yonetmîş kê, Wele [e]z ê vegeim. Go keça'm 'esil ti wî. Keçik li hespê xwe siwar bû go ya Allah ya Xwidê û zingo danê da. Qûnaxa dîtirê kurê pîrê go yabo! Go ha. Go ma ne xwiha mi tenê ma li mal û 'îşê mala me! Ma kî yê evqa xulam û xizmetkara yonetmîş kê, Wele e[z] jî yê vegeim. Go kurê'm ti jî vegere. Heta hat keçikê bakire çil keçikê di yaşê hev da, harekê destek cilê 'eskerê hingî li wa kir û dora sûrhê kire çember. Go win nahêlin çûk ser sûrhê ra herê. Go bila. Ma'lûm e mi'aşê wa didê wa û wa xwidî dikê, weke 'eskerîyê. Kurê pîrê 'arê malê ye. Kurê pîrê hat bi pehîna bi der qûna wî ketin, eman zeman gidî, ez kurê malê me filan bêhvan... Go defol! Çil pehîn lê hijmartin berdanê da.

Gel zeman gît zeman, bû wextê hecîya ji hecê vegeirin (ma'lûm e heca berê neh meha bi rê da diman). Dibê weke ti bêjê Wele hatne Îraqa xwar, kurê pîrê çû pêşîya wa. Yabo win bi xêr hatin. Erê kurê'm. Çi heye çî nîn e? Go yabo ma çî heye, go Wele bi anîya bavê xwe kim, go ji roja ti çûwî heta niha, go mala me bûwe kexxane dûrî vê hizûrê. Ji 'esker pê ve mi tiştê nedîye, bi Xwidê ez çûm nehiştin bi hindirû jî kevim, pînihane mi bi pehîna, berdane mi. Go a'eeeew bavo ev jî heye! Go ebeden! Gote kurê xwe go kurê mi! Go ha? Go here vê dêlê bibe derekê bikuje nehêle ez bibînim. Kurê wî ling dane zengowa şev kire şev û ro kire ro, hat. Go xwiha'm! Go ha? Go bavê mi ji kerbê te dîn biwe nema bi rê da tê, were bigihe bavê mi. Keçikê bê arzaq û bê qomanî û bê cil û filan heme xwe avête ser pişta hespa birayê xwe û lê dan çûn. Hecacî yê ji qublet ve ên, ewî berê xwe da bakur. Dibê şev û rokkê meşin hingî meyzandin go wî li dora Îraqê sekinîne. Rojê pencê xwe berdane 'erdê, li ser devê kahnîkkê sekinîn, hespa xwe girêda û li wê dê rûniştin keçikê go xirp û di xew ve çû. Ew keça nazik, tî û birçî go xirp û di xew ve çû. Kurik di cara şûrê xwe lê kişand, demanca xwe (ka sîlehê hingî çî bûn) lê kişand destê wî neçûnê da. Go bavo hema bila li vir bê û bi xatirê te. Li hespê xwe siwar bû û hat.

Li hespê xwe siwar bû hat, hate pêşîya bavê xwe. Ma'lûm e heta hingî bav jî hinekî vir da hat. Go kurê'm ma te kuşt? Belê yabo. Go te qenc lê kir. Sibihî keçik rabû go rojê qamekê diwa yî hilatî, xwêhdanê yî di qijka serê wê ve avêtî, nizanê ji kû ve hatîye û bi kû ve herê. Dibê dirihreşkê li ser pişta kahnîyê bû heme çû xwe kire nav wê dirihreşkê da. Dibê şûxekî³⁷ 'ereba jî nêzikî wa ye, mitlê'î şûxekî 'ereba da ne, ewî û di xulamê xwe go [e]m ê derkevîne nêçîrê. Li hespê xwe siwar bûn hatin, vir dera dî, vir dera dî, vir dera dî bû nêzikê nîro go bavo Xwidê ti nêçîr xuya nakê heme da em hespê xwe bibîne ser vê kahnîya ha av din, dest û riwê xwe bişon em ê vegeirine mal. Tajî û tolê wa li pêşîya wa ne, ma'lûm e yê cih in berî wa çûne ser kahnîyê. Heme neçûne ser avê û ketne nav ça 'vê dirihê da û cewt û cewt û cewt reyîn. Şûxê 'ereba go camêrno! Go ha. Go Welleh ev dahbe ne bê bela ne, go Welleh go ev heywan bana wî rabê [ji ber tajîya]. Ew jî xort e hê bêkar e. Çûn li nav ça 'vê dirihê meyzandin go va keçikka di nav da ye weke vê lempê ye. Ti çî kesekî? [Keçikê] dey nekir. Ti 'ins î? Dey nekir. Ti cins î? Dey nekir.

³⁶ Amûrekî coht e ku haletî pê ve girê didin. (Veb.)

³⁷ Şûx yanî axa yan jî şêxê ereba. (Veb.)

Ti perî yî? Dey nekir. Rahîşte destê wê ji nav gerhê kîşa. Anî ser devê kahnîyê dest û riwê wê şîşt, av dayê û li pişt xwe kir û bire mal. Ne bi dilekî bi sed dilî dilkete keçikê da. Keçik jî layîq e wilo.

Gel zeman gît zeman, rokkê, diwa, sêya, çara, deha, bîsta ma, bakire melayê xwe go heyra! Go erê. Go were vê keçikê li mi mehr ke naştexilê. Ebeden xwe lal kirîye naştexilê. Keçik li xwe mehr kir bû pîreka wî. Hal û heraketê wê ne weke yê ker û lala ne û naştexilê. Dibê rojekê gote axayê xwe, mezinê êla xwe, go apo! Go ha. Go Welleh pîreka mi ne weke lala ye, sê zarokê mi jî çêbûne û mi tişteke jê fêhm nekir. Go birazî! Go ha. Go ez ê şîreteke li te kim go ti bi ya mi bikê ez ê wê hişkere kim, lal bê ne lal bê wê derkevê meydanê. Go e[z] çi bikim? Go dexla êlê bide hev bikire. Ji te sed teneke kirî hişte hindik qûtê te, ji yê dî dised kirî, ji yê dî çarsed kirî... Dexla wa wilo hindik hişt go negihine nivê salê. Dibê xelakkê wilo kire nava êlê da go îde nan çû zêrê sor. Go gote wî ixtîyarê xwe go apo! Go ha. Go ne wilo lê hatin! Go zanê? Go erê. Go de vêca rojeke go keçik çû cilşowê wê ya devê tenûrekê wê ya rêkkê, sê qet nan bike destê her sê zaroka da. Qetê mezin bide yê piçûk; yê piçûk bidê yê mezin wilo terzîne li wa bela ke. Ew ê bê yê mi hindik e, ew ê bê yê mi gelek e wê ser pev çin û xwe di hindirû da veşêre. Go hermet hat go zaro yî wilo lev dikin pîrek dîlnazik in, go ne lal bê wê pekê, wê şitexilê. Nêzikê go hermetê ê mêrik wilo çêkir û zarokê wa pev çûn, wê go yê mi hindik e wê go yê mi gelek e lev dan, viçik û girîz û hêstir tevlihev bûn. Ewî jî xwe di hindirû da veşartîye. [Pîrek] hate derê xênî go zarokê wê yî wilo. Dêhnê xwe dayê go ser nên pev diçin. Destê xwe kirine kêlekê xwe da, hêstira dî ça'vê wê ra avêt go heeey hey. Go ez keça Ebû Delav bim, go çend çohîte bavê mi gereha, go sîfra bavê mi ji 'erdê nedirabû, go îro zarowê mi ser qetek nan pev diçin. Mêrik derket, destê xwe di sikûra wê ra anî go hermet li qisûrê nemeyzêne, heta niha mi nizanîbû ti kî yî, keça kê yî, te xwe hişkere nedikir (Ma 'lûm e hermetê jî negotîye ser vê olayîyê ez teriqî me). Rabe xwe kar ke ez ê te şîyênime mala bavê te. Dibê ser û cilê xwe û zarokê xwe paqij kirin û roja dîtirê bakire melayê xwe û di xulamê xwe û kire hocbekê³⁸ da, zarokê wê kirne rex da û go de herin. Şev kirne şev û ro kirne ro meşîn. Go li wa dibê êvar ser devê kahnîkkê mêngikê dideynin şîva xwe dixwin û nobeta xwe digirin û taştêya xwe dixwin û dirabin dimeşin. Dibê sibihekê meşîn heta êvarî, êvarî li derekê qonaqlemîşbûn dibê melê gote herdû nobeçîya û xulamê wa go ne bi we bê û ne bi hevaltîya we bê û ne bi insanetîya we bê! Go çima seyda? Go malxirab ma hû[n] nizanin xêra di sa'et nobet bi çiqa 'îbadet e? Şevî dîtir heta bû sibih we nobet girt we nego seyda heme ti jî di sa'etê xwe bigire. Ê feqîra bi rê hatine, betilî ne, ji qerem ketine û êvara dî jî nobet e nerazahane, ji 'eyar ketine. Go seyda heta sibihi ji te ra. Go hey mala we û bavê we ava. Êvarî şîva xwe xwarin û serê xwe kişandine kurk û hewranîyê xwe da xwe gêr kirin razahan. Şev qar bû, mela çû ser herd[û] hevalê xwe ra halo bala xwe dayê go xew a li wa giran bûwî bezî hocba jinikê. Go filankes! Go ha? (Heyra navê wê nayê bîra mi, bila navê wê Perîxan bê). Go Perîxan, Wele ti xwe nedê mi [e]z ê serê kurê te jê kim. Eman, zeman, mela, di bextê te da gidî... Go ebeden. Ê go Welleh jê ke. Serê kurê wê jê kir. Heta [mela] hat serekî dî da nobeçîya jinikê herdû guhê wî [yê kurik] jê kirin kirne berîka xwe da. Go Perîxan! Go ha? Go Welleh ti xwe nedê mi ez ê serê kurê te yî dî jî jê kim. Go Welleh nîn e ew tişt. Car dî serê kurê wê jê kir. Heta dîsa çû serek da nobeçîya, hermetê herdû guhê wî jî jê kirin kirne berîka xiftanê xwe da. Heta çû serek da nobeçîya û vegereha go Wele ti xwe nedê mi ez ê serê yê dî jî jê kim. [Go] serê wî jî jê ke. Heta vegereha ji ser nobeçîya, jinikê guhê wî jî jê kirin û xwe da nav wê çîtikê, mêrg e, qiram e, çîtik e, gelaş e, bi nav da baz da çû.

Çû, epey zeman paş ket, weke şîxûlê sa'etekê paş ket li derekê liteha heta bû sibih. Mêrik hat halo li hocbê meyza go jinik ne tê da. Vir da bazda, wê da baz da, Allah vêrsin. Her sê kurik birin avêtine nav gelaşekî ji wa û hocb jî paqij kir şîşt û ji wî rexê avê anî rexê dîtirê û hat li wê dê di birînê xwe da hisa. Ro hat go heme hilê nehilê, hedê go nêhta wa ber limêj kevê, mela hat dey li herdû hevalê xwe kir. Go kuro rabin pek û li vê 'ecêbê em mane di xew da, agir bi mala mi neketî! Bi qur'ana mi xwendî aha e[z] jî niha şîyar bûm, e[z] di xew ve çûbûm! Rabûn bi bezekê limêja xwe kirin û rabûn ça û qahwê xwe vexwarin û qahwaltîya xwe kirin. Go de ka qahwaltîya Perîxanê jî bidinê da. Qahwaltîya Perîxanê birin go hocbeka vala. Kuro mela kanî? [Mela] çû go kuro ma kanî? Allah versin. [Melê] go bi qur'ana mi xwendî ev cîn bû. Go vî çepelê heram em bi vê ra bi rê xistin, baş e go em jî bi xwe ra fena nekirin. Bi qur'ana mi xwendî em ucûz kurtulmîşbûn. Feqîra didowa belengez bûn bawer kirin go qey rast e. Li wê dê vegerehan. Bila ev li vir bê em ê êne pey şopa jinikê.

³⁸ Hocb: Weke mezelkikê bû li ser piştta deviha dikirin. (Veb.)

Jinik sibihî lê bû sibih, rojê hilat. Dêhnê xwe dayê roj ji kû ve dihilê di kû ve diçê ava û çilo hatîye? Difîkirê, dewr dewr da, bi ser şopa vê bolgê ve bû. Hingî dimeyzênê go wa hatî Şiharê Rîwanê³⁹. Dibê giha şivanekî, [go] qewet bê. Erê. Ti şivanê kû wî? Go ez yê Delavê Qesrê me. Ti yê kê yî? Ez yê mala Ebû Delav im. Go ma ev çend heyv e ti li ber vî pezî? Go ev sê heyv e. Go ma ucureta te çi qas dane te? Axir go heqa dane mi. Go filankes! Go ha? Go ti nayê e[z] cilê xwe bidime te, ti yê xwe bidê mi û ez heqê te bi timamî bidime te, ti herê mala xwe û ez bimênime li ber pezê te? Kurik go pek û li vê 'ecêbê! Wele ev pîyango we. Rabû cilê xwe pev degîş kirin û jinikê heqê wî fazlasîyla dayê. Kurik oxira xwe xêr kir çû giha mala xwe û keçik hate nav pezê xwe. Êvarî xwe hişte li talîya şivana, de de de de bi mexreba tarî ra, dora 'eşayê ew jî hate mal. Dibê çû nav şivana şîva xwe xwar, rokkê diwa, sêya, çara, ka çi qederê ma li ber pezê xwe.

Zilamê wê yê 'ereb rojekê bakire herdû xulamê xwe go heyra! Go erê! Go Welleh ev pîrek ne weke cina bû û mela heme li ser disekinê dibê pîreka te cin bû! Heyra werin [e]m ê li pey çin. Herdû xulama go bila ser ça'va. Bakire melê, mela go heyra tê me defînênê, Welleh ev jinik cin e, bi qur'ana min û bavê mi xwendî cin e. Ê kurik sê zarokê wî jê hene û pîreka sê-çar-pênc sala pê ra mayî... Go Wele mela [e]m ê li pey çin, gotîye ez keça Ebû Delav im. Rabûn li pey hatin. Go ma [win] heta bi kû hatin? Go em hatine aha heta bi vê dê. Lê dan hatin. Delavê Qesrê li kû we, Delavê Qesrê li kû we, Delavê Qesrê li kû we heta hatin. Dibê êvarekê jinik hate mal ji ber pêz, dêhnê xwe dayê go zilamê wê û herdû xulamê wê û melayê wê wî li mala bavê wê. Dibê ew jî hate guhê koçkê di nav şekala da rûnişt li wa dihisênê, li wa dimeyzênê heme tiştêkî nadê der. Ebû Delav go gelî camêra! Go ma yekî vê êvarê serborîkkê, serhatîkkê, salfekê⁴⁰; me pê bisebirênê nîn e di nav we da? Ma 'lûm e kurê pîrê mela ye, kurê wî [yê Ebû Delav] mela ye, yê 'ereb mela ye. Sê mela ji xey axa û axalera û yê bilîmlî. Go keçikê (ma 'lûm e şivên em ê bêjin kurik) go yabo go mishada we hebê [e]z ê salfêke we bêjim. Go de bêjê kurê'm. Dibê dest bi vê salfê kir heta çûne hecê û vegerehan, dibê kurê pîrê fêhm kir. Fêhm kir ku ji wî ra dibêjê. Go yaw de evqa 'alim in û evqa axa û axaler in vî sêwîyê çepel çitû salfê dibêjê. Go heyra ez nema dibêjim, madem ti 'adiz î ez nabêjim. Birayê keçikê fêhm kir. Fêhm kir hat di rex da rûnişt. Destê xwe di sikura wê ra anî: Bavê mino ti bêjê, ez qurbana te me ti bêjê, riwê wî maç dikê, destê wî maç dikê, lingê wî maç dikê. Heta pê da gotin bedlek ji şevê çû. Dîsa dest pê kir, heta giha yê 'ereb. Heta giha yê 'ereb, dibê melayê 'ereb go de vî sêwîyê çepel, ka misînê mi bidinê mi [e]z derkevim, mixê me bir. Mêrê wê rabû go rûne di cihê xwe da terbiyêsiz! Bi Xwidê ti bi xwe da birî ti derneketî. Ê go hera wextê ne bi dilê we ye ez nabêjim, dîsa kurik sekinî. Mêrê wê jî hat di rex da rûnişt: De bavê mino bêjê, de qurbana te me bêjê; riwê wî maç dikê, destê wî maç dikê, lingê wî maç dikê. Ka çilo bû? Ka dewam ke. Bi kû ve çûn? Çawa bû? Çilo bû? Heta pê dane gotin kevir bûne qet. Ma 'lûm e bedlekî di ji şevê çû. Herdû mela êsîr in di wir de, dibê hewara me bi xwe da mîst, hewara mi bi xwe da rît, heme ji bo xatirê fîrsetê bibînin û baz din. Birayê wê û zilamê wê dibê go hûn bimirin jî hûn narabin. Dest pê kir heta bira hat, bir da wê bidê kuştin û melê ew zarowê wê qetil kirin û hat giha şivanê wa û çû ber pezê wa, go Wele ji vir û pê da ez hew zanim. Bav jî rabû hat di cem da rûnişt. Yê 'ereb; zilamê wê û birayê wê û bavê wê her sê hatin di cem da rûniştin. Destê wî maç dîkin, riwê wî maç dîkin, lingê wî maç dîkin... Ez qurbana te me ka rêkkê jê bike der. Erê hate ber pezê bavê xwe û ma [piştra] bi kû ve çû? (Vêca [keçik] nabê bavê mi, dibê melik.) Heta talî go heyra! Go hê! Go ma we hê nas nekirîye? Go na Wele me nas nekirîye! Dibê destê xwe avête kumê xwe, serê xwe vekir, kezîyê wê xiriqîne ser milê wê. Destê xwe avête berîka xwe herşes guhê her sê kurê xwe avêtine ber wa go wî bûne weke qaqiloşka hişk bûne. Go aha mala we xira bû ma hê we ez nas nekirime, Wele ez im. Vêce mi nedî û bawer jî neke, dibê agirek li wê teyara Sûrhê⁴¹ kirin û herdû mela avêtine ser û ti ji mi ra sax.

Heke em berê xwe bidin vê vegotinê em ê bibîbin ev vegotinên ku der barê Ebû Delav da ne, bi awayekî jî navlêkirina navê gundê Delavê Qesrê vedibêjin. Lewra li ser serpêhatî û hin taybetmendîyên Ebû Delavî ne û wek ku vebêjer jî amaje pê dîkin gundî navê xwe ji Ebû

³⁹ Rîwan tilek e ku ziyaret e û di navbera Delavê Qesrê û Xirabê Mişkê da ye.

⁴⁰ Salf yanî mesele. (Veb.)

⁴¹ Sûrh tilekî biçûk e di nava gundê Delavê Qesrê da ku cihê Qesra Ebû Delav e.

Delavî girtîye. Lewma ji alîyê toponîmîyê ve mirov kare bêje mînaka komonîman e ku cureyekî oykonîman e.

Ji alîyê din ve wek ku ji navê gundî jî xuya dike behs li ser qesrekê ye. Heke ev der qesir be dîsa dibe oykonîm lewra oykonîm ew cure toponîm in ku mal, avahî û meskenên bi vî awayî îfade dikin û qesir jî meskenek jî van e. Lê belê ew nîqte wek “serê sûrhê” jî dihê binavkirin. Lewma heke ew der sûrh be (yan jî di heman demê da sûrh hebe) divê mirov wek urbonîm bihesibîne ku li gel rez, bexçe, meydan, kuçe û rêyan navên kelehên aîdî bajaran jî îfade dike.

Li gorî çavdêrîyên me Hecî Sarî û Xelîlê Mexso di wê bawerîyê da ne ku ev vegotinên wan rastîyên ji dîrokê ne. Her wiha der barê kes û cihekî dîyar da ne, li dinyaya niha ne û di demeka nêzîk da rû dane lê belê ji ber ku tiştên derasayî nîn in mirov nikare wan wek efsane bihesibîne. Li gel hevparîya van xalan mirov dikare awayê ku Hecî Sebrî vedibêje wek “çîrok” bihesibîne û bêje hem li gorî senifandina Thompson hem li gorî ya Uther ev cureyekî “çîrokên rasteqîn” e. Tevî vê yekê îfadeya ku vebêjer pê diqedîne û dibêje “mi nedî û bawer jî neke” dibe palpişteke bo vî fikrî.

3.3.2. Kevirê Şîrîn⁴²

Ev vegotin xwe dispêre bûyereka rasteqîn. Jineka bi navê Şîrîn û piştra jî kujerê wê bi awayekî hovane dihên kuştin ku vegotin li ser vê bûyerê ye. Ji ber ku kujerê Şîrînê, wê bi rêya keviran dikuje, kevirê ku serê wê danîye ser wek “Kevirê Şîrîn” hatîye binavkirin. Ev cih li çola Delavê Qesrê cih digire û heta çend salan berê jî ew kevir li cihê xwe bû. Piştî ku bi mekîneyên karî erd hatine paqijkirin kevir jî hat avêtin. Ev kevir weke kêlekê bû û li gorî bawerîya gelê vê herêmê xwîna Şîrînê her li ser bû. Ji ber rengê wî yê sorikî wisa bawer dikirin lewra li gorî bawerîya wan xwîna mirovan ji keviran naçe. Jixwe ev cih wek “Mextela Şîrîn” jî dihê binavkirin.

Ji ber ku ev serborî ne ji mêj e, di neqilkirina vegotinê da navê hin kes û malbatan hatîye guhertin ku deretîk nebe.

Vebêjer Zeyneba Mala Eyşo ku ji devê şahida bûyerê bihîstîye ev serborî wiha vegotîye:

Go Cemîl heft sala çû ber pezê ‘Elîyê Simo, ‘Elî jî mezinê gund bû. Go [e]z ê keça xwe dime te, heft sala tê li ber pezê mi bê. Heft sala çû ber pezê wî, bêbextî lê kir keça xwe nedayê. Go ji pey navegerihim dergîstîya min e, bide mi. Go ez nadime te. Keçik û jinama xwe çûn çolê firavîna pala birin, kurik hate pêşîyê. Go ti dergîstîya min î, heft sala mi xulamîya bavê te kirîye bi mi ra were [e]z ê te

⁴² Çi nêr çi mê ku raveker navê şexsan be li vê herêmê gelek caran nayê tewandin.

revênim. Keçikê go ez nayê. Çiqa gotîyê go ez nayê. Ya dîtirê [jinama wê] girêda û keçik jî girêda û serê wê danî ser kêvir, kevir bi ser dara. Û îde kirne hewar. Baz da çû xwe kire nav sapekî da heta bû şev. Go bû şev derket çû binxet⁴³ bû. Çû binxet bû, hemşerîyê wî jî ji Mala Osmên⁴⁴ bû. Mala Simo çûne Fisqînê cem Mala Osmên bertîl dane wa go hemşerîyê we ye, bi dostanî ji me ra bênin. Go ji me ra serxet kin da qene em bikujin heyfa keça xwe hilênin. Vêca hemşerîyê wî rabû çû pey go were [e]z ê te û malbava keçikê lev ênim. Ma 'lûm e bêbextî bû, bertîl dabûnê da. Çû anî. Kurik lê guwenmiş bû anî va çîya wa⁴⁵ go em tî bûne wa ha şikefteke deme em ê tê da avê vexwin. Go çûne devê şikeftê, avzênke di devê şikeftê da bû weke golikkê bû, wexta devê xwe kire avzênkê go hema wî xencer avête guhê wî. Go aaay, mi di derba bêbextîyê gayî, Wele te bêbextî li mi kir. Meyza go bavê keçikê û amê keçikê jî wî li wir in, ew jî wî di şikeftê da ne, li hêvîya wa bûn. Bêhvila wî bi saxîti jê kirin û guhê wî jê kirin û berik di laşê wî kirin û hûr hûr kirin û birin kirne şahwekê⁴⁶ da. Di nav şikêrê da veşartin, şivanê Mezriya⁴⁷ sibihî çûne ber pêz seyê wa çûn li şikêrê xebitîn dîtîn. Îde 'ilm dane qereqola Delavê Qesrê go Wele va cinazekke. Go hikûmetê çû derxistin, cîya mi digo e[z] zarok bûm, anîne hewşa qereqolê go li milê Simo (bavê keçikê) kirin. Go dohnê misirmên wilo diheleha pê da dihate xwarê û go wilo birne heta bi Hezexê.

Ya pê ra; Asya ji mi ra got, go ez zarok bûm. Go ez girêdam. Asya ev di sê sal e mirî. Nizanîbû go xalê mi bû ji mi ra digot, go guhê wî û bêhvila wî ji mi ra anîn. Go mi go guhê wî û bêhvila wî bi saxîti jê kin û ji mi ra bênin. Go serê wê danî ser kêvir û kevir bi ser dara kîsikê mêjîyê wê pekî wê dê ji wilo lê kûr bû. Vêca niha ji wir ra dibêjin kevirê Şîrîn/mextela şîrîn. Wilo weke kêlekê bû û heta wa salê ha jî xwîn pê ve bû, xwîna insana ji kevirê naçê. Ev heftê heştê sal heye.

Xelîlê Mexso jî heman bûyerê di formata vegotinên gelêrî da wiha neqil dike:

Ev î ji va Feqîyan⁴⁸ bû, amê Xelîl bû. Vêca digotinê da Cemîlê Yadê. Vêca 'Elîyê Simo gotîyê da go were nav mala min, şivanîya mi bike ez ê Şîrîn dime te. Go çû [ber pezê wa] heta qewlê wî qedeha go ka dergîstîya mi, 'Elî berûpî danê da, [keçik] nedidayê da. Axirê wêna ew Asya jî zarok e [pê ra ye] û Şîrîn jî firavîna pala wa dibê. Teştê xwarinê li ser milê wê ye wê bê ji pala ra. Ew dera ji Rîwanê û vir da; dibê Meydanê, vêca rabû li wê derê ['Elî] çû pêşîyê go ez ê te revênim. Go Şîrîn gotîyê da go Cemîl ka hêdî heta ez firavîna pala bibim vir da wê da... Go na tê hîla li mi kê, ti nayê. Go bavê te hîle li mi kir ti nedayî min û ez heft sala bi mala bava te ra mirim. Go heta firavîna pala bibim filan bêhvan, [Cemîl] go na. Go rabû Asya girê da û li wê dê [Şîrîn] da 'erdê, serê wê danî ser kevirê û rahişte kevirê bi ser serê wê dara kuşt. Hewar bi pala daket, ['Elî] baz da çû kete Stewranê⁴⁹ da. Kete Stewranê da û hewara Hemika⁵⁰ li pey çû bi tivinga. Li wê dê Stewranîya û wana tivingin avêtine hevdu û di wê dê da xilas bû çû. Xilas bû çû Binxetê.

'Elîyê Simo gote va Mala Osmên go ez ê jinekê dime we go win Cemîlê Yadê bikujin ji mi ra. (Mala Osmên li binya xetê ne.) Rabû ser xwe jinek da Mala Osmên, wa jî Cemîl girtine xwe û tivinga wî jî pê ra heye kaçax tînine va gunda wa difiroşin. Li Zivinga Ga⁵¹ şikefteke heye, hatine wê şikeftê. Vêca hevalê yî yê Mala Osmên dibê Cemîl ka tivinga xwe bide me û ti li vê dê li ser mêl be heta em herin [û werin] ma em miştirîya nabînin. Li wana êmin bûyîye tivinga xwe didê wa. Derketine jiderve ew î di şikeftê da ye û lê vegerehan devê tivinga bi ser da serjêr kirin. Go Cemîl go e[z] bikutime bextê we û bavê we da. Go req req di wê dê da kuştin ji Mala Simo ra.

⁴³ Li vê herêmê ji bo Sûrîyeyê anku alîyê din ê sînor binxet û ji bo alîyê Tirkîyeyê jî serxet dihê gotin.

⁴⁴ Malbateke Fisqînî ye ku ew jî gundekî Nisêbînê ye û li ber sînor e. (Navê resen hatiye guhertin)

⁴⁵ Mebesta vebêjerî çîyayê dora Delavê Qesrê ye.

⁴⁶ Koma kevirên li ser hev komkirî ne ku jê ra şikêr jî dihê gotin.

⁴⁷ Mezrê gundekî li vê derdorê ye.

⁴⁸ Navê bavikkî ye li Delavê Qesrê. (Navê resen hatiye guhertin)

⁴⁹ Gundekî li vê derdorê ye.

⁵⁰ Navê eşîrê ye ku navenda wê Delavê Qesrê ye. (Navê resen hatiye guhertin)

⁵¹ Li çîyayê Bûtika navê cihekî ye. Butika eşîreke vê herêmê ye.

Li wê dê kuştin û hêdîka zibil ji binê şikeftê kolan, danîne ber qeraxê şikeftê, kevirkin dane dorê û ser sikê wî tişî zibil kirin. Gotine Mala Simo go Wele me kuşt.

Yekî Êzîdî jî tê cem Birahîmê Derwêş dibê Birahîmo qulkê/[şikefteke] jî va bide mi e[z] jî pezê xwe bînim vê zistanê bême vê zivingê. Dibê hera bi Xwidê her şikefteke carna di mal di ser hev da ne rê nîn e lê here filan şikeftê ji xwe ra paqij bike pezê xwe bêne, çal jî li devê wê ye. Ew jî diçê li wa da dipelênê “bavo ev çi ye di vir da!” Dîvekê go va laşek. Birahîmo go hat go kuro Birahîmo! Go mi go çi ye? Go kuro laşekî di wê şikeftê da ye. Kuro laşê çi ye? Go ti nebê ha yê wî Cemîlî ye. Îde gilê wa kirin, qederekê hatine girtin jî û ‘efûwê lê da nîza çilo çêbû hatine berdan. Ê ew Cemîl, çûn laşê wî anîn li vê dê veşartin.

Carê qufrekî⁵² wîlo serê wî bilind di wê rê[yê] da bû niha hilkirine, digo Mextela Şîrîn.

Heke mirov van vegotinên binirxîne:

Ev vegotin li ser navê kevîrekî anku niqteyeka biçûk e ku divê di nav mîkrotoponîman da were kategorîzekirin. Mextel cihên lokal in û şert nîn e ku ji aliyê cografîk ve xwedîyê taybetmendîyeka beloq bin. Tevî vê, li vê herêmê mirov li gelek mextelan rast dihê ku mirov karê wan wek “şûn” qebûl bike. Lewma li gorî fikrê Îbrahim Şahînî, ev mextel di nav toponîmîya heşîfî (silikyeraadibilim) da ne ku li gel navê til, çîya, zevî, gir û hwd, navên “şûn (cih)”an jî vedibêjin.

Wek ku ji neqilkirina vebêjeran jî dihê fêmkirin, vî cihî (anku vê şûnê) navê xwe ji keçîka bi navê Şîrîn wergirtiye. Jixwe mextel hemû bi vî awayî bi nav dibin lewra berîya ku ew bûyer li wir rû bide jixwe navekî wir nîn e (hebe jî eleqeya xwe bi navê nû ra nîn e). Lewma di navlêkirina van cihên lokal da pîvan bi awayekî teqez ew e ku cihî navê xwe ji bûyer yan jî kesan girtiye.

Ji ber ku şahidên vê bûyerê hê dijîn, mirov kare vê vegotinê wek serpêhatî bi nav bike. Jixwe me ev vegotin jî hem ji şahidê wê demê hem jî ji neqilkera şahida bûyerê wergirtiye. Lewma li gel îhtîmala hin guhertin û pirrolekirin yan jî xiritandinê, ji rastîya vê bûyerê şik û guman nîn e.

Mirov kare di nav memoratan da jî bi cî bike çiku ew pexşan e, kurt e, bûyeraka bîraver û balkêş vedibêje. Her wiha li gorî Necat Keskin di kurdî da bo memoratan “serpêhatî” jî dikare bihê gotin. Li gorî fikrê Sydowî jî nabe memorat çiku ew dibêje kesên duyem nikarin memoratan bêjin lewra ew tecrûbeyên şexsî ne. Heke bêjin û ev neqilkirin peyv bi peyv bi neqilkirina kesên yekem ra hev bigire jî êdî mirov nikare bêje wê memorat. Lê li gorî Christiansen memoratin hene ku ji tecrûbeyên rasteqîn ên destê yekem yan jî duyem derdikevin.

⁵² Kevirê mezin ku di erdê da ye. (Veb.)

Lêkolerekî din Pentikäinen jî li ser zêde dike û hejmara di vê zincîrê da wek çar kesan îdealîze dike. Ev mînaka me jî hê nehatîye wê xelekê ku bikeve forma fabulatan û jê wêdetir memorata sexte yan jî memorata qaşoyî da.

Di encamê da li gorî van agahîyan em dikarin vê vegotinê wek memoratê qebûl bikin lê divê neyê jibîrkin ku hê jî li ser vî cureyî konsensusek nîn e.

3.3.3. Şêx Şerîf

Ev zîyaret di navbera gundê Delavê Qesrê û Xirabê Mişkê da ye. Li vir bi navê “Rîwan”ê tilek heye ku niha di kategoriya “cihên ku divê werin parastin” da ye. Bi saloxan demên berê ku karwan diçûn û dihatin bo Wanê, ev cih konaxa wan a bêhnvedanê bû û navê xwe jî ji vir digire. Li binîya vî tilî jî li gel kanîyên avê hicrek heye û li gorî bawerîya gelê vê herêmê gora şêxekî bi navê Şêx Şerîf di vê hicrê da ye. Her çend gel bawer bike ku ew ji Mekiha Erebestanê hatîye û li vir wefat kirîye jî der barê nav, welat, salên ku jîyaye û serpêhatîyên wî tu belgenome nîn in. Li gorî agahîyên ku vebêjer Hemedê Kurd dide ew ji bo herbê li pey mişrikan hatîye vê herêmê, li vir şehîd ketîye û li vir hatîye veşartin. Ji gelek deveran mirov vê gorê ji bo mirazan û sedemên bi vî awayî zîyaret dikin û wek cihekî pîroz dihê qebûlkin.

Belgenomeyên nivîskî nîn in lê belê em di çîroka Binîhelalîyan da li navê Şêx Şerîf rast dihên. Beşeka vê çîrokê ku li gelek deveran varyantên wê hene li ser serpêhatîyên vî şêxî ne. Helbet çîrok rasterast ne li ser vî şêxî ye û jixwe di varyantên herêmên din da behs jî nayê ser vî şêxî. Li gorî bawerîya me saloxên der barê Şêx Şerîf da ji aliyê vebêjer Hemedê Kurd ve bi vê çîrokê ra hatine sentezkirin ku ev yek jî di çarçoveya adaptekirinê da ye. Ji ber ku ev vegotin gelekî dirêj e em ê di vir da tenê beşa li ser Şêx Şerîf ji Hemedê Kurd neqil bikin û giştîyê vegotinê di pêvekê da bi cî bikin. Lewra tomara dengî 170 deqe û deşîfrasyonê jî 13 rûpel⁵³ girtine. Hemedê Kurd dibêje:

Rahme li dê û bavê hazira. Dibê Şerîfê Mekihê hebû û dibê ev Şêx Şerîfê Rîwanê⁵⁴ Şerîfê Mekihê ye. Vêca ma'lûm e hingî hê nehatîye Rîwanê li Mekihê ye. Ew û Şêx Hadîrê go Şêhadîr⁵⁵ pê bi nav kirine tev da hatine va da di herba kafîra wa da şehîd ketine. Vêca dibê Melik Serkîs, Şerîfê Mekihê standibû, êla wî kiribû bin emrê xwe da. Weke niha tirk dibê îcra û kurmanç dibê hasil; hasila xwe dista. Di bin hikmîya wî da bû sîleh jî lê qedexe kiribûn. Melik Serkîs ji qewmekî cihûwa bû. Vêca dihat serê deh miha mihek ji Şerîfê Mekihê dista, serê deh bizina bizinek jê dista, serê deh deviha devihek jê dista. Vêca dibê heft sala nehat. Şerîfê Mekihê go ev heft sal e nehatîye hasila xwe nestandîye belkî emrê wî ser me rabûwe. Sala heştî ma'mûrê wî hatin go em çend sala nehatin, em ê heft qet hasila xwe stênin û em ê kevine nav bajarê Mekihê da bê çi keçîkê spehî hebin em ê wa jî ji xwe ra bin. Vêca ma'lûm e lev gihane

⁵³ Tekst bi 11 puntuyan hatîye bicihkirin û navbera rêzan wek 1,0 hatîye eyarkirin.

⁵⁴ Zîyareta Şêx Şerîfê û di navbera Delavê Qesrê û Xirabê Mişkê da ye.

⁵⁵ Gundekî Hezêxê ye ku di navbera Nisêbîn û Cizîrê da ye.

hevdû, Şerîfê Mekihê jî go Wele heta niha malê dinyayê bi mi netêşeha vêca namûs zor e, namûs jî li ber pîya çû. Civîn çêkirin go ka ma em çi bikin. Gotin go hinek hene navê wa Binîhelalî ne. Go ha em ê çin xwe li Xwidê û bextê wa girin. Heke li ber barê me rabûn wê me ji bin emrê vî kafirî derxin û heke nerabûn jî ne sîlehe me hene û ne qeweta me heye, wê weke xwe bi me ra kê. Hêdîka dibê ma kî yê çê kî naçê? Dibê hêdîka Şêx Şerîf û wezîrê xwe li hespê xwe siwar dibin û dipirsin. Dibê miho bi pîrsa diçê qursa, dipirsin diçin. Binîhelalî li kû ne, Binîhelalî li kû ne? Ji camêra dipirsin...

Şerîfê Mekihê diçê sofikkî dibînê. Dibê selama 'lêkim; 'elêkûmesselam. Dibê sofî! Dibê ho! Dibê Wele em hatine go hûn me xilas bikin, em ji ber zilmekê revîne, zilma Melik Serkîs. Lê kes li me napirsê! [Sofî] dibê çil rojî hûn dibînê vî konî da xwarinê bixwin wê ji nûka kevine wê ferqîye go hûn xerîb in. Lê heke 'îşekî we yî lezgînî heye ji me ra bêjin em ê 'îşê we pêk ênin. Ez ê bi şexsê xwe çime cem Sultan Kazim (Sultan Kazim jî li binê kon e). Werhasil dibê Wele em ji Mekihê hatine, ez Şerîfê Mekihê me û ev jî wezîrê min e û 'îşê me gelekî lezgînî ye. Em dixwazin go rokkê berî rokkê hûn 'îşê me çêbikin, me pêk bînin û me li ser rêya me bişîyênin. Ya bê na ya bê herê. Sofî diçê cem Sultan Kazim, selama 'lêk; 'elêkûmesselam. Dibê Wele Sultanê mi tiştêkî halo heye, ji Mekihê mêhvanê te hatine dibê e[z] Şerîfê Mekihê me û 'îşê wî lezgînî ye. (Dibê 'îşê lezgînî bê sê roj in, dîsa di wê sa'etê da çênabê.) Sê rojê wa çêbûn çûne cem Sultan Kazim. Selama 'lêkim; 'elêkûmesselam. Hûn bi xêr hatin ya mêhvanê 'eziz, ser serê mi ser ça'vê mi hatin. Mexseda xwe bêjin ji mi ra (Sultan Kazim dibêjê). Dibê e[z] Şerîfê Mekihê me û ev jî wezîrê min e. Em ji Mekihê hatine me xwe li Xwidê û derîyê te girtîye. Melik Serkîs heye, melikkî gawira ye, em standine û em di bin emrê wa da ne. Her sal tê hasilê ji me distênê, heft sala nehatîye niha dibê wê heftqet hasilê ji me stênê. Gotîye ez ê kevime nav êlê da çi keçikê spehî jî hebin ez ê ji xwe ra, ji ma'mûrê xwe ra bim. Vêca malê dinyayê erê lê bi Xwidê namûs bi mi têsêhê. Me xwe li Xwidê û derîyê te girtîye. Dibê wilo di rayê melkomot ji nava va herd[û] birhê wî sîx dibin, hingî diqehêrê. [Sultan Kazim] delêlî dibêrdê nava êlê dibê insanê go bi kêrî darekî û kevîrekî û qeteka xencera û qetekî şûr û mertala werê, lazim e di şûxilê sê sa'eta da li vê dê bin.

Meydanaka wilo mezin e, ma'lûm e delêlî berdaye nava êlê, ji hîrhîrê dewara û çîngeçîngê şûr û mertala û req û req û req û gurm û gurm û gurm êtîmê dîkin, xwe perwerde dîkin. Yanî go xwelî hildêrabana ji siwara nedigîha 'erdê. Wî sofîyê hînga pêşî çûyîn jê pîrsîn go yaw win ê vîqa 'eskerî bine Mekihê belkî sê heyva belkî salekê ev 'esker herbê bikê! Careke dî gote Sultan Kazim go ez dixwazim ti tiştêkî sivik bi wa ra bişîyênê. Belkî ji wa newê vîqa 'eskerî xwidî bikin. Wexta wilo got, go Sultan Kazim go hêêê! Herkesekê herine malê xwe û ti kes li vê derê nemênin. Siwar û pêlewan û filan, werhasil herkesekê çûne malê xwe, kes li wê dê nema. Hêdîka go çi ye, ne çi ye? Sultan Kazim go bakine Risk, Riskî Binhelalî...

Tên dimeyzênin ma'mûr wî di meclîsa Mekihê da hesaba dîkin. Pêz hesêb dîkin û pîreka hesêb dîkin û deviha hesêb dîkin û çêleka hesêb dîkin, yanî çiqasê ber bahra me kevê. Risk go yaw ev ditîjibê dewleta, va insana henekê xwe bi me kirîye! Evqa ma'mûrê wa filan bêhvanê wa, Welleh meselek di vê da heye. Go hêdîka devê xwe kire ber guhê Şerîfê Mekihê da go ma ev ma'mûrê kê ne? (Heke Şerîfê Mekihê gotibana ev ma'mûrê min in wî baz din.) Dibê Wele ew Melikê ez standim, ev ma'mûrê wa ne hatine hasilê. Hatine pîreka û hatine mêl û hatine zêra û hatine çêleka û hatine deviha û hatine pêz û... Dibê nabê? Dibê Welleh. Hînga wilo dibêjê dibê wilo sîx dibin mûwê wî [Yê Risk] û carekê şûrê xwe dihildê û qîrekê didê. Dibê ez Riskî Binhelalî me! Ma we nizanîbû go rihê we wê bi destê mi ê standin, hûn hatine çi? Û bi nav wa dikevê, pelq û pelq û pelq... Şûra li serê wa didê weke go ti darê xwe li serê serteşîka dê bîst û pênc metra serê wa difirê. Çil ma'mûr e sîh û heştê dikujê dowa dihêlê. Dowa dihêlê, ça'vê yekî dipeqênê û pîyê yekî dişkênê û wî yê pîyê wî şikestî li wî yê bi ça'vekî siwar dikê dibê lazim e halo û bi vê temkêlê ew Melik Serkîs te bibînê. Bê Welleh Riskî Binhelalî hatîye 'emrê te nemaye heta sibe vî wextî wê serê te jê kê. Hûn tên bi namûsa misirmanana dileyîzin!

Melik Serkîs jî li serê qesra xwe ye û bi dûrbênê dimeyzênê dibê Wele wê niha ên û wê çêleka ênin û wê pêz ênin û wê keçîka ênin û wê dansozcîya ênin û [e]z ê çime pêşîya wa û... Dibê delêlî berdana nava êla xwe go insanê go di mala xwe da bimênê, ji xey pîreka zilamê ser çardeh salî ra di mala xwe da bimênê, serê wî yê jê bê. Lazim e hê melê bang nedayî, bi fecrê ra dora Mekihê bibê [çember] çûk bixwe jî nikaribê bifirê! Heta bi zaroka ser pêçekê werê kuştin, 'efû nîn e. Hînga go ma'lûm e [Risk]

her çil ma'mûr kuşt, Şerîfê Mekihê gote wezîrê xwe go te digo ev her sê sêwîk, te dît bê çi kirin? [Wezîr]
go ma çi ne? Em ê sibe hevdû bînin! Şerîfê Mekihê go tamam em ê hevdû bînin.

Go hê fecrê nevedayî go dora Mekihê aha halo kirin⁵⁶, kirne çeqûber, kirne xefk. Ji hîrehîrê dewara û ji şûra û vêca dîloka dibêjin, dikine toz însan di nav tozê ra xuya nakê. Dibê wezîr dirabê limêja sibihê halo dimeyzênê go wî bi wî mûcibî, carekê wezîr diçê cem Şêx Şerîf. Go rabe mero! Te digo ev her sê sêwîya ha, de ka vêca rabe ji xwe ra li 'esker meyzêne. Bi Xwidê namûs jî çû û heta bi zaroka pêçekê serê wê yê ê jêkirin! Heqeten Şêx Şerîf çû meyzand, yanî bizdeha, gelekî tirseha. Çû gote Risk. ...çû pêşîya wê kûmata esker. Şûrê xwe go hîh li 'erdê da wilo kir go sê bosta bi 'erdê da çû. Şûrê xwe çiqand û go ez ê tiştêkî ji we ra bêjim. Go de bêj e. Go ez naxwazim go xwîn birijihê û em qetli'amê bikin. Vêca heke hûn werine ser destê min û hûn bi dilekî xweş û geş misirman bibin Welleh ez ê we 'efû kim. Lê heke go hûn bê herb, ez ê bi hezara we kujim jî û dawîyê dîsa win ê êne ber destê min, hûn ê teslîmî mi bin çinkû mimkûn nîn e...

Ma'lûm e vêca Mekihê civînê xwe çêkirin (tiştêkî wilo ji wa ra kirine, zêdeyî qeweta însanî ye go xelefê wa li wa vegeerênê) go gelo ma em çi ji wa ra bikin? Em zêr bidine wa zengîn in, em malê bidine wa nabin. Em çi ji wa ra bikin? Hêdika Şêx Şerîf diçê dibêjê Risk dibê birazî! Dibê ho. Dibê birazî ez ê pîrsekê ji te kim. Dibê bêje amo. Dibê ma te jin anîye an te jin neanîye? Dibê Wele ez azîb im. Dibê ez ê tiştêkî ji te ra bêjim go ti qebûl bikê. Dibê bêje amo. Dibê keçeke mi heye ez ê dime te, başqe e[z] nikarim xelefê we vegeerênim. (Ma'lûm e şahreza ye xwe bi mirhovatîyê jî bi wa ve girêdidê. Ji boy çi? Ji boy rojekê di tengayîkke dî da jî bi kêrî werin.) [Risk] dibê amo! Dibê ho. Dibê Welleh billeh tilleh, hê mi ça'vê xwe neberdaye însanî lê piştî go ti keça xwe layîqî mi dibînê, mi nedîtî qebûl kir. Dibê ser sera, ser ça'va... Go tamam. Go vêca birazî daxwazîkke mi'j te heye. Go de bêje amo. Go heçî zerîyê me ne go kurik [ji wa ra] çêdibin a reş e hebeşî ne û go keçik in tavêjine dîyê xwe. Go keçikte jî çêbibin wê 'eynî weke cîya xwe spehî bin û go kurik çêbibin li mi meyzê, wê avêjê kalikê xwe naavêjê we (heqeten jî dibê Şêx Şerîf jî reş î hebeşî bû). Vêca [e]z ê kaxezekê yas kim vê kaxezê bide Sultan Kazim. Ji boy go wî wextî haşa haşa hinek bê cîya wî jî xweşik e û bavê wî jî xweşik e, ev kurikê reş î hebeşî ne ji bavê xwe ye. Ji boy go xebera wa jê hebê Şêx Şerîf înze kirîye û mohra xwe jî lê daye. Go ser serê mi, ser ça'vê mi û bi rê dikevin tên. Ma'lûm e hingî wilo keçikke spehî ya delal e û hingî ew pêlewanekî wilo we, di nav wê 'eqqa xwe da ew kaxeza xwe jî bîr kirin. Kaxez winda bû çû. Kaxezê nadine dest Sultan Kazim...

Vebêjerekî din Hecî Osman jî der barê Şêx Şerîf da li gel çend cudahîyên biçûk vedibêje. Wek mînak di vê varyantê da Siltan Kazim dibe Siltan Hesên; cihê peyva gawir Ecem digire; navê keça Şêx Şerîf Xedra dibe Hezna û hwd.

Heçî Şerîfê Mekihê bû di bin destê Şahê 'Ecem da bû. Salekê bi ser wa da hat gotine Şerîfê Mekihê go tê çil keçikî dê me keçikê azîb, em ê li xortê xwe mehr kin. Pek û li vê 'ecêbê! Ew gawir û em îslam, em ê çilo keçikê xwe din! Ê nikarê herba wa jî bikê. Em ê xwe li kê girin, em ê xwe li kê negirin? Go em ê xwe li Siltan Hesên girin. Siltanê dîne îslamê, Siltan Hesên kiribûne siltan. Hingî merd bû û Riskê Binhelalî pêlewanê wî bû. Vêca go Wele [e]m ê xwe li Binhelalîya girin, em ê xwe li Siltan Hesên girin. Ew [Şerîfê Mekihê] û di yahwerê xwe hatin çûne cem Siltan Hesên. [Siltan Hesên go] xêr e? Go Wele hal û mesele ev e. Hatîye ser namûsê û bi Xwidê ji me nayê em herba wî bikin ka wê çawa bê. [Siltan Hesên] bakire Risk. Go hal û meselê Şerîfê Mekihê ev e, ka ti çi dibêjê? [Risk] go heçî Şerîfê Mekihê ye [êla wî] hindik e, nikarê 'eskerê mi ragirê, nikarê xwarina wî bidîyê. Vêca em ê wa bi rê kin bila ew herin ez ê îdê li nav Binhelalîya gerihim. Gotine [Şerîfê Mekihê] hûn herin em ê li pey we ên. Di hesabê wî da wê hezar mêr, di hezar mêr bê.

Li nav millet gereha ça'vê wî ji kesî tişî nebû. Çû nav şivana ça'vê wî ji wa tişî nebû. Çû nav gavana ça'vê wî ji wa tişî nebû. Çû nav şuvîkvana (şivanê devîha) go dido yî di kunrovîkkê da. Lingê xwe li bin lingê wa da, serê xwe hildan go xêr e? Go ka li we meyzênim. Li wa meyza, go navê te çi ye?

⁵⁶ Vebêjer bi destê xwe nîşan dide ku Mekihê dorpêç dikan.

Go Hadel Benik. Go navê te çi ye? Go Hadel Girik. Go werin! Çû gote şûvikvana go kuro emanetê devihê wa, go deviheke wa winda bibê ez ê rayê pişta we qetênim. Go tamam.

[Girik û Benik] bi xwe ra anîn, birine himamê. Himamîş kirin û cilê şêxa li wa kirin û pova wa hûna weka ya şêxa û çûne binê konê Siltan Hesên. Go [e]z ê va herd zilama bim û çim. Ma 'lûm e dem ketîyê da, Şerîfê Mekihê gotîye şahê 'Ecem çil rojî bide mi heta ez wa kar kim. Meyzandin go sê zilamê tenê, simbêlê wa ketine devê wa da.⁵⁷ Çil rojê wa qedehan dîsa qasid hat, [Şerîfê Mekihê] gote qasid go çil rojî dî bidine me. Hêdîya Risk çû kete pêşîya wa [qasida] da, bêhvila yekî jê kir, guhê yekî jê kir û destê yekî jê kir.

Wextê şahê 'Ecem halo li wa meyza, pek! Go Şerîfê Mekihê digote mi digo ez sadiqanê te me! Ev naxwe herbê ji mi dixwazê. Dora Mekihê kire çember. Sibihî Şerîfê Mekihê rabû misîne wî go rep û ji destê wî da ket ji tirsê. Go Wele bi xaliq ev ji destê mêhvanê mi lê ket!

Taşteya wa anîne ber wa, Benik go Wele go şerê vê sibê ne ji mi ra bê ez xwarinê naxwim. Go bila şerê vê sibê ji te ra bê. Rabû beyreqa herbê çikandin. Şahê 'Ecem meyza go yekî tenê hate [bi ser wa da], go herin wî bigirin em ê di binê kon da laşê wî kine beltik em ê xwê kinê da. Go wextê xwe jê ra berdane meydanê go Benik kete nav wa da. Rep û rep û rep û rep... pênsed hesp girh kir û bire nava êlê. Şerîfê Mekihê go heek vî çî 'ecêb çêkir!

Rabû sibiha dîtir Girik go ma ez kêmi Benik im, Wele go şerê vê sibê ne ji mi ra bê ez taştê naxwim. Go şerê vê sibê ji ji te ra. Vêca wî hezar hesp girh kir û anî nava êlê. Roja dîtir [Risk] go hera ez ê li alîkkî dim û win li alîkkî din û ketine nav da. Ne xwezî li wî go ji mala xwe hatî! Heta serê şahê 'Ecem jî jê kirin. Go serê şahê 'Ecem jê kirin timam teslîm bûn.

Wê çilo bê? Girik û Benik birne himamê, himamîş kirin û harekê xiftanekî Şamî li wa kirin û go win herin û go Risk ti bimêne. [Şerîfê Mekihê] bi rihspîya şewirî, go keça xwe lê mehr ke. Hezna⁵⁸ lê mehr kir. Ji bîr kir go bê meyzê go kurik werin evdê reş in û keçik werin hezna dinyayê zehf sipehî ne.

[Risk] çil rojî ma li wir, ew bixwe çû, go here em ê Hezna şîyênin. [Şerîfê Mekihê] kaxez nivîsî û çima malmîratê neda Risk, bi xwe ra hişt [Hezna bi xwe ra dihele]. Vêca wextê go Xwidê Te'ela Abûzêd dayîyê da birne cem Siltan Hesên. Navê yekî Berekat bû, li nava êlê gotin ji Berekat e. Hingî li Risk ta'n hat bi çembilê wê [yê Hezna] girt tevlû Abûzêd bire Kerbelayê. Go mademkî ji Berekat e aha win li vê dê bin. Vêca tî bû, bi vir da çû û bi wir da çû bi wê da çû, Xwidê Te'ela kahnîk jê ra vekir. Cihê pahnîkê kurik bû av û herikî. Em ê bêjin weke vir û 'Evdika⁵⁹ çû. Meyza va bazirganekî hat, çû bi serê bazirgên girt go li ser ava mi nedeynin. Ê go ma hineke te hene? Go na Wele xwidîyê mi Xwidê ye, ev ava min e Xwidê daye mi. Ê go em ê te û kurkê te xwidî kin û em ê di bin destê te da bin heta hetayê, heta nesîbê me li vir e. Ê go de baş e [Hezna dibêjê bazirganî]. Rabû îde konek danê û xwidî kirin heta Berekat mezin bû. Hezna hespek û tajîk danê da go kurê here ref û nêçîrê xwe bi'elimêne. Ma 'lûm e bû hifdeh salî, îjdeh salî û xwe di'elimênê şûr û mertala wana.

Dibê rojekê Risk dibê malava, ew hermet mi bire wê derê û e[z] nizanîm ne gura xwar ne çî. Go çû wî cihî go hey lo ew der nehîtekî bajara, were kona, hîrhîrê hespa... Pek û li vê 'ecêbê! Go çû binê konê şêf, go çima we li ser 'erda me danîye? Go hera ne 'erda te ye, 'erda Berekat e. Zimanê xwe gez kir, go ka Berekat? Go Wele çîwe ref û nêçîrê. Bi Xwidê em nikarin xwe ji Berekat tev din, 'erda wî ye û ava wî ye. Ya te çi ye? [Risk] go bêjîyê bê kara herbê bike ez ê êmê. [Bazirgan] gote Hezna go hal û mesele ev e. Go bila (ew zanê go Risk e). [Hezna] go kurê. Go çi ye? Go siwarekê ê te, jê werê wê te kujê lê belê bigire û ji mi ra werê...

[Risk û Berekat] çûne hevdu. [Berekat] derbê jê distênê lê ça'vê wî li girtina wî ye. Heta êvarî derb lê neanî. Êvarî Risk çû, [jê pirsîn] go çawa ye? Go bi Xwidê karê mi bikujê lê Welleh ça'vê wî li

⁵⁷ Ev biwêj dihe wateya xirabûna moralî û şikestina kêfê.

⁵⁸ Keça Şerîfê Mekihê ye.

⁵⁹ Gundekî du km'yan dûrî gundê vebêjerî ye.

girtina min e. Go naxwe bila çil keçik werê bi 'erebî şa'ra bavêjine ser, hê xort e wê guhê xwe dê ser [wa] îde tê derbekê lê dê...

Hezna gotîyê go kurê? Go çi ye? Go meyzê ti guhê xwe nedê wa keçika, ew zilam wê te kujê ha, lê bigire û werêne. Dibê carekê çûne hevdû. Çûne hevdû, derb jê nesita go bi Xwidê halo çênabê. Jê ra bazda [Berekat ji ber Risk baz dide] em ê bêjin weke vir û Tilseqanê⁶⁰ pêşberî keçika êxist û carekê lê quliba û hatîyê da. Bi qarîşa piştî wî girt û li ber xwe danî [Berekat Risk digire]. Destê wî girêdan û anî go yadê aha va ye. Di nav keçika da bû şîn û girî û çûne mal go Wele bi Xwidê Risk girtin. Hezna gotîyê go çi bi bextê te hatibû malmîrat? Bavê mi ez dame te, te ev 'ecêb anî serê mi. Aha go vêca li Bereket meyzê. Go heçî kur in 'evd in û heçî keç in gurt in, malmîrat. Kurê mi karîbû te bikujê lê mi gotîyê da mi go bigire û werêne. Go e[z] bi te û ti bi Xwidê, mi berde. Rabû berda.⁶¹

Berekat hat, go yadê te nego zilamekî mi werê! Go kurê bavê te ye. Go bavê min î kû we? Kurê Welleh bavê te ye. Go kurê şanikka li neqebîna herd milê wî ye, lê meyzê ne go ne wilo bê... Lê meyzî go wilo we. Îde navê wî [yê Berekat] bû Abûzêdî Binhelalî. Û serê te sax.

Mirov dikare van nirxandinan li ser van vegotinan bike:

Ji alîyê toponîmîyê ve ev mînak dikeve qada urbonîmîyê da lewra ew li ser zîyaretekê ye û urbonîm e. Urbonîm navê tiştên aîdî bajaran îfade dike lê belê zîyareta Şêx Şerîf îro li çolê cih digire. Dîsa jî ji ber ku Girê Rîwanê, berê gund yan jî bajarek bûye (ev yek ji kaviên heyî dihê fêmkirin) ev şertê aîdbûnê pêk dihê. Bi vê pêkanê mirov dikare bêje ku ew zîyareteka aîdî bajarekî ye û lewma jî cureyekî urbonîman, gorodskoy horonîm e. Vê gorodskoy horonîmê jî navê xwe ji cendekê wir anku Şêx Şerîf wergirtiye.

Her du vebêjer jî vegotina xwe di formata çîrokê da neqil dikin lê belê lehengên wê ne ji ajal û kesên derasayî pêk dihên, mirov in û dem û welat jî dîyar e. Ji alîyê din ve di destpêk û dawîyê da qalibên dîyar ên çîrokan nîn in lê ev yek jî hin caran li gorî performans û tercîha vebêjer derdikevin. Li gorî çavdêrîyên xwe em dikarin bêjin ku ji rastîya wê şik û gumana vebêjer û guhdaran nîn e anku ev bawerî li vê herêmê bo hemû civakê derbasdar e. Hinek hêman û rûdanên derasayî hene lê belê têrê nakin ku mirov bi giştî wek cure, efsane jî bihesibîne. Wek mînak di cihê panîya pitikî da kanîyek vedibe û ji alîyê din ve leheng di şerî da bi tena serê xwe bi sedan leşker dikujin lê belê ev ji hêmanên efsaneyî bêtir dikevine kategorîya pirrolekirinê da ku pêkan e mirov di gelek vegotinan da lê rast were. Hin leheng (wek Şêx Şerîf) pîroz werin dîtin jî bi giştî helwest bo vê vegotinê ne pîroz e. Gelek hêmanên çîrokan tê da hene lê ji ber dîyarbûna kes û cihan bişibe hîkayeyên gelêrî jî beşên menzûm tê da nîn in. Lewma ew bi awayekî tekûz nakeve kategorîya hîkayeyên gelêrî da jî. Ji alîyê qebarê û mijarê ve taybetmendîyên hîkayeyên gelêrî vedihewîne. Mînak gelek leheng hene, bûyerên cuda têkilî

⁶⁰ Gundekî 5-6 km'yan dûrî gundê vebêjerî ye.

⁶¹ Anku destê wî vekirin.

hev dibin û di encamê da jî li nav hev dikevin. Lewma li gorî senifandina Boratav dişibe hîkayeya dirêj û qehremanîyê.

3.4. EVDIKA

Ev gund di navbera Hezex û Nisêbînê da cih digire û navbera Evdika û Delavê Qesrê 2 km ne. Gundê eşîra Bûtika ye. Şênîyên gundî debara xwe bi cotkarî û sewalkarîyê dîkin û hinek gundî cerdevan in. Serhejmara vî gundî li gorî daneyên 2020an 356 e (TÜİK, 2020).

Li vî gundî vegotinek hatîye berhevkerin ku der barê toponîmîya zîyaretekê da ye.⁶² Lehenga sereke ya vegotinê keçîkek e ku bi taybetmendîyeka xwe ya fizîkî hatîye binavkerin. Ev zîyaret di çîyayê Evdika da ye û li gorî agahîyên ku vebêjer dide ev keçîk ji Evdika ye. Ew keseka pîroz û bêguneh e lê bebextî lê hatîye kirin.

Ev vegotin ne tenê li gundê Evdika li gundên derdorê jî dihê zanîn û demeka dirêj e dihê gotin. Bi taybetî van demên dawî berbelavtir bûye û bo hin xebatên modeyî jî bûye materyal ku bi vî awayî hinekî ji eslê xwe jî hatîye dûrxistin. Modenas Cemîl Îpekçi ev vegotin berhev kirîye lê navê wê kirîye Bêrîvan (dibe ku wisa jê ra hatibe neqîlkerin) û bi bingeha vê vegotinê projeyeka atolyeyî daye destpêkirin.⁶³

Vebêjer Hemed Sedîqê Seyd Tahir ku ji gundê Evdika ye dibêje ev keçîk dibe metika me, heft bavan dûrî me ye û texrîben pênsed-şesed sal heye. Navê wê nayê gotin, me her “Keçîka Bikezî” bihîstîye lê îxtîyarekî me digo navê wê Sedîqa ye. Hemed Sedîq, serpêhatîya Keçîka Bikezî wiha neqil dike:

3.4.1. Keçîka Bikezî

Keçîka Bikezî seyîd e ji sûlala pêxemberê me ye. Ew jî di zemanê kevin da ji Bêcirman hatine⁶⁴ û navê kalikê wa jî Seyîd Bilal⁶⁵ e. Hatine li vê beriha ‘Evdika mane, yanî mala wa di berihê da bû. Vêca hinek dibê sê birayê wê bûn hinek di bê çar bûn û ew jî insaneka salîhe bû. Yanî ti heyata wê yî go ti bêjê weke ya vî zemanî nebû, heyateka wê yî dunyewî nebû. Îsaneka salîhe bû, her ‘îbadetê Xwidê dikirin û her tiştê baş û qencî dikirin.

Vêca li çîye cihek heye dibê Hewtê Bixiram, diçû wê derê sitilê xwe yî şîr dibirin û pezkovî dihatin (ma’lûm e pezkovî naçine cem her kesî, ji ber go salih bû xwe disipartinê da) didohtin, şîrê wanakê jî dibire mal. Vêca jinbirê wê jê qiskanmîş bûn jê heset distandin. Go yaw ev vî şîrî ji kû tîne halo! Qey diçê bi şivana ra (haşa) nebaşîya dikê heta şîr didinê da! Wilo zeman tê ve derbas bû jinbireka wê gote mêrê xwe go Welleh xuha te diçê va nebaşîya dikê bi şivana ra û şivan vî şîrî didinê da. Birayê

⁶² Darên derdora zîyaretê jî wek “Darê Keçîka Bikezî” dihên binavkerin.

⁶³ Bnr: <https://www.dha.com.tr/yurt/mardin-cemil-ipekci-tore-kurbani-berivan-bebek/haber-134722>

⁶⁴ Gundekî Kerboranê ye.

⁶⁵ Seyîd Bilal kesekî navdar e ku zîyareta wî li gundê Bêcirmanê ye.

wê jî nego ka ez ê teftîşê lê kim ka ma rast e ne rast e... Dirabê birayê wê jî diçê kozikka xwe dideynê hê keçik nehatî û sîlehê wê tarîxê bê ka çî ne (tîr û kevan bûn miheqqeq)... Dirabê çawa xuha wî tê ew jî tîr û kevan tavêjê dikujê. Vêca hê nemirî (ma 'lûm e birîn germ e û ne weke sîlehê vî zemanî ne go ti bê derhal wê mirê) dibêjê birayê xwe dibê va ye te ez kuştim vêca hema weke 'îşê nîvsa'etekê bimêne û piştra here. [Birayê wê] dibê tamam.

Piştî nîv sa'eta wî diqedê dimeyzênê go va pezkovî hema hatin. Yanî ka sed e dised e bê çiqas e (wî zemanî ev Çîyayê Bagokê û ev çîyayê me tişî bûn). Vêca dimeyzênê nêhrîyê wa pezkovîya tê ser ra dimênê sekînî [ser keçikê ra], xwe nalepitênê. Dibê sitirhê xwe wilo didê bin laşê wê yanî weke go dey lê kê. Dimeyzênê go xwîn wilo di bin ra diherikê dibê wilo pirkênî pê [bi nêhrî] dikevê, weke go insanek qîrekê bidê yanî. Wilo pirkênî pê dikevê û îde ew pez dibê rast diçê. Nûka birayê wê dibê wey Wele mi mala xwe xira kir! Lê fêde nakê.

Berî hingî jî ji birayê xwe ra gotibû mi li vî çîyayê ha, li wî kaşê bilind veşêrin û ti insana jî li cem mi neveşêrin bila zîyareta mi bi tenê bê. Vêca niha halê hazir jî bi tenê ye li wê derê. Îde piştî kuşt ew birayê wê jî tê xuha xwe dibê li wê dê diveşêre.

Vêca li gorî me ji pêşîyê xwe bihîstîye dibêjin ew birayê wê çû helakê, yanî bêdundan çû zaro maro jê ra çenebûn.

Vebêjerekî din Xelîlê Mexso ku ji gundê cîran Delavê Qesrê ye jî serpêhatîya Keçîka Bikezî vedibêje:

Ev keçîka bikezî ahleke Xwidê bû. Birakkî wê hebû û hew. Vêca hewtnî ji wê keçikê [ji tirba wê] û wê da ne, hewtê avê ne. Vêca diçû wê dê, pezê kûvî dihate wê dê, li devê wa hewta ji xwe ra didoht û dikire meşka xwe da tanî mal. Vêca xelkê gote birayê wê go keçîka bikezî (dibê keçîka bikezî, ti nave dî xuya nakin) haşa diçê nav şivana pê ra ma 'mîlê dikin û şîr didîne da. Haşa wilo seba wê kirin. Rabû ser xwe xwiha xwe kuşt. Wextê wê kujê [keçikê gote birayê xwe] go filan sa'etê here devê filan hewta, hingî tê zanibê. Go [piştî kuşt û çû cem hewta] meyza carekê pezê kûvî hate ser ava wa hewta. Ti nebê [keçikê didoht]. Poşman bûbû pa kuştibû. Ha vêca wî li vê derkê veşartî ye.

Mirov dikare van vegotina wiha binirxîne:

Ev dever zîyaretek e ku tenê gorek lê heye ji ber vê yekê jî di eslê xwe da ne zîyaret lê hicir/hicrik e û wek cihekî pîroz dihê qebûlîkirin. Balkêş e ku ev gor neşibe gorên din ên misilmanan çiku berê wê bi awayekî tekûz ne li qubletê ye lê sedema vê yekê nayê zanîn. Vebêjer Hemed Sedîq dibêje “go pezek ketibana nav hicra wê da hê di nav da qarên pê diket derhal digurandin, yanî tehemûl nedikir. Gelek musulmana çûne dar jî jê anîne bawer ke belayê mezin dîtine. Fadil e yanî (fadil weke ma'na “pêvedan”ê ye), yanî insanekî fedla wî li cem Xwidê heye, Xwidê ser dixeyîdê.” Li gorî gotina Xelîlê Mexso jî dema însanan ta digirt, diçûn paçik pê ve dikirin ku ev pratîk û helwest hema bêje bo hemû zîyaretan derbasdar in. Ji ber ku ew zîyaretek e ji alîyê toponîmîk ve mirov dikare wek gorodskoy horonîm bihesîbîne ku cureyekî urbonîman e lê şertê aîdbûna bajarekî wê li derveyî vî cureyî dihê. Lewra divê mirov vî cihî tenê wek mîkrotopîmekê destnîşan bike.

Weke hemû zîyaretan (hicran) navê xwe ji wê kesê digire ku li wir hatîye veşartin. Ji ber ku di nexşeyan da cih nagire jî mirov dikare wek mîkrotoponîmekê bihesibîne lewra ew cihekî biçûk e.

Li gorî vebêjer û li gorî kesên vê herêmê ev bûyer rast e anku serpêhatîyek e ku wek mesele bi nav dikin. Der barê kes, bûyer û cihekî rast da ne lewma bi vî alîyê xwe dişibe efsaneyan. Her wiha jê dihê bawerkirin û dihê qebûlkirin ku ev bûyer qewimîye lê belê qala bûyer û mirovên derasayî nake. Lewma jî bi awayekî tekûz nabe mînak bo efsaneyan. Têkilîya Keçika Bikezî ya bi pezkûvîyan ra derasayî û wek hêmaneka çîrokî xuya bike jî ne gelekî dûrî aqilan e û ev yek jî bi tena serê xwe têrê nake ku mirov bêje efsane yan jî çîrok e. Tevî vê yekê bi gotinên qalibgirtî dest pê nake û naqede, pexşan e û mekan jî ev dinya ye lewma ev taybetmendî jî wê ji çîrokbûnê dûr dixin.

3.5. GUNDIKÊ HINDO

Ev gund gundekî Hezexê ye ku dikeve navbera Hezex û Cizîrê da. Li rojhilatê Hezexê ye û roja îro kaviş e. Şênîyên gundî Keldanî bûn û kurdîaxêv bûn. Wek ku ji nav jî xuya dibe gundî navê xwe ji kesekî wergirtîye. Vebêjer Ûsivê ‘Emerokê, meseleya keşayî ku navê wî Hindo ye û navê xwe daye gundî, ji Sofî Bihemedê Birho û Emerê Dîwanî wergirtîye û wiha neqil dike:

3.5.1. Gundikê Hindo

Qehremantîyek di an jî şahnazîyê di, Gundikê Hindo heye li vê derê, di neqebîna Xirabê Tiwa û Dikîyê û Deştadarê û Kovexê da. Ev gund cîranê wî ne. Gundik xirabe ye, xirbihek e. Gundî Keldanî bûn, bi zimanê xwe diştexilîn lê ji ber xatirê ku Kurdistanî bûn kurmançîya wa jî weke ya deştîya bû, weke me diştexilîn.

Dibêjin keşeyekî meşûr di Gundikê Hindo da bû. Ez dixwazim qehremantîya keşa û mêhvanperestîya keşa û çelîşkîya di neqebîna wî û Mîrê Botan da bînim ziman. Rokkê bi ‘eskerekî gelekî mezin Mîrê Botan bi rê dikevê li herêmê gerekê dikê. Li keşê Gundikê Hindo dibê mêhvan. Ji berê da tê gotin li vê herêmê miho biça tixûbê gundekî miho yê zanîbana ew gund gundê keldanîya ye yan yê misirmanana ye. Çima? Yanî kar û xebet û keda di nav yê wa da [gundê wa] hatî kirin ferqlî bû, ya ku di nav yê misirmanana da hatî kirin ferqlî bû. Dema ti diçûyî gundekî wa te zanîbû di vê dê da keda mesîhîtiyê heye. Çinkû bi kedeke jidil ‘erda wê paqij dikirin. Vêca Mîrê Bota tevlû bi grûbek siwarê xwe ve li keşê Gundikê Hindo bû mêhvan. Gote keşê ti karê nanê mêhvanê xwe hemiwa pêk bîne an ti nikarê? Go mîrê’m ez karim, rehet be. Heft bûkê wî hebûn, heft kurê wî hebûn. Go gote bûkê xwe hûn nanê genimî bistirihin lê gelekî bistirihin wexta go nerm bê bi hindik yaxê jî bê ti dibê qey gelekî biyax e. Nanê sêlê yî ditew çêdikin. Go bûkê wî hevîrê spehî sitirahan û ketne ber sêlê da nanê sêlê çêdikin. Her heft bûka xwe li wî hevîrî westandin heta ew hevîr pêk anîn û kirne nan. Heke pêncih, heke şêst, heke sed siwar; xwarina hemû siwarîyê Mîrê Bota pêk anîn û sifra nênan danîn. Sadece nan û dew. Sifre danîn û xwarina xwe xwarin. Mîrê Bota gotîyê go keşa Xwidê kî çiqas pezê te heye? Go Wele bi qay sed-dised pezê mi heye. Go pekî yaxa dised pezî va li ser vî nanî ye, te di kû ra dabû hev? Go [ez] ê ji te ra bêjim mîrê mi. Go pekî em jî nanê genimî dixwin ta’ma nanê me û vî nanî çima ne weke hev e, te ev ta’ma ji kû

anî û tevî vî nanî kir? Go mîrê 'm [e]z ê wê jî ji te ra bêjim. Go de ka naxwe bêje. Go zanê mîrê mi, heft bûkê mi hene her hefta xwe bi vî hevîrî ra westandîye. Çiqas hebê bila kîlokik yan di kîlo yax hebin, min ew jî lê kirîye. Ne bêyax e lê belê ne weke kû xuya dikê. Bi hindik yaxê helqa xweş bûye. Evqas e, ne tiştêkî dî ye. [Mîr] go pekî te bi çi da hev? Go zanê mîrê mi, mi çi da hev? Go di heyata xwe da şixûlê xwe yî îro mi ji bo sibe nehişt, daîma mi şixûlê xwe yî îro, îro xilas kir. Lê xwarina xwe ya îro mi hesabê sibe kir. Mi bi vê daye hev. Go mîr gotîyê da go ez dixwazim ti bûkekê ji va yê xwe (ne mîr bêfihêt in) bidê mi. Go Welehî mîrê mi ez ê nikaribim bi hemdê xwe bidim, lê bi kotekî bê kerem ke. Go ti bi hemdê xwe bidê, ti nedê ez ê bim. Dibêjê bûkeke wî bi xwe ra bir û çû. Keşa kete xemgînîyeke mezin da û go Welehî 'erza mi şikest û ez bê'ertz bûm. (Ê normal e, wexta go insan ser vê tiştê neqeherê ma wê ser çi dî biqeherê. Feqet dema go kotekî werê ez ê bê ma ez ê çi kim.)

Vêca mîr ew bûk bir, bire mala xwe, bire Cizîrê. Ti tiştî xirab, gotineke xirab jî [negotîyê]. Mala wî 'elimandine çekirina xwarinê, sitrahana hevîr û pahtina nan. Çend roja hişte li wê dê û rojekê çend siwar dane pêşîyê û anî teslîmî keşa kir. Go keşa? Go ha. Go ez dizanim ti gelek xemgîn bûyî, ez zanim ti gelekî 'erzşikestî bûyî ser vê kirina mi. Feqet sirf mi go bila bûka te herê kufletê mala mi, kebanîya mala mi bi'elimênê sitrahana hevîra û çekirina nana û xwarinê. Mi ji vê ra bi xwe ra bir. Vêca eger ku ez mîrê Cizîrê bûm zaten weke keşa mi bû. (Ev mîr kîjan bû ez nizanim feqet ez texmîna Mîr Amiddîn dikim.) Go bila keşe bizanibê mi ji bo vê bir û hostayek baş bû, mala wê ava xizmet ji me ra kir çend roja.

Ev gund bi wî keşeyî binavkirî ye, navê keşe Hîndo ye.

Heke em nirxandinekê li ser vê vegotinê bikin em dikarin bêjin ku ev vegotin der barê Keşe Hîndo da ye, bi awayekî jî navlêkirina navê gundê wî vedibêjê. Lewra li ser serpêhatîyeka Hîndo û malbata wî ye û di heman demê da hin taybetmendîyên wî û yên wê demê jî vedibêje. Rasterast awayê navlêkirina gundî venebêje jî wan agahîyan dide bê ka ew kesê ku navê xwe daye vî gundî kesekî çawa ye û xwedîyê xislet, feraset û çandeka çawa ye. Di encamê da jî li gorî vebêjer ev xuyabûna wî dibe sedem ku ew gund bi wî bi nav bibe. Lewra bi vê pîvanê mirov dikare bêje ku ev vegotin di heman demê da vegotina navlêkirina gundî ye jî. Ji ber ku ew vegotineka li ser navê gundekî ye, ji alîyê toponîmîyê ve dibe komonîm ku cureyekî oykonîman e. Lewra oykonîm ew cure toponîm in ku navê meskenên wek gund, bajar, çewlik û hwd ên rûniştinê îfade dike.

Ev bûyer wek rast dihê qebûlkirin, cih ev dinya ye, helwest ne pêroz e û leheng jî mirov in. Her wiha tiştêkî derasayî tê da nîn e û tiştên dihêne vegotin ji jîyana rojane ya wê heyamê ne. Lê belê mirov nikare wê rasterast bi yek cureyî vegotinên gelêrî bi nav bike. Lewma ew taybetmendîyên gelek nîşan dide lê yên yekê jî tekûz nahewîne. Herî zêde wek serpêhatîyekê xuya dike û wisa dihê qebûlkirin jî lê dîsa jî ew ne çîrok ne jî memorat e ku navê “serpêhatî (serhatî)” hin caran bo van her du cureyan dihê bikarînan.

3.6. HACÎKASAN

Hacîkasan di navbera Hezex û Nisêbînê da ye û cîranê Delavê Qesrê ye. Bi awayê fermî li ser Hezexê ye û 18 km'yan ji navçeyê dûr e (mesafe.hesaplama.net). Cihê vî gundî dibe aqarê eşîra Hemika lê belê berîya 100-150 salî şênîyên îro hatine lê bi cih bûne ku ji eşîra Kerreşa ne û ji gundê Kerreşa yê li ber Çemê Dicleyê hatine vir. Gundîyên cerdevan, kurdên sunnî û kurmancîaxêv in. Serhejmara gundî li gorî daneyên 2020an 831 e (TÜİK, 2020). Gundî debara xwe bi karkerîya însaatê, sewalkarî û cotkarîyê dikin. Li vir der barê gelîyekî û mextelekê da du vegotin hatine berhevkirin. Vebêjerê her du vegotinan jî heman kes anku Hecî Smayîlê Mihbo ye.

3.6.1. Gelîyê Piling

Ev gelî di navbera Hacîkasan û Kêla Hemika da ye. Li gorî gotinan li wir pilingek hebûye ku ji bo kesên vê herêmê xetere bû. Hecî Smayîl wiha neqil dike vê behsê:

Wextê bapîrê me ji Kerreşa xwînî bû ji ber Mîrê Bota bazda. Şeş bira bûn, dido mane li Kerreşa, dido hatin çûne bi rexê Mêrdînê da, herdikê dî hatin xwe li Mendo girtin; Mendo di Delavê Qesrê da bû. Herdû hat[i]ne cem, axir qederekê man meyzandin go wî havîna di xanîya da dirazihin. Go çima halo win di xênî da dirazihin? Go hera bi Xwidê dahbekik heye tê zarokê me direvênê. Ew dahbe piling bû vêca ev Gelîyê Piling bi wî bi nav kirine. Vêca herdû di şopa wî ra tene Kevîrê Boş,⁶⁶ berî xebera Mendo tene. Şopa wî ji Gelîyê Piling derdikevê di wir ra tene Delavê Qesrê. Hêdika ew herdû jî diçin xwe dikine pêşîyê da [pêşîya piling] xwe li ber diveşêrin. Hingî bê ka sîlehê wa çi bûn, wextê ew dahbe tê herdû tîfingê xwe tavêjinê ji qudreta Xwidê lê d'din dikujin. Dikujin dibin. Dibê kê ev nêçîra ha kirîye, kê ev dahbê ha kuştîye? Dibê Wele Hesênê Qerêş û Şêxmûsê Qerêş kirine. Vêca [Mendo] dibê ka ma em hedyâ wa çi bidine wa? Dibê keça xwe bidîyê da, dirabê keça xwe didîyê da. Keçeke xwe lê mahr dikê û ew jî dimênê li wê derê. Vêca rabû go hera hema em ê vê zivînga ha dine we (behsa Hacîkasan dikê). Hemikî û Hasînî⁶⁷ dijîminê hev in dibê em ê di zîlamê qenc kine tixûbê xwe û wa da ji bo wîlo wa [Hesen û Şêxmûs] dikine va şikefta da.

Axir serê te neêşênim bê çiqasî dimênine tê da, keçikê Hemika tene çîyê; tene kêrdî, tene kerenga... Tene Hewtê Qeşmer,⁶⁸ bihara wa av diketîyê da, vêca sewalkê wa li ser bû, li devê wî limêj dikirin... Hesênê Qerêş jî li devê hewt e, keçikê Hemika tene heke tene kêrdî heke tene kerenga ça'v lê dîkin (xortekî spehî ye) hin dibê xwizî tîyê me bana, hin dibê xwizî nîza çî me bana... Ew jî dibê xwe ji wî mîrî bikişênin (haşa) yê weke min ê ji we da kevin. Dişa wî ne di nav wa da ye! Dişa wî his dikê diçê dibêjê bavê xwe. Dibê yabo! Dibê çi ye? Dibê te fa'lekî keçikê Hemika kirîye dera ha da! [Dibê] çi ye keçam? Dibê hal û meselê me û wî ev e.

'Eyd bi ser da tene (ma'lûm e ev xanî nebûn, di va şikefta da bûn kulava derdixin û li wa bêndera rast dîkin) dibê [Mendo] dirajê kulavê wî û cilê wî tavêjê [yê Hesênê Qerêş]. Dibê mi ti ji vê dê xwînî kirîye, heta ti rîqanîne hebanî li der qûna jîna xwe nedê ez te nahewênim! Wextê wîlo dibêjê tene der, diçê 'Erebanê.⁶⁹ Heft sala li 'Erebanê dimênê. [Rojekê] yekî ixtîyar dibê birazî çi bela te ye? Tî mexdûr î, tî xwînî bûwe, çi bela te ye? Dibê hal û meselê min û xezûrê mi ev in. [Yê ixtîyar] dibê malava sehl e! Ha

⁶⁶ Navê cihekî ye li Delavê Qesrê.

⁶⁷ Du eşîrên vê herêmê ne.

⁶⁸ Navê cihekî ye li Hacîkasan.

⁶⁹ Gundekî Hezexê ye ku di navbera Hezex û Midyadê da ye.

va 'eyd a hat rabe di qetê hebana çêke bila [jina te] li bin xiftanê xwe bidê û go çû binê Tûka Hesên⁷⁰ bila xiftanê xwe hildê [Mendo] wê bînê îde 'îşê te jê nebê! Ew jî [pîrek] 'eydê tê diçê mala bavê xwe, diçê 'eyda bavê xwe, xiftanê xwe li xwe diqulibênê. [Mendo] dimeyzênê go heban î lê, dibê keça'm xiftanê xwe berde! Carekê dî dibê [e]m ê çine pey mala Hesênê Qerêş û tîne dîsa dikê Hacîkasan da.

Em dikarin van tiştan bibêjin li ser vegotina Gelîyê Piling:

Her cihê cografîk ê binavkirî yan li gorî taybetmendîyên xwe yên fîzîkî yan jî bûyereka ku li wir qewimî dibe xwedîyê vî navî. Weke ku ji navî jî xuya dibe û vebêjer jî dibêje ev der gelîyek e ku ji rûdaneka li wir navê xwe girtîye. Ji alîyê toponîmîyê ve jî mînakê oronîman e.

Çi rast çi çêkirî ev vegotin li vê herêmê wek rast dihê qebûlîkirin, der barê cih û kesên dîyar da ye û karakter jî mirov û jîndar in. Dem nêzîk û mekan jî dinyaya niha ye ku ev taybetmendîyên efsaneyan in lê belê ji ber ku derasayîbûn tê da nîn e ji efsaneyan dûr dikeve. Ji ber ku ev kesên behsa wan dihê kirin kesên rast in (anku ne karakterên çêkirî ne) mirov dikare wek serpehatîyekê qebûl bike lê belê piştrastkirina wê ne mimkun e. Vebêjer jî vê vegotinê wek “mesele” bi nav dike ku ji alîyê teorîk ve wek cureyekî çarçoveyek jê ra nehatîye danîn.

3.6.2. Mextela Evlê Saro

Ev vegotin li ser cihekî lokal e ku yekî bi navê Evlê Saro lê hatiye kuştin. Gelek devêrên halo (anku mextel) li vê derdorê peyda dibin û ew bûyerên ku qewimîne ne di demên gelekî dûr da ne. Vebêjerê “Gelîyê Piling” vê bûyerê wiha neqil dike:

Bavê mi wa go em li ber pêz bûn go me ji cem pîrekkê mewîj anîbûn go me gîskik qusa [hirîya wê] li ber kir. Go 'Evlê Saro serê meqesê xwe halo di nav geyê ra bire kevîya mêzînê û her hermetê mewîj lê kirin, lê kirin... Bavê mi go mi go de bes e xuha mi hema raje keja xwe [û here] (ma'lûm e meqes danîbû ser mêzînê). Go bi Xwidê ['Evlê Saro] mewîjê xwe dixwarin û kom di Kêla Biçûçik⁷¹ da bû. Ketibû serê Kêlê da û ketibû Warê Şêx⁷² da. Koma vî rexê Hasina û Domana wa tev da hatibû. Hatibûna talan. Vêca pezê Hemika tişta pişt Kêlê ket dane ber xwe [birin]. Herdû ['Evlê Saro û hevalê xwe] jî a bi tiving in tîne wê derê. [Hasinî] dibê hera bi Xwidê ev herd[û] zîlamê ha bi tiving derbas bibin em reda wa nabin! Em ê pêşî avêjine wa. Ê pezê Êsîyayê Silko wana ji wa derbas dibê diçê, pişt wa dikevê. Hema tavêjine herdika. Ew ['Evlê Saro û hevalê xwe] jixwe hatine kuştin û talan birin çûn. Hawara Hemika çû.

Hesênê Şêx go ez î li nav darê Kevanê⁷³ bûm go mi dî yekî hûrik (yekî Hemikî) hat, hat, hat, li binîya Warê Şêx kete kozikê da. Go yekî filih î bi mi ra bû go mi go hera ev ê hina ji me kujê! Go de lo mala te! Dûr e wê li kû [me kujê]! Go bi Xwidê carekê terqên ji tivinga wî hat go mi dî yê filih go ay dawê! (Go “dawê” yanî ûrê wî bû). Go Wele ew nehîr da 'erdê. Ê Êsîyayê Silko⁷⁴ jî sax bû di nav pêz da birin.

⁷⁰ Zemanekî tûkîk li devê Bîra Pahn hebû civata wa li wir bû. (Veb.)

⁷¹ Kaşek e di navbera eşîra Hemika û Hasina da ye û her wiha sînorê aqarê her du eşîran e.

⁷² Cihekî nêzîkî Kêlê ye.

⁷³ Tilek e di navbera Delavê Qesrê û Hacîkasan de.

⁷⁴ Êsîya yekî Hemikî ye û Hasina ew di nav talanî da bi xwe ra birine.

Ûsîya jî bi saxî bi xwe ra birin û ew herdû li wê dê hatine kuştin û ew ê filih li wa da Hemika da 'erdê û çûn hevdû kirine Kêla Berana da. Ew hawara Hasina kete wir da û ya Hemika bi wa ve qedimî. Go veka yekî Hasinî go "aaaa, stirhê me Hasina hene!"⁷⁵ Go Dêwid bakire Xelef go ça 'vê te lê bê bi Xwidê vê ga Bihemedê Ferhikê wî dê 'erdê!⁷⁶ Û go terqên ji tivinga Bihemed hat û me dî di şikêrê⁷⁷ da qulipt. Go ma li wê dê, newêrabûn werine ser laşê wî jî. Vêca Emnowa Faris; a Rîzokî⁷⁸ bû, Xelef go me gotîyê da here tivinga wî werêne, go çû û me dî carekê li kaboka xwe da go pepû[k]! (Ti nebê kuramê wê bû.) Çengê Bihemed jî birîndar bû û tiving [mebest gule ye] li quntaxa tivinga wî jî dan. Go îde rabû Heznê⁷⁹ anî mal.

Go Sêyd Mirad hat beyreq hilda go bextê qur'anê di negeba wî da bê heçîyê tivingê bipeqênê! Go Dêwid bakire Xelef go Xelef! Go çî ye? Go rabe bi Xwidê xwîn ji yekî Hasinî bê wê kurê Çaçô⁸⁰ dine ber xencera hema rabe bêxêr e! Go bi Xwidê fişekê Hasina nemabûn lê ji ber Ûsîya em rabûne ser xwe, em hatine devê Kahnîka Sedlawîya me li wê dê av vexwar û vêca cinazê 'Evlê Saro wa anîne mal.

'Evlê Saro Hemikî bû û di wê talanê da hate kuştin û niha jî dibêjine wir Mextela 'Evlê Saro, ji Kêla Biçûk û vir da ye.

Heke em vê vegotinê analîz bikin:

Kuşîna 'Evlê Saro di talanekê da dibe ku wê demê bi awayekî gelekî berbelav li talanê hev dixin û ev rûdan sedema gelek problemên sosyolojîk in. Her wiha di navlêkirina cihên lokal da jî roleka xuya wergirtine. Anku bi hin rûdanên di encama van talanan da gelek cih hatine binavkirin. Bi gotineka din gelek mextel li vê herêmê peyda dibin.

Ev vegotin rasterast navlêkirina cihekî/niqteyekê vedibêje. Lewma jî bi awayekî rasterast têkildarî toponîmîyê ye û mînaka mîkrotoponîman e. Ji ber ku ji alîyê cografîk ve tu taybetmendîyên fîzîkî yên vî cihî nîn in, mirov nikare di nav cureyên din ên toponîmîyê da bisenîfîne.

Îhtîmal e ku berîya vê bûyerê qet navekî vî cihê lokal nebû, hatibû jibîrkirin yan jî bi navekî din dihat zanîn. Lê piştî bûyeraka ku di hafîzeyê civakê da cih digire êdî navê wir jî peyda dibe yan jî diguhere. Anku bi awayekî aşkere dîyar e ku vî cihî navê xwe ji bûyerê wergirtîye û vegotin jî li ser vê bûyerê hatîye guhastin.⁸¹ Her çend 'Evlê Saro di bûyerê da karakterekî heşîfî be jî ji ber ku hatîye kuştin û bi taybetî piştî kuştina wî bûyerê geşe daye, di

⁷⁵ Di şerî da ev cure qîrdan dihê wateya zirtan.

⁷⁶ Dawid, Xelef û Bihemedê Ferhik hin mîrên naskirî yên Eşîra Hemikîya ne.

⁷⁷ Şikêr: Kevirên li ser hev komkirî anku koma keviran.

⁷⁸ Rîzok, gundê Hasina ye.

⁷⁹ Xuha Bihemedê Ferhik e. (Veb.)

⁸⁰ Kurê Çaçô Ûsîya ye.

⁸¹ Em di vir da bêjeya "honandin" yan jî "afirandin" tercîh nakin lewra ev rasterast neqîlkirineka ji devê şahidan e û hema bêje tu taybetmendîyên hûnerî jî nîşan nade.

navlêkirinê da navê wî derketîye pêş. Jixwe wek lojîk, ji bo ku cihek wek mextelê bi nav bibe divê kuştinek li wir hebe yan jî kesekî/a xuya li wir miribe.

Ji ber ku ev bûyer û pê ra têkildar ev navlêkirin ne kevin e, mirov dikare wek serpêhatî qebûl bike. Lewra vegotin bi zimanekî sade ye, bûyer ji çandeka nas e û karakter kesên rasteqîn û nas in. Kesên ku îro dijîn, ji wî nîfşî ne ku bavekî-du bavan piştî vê serpêhatîyê ye. Anku ev vegotin rasterast ji şahidên bûyerê wergirtine. Tevî vê yekê vebêjer jî di hin cihan da rasterast gotinên bavê xwe neqil dike. Ji vî alîyî ve hin taybetmendîyên memoratan jî vedihewîne.

3.7. MARÎN

Ev gundê Nisêbîna Mêrdînê gundekî kevnare ye. Gund li pişt Girê Mîra, di binya Çîyayê Bagokê da ye. 85 km'yan dûrî Mêrdînê û 29 km'yan jî dûrî Nisêbînê ye (mesafe.hesaplama.net). Gundê ku berîya niha yê suryanîyan bû, îro kurdên sunnî tê da ne. Ev gundê ku di eslê xwe da bajarekî antîk e, ji wan cihan e ku divê werin parastin. Ji ber sedemên siyasî di sala 1992yan da hatîye valakirin heta ku sala 2000an dîsa şênî vegerîyane gund vala maye. Li gorî 2020an serhejmara gundî ji 162 kesan pêk dihe (TÜİK, 2020).

Li gorî agahîyên ku vebêjer Osmanê Besikê dide, Marîn navê xwe ji keça qaranê⁸² Mêrdînê werdigire. Li gorî gotina wî pêşî qaranek bi navê Qaran Tîto li vî gundî hebûye. Piştî ku Tîto ji qarantîyê dikeve, qaranê Mêrdînê keça xwe Marya dişîne cihê wî û gund jî bi wê bi nav dibe.

Li vî gundî du vegotin hatine berhevkirin ku têkildarî toponîmîya wir in. Yek der barê zîyareteka gundî da ye, ya din jî der barê navê bestikkê da ye. Ji bilî van yek jî ji çavkanîyeka nivîskî hatîye neqilkirin.

3.7.1. Kîzên/Kêzîn

Ev cihê ku hin kes wek kîzên hin kes jî wek kêzîn bi lêv dikin di eslê xwe da bestikek e. Kîzên/kêzîn navê wê qenala biçûk e ku tiştên wek avê herikbar tê ra derbas dibin. Ev kîzên jî bi armanca bazirganîyê hatîye çêkirin. Li gorî bawerîya kesên vê derdorê, ji Marînê heta bi Mûsilê lûle hatine danîn da ku dimsê di wan ra bişînin Mûsilê. Tevî vê yekê li gorî vebêjerî niha jî dema mirov erdê bikole bermahîyên wan lûleyan derdikevin. Vebêjer Osmanê Besikê bi vî awayî vedibêje:

⁸² Vebêjer vê bêjeyê di wateya pêşeng/mîr da bi kar dihîne.

Rezê cimî'ê Midyadê û Hezexê û ew bajarê Torê hebûn û hingî dims çêdibû. Go dims çêbû rabû miştirîk jê ra çêbû go ez ê dimsê kirim. Lê em ê çilo şîyênine Mûsilê! Rabû ev kîzên danîn heta bi Mûsilê. Go kîzên danîn heta bi Mûsilê, li wê dê qapan heye vêca wê dimsê berdin. Vêca rabû bire Mûsilê, yanî dims di vir ra diberdanê, dişîyandine Mûsilê. Go kurê wî gotîyê go yabo ev ta'bike boş e! Go çima? Go her gundê wê li derba xwe qulkê di wa borîyê te kê, wê çê [vala çê]. [Bavê wî] go meyzê vî ev şeytanî anî bîra xelkê! Vêca dibê rabû şûr avête serê kurê xwe serê wî jê kir. Hê ew gotin di devê wî da serê wî jê kir. Heta hat meyza go heyloo... [Bi rastî jî weke gotina kurê wî derketîye]. Dibê hingî "hasil negihaye Mûsil." Yanî ji wê dimsê hemikê hasil negihaye Mûsilê. Hasil yanî ji deha yek e.

Vêca ji wir ra dibêjin kîzên, îro jî ti lê bixebitê devera go xira nebûye ew borî wê derkevin. Di vir ra diçê.

Dema em berê xwe didine vê vegotinê xuya dibe ku ev vegotin li ser navê bestikekê ye lê belê fokus ne li ser bestikê li ser wan lûleyên çêkirî ye. Heke mirov wê, ji vê xeta lûleyî ya çêkirî xweser anku wek bestikê bihesibîne ew dibe nimûneya potamonîman ku cureyekî hîdronîman e. Lê ji ber ku ji bilî awayê xwezayî xeteka sînî jî heye û fokus li ser vê xetê ye, ev cih dibe dromonîmek ku navê rê û xetan îfade dike. Bi çêkirina van lûleyan fonksîyonek hatîye armanckirin û bi vê fonksîyonê jî nav li vî cihî hatîye kirin.

Di derketina vê vegotinê da du îhtîmal hene. Yanî hem pêkan e ku vegotin li ser hebûna vî cihî hatibe afirandin, hem pêkan e ku ev cih bi vê vegotinê hatibe wekhevîkirin û bi vî awayî armanc xurtkirina vegotinê be. Şêwaza vegotinê xwerû û ji rêzê ye. Li gorî çavdêrîyên me, vebêjer jî di nav da gelê vê derdorê ji rastîya vê vegotinê bêşik e lê belê helwesteka pîroz û hwd nayê nîşandan. Der barê cihekî dîyar da ye lê belê karakter ne kesên dîyar in. Raxistina lûleyan ji vî gundî heta bi Mûsilê tiştekî dûrî aqil e anku derasayî ye. Lê dîsa jî kêmtaybetmendîyên efsaneyan vedihewîne. Zehmet e mirov wek serpêhatîyê jî bi nav bike lewra karakter ne kesên dîyar in û piştrastkirin ne pêkan e. Her wiha vebêjer jî vê vegotinê wek mesele bi nav dike.

Ev vegotin dersekê vedibêje û di encamê da bi wê gotina qalibgirtî ve dihê bestin ku dibêje "hasil negiha Mûsil" yan jî "hasil giha Mûsil". Jixwe li gorî bawerîyê ev biwêj jî ji vê rûdanê derhatîye. "Hasil giha Mûsil" gihîştina armancê; "hasil negiha Mûsil" jî rewşa bereksî wê îfade dike. "Hasil" jî dihê wateya parek ji deh paran ku pîvana zikaya îslamê jî bi vî awayî ye. Hebûna dersê jî vê vegotinê ber bi memoratan ve dibe lê belê ew ne tecrûbeyeka şexsî ye û qaîdeya zîncîra memoratbûnê jî di asta bilind da dişkîne lewra ew neqilkirineka ji demên berê ye.

3.7.2. Şikefta Şoxirdîn

Ev vegotin li ser zîyaretaka pîroz e ku li gundê Marînê ye. Gelek tirbên vê zîyaretê di şikeftekê da ne û nêzîkî zîyaretê mizgefteka biçûk heye. Di nava vê şikeftê da hicra şêxekî jî

cih digire ku wek Şêx Nûredîn dihê binavkirin lê navê “Şêx Nûredîn” bi demê ra deforme bûye û niha wek “Şoxirdîn” dihê bilêvkirin. Osmanê Besikê wiha vedibêje:

Şêx Nûredîn û Mazil'evdîn ji kurda bûn. 'Ereb bi wa hisahan go xwe li şêxîti qewimandine. 'Ereba rabû hicûmî wa kir go em qebûl nakin ji kurda şêx rabin. Hêdîka rabû meyzandin çara wa nema, nema karîbûne 'ereba, baz dan. Go baz dan, hezar siwar bi siwarî kete pey wa û ew jî li hespê xwe siwar in bi siwarî baz didin. Hema zanin go telpa tozê xilbe ye. Meyzandin nêzikî dora Nisêbînê bûn, hatne cem Mêr Yaqûb. Go hatine cem Mêr Yaqûb go mesela me ev e, ev e; (cihê wî hebû) hilandin. ('Ereb) hatin, hatin; go gihane Mêr Yaqûb go [ka] ew zilamê siwar a go hatin di vir da man? Mêr Yaqûb go heyra mi kes nedîtîye! Go çawa! Ma di kû ra çûn? Zor danê. Go zor dana Mêr Yaqûb, go ha ew çîyayê ha go ti dibînê nîn e? Go erê. Go ha ew siwar çûne wî çîyayî. 'Ereb çûne çîyê jî tiştek nedîtîn. Vegerehan hatin kurê Mêr Yaqûb dane 'erdê û kêr dane sikurê da serê wî jê kin ji bonî bêjê. [Mêr Yaqûb] go heyra heft kurê min in go ti her hefta bigurênê ev îsan nîn in. Heta wilo liçik xwîn jê anîn jî yekî jê go na, wextê go hebana wî bêjê. Vegerehan.

Mazil'evdîn bêhnfereh bû, lefzê Şêx Nûredîn teng bû. Ji ber hev derxistin da heke Xwidê nekê tiştek çêbibê yek ji wa xilas bibê ('ereb a hê di pey wa da ne). [Mêr Yaqûb], Mazil'evdîn li ba xwe hişt û da pêşîya Şêx Nûredîn û hate cem qaranê Marîne. Qaran jî navê wê Marya ye keça qaranê Mêrdînê ye. (Di keçe qaran hene Marya û Mardîn. Marîn bi Marya bi nav dibê û Mêrdîn ji bi Mardîn.) Marya gotîyê go ma ti da'wa çi l'mi dikê? Go ez dixwazim go ti vî şêxê kurmanç bihewênê ba xwe. Go çima? Go mi xwe l'ser wa kirîye û îsanê go xwe avêtine Dêra Mêr Yaqûb wextê go îro em qîmet nedîne va îsana dêmek em nabine tiştek! (Yanî dixwazin xwe bikne filihstanî; suryanil qedîm.) [Marya] go bera, ser ça'va, ez ê wa hewênim. Lê belê ez bajarê ava nadime wa cihê xelkê ye, lê aha ji vê mehelê û halo [bila ji wa ra bê]. (Di kelehê ra û vê bestika cem xaniyê me ra, di ba Dêra Çilderî ra⁸³) go ev miqam xirabe ye şikefta ji xwe ra tê da bikolin. Ji xwe ra tê da çêkirin.

Vêca cebanê Şêx Nûredîn li wir e ama di şikeftê da ye. Cihê fereh e, hezar tirb tê da heye (û miqamê wî jî niha mi kesk girtîye ser). Vêca ew Şêx Nûredîn bû xwidîyê Marîne û ew Mazil'evdîn bû xwidîyê Nisêbînê. Dibê Mazil'evdînê Nisêbînê û Şêx Nûredînê Marîne. Dewlet Xwidê serê Mêr Yaqûb ev herdû bûne xwidîyê ewê.

Hin kes vî cihê wek Şikefta Şoxirdîn, hin kes jî wek Zîyareta Şoxirdîn bi nav dikin. Lewma heke mirov wek zîyaret qebûl bike dibe gorodskoy horonîm ku cureyekî urbonîman e û navê zîyaretên aîdî bajaran îfade dike. Helbet divê neyê jibîrkirin ku Marîn di eslê xwe da bajarekî antîk e da ku ev senifandin tekûz bibe. Lê heke mirov vî cihê tenê wek şikeftê qebûl bike wê demê dibe speleonîm ku cureyekî oronîman e. Speleonîm ew cure oronîm im ku wek şikeft, kendal, bestik û hwd di binê erdê da bi awayekî xwezayî çêbûne. Di vir da pîrsgirêk ew e ku ev şikeft ne di bine erdê da li ser erdê ye û hatiye çêkirin yan bi awayekî xwezayî çêbûye ne teqez e. Her wiha çi şikeft çi zîyaret, ev cih jî weke gelek zîyaretan navê xwe ji vî şêxî digire. Anku cih bi kesî bi nav bûye.

Ev vegotinek ji dîrokê ye lê belê rastîya wê nehatiye piştrastkirin. Der barê cih û kesên dîyar da ye û helwesta ku ji bo van kes û mekanan dihê nîşandan li ser pîrozîyê ye. Tevî vê yekê li gorî bawerîya kesên ve herêmê bi rastî vê bûyerê rû daye. Ev taybetmendîyên efsaneyan in lê

⁸³ Hin cihên li Marîne ne.

belê ji ber ku derasayîbûn kêr dimîne ev vegotin nabe efsaneyek. Li gel van taybetmendîyan, her çend bi rasteqînî (yan jî wisa qebûlkin) û qebare û bertengîya mijara xwe bişibe hikayeyên gelerî jî ji ber ku tekst tenê pexşan e nakeve çarçoveya vî cureyî da.

3.7.3. Dêrmarok (Mor Evgîn)

Ev vegotin ji pirtûkçeyeka bi navê *Efsanelerden Masallara Mardîn* hatiye wergirtin. Pirtûkçe di çarçoveya projeya geştûgerîya da hatiye amadekirin û nivîskarê wê Mesut Alp e. Di beşa pirtûkçeyê da ku behsa Mor Evgîn dike nivîskar dibêje me ev agahî ji çavkanîyên nivîskî û peywirdarên dêrê wergirtine (Alp, 2015: 44). Di pirtûkçeyê da jî û bi awayê fermî jî navê vî dêrê wek Manastira Mor Evgînî derbas dibe lê belê li gundê Marînê û derdorê wek Dêrmarok dihê binavkirin û naskirin. Li gorî gundîyan dema ku ev nav lê hatiye kirin navê keşeyê wê demê Marok bû lewma dêr bi wî bi nav kirine.

Bi halê redaktekirî nivîskar wiha behsa Mor Evgînî dike:

Mor Evgînê ku bi eslê xwe ji Girava Kluzma ya welatê Misrê bû, xizmeta rûhanî û kûrbûna rûhî ji xwe ra kiribû huner. Li girava ku lê dijîya noqî avê dibû, mircanên ku derdixistin difirotin û pereyên ku qezenç dikirin didan dêr, xilwetxane û feqîr û hewceyan. Bi saloxan piştî kûrbûna rûhî ya bîst û pênc salan êdî bi saya stêreka ku bi îlhameka îlahî didît, dikarî li ser ava behrê bimeşe weke ku li ser erdê be. Li gorî rîwayetê carekê, wextekî şevê Mor Evgîn çû Çiyayê Cûdî, pirxwedayîyên (pagan) li wir vexwendin ser dîne îsevîtiyê û ew tafil (vaftîz) kirin. Di dema vegerê da nêzîkî Bethzadbayê (Cizîr) li Çemê Dicleyê rast hat lê ji bo ku bi hevalên xwe ra derbasî alîyê din bibin keştîyek peyda nekirin. Lewma ser avê ra meşî û dema giha nivê avê li pişt xwe nêrî ku deh hevalên wî jî li pey wî dihên.

Dema li Misrê bû di demeka kurt da navê wî li hemû giravên derdorê berbelav bû. Ji ber dîlnizmîya xwe Mor Evgîn ji vî şohretê aciz dibû û xwest biçe cihekî ku lê neyê naskirin. Çû xilwetxaneyê Beth Fakum. Ji ber ku bi cil û bergên ji rêzê çû xilwetxaneyê, rahîban ew nas nekir. Lê li vir jî di demeka kurt da hate pileyeka bilind, lewma bêrîya ku kes pê bihesê ji vir jî veqetîya. Li gel heftê û du rahîbên ji Misrê hate heta bi çemê Moşoxê ku li Nisêbînê ye. Qefîleya ku her diçû mezintir dibû, di başûrê Nisêbînê ra derbas bû, li kêleka cihekî biqamîş bi cih bû û heft rojan ma li vir. Mor Evgîn li vir rihê xirab ji rihê zilamekî qewirand ku sih û sê sal bûn li wir dijîya. Ev mucîze di demeka kurt da belav bû û li ser vî yekê gelê Nisêbînê hemû hate pey Mor Evgînî û jê lava kirin ku bikeve bajarê wan da. Lê ji ber ku Mor Evgîn kesekî dîlnizm bû li gel rahîbên bi xwe ra wê şevê ji wir veqetîya. Dema ku gihan gundê M'aare/Marînê yê li Çiyayê Îzlayê (Bagok) û di şikeftê da bi cih bûn hejmara wan gihabû sêsed û pêncî kesî. Ev şikeft sih salî bû mal ji bo wan.

Mirov dikare van tiştan bibêje li ser vî vegotinê:

Ev cih ji alîyekî ve dibe meskenê rûniştinê çiku ev kes hatine li wir bi cî bûne û jîyane; ji alîyê din ve dibe sazî çiku ew manastirek e û di çarçoveyeka dîyar da peywîrek girtîye ser xwe. Lewma heke mirov vî manastirê wek meskenekî qebûl bike dikeve kategorîya oykonîman da, lê heke mirov wek sazîyekê qebûl bike dibe ktemtonîm ku cureyekî urbonîman e. Wek ku ji navê Dêra (manastir) Mor Evgînî jî dîyar dibe vî cihî navê xwe ji kesekî wergirtîye. Anku cih

bi kes bi nav bûye. Her wiha ji bo navê “Dêrmarok” jî heman tişt derbasdar e. Bi vê nêrînê jî mirov dikare bêje ku behsa Mor Evgînî (yan jî Marokê Keşe) di heman demê da toponîmîya vî cihê jî vedibêje.

Vegotin rast yan jî xeyalî bi kes û cihekê dîyar ve dihê girêdan, mekan ev dinya ye û li gorî bawerîyê rast e ku ev taybetmendîyên serekê yên efsaneyan in. Lê belê heyberên derasayî tê da nîn in. Hin kirinên Mor Evgînî yên wek meşa li ser avê derasayî bin jî ev têrê nake ku vegotin bibe efsaneyek. Herî zêde mirov dikare bêje ev kirin mucîzeyî ne û vî kesî dikin kesekî efsaneyî. Bi hin çavkanîyên nivîskî hebûna vî kesî, bicihbûna wî û hin bermahîyên ku behsa wan dihê kirin (wek selîbeyî darî ya niha jî li dêrê) nîşaneyên rasteqînîyê bin jî ne mimkun e hemû bûyerên ku behsa wan dihê kirin werin piştrastkirin. Lewma bişibe serpêhatîyan jî mirov nikare navê cureyî misoger bike.

3.8. MEZRA SEYÎDA

Gundekî Nisêbînê ye ku dikeve navbera Nisêbîn, Midyad û Hezexê da û binya Çîyayê Bagokê da. Gundê kevin kaviil e lê vê dawîyê li kêlekê, gund ji nû ve hatîye avakirin. Gundî seyîd in û ji eşîra Seyîdan in. Şênîyên gundî debara xwe bi cotkarî û sewalkarîyê dikin. Gundekî din ku cîranê Mezra Seyîda ye û têkildarî vegotina berhevkirî Kelha Hêtim e, gundê Sêrwanê ye. Lewra mirov dikare di Sêrwanê ra jî biçe Keleha Hêtim û di vegotinê da jî ev gund wek rêgehekê derbas dibe. Şênîyên vî gundî jî Mala Serhan in ku li gel sewalkarîyê bêtir çandinîyê dikin. Ew jî weke Mezra Seyîda gundê kevin kaviil e lê li kêlekê gundekî nû hatîye avakirin. Şênîyên her du gundan jî kurdên kurmanç û misilman in.

3.8.1. Kelha Hêtim⁸⁴

Li ser toponîmîya vî gundî der barê kelehekê da vegotinek hatîye berhevkirin. Ev keleh ne di nava gund da ye, li Çîyayê Bagokê ye û têra xwe jî ji gundî dûr e lê belê di aqarê Mezra Seyîda da ye. Li gorî gotinan xwedîyê vê kelîhê kesekî bi navê Hêtim e ku di heman demê da pêşengê gelê xwe ye. “Hatêmê ku mezinê qebîleya Tay e helbestvanekî girîng ê serdema cahilîyeyê ye û kunyeya wî Hatem bin Abdullah bin Sa’d et-Tai el-Kahtani ye. Dîroka jidayîkbûn û mirina wî nayê zanîn lê li gorî texmînan piştî çêbûna Pêxember Mihemed bi heft salan, anku di sala 578an da mirîye” (rne.com.tr).⁸⁵

⁸⁴ Navê vî kesî li vê herêmê wek Hêtim dihê bilevkin lê di çavkanîyê nivîskî da wek Hatem derbas dibe. Îhtîmal e ku “Hêtim” awayê tewandî be lê êdî nav bi tena serê xwe jî bi vî awayî dihê bilêvkin.

⁸⁵ <http://www.rne.com.tr/portreler/hatem-i-tai/> (Dîroka gihiştinê: 01/03/2021).

Hêtimê ku bi merdî anku destvekirîya xwe li cografyayeka berfireh bi nav û deng e, di dorpêçkirina kelehê da heft salan li ber xwe dide. Tam wextê ku dê bi zîrekîya xwe bi ser keve, bi îxaneta xwarzîyê xwe têk diçe lê belê ev têkçûn tiştekî ji navdariya wî kêr nake.

Merdî, rasteqînî, şohret û alîyê efsaneyî yê Hêtimî di *Mem û Zînê* da jî derdikeve pêşberî me ku Ehmedê Xanî navê wî bi yê Rustemê Zal ra hildidêre. Dema Xanî di *Mem û Zînê* da pesnê kurdan dide, di malika 219an da behsê dihîne ser destvekirîya Hêtimî ku her mîrekî kurdan dişibîne wî:

“Her mîrekî wan bi bezlê Hatem

Her mîrekî wan bi rezmê Rustem” (Dost, 2010: 132).

Di van risteyan da Xanî her mîrekî kurdan wek Hêtimî merd û her mîrekî wan jî wek Rustem şervan pênase dike. Di du malikên pêşdetir da (374 û 375) dîsa navê Hêtim hildide ku destvekirîya wî hempayî mêranîya Rustemê Zal dinirxîne:

“Muhtacê sexaweta wî Hatem

Mexlûbê şeca’eta wî Rustem

Hatem ji kemalê himmeta wey

Tomarê sexaweta xwe kir tey” (Dost, h.b.: 175).

Hêtimê Teyî ku têra xwe bi nav û deng e li vê herêmê jî bûye mijara vegotinên gelêrî û kelehê li vê herêmê wek ya wî dihê qebûlkirin û bi wî dihê binavkirin.

Xelîlê Mexso vegotina Kelha Hêtim wiha neqil dike:

Hêtim, î Teyî bû, ‘eşîra wa digo Teya. ‘Ereb bûn lê heme ne ahlê îmanê bûn, ne misirman bûn. Vêca dibê Hêtim⁸⁶ zistana xwe dihilda vî qelaçî, ji wê derê digirt û ji wê ve heta ber bi Bagokê diçû derba Nisêbînê û ji vir ve jî dihate heta bi derba va gunda, va zivîngê banî û xwe bi qûna qelêç ve jî zemt dikir. Go digo “Wele xweş wetan e lê teng e”, hingî miletekî wilo boş bû. Ew jî [Hêtim] melik bû. Vêca şixwe kitêb dibêjê, dibê dowe merd ji misirman rabûne û dido ji kafira. Vêca ew Hêtimê Teyî, wextê Xwidê nû dayî singa dîya xwe negirt. Vêca ne insanê bîrewer man ne rimildar man... Ji zîlamê bîrewer, zîlamê aqillî, ji petrika, ji zana dipirsîn digo çima ev kurik singa dîya xwe nagirê? Go yekî ‘alimê îslamê go bila dîya wî zarokke xerîb bavêjê ser singa xwe, singa xwe bikê devê ya xerîb da û ya

⁸⁶ Ji navê mezinê eşîrê mebesta vebêjerî eşîr giştî ye.

dî bikê devê wî da belkî bigirê. Negotîye wê girê jî digo belkî bigirê. Vêca wextê singa xwe kire devê zaroka xerîb da û ya dî kire devê wî da girt. Dibê heta ji şîr vebû vîqasî go ne dîya wî zarokke dîtir avêtibana ser singa xwe û singa xwe kiribana devê wî da, go ne pê ra xwaribana, [Hêtim şîr] nedixwar. Vêca heta go bi xwarinê ket go ne hineka pê ra xwaribana, xwarin nedixwar. Xwidê Ti'ela firşikê wî ji merdîyê çêkiribû. Heta mezin bû, bilox bû, giha bû melik (hingî malê wî jî zehf çêbûbû), dibê hinek çûbana cem kehrekî, bizinek dida; çûbana bizinekê, nêhrîkik dida; çûbana nêhrîkkî mihek dida; çûbana mihekê, beranek dida; çûbana beranekî, golîkik dida; çûbana golikkî, çêlekik dida; çûbana çêlekkê, gamêşek dida. Her tişta qîmetlîtir didayê da, hingî wilo merd bû.

Vêca rojekê miletê wî gotîyê da ya Hêtim! Ma ka te hineke ji xwe comerttir dîne? Go a. Go kî bû? Go e[z] li kurîkkî sêwî qesidîm, dêkke wî hebû û deh pezê wî bûn, go ew ji mi merttir bû. Go ma çima ji te merttir bû? Go bizinek ji mi ra gurand û tişta hate xwarin anî li ber mi danî. Go mi rahişte parçek goşt, mi go ji goşt hemûwî ez hi'j vî parçeyî dikim. Go berî ez rabim derketîye her neh bizinê dî jî gurandine û ew her neh parçe ji wa laşa kirine û çêkirine anîne ber mi. Go heta ez pê da xeyidîm mi go heme mi go ez hi'jê dikim ma [e]z î xilas kim! Go ne te go ez hi'jê dikim mi go da qene ti têr bixwê. (Kurik bixwe Hêtim nas nakê, bavê wî nîn e û wilko sîpelokî ye.) Go aha ew ji mi merttir bû. Go ma mekafata wî te çi dayê da? Go mi sed pez dayê, mi sed dewar dayê, mi sed gamêş dayê. Go ne va te gelek dayê da! Go na. Go mi da, mi nizanîbû mi ji kû da, lê wî deh pez ji bo xatirê deh perçe goşt gurandin.⁸⁷

Vêca dibê heft sala (e[z] nîza ne 'eskerê siltana ye, ne ka kîja dewlet) maye li ser wê kelhê safî nekirîye. Go safî nebû [lê] tişteki di ser da nema. Go rabû ji axurê dewara çengik ce da hevdû, hêrtin kirne nan û dêlikê jî zabû şîrê wê dohtin kirne mast û şîyandine nav wî 'eskerê go li ser kelhê. Go ['esker] go kuro va ye hê di nav da bihar e! Wele çare tê da nîn e em nikarin safî kin, hê mêst û şîr dixwe! [Halbekî] tişteki nemabû. Vêca 'esker ser rabû hate vê Sêrwana ha. Xwarzîyê wîna xayîntî lê kir (heke ji nêza xwe, heke go da qene ez xwe xilas kim) hat li Sêrwanê giha 'esker go Wele hal û mesele ev e. ['Esker] lê vegereha ma'lûm e tişteki di ser da nemabû safî kir [Hêtim jî] kuştin. Aha mesela wî jî ev e.

Em dikarin vê vegotinê wiha binirxînin:

Urbonîm ew cure toponîm in ku navê rez, bexçe, pir, keleh û hwd vedibêjin. Di vê çarçoveyê da Kelha Hêtim dibe mînak urbonîman lê belê şert ew e ku ev cih aîdî bajaran bin. Her çend ji vî alîyî ve ev keleh ne aîdî bajarekî xuya bike û ji ber vê yekê ji pênaseyê dûr bimîne jî dîsa divê mirov wê wek urbonîmekê qebûl bike. Lewra wek ku ji neqilkirina vebêjer jî dihê fêmkirin di dema xwe da ev keleh bixwe di statuya bajarekî da bûye.

Ji alîyê awayê navlêkirinê ve jî pîvan ew e ku cihî navê xwe ji kesî wergirtîye. Ev keleh berîya Hêtimî hebû yan ji alîyê wî ve hatîye çêkirin cihê nîqaşê ye. Lewra li gorî Süleyman Tülücü wî jîyana xwe li Gelîyê Hâil derbas kirîye û niha jî gora wî li wir e (Tülücü, 1997: 472). Heke ev agahî rast be wê demê mirov dikare bêje ku ev keleh jixwe hebûye û ev vegotina gelêrî li ser vî cihî hatîye afirandin. Helbet ev yek jî îhtîmal e lê hasilî her çawa be ya aşkere ew e ku keleh bi Hêtimî hatîye binavkirin û dihê naskirin.

⁸⁷ Ji bo varyanteka din a vê beşê bnr: <http://www.rne.com.tr/portreler/hatem-i-tai/>

Rasteqînîya lehengên mirov, mekanê dîyar û hebûna bûyerê ew taybetmendîyên vê vegotinê ne ku bi yên efsaneyan ra hevpar in. Lê çima ku derasayîbûn taybetmendîya sereke ya efsaneyan e û di vê vegotinê da jî derasayîbûn nîn e ew nabe mînak bo efsaneyan. Li gorî bawerîya gelê vê herêmê, Hêtim nêzîkî pênsed salî jîyaye ku belkî mirov karibe vê angaştê wek taybetmendîyeka derasayî binirxîne. Her wiha weke Adem û Nûh gelek kesên ku di hafizeya civakan da bi vî awayî cih girtine, layîqî temenekî dirêj hatine dîtin û bi vê angaştê bûne kesên efsaneyî. Weke ku ji hevoka dawî ya vebêjerî jî dîyar dibe, ev vegotin wek mesele dihê binavkirin. Ev navlêdanîn jî dîyardeya wê ye ku li gorî vebêjerî (û giştîyê civakê) ji rastîya wê şik û guman nîn e.

Ev vegotin jî wek destanan li ser kesekî îdeal û rêvebirê civakê ye lê belê ji ber ku şerê behs li ser e, ne di navbera lehengî û afirîdeyên derasayî da ye, wek cure li derveyî destanan jî dimîne. Ji alîyê mijarê ve bişibe Keleha Dimdimê jî sehneyên şexsan bi hûrgulî nahên vegotin, vegotin ne li gel enstrûmanekê ye û ji alîyê qebareyê ve jî li gorî cureyê destanê kurt dimîne. Her çend hîkayeteka der barê kesekî û qehremanîya wî da be jî tekst tenê pexşan e. Di hin varyantên din da beşên menzûm hebin jî varyanta ku me berhev kirî ji vî alîyê xwe ve nabe destanek.

3.9. NISÊBÎN

Nisêbîn navçeya Mêrdînê ye ku ji alîyê rojava ve cîranê Qoserê, ji alîyê rojhilat ve cîranê Cizîra Şîrnexê, ji alîyê bakur ve cîranê Midyadê û ji alîyê başur ve cîranê Qamişloya Binxetê⁸⁸ ye. Ev navçeya dîrokî ku gelek caran dest guherîye û bûye paytexta şaristanîyan li ser rîya Hevrîşîm a dîrokî ye. “Hemû riyên ku Asyayê bi Derya spî ya Rojhilat ve û Mezopotamyayê bi Rojhilatê Anatoliyê ve girêdidan heyamên berê di vir re derbas dibûn” (Tanhan, 2005: 89).

Li gorî daneyên 2020an serhejmara navçeyê 111.674 kes in û 81 gundên wê hene (TÜİK, 2020). Nisêbîn li binya Çîyayê Bagokê û di deştê da cih digire ku bi giştî “pîvana erda wê 1.177 km² ye û 2/3’yê wê deşt e, ya mayî çiya ye” (Tanhan, h.b.: 89).

Li navenda Nisêbînê bi navê Mizgefta Selmanê Faris mizgeftek heye. Vegotina ku li vir hatîye berhevkirin hin serpêhatîyên Selmanê Faris vedibêje. Ev serpêhatî di encamê da bi

⁸⁸ Li vê herêmê Rojavayê Kurdistanê wek “Binxet”ê jî dihê binavkirin.

navlêkirina mizgeftê ve dihêne girêdan ku bi vî awayî mirov dikare di warê toponîmîyê da binirxîne.

3.9.1. Mizgefta Selmanê Faris/Selmanê Pak

Di dîroka dînê îslamê da Selmanê Faris navekî girîng e. Selmanê Faris bi eslê xwe ji gundê Ceyê ye ku li ser Isfehana Îranê ye û navê wî yê berî bibe misilman Mâbeh b. Buzahşan b. Murselan b. Behbuzan b. Firuz b. Suhrek e (Aytekin, 2017: 30). Li ser dîroka jidayîkbûna wî di çavkanîyan da agahîyek nîn e lê li gorî texmînan piştî Hz. Mihemed bi 5-10 salan, anku di 571ê da hatîye dinyayê (Altay, 2008: 14).

Selmanê Faris di nav malbateka mecûsî da dihê dinyayê, piştra îsevîtîyê ji nêz da nas dike û piştî koça Hz. Pêxember a Medîneyê dibe misilman û sehabîyekî girîng (Altay, h.b.: 15). Li gorî vebêjer ev mizgeft mekanê Selmanê Faris bû lewma jî bi wî bi nav bûye lê li gorî Alp dema ku Selmanê Faris dihê Nisêbînê ne misilman lê îsevî ye. Lewma jî dibêje ne pêkan e ku Selmanê Faris li Nisêbînê mizgeftê çêkiribe yan jî wek mekan tê da bi cih bûbe lê îhtîmal e wek nîşaneyê qedirpêdanê gel li ser navê wî ev mizgeft çêkiribe (Alp, h.b.: 62).

Vebêjerê ku nexwestîye navê wî were parvekirin der barê Selmanê Faris û mizgeftê da wiha vedibêje:

Zemanê Nebî 'Îsa bû, berî Pexember bû. Rahbekî ticaretî dikir di neqebîna vir û Îranê wa da. Vêca xanîkîk girtibû tê da încîl dixwendin. Şêx Selmanê Farisî jî kurê milûkê farisa bû, diçû mektebekke di dixwend bê çî mektebe bû. Di devê dêrî ra [derîyê wî xanîyî] hat, dengê încîlê hatîyê da. Lê xweş hat go Wele ev kîtab ji ya me xweştir e! Çû li dêrî da, [încîl] ji ber hilandin. Go ka [kîtaba] we dixwend? Anîn şanî kirin, xwend xwend; go Wele ev ji ya me xweştir e vê dersê bide mi e[z] naçime ya xwe û mi şikere jî nekin. Vêca ders dayê da heta darsa wî li cem ê rehîb nema. [Selmanê Farisî] go mi bişîyêne ba 'alimkî di go [dersê] bidê mi. Şîyande [cem] Mer Yaqûb. Go ez ê te şîyênime [cem] Mer Yaqûb lê ez nikarim! [E]z ê te çilo bim? Go mi bike cemika da û ser banê heywana deyne heta hidût xilas bikê lê bavê mi pê 'îlam bibê wê mi jî kujê wê te jî kujê. Vêca go kire cemika da û li ser banê heywana danî û şîyande [cem] Mer Yaqûb. Ji Mer Yaqûb ra jî got, go xortkî halo wê ê wî neberde. Heta tiştê darsa te go heye, 'ilmê te [heye] tê jê ra bêjê. Şîyande vê derê. Mer Yaqûb ji mal derketibû, tembîhat li kufletê xwe kir go xortkî halo heye go bê wî neberdin heta ez werim...

Mer Yaqûb ne î li mal bû, keça wî li mal bû. [Selmanê Farisî] go ka Mer Yaqûb? Go Wele çûwe dera ha. Hate fikra keçikê jî, go rûne bavê min ê niha ê. Bavê wê hat... Li cem Mer Yaqûb jî xwend heta go 'ilmê wî jî xilas bû. Îde şîyande jêr. Şîyand heta çû Tayîfê.

Îde yê go dayîyê da [yê go Mer Yaqûb Selmanê Farisî teslîmî wî kirî]; wî, [Selmanê Farisî] bi koletî firot. Ê go patronê wî bû dar pê [bi Selmanê Farisî] didanîn. Resûlê Xwidê û Ebabekir Sedîq hatine Tayîfê li binê darkê rûniştin. [Selmanê Farisî] meyza go li wê dê ne, wilo li şitexalîya wa dihisênê. 'Îşaretê pêxember jî zanîbûn, jê ra gotibûn, go ti tiştêkî bidîyê ti bê zekat e navê; go ti bê hedîye ye distênê. Westê go ça'v lê kir, dêhnê xwe dayê da go Wele bi Xwidê ev 'îşaretê Pêxember in! Çû gote patronê xwe Wele di zilamê qenc in em ê tirihî ji wa ra bin. Weşîk di weşî tirih anî danî ber wa. Dêhnê xwe didayê libek dixwar dido zêde dibûn. Îde fêhm kir go Pêxember e. Pêxember jî zanîbû go Şêx

Selmanê Farisî ye. Hêdîka gote yê patronê wî go ma ti vî koleyî nafirosê? Go belê. Go bi çi qasî? Go bi hevqa zêr û tê heftê darî jî ji mi ra deynê go di roja xwe da şîn bibê. Pêxember gote Ebabekir go perê mi nîn in, pere li te û dar li mi. Dibê dar danîn di roja xwe da ber jî girtin. Îde eda kir û navê wî kirne Şêx Selmanî Pak (yanî ji me ye). Îde bi pêxember ra gereha heta...

Vêca ev mizgeft [wexta go li vir bû] mekanê wî bû. Di wir da maye, niha ne li wir e,⁸⁹ ew mekanê wî bû. Ji ber go di wir da maye navê wî li mizgeftê bûwe. Li Qamişlo jî camîya wî heye, li Medînê jî heye.

Weke ku vebêjer dibêje heke mirov vê mizgeftê wek mekanê Selmanê Faris qebûl bike, ji ber ku dê bikeve statuya meskenan da dê bibe oykonîmek. Lê heke mirov tenê wek avahîyeka aîdî bajarî qebûl bike ew dê bibe urbonîm ku avahî jî di nav da navê gelek tiştên bi vî awayî îfade dike. Çi wî çêkiribe çi li ser navê wî hatûbe çêkirin, ev mizgeft bi Selmanê Faris bi nav bûye û îro jî wilo dihê naskirin û binavkirin. Anku cihî/mekanî navê xwe ji kesekî navdar wergirtîye.

Dema mirov van vegotinên vebêjer dide ber çavkanîyên nivîskî yên der barê jîyana Selmanê Faris da, li gel hinek cudahîyan hev digirin. Bi vî awayî jî mirov dikare wan wek rast qebûl bike lê divê mirov dîyar bike ku ew çavkanî jî xwe dispêrin rîwayetan. Lewma ya lojîk ew e ku mirov vê yekê bike palpiştê nêrîna civakê ya li van vegotinan. Anku ev vegotin di nav civakê da ji rastîyê dihêne qebûlkirin. Di vê çarçoveyê da hîkayeyeka rast vedibêje, der barê kes û cihekî dîyar da ye ku ev taybetmendîyên efsaneyan in. Lê ji ber ku tiştekî derasayî tê da nîn e nabe mînak bo efsaneyan. Leheng kesekî rasteqîn e lê belê bûyera ku li ser disekine ne berteng e û mijar jî ne evîn û qehremanîyê. Lewma ji hîkayeyên gelêrî jî dûr dikeve. Dema bi awayekî qebe were nirxandin mirov dikare wek serpehatîyên kesekî binirxîne ku kesê çavkanî jî wek mesele bi nav dike.

3.10. QESIRBELEK

Ev gundê li ser Nisêbînê, di navbera Nisêbîn û Cizîrê da, li ser Rêya Hevrîşim e. Gund 95 km'yan dûrî Mêrdînê û 39 km'yan dûrî Nisêbînê ye (mesafe.hesaplama.net). Gundê ku serhejmara xwe li gorî daneyên 2020an 229 kes e (TÜİK, 2020), debara xwe bi çandînî, sewalkarî û bazirganîyê dike. Şênîyên gundî yên îro misilmanên sunî û kurdên kurmanç in.

Ev gund navê xwe ji qesrekê digire ku îro ne li ser pîyan e û tenê wek kavil şûna wê maye. Der barê vî gundî û her wiha navê gundî da vegotinek hatîye berhevkin.

⁸⁹ Mebesta vebêjerî gor e.

3.10.1. Qesirbelek

Bêjeya “qesra belek” hêr wê yekê dihîne bîra mirov ku qesir bi awayê xeteka reş û yeka spî hatîye çêkirin û ji ber vê jî rengdêra belek lê dihê zêdekirin. Ev yek ji bo Birca Belek a Cizîrê jî derbasdar e ku li gorî vegotina Xelîlê Mexso jixwe têkilîya van her du cih û navan jî bi hev ra heye. Bi saloxan dîwarên qesra li vî gundî jî bi heman awayî ji xeteka reş û yeka spî pêk dihatin ku heta demeka nêzîk wek bermahî li ser pîyan bûn. Her wiha belekîya Birca Belek îro jî li ber çavan e ku mirov dikare bêje ev yek dibe stûnek bo vî fikrî. Helbet dibe ku bi rastî jî rengdêra belek ji ber rengê dîwarên wan derketibe holê lê li gorî vegotina hatî berhevkirin ihtîmaleka din derdikeve holê. Lewra bêjeya “belek” ji navê hostayê van cihan dihê ku navê wî Cihûwê Belek e. Vebêjer Xelîlê Mexso vê vegotinê wiha neqil dike:

Mendelî hebû, navê wî Mendelî bû. Vêca Mîrê Bota bû. Ahlê Bota înkîlab lê kirin, ew ji mîrîtî danîn û digotine yekî Miheme; ew di dewsê da rakirin kirne mîr. Xulamekî Mendelî heye navê wî Silêman e. Go Silêman! Go libê mîrê mi! Go here bêje Miheme bê hinek zevî bide me, em ji xwe ra carê biçênin. Ma [e]m ê bi çi îdare kin? Vêca rabû çû cem. Go Miheme gote Silêman (xulamê Mendelî), go here bê mi avîya ser ciwê ra da te. Yanî tiştêkî nadime te (ma ‘erdeki ser ciwa avê ra bê wê çilo çêbê!). Go [Silêman] vegereha go Wele halo gotîye. Mendelî go Wele Silêman ev cih nema bi kêrî me tê! Rabû lê da çûne Stembolê.

Heke avayî ji xwe ra kirîne û heke kirê ye axir ketne avayîkkê, raserî çarşîyê ye. Keça siltan ji avayîya wê ne bi dev ya bavê wê ve ye jê dûr e, şewtekê vederî ya bavê wê ye. Rojekê Mendelî dibê Silêman! Dibê ha! Dibê bêhna mi teng e were çend firdika ji yê cihê Bota ji mi ra bêje (yanî bistirêne). Rabû go ser ça ‘va. Keça siltan ji di şebakê ra hisa sitrana wî dikê, guhê xwe didê ser go wî wilo distirênê. Hingî dengê wî xweş e û hingî li xweşîya keçikê jî hat go ne ez nizamî ne ev kurmancî ye û ne bi tirkî ye û ne bi ‘erebî ye, ne bi farisî ye! Zehf xweş dikê lê ma çi fêde dikê, ez fêhm nakim! Lê ji xêra Xwidê ra evê go jê ra dibêjê mi dîtibana (ne go Silêman meraq dikê, behsa Mendelî dikê yanî). Ji keçikê ra bû derd. Bû qilawizê wîna, carekê ça ‘vê wê pê ket ne bi dilekî bi sed dilî dilketîyê da. Pa ne mîrê Bota ye, weke tak rihan e! Wilo dilê wê çû ser û haya Mendelî ji keçikênin e. Çend rojek tê ve çû (cêrîya wê jî heye), xwarinekê çêkir û aha hevqa⁹⁰ zêr kirne binê firaxê da û xwarin berda ser (ne ji pêl keçikê ve, wilo başqe). Xwarineke wilo meqbûl çêkir û zêr kirne binê firaxê da û xwarin valakire ser. Go here bibe vê mala ha, mi his kirîye go feqîr in, bila xêra me bê bibe ji wa ra. Keçikê [xwarin] bir da destê Silêman. Silêman xwarina wê bire medbexê valakir go ewqa zêr î di bin da. Zêr hilandin û xwarin bir di nav kuflet da danî. Go Wele malekê ji me ra şîyandîye nîza kî ye. Serê heyvekê dowa wilqa zêr wî şîyênê. Silêman pera jî nabêjê Mendelî, [nabê] Wele zêra jî dişîyênê. Her wilo Silêman jî zêra li cem xwe dihilênê, li dora Stembolê dipirsê dibê ma ahlê Bota li va da kî ne, hene nîn in, li kû dê ne, çawa ne? Dibê hene çima nîn in! Li filan derê û filan derê û filan derê... Silêman hemûwa dixwazê cem xwe. Bi wa pera cilê herbê ji wa ra dikirê, çek û sîleha ji wa ra dikirê, heta bi çek û sîlehê Mendelî jî hazir dikê. Dibê rojekê heme hew te dî siltan înkîlabê li me bikê da qene em bi kêrî xwe bîn xwe xilas kin. Ew wê hereketê dikê, haya Mendelî jê nîn e; ji Silêman. Dibê çil siwarê herbê hevdû ji cihê Bota neqa û çûne Stembolê. Go dinyayê belanin bêne serê Mendelî, ma em xilas nakin. Dilxwazê wî bûn, ew jî çûn gihane wa.

Dibê rojekê Mendelî go Silêman! Go libê mîrê mi! Go vê sibê dêhnê mi li vî bajarî ye ti dibê hemû jev xeyîdî ne. Ne silav dikine hevdû, jin û mîr û zarok tev da, me ‘dê hemîwa kirîye. Ti nabê çi bela vî bajarî ye? Go mîrê mi ti pê nehisahaya? Go na. Go dibê Ferensa li ber bajêr danîye da ‘wa herbê li siltan dîkin, ma ti pê nehisahaya? Go na Welle! Dibê [Silêman] go mîrê mi rabe! Go ma Silêman ez ê rabim bê çi, ne ‘esker e û ne tiştêk e. Qeweta mi nîn e, ma ez ê çilo rabim? Go ne go ti rabûwî heye, e[z]

⁹⁰ Vebêjer bi destê xwe pencekê nîşan dide.

dibêjime te rabe! Cilê wî yê herbê anîn li cem danîn û sîleha wî (bê ka çi bû wî zamanî) li ber danî. Û go carekê Mendelî derkete jiderve go heyloooo! Go 'eskerê wî yî ji yê siltan bêhtir. 'Eskerê Mendelî kete milekî û yê siltan kete milekî û lê dan. Yê go ji wa hatine kuştin û yê go ji wa hatine kuştin. Şikandin. Herb ser rabû, siltan bi dîwanê şewirî go em çi bid[i]ne vî zilamî? Ahlê dîwanê gotinê go siltanê mi! Go çi ye? Go en îyîsî keça xwe bidîyê da, bibe mirhovê wî; rojekê li te biqewimê ev zilam ê bi kêrî me ê. Go ti pera bidîyê wê xilas bin ji xezînê, nabine tiştek lê go ti keça xwe bidîyê da, ti mirhovatîyê bidîyê da rojekê li me biqewimê ev zilamê bi kêrî me ê. [Siltan] go Wele xeberê we ye. Rabû bakire keça xwe û bakire Mendelî, go mi divê keça xwe bidime te. Siltanê mi, mi navê filan bêhvan, keça te ne layîqî min e! Go ne çênabê, bawer ke ez ê li te mehr kim, layîqê te ye. Rabû lê mehr kir. Şixwe keçikê dîbû, dilketibûyê.

Qederekê ma li wê dê, heke salekê, dowa, sêya... Go ya siltanê mi, izna mi bide [e]z ê çime Cizîra Bota. Bê ka çi tedarik pê ra kar kir [û şand]. Go ma tiştekî ji te ra lazîm nîn e Mendelî? Go ya siltanê mi go Cihûwê Belek bide min, min ti tiştî dî ji te navê. Cihûwê Belek jî hosta ye. [Siltan gote Cihûwê Belek] go tê bi vî zilamî ra çê Cizîra Bota. Ka vêca çend roja bi rê da heta ji Stembolê tîn vêca ka bi çi, heke bi dewara ye û heke ka bi çi werhasil. Pê ra hate Cizîra Bota dibê ev Birca Belek çêkir wî hostayî. Mendelî 'emele girtin, perê wî zehf in û zavayê siltan e... Ew Birca Belek, bê avayîya siltan di hindirû da çilo ye wilo çêkir lê belê bi qay ya siltan bilind nekir, di rêza kêrî hişt. Dibê Cihûwê Belek xatir jê [ji Mendelî] xwestin, ka wî jî çi qencî pê kir... Dibê li dev rêya xwe ew "Qesirbelek" a ha çêkir. Dibê Qesirbelekê, qesrek li wê dê jî çêkir Cihûwê Belek û derbas bû çû.

Vêca Mihemed Begê şîyande ji siltan ra go zavayê te xwe bi ser te êxistîye. Te keça xwe lê mehr kirîye, [wî] xwe bi ser te êxistîye yanî [dibê] ti ne tiştek î. Siltan 'esker kar kir [û] go ez ê çim go wilo bê bi anîya bavê mi ez ê serê wî jê kim. Hat, çû li Birca Belek meyza go 'eyn danîna ya wî lê heme bi di rêza kêrî ya wî ye, jê ne bilindtir e. Go bakire Mihemed Begê go te go zavayê te xwe bi ser te êxistîye, va ye xwe kêrî mi hiştîye. Îde rabû [Mihemed Begê] avête gerê⁹¹ xeniqa. Hê dibê "Gera Mîr Miheme", li Cizîrê, di şetê Cizîrê da ye. Avête gerê xeniqa û Mendelî dîsa hilda ser têxt, kire mîrê Bota û canê te sax.

Dema em bala xwe didine vê vegotinê em dibînin ku ev vegotin hem navê qesrekê hem navê gundekî vedibêje ku bi wê qesrê bi nav bûye. Çi navê qesrê çi navê gundî, ji alîyê toponîmîyê ve dibe mînakî oykonîman ku li ser navê meskenan disekine. Lê heke mirov wek navê gundî bixwe binirxîne wê demê dibe komonîm ku ew jî dîsa cureyekî oykonîman e. Ji alîyê navlêkirinê ve jî zîncîrek e ku qesir navê xwe ji hostayê xwe anku kesekî û gund jî navê xwe ji qesrê werdigire.

Heke çêkirî be jî mirov dikare bêje ev vegotin li ser hebûna vê qesrê hatîye afirandin lewra şûn be jî bi awayekî şênber cihek heye. Yanî ne ku vegotinek jixwe heye û piştra ew cih li gorî vê vegotinê bi nav bûye; cihek heye û vegotinek li ser hatîye honan. Jixwe ne pêkan e vebêjer şadihê van bûyeran be lê wî ji pêşîyên xwe wergirtîye û neqil dike û rasterast wek "serhatî" bi nav dike. Ev jî dihê wê wateyê ku jê ne piştrast be jî di hişê xwe da wek rastîyan bi cih kirîye û wisa qebûl dike. Her wiha di kêlîya neqilkirinê da jî ev yek daye hîskirin. Lê divê neyê jibîrkin ku bêjeya serhatî (serpêhatî) ji bo vebêjer û lîteratûrê ne heman tiştî îfade dike. Lewra li gorî destnîşankirina Necat Keskin ev nav ji bo çîrok û memoratan jî dihê bikarînan.

⁹¹ Cihê ku av lê li hev digere (Tr: girdap).

Memorat tecrûbeyên şexsî bin û ji wan were bawerkirin jî çîrok çêkirî ne û ji bo wan cîdîyetek nayê nîşandan. Ji alîyê din ve lehengên çîrokan ajal û heyberên derasayî ne û ne girêdayî dem û mekanekî ne. Lê di vê vegotinê da leheng kesên rasteqîn in; dem xumam be jî mekan dîyar in.

3.11. RÎZOK

Ev gundê ku girêdayî Hezexê ye di navbera Hezexê û Rêya Hevrîşim da cih digire. Gundê ku serhejmara wî li gorî 2020an ji 1355 kesan pêk dihê (TÜİK, 2020) dikeve başûrê Hezexê da û 11,5 km'yan jê dûr e (mesafe.hesaplama.net). Gund di serê sedsala 20an da cihê suryanan bû (Nişanyan, 2021)⁹² lê niha misilman û kurdên kurmanç tê da ne ku navê eşîra wan Hasina ye. Gundî bi sewalkarî, cotkarî û karkerîya însaatê debara xwe dikin.

3.11.1. 'Elî 'Alim (Êlim)

Raserî vî gundî girekî têra xwe bilind heye ku navê xwe ji mişayîxekî digire. Navê vî mişayîxê ku vebêjer Smayîl Xelîl wî wek sehabî jî bi nav dike Êlim e. Li gorî agahîyên ku Smayîlê Xelîl dide hin kesan digot navê wî 'Elî Alim e û di şerê misilman û kafiran da li vî gundî şehîd ketîye. Niha edî nema be jî heta demekê her sal meha îlonê zêwa⁹³ Êlim didan ku roja çarşemê diçûn ser zîyareta wî heta roja îne. Ji ber ku ev kes pîroz dihê dîtin li vê herêmê bi navê wî sond jî dihê xwarin.

Zîyareta Êlim li serê vî girî ye ku vebêjer dibêje Girê Êlim û Cûdî birayên hev in lewma kêlîka berf diavêje Cûdî, diavêje vir jî. Di heman demê da zîyareteka din jî bi navê "Hacî Bekirê" li vir heye ku der barê her duyan da vegotin hatine berhevkirin û dikevîne çarçoveya toponîmîyê da.

Weke piranîya şêx û mişayîxan li vê herêmê jî kerametên Êlim bi awayekî berbelav dihêne vegotin. Ev vegotin ne rasterast li ser navlêkirina cihekî anku çêbûna toponîmîyê ne lê belê ji ber ku cihek bi kesekî hatîye binavkirin têkilîyek di navbera vegotin û toponîmîyê da saz dibe. Smayîlê Xelîl wiha behsa Êlim dike:

Carekê bavê mi (rehma Xwidê lê bê) go em razahayî ne, xebera me ji tişteki nîn e go 'eskerîyê dor li vir girtibû. Hineka digo me dîye ev mişayîx [Êlim] li hespekî boz siwar bû, kezîya hespê wî û dûvê hespê wî hinekîrî bû. Bavê mi go amirê wa çû 'Eyserê⁹⁴ go yaw yek li vî gundê ser we ra bû, ne yek anî

⁹² <https://nisanyanmap.com/?y=&t=%C4%B0dil&ua=0> (Dîroka gihiştinê: 05/03/2021).

⁹³ Xwarina ku ji bo xêra kesên pîroz (wek şêx, ewlîya û hwd) dihê çêkirin û xwarin.

⁹⁴ Gundekî cîranê Rîzokê ye.

serê me! Nehîşt em rê bi ti dera bibin! Go kete pey me da go ma ev cihê we ye? Herin! Go berda wa çûn (û gundîyê me pê nehisahabûn). Go wilo avêtine ser gund jî û gundî pê nehisahan wî mişayîxî berda wa.

Go carekê şivanek li ber pezê xwe bû, go ew mişayîx li hespê xwe siwar bû go hespekî boz bû û kezîyê wî û dûvê wî hinekîrî bûn. Go şivan li neqeba Xirabê Ripin û Firfêlê⁹⁵ li ber pezê xwe bû. Go [Êlim] siwar bû çû cem şivên û gote şivên go bide pêşîya mi. Go ezbenî ne pezê min ê mênê bêxwîyî! Go 'îşê te ji pêz nebê. Go da ber singa mehîna xwe, bire Çemê Gizêrîyê (di neqeba Zinarexê û Selekûnê⁹⁶ da ye). Go gote şivên ti li vê derê rûnihe. Go [Êlim] çû serê girik û go carekê derbek danî û go qarên jê hat û go bû rast vegereha. Hat gote şivên go xwe bike ber singa mi da. Go wextê ew qarên jê hat go carekê weke gurîya êgir li pey hat. Go vêca agirê wî li pey 'Elî 'Alim dihat go hespê wî wilo dûvê xwe dihejand weke êgir ji xwe vedê. Go ha ew [ê go derb lê dayî] Mêrê Qotikê bû, xenîmek bû. Digo go Mêrê Qotikê li sewêl didê, sewêl dikujê. Heta ji mintîqa wî derket hate vî alî.

Go şivên go em hatin go hê pezê min î di tewla xwe da ye, ne lepitîye te digo deh şivan li ber in. Go vêca [Êlim] go bi xatirê te ez ê çim û ha wa pezê te ye.

Kurê Smayîlê Xelîl Qasim jî hin kerametên Êlim dibêje ku li gorî vegotina wî Êlim parêzvanê gundê wan e. Her wiha mirov der barê gelek şêx û mişayîxan da li vê mijara parêzvanîyê rast dihê. Qasimê Smayîl dibêje;

Salê notî qereqol li cem me bû, vêca 'eskerî çû serê gir; cihê nobetê bû ew der. Çadirê xwe vedan di devê mîhrabê da û êvarî li wir man. Go berf hat. Başçawîşê qereqolê go yaw şevî dî tişteki bi serê me hat! Go wê berfê mîrowa digirte me! Go êvarî firtonekkê li wa da. Êvarî firtonek li wa da, sibihî gundî çûne bi wa ve. Go vêca [başçawîş] li vê dê digo yaw vê şevê mîrowa digirte me. Go me bixwe [Êlim] dî, go carna dihat û carna diçû. Go digo yaw we heyat ji mi ra nehiştîye, ji vê dê derkevin herin! (Go Êlim wilo gote me) Go me nizanîbû kî ye jî, go me dimeyza xunda dibû û derdiket û go li hespekî siwar dibû. Go em şaş bûn, me nizanîbû çî diqewimê. Go sibihî gundî çûne bi wa ve anîn û hema bar kirin çûn.

Çend cara mi dî [eskera] gotin, digo emrê Rîzokê hat go em xira kin. Go em dihatine serê vê kelhoşka ha û weke go tişteki nebû me xwe ji bîr fikir. Digo ew jî ji ber vî mişayîxî bû.

Salê notî, wextê gund vala dikirin; hatine serê gir û li va gunda direşandin. Mesela li 'Eyserê pîrekîk birîndar kirin lê li vir sewalek jî nehate kuştin.

Mirov dikare van şîroveyan li ser vê vegotinê bike:

Her çend wisa xuya bike ku ev vegotin der barê kesekî da ne, di eslê xwe da ew navlêkirina cihekî jî didin zanîn. Çiku li vê herêmê, bi awayekî berbelav bi kesên xuyayî yan jî kesên pîroz cih û war bi nav dibin. Dema ku behsa kerametên Êlim dihê kirin jî ji ber ku li vir girek bi navê Girê Êlim heye, mirov dibînê bê vî girî çima û çawa navê xwe girtîye. Bi vê kontekstê jî mirov dikare bêje ev vegotin têkildarî navê (û navlêkirina) girekî ye ku dibê mînaka oronîman.

⁹⁵ Du gundên cîranê Rîzokê ne.

⁹⁶ Du gundên Hezexê ne ku nêzî vê derdorê ne.

Vegotin der barê kes û cihekî dîyar da ne, mekan jî ev dinya ye û ev bûyer rast dihêne qebûlkirin lewra ew keramet in. Wek hespê Êlim, Mêrê Qotikê û hin bûyerên rûdidin hêmanên derasayî jî hene. Ev taybetmendîyên efsaneyan in ku mirov dikare bi van taybetmendîyan van vegotinan wek efsaneyan qebûl bike. Ji alîyê din ve tecrûbeyên şexsî yên metafîzîkî ne, tiştên balkêş vedibêjin, rûdanên derasayî hene û tekst jî pexşan û kurt in. Ne ji devê kesê/a xwedîyê tecrûbeyê hatine wergirtin lê dîsa jî ew zîncîra di navbera wî/wê û vebêjer da neşikestîye. Lewma berî efsaneyê divê mirov van vegotinan wek memoratan binirxîne ku taybetmendîyên vî cureyî bi awayekî tekûz vedihewînin. Divê neyê jibîrkirin ku memorat heta demekê wek bincureyekî efsaneyan dihatin nirxandin lê piştra wek cureyekî serbixwe hatine qebûlkirin. Bi vê boneyê nêzîkayîya van her du cureyan pêkan û jirêzê dibe û normal e ku tekstek taybetmendîyên her duyan vehewîne.

3.11.2. Darê Hacî Bekirê

Cihekî din ê di Girê Elim da “Darê Hacî Bekirê” ne. Di navî da bêtîya “dar” derketîye pêş lê belê ev cih zîyaretek e. Navê darên derdora vê zîyaretê dihê hildan çiku dar xuyatir (bilindtir) in lê belê mebest saloxdana cihê gorê ye. Bi gotineka din dema dibêjin Darê Hacî Bekirê, qala zîyareta wî dihê dikin ku jixwe daran jî navê xwe ji cendekê wir wergirtine. Hîkayeta Hacî Bekirê, varyanteka Weysel Qaranî û Şêx Osman⁹⁷ e ku tîrbên wan jî wek yên Hacî Bekirê û Êlim dused metreyî dûrî hev in.

Vebêjer Smayîlê Xelîl wiha vedibêje der barê Darê Hacî Bekirê da:

Hacî Bekirê mişayîxek bû, sofîkik bû, seyîd bû ka çi bû. Ka ji kî beledî ve dihat go werê ser vî mişayîxî [wî] tiwaf bikê. Go wilo ixtîyar bû, şepirze bûbû. (Dûrî riwê we tev de) go na'letî li rasta wî hat go sofî tê çê bi kû ve? Go ez ê çime ser mişayîxê Êlim, ez ê çim tiwaf kim. Go vegere rebenooo! Ma Êlim li vir e, salekî dî jî ti herê ti nagihê. Ti şekaleke demir jî bixê pîyê xwe da ew şekala te yê helihê û ti nagihê. Halbekî gelekî hindik mabû. Aqîlê wî ji rê bir go da neçê ser wî mişayîxî, [wî] tiwaf nekê. Ma'lûm e na'letî (dûrî riwê me tev da) 'edû we, neyar e, rêya qencîyê nade ber xelkê, berê wa didê neqencîyê. Vêca go ya Rebî ti qevza rihê mi bikê. Mi go [e]z ê çime ser wî mişayîxî va nikarim, dûr e nagihimê da. Hema ti mistek ax bidê mi, qevza rihê mi bikê. (Hingî di'a qebûl dibûn) li wê dê emrê Xwidê kir û ha hê hicrika wî li wir e.

Vêca navê wî zîlamî li wa dara kirine, hê dibê Darê Hacî Bekirê.

Darê Hacî Bekirê navê mintiqeyeka biçûk anku mîkrotoponîmekê dide zanîn. Ne ku navê daran lê navê zîyaretê ye û ji ber ku bi daran dihê nîşandan di navlêkirinê da jî navê daran derketîye pêş. Yanî ev dar jî aîdî vê zîyaretê ne. Wek cureyekî urbonîman gorodskoy

⁹⁷ Bo varyantê bnr: Ağır, A. M. & Bozkur, N. (2012). Veysel Karani İle İlgili Söylencelerden ‘İna Gulanê’. *e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi*, (8), 51-66. <https://dergipark.org.tr/tr/download/article-file/116000>

horonîm ew toponîm in ku navê semt, mehele û zîyaretan didin zanîn lê şertê aîdî bajaran heye. Ji ber vî şertî jî mirov nikare vê zîyaretê di nav vî cureyî da bi cih bike çiku ew ne aîdî bajarekî (yan jî jîngeheka di vê kategorîyê da) ye. Wek zîyaretên din bi awayekî xwezayî vê zîyaretê anku cihî jî navê xwe ji kesî wergirtîye. Jixwe îhtîmal e berîya ku Hacî Bekirê li vir wefat bike û were veşartin navê vir nebû yan jî navekî din lê hebû. Her wiha di dawîyê da vebêjer jî vê yekê dihîne zimanî.

Vebêjer vê vegotinê wek mesele bi nav dike ku dixwaze bi vê navdanînê bawerîya xwe ya ji van rûdanan jî îfade bike. Jixwe bi taybetî di rûdan û warên têkildarî bawerîyê da pêşqebûlên bi vî rengî her derdikevin pêşberî mirov. Ji ber ku ew cih û kesê lê veşartî pîroz dihê qebûlkirin helwest jî têkildarî vê yekê teşê digire. Yanî rast dihê qebûlkirin, rûdan di demeka nêzîk da ye, cih ev dinya ye, der barê kes û cihekî dîyar da ye. Ji ber ku hêmana şeytanî jî şertê derasayîbûnê pêk dihîne, mirov dikare vê vegotinê wek efsaneyê qebûl bike.

3.12. TILDÎB

Gundekî di navbera Nisêbîn, Hezex û Cizîrê da ye ku li ser Hezexa Şîrnexê ye. Gundê ku dikeve başûrrojawayê Hezexê da gundekî Eşîra Hemika ye. Şênîyên gundî ku kurdên kurmanç û misilman in debara xwe bi sewalkarî û cotkarîyê dikan.

Di çarçoveya toponîmîya vî gundî da li ser navê gundî vegotinek hatîye berhevkirin.

3.12.1. Til Dîyab (Tildîb)

Gund navê xwe ji kesekî digire ku navê wî Dîyab e. Her wiha li gundî tilek jî heye ku bi kelijandîna bêjeyên “til” û “Dîyab” navê gundî pêk hatîye. Li gorî vegotinê jî ber ku keça qadî di kanîyê da dixeniqe, kanî dihê xitimandin. Ax li ser kanîyê dihê valakirin heta ku ev ax bilind dibe û tilekî biçûk jê çêdibe lê dîsa jî kanî di bin axê ra dide der.

Dîyab yekî Binîhelalî ye. Dema ku Eşîra Binîhelalîyan di vê herêmê ra derbas dibe Dîyab dikeve gundê Tildîbê da û ev gund wek Til(ê) Dîyab bi nav dibe. “Til(ê) Dîyab” bi demê ra deforme dibe û wek “Tildîb” teşê digire. Behsa Dîyab jî di vegotina Binîhelalîyan da derbas dibe ku di vir da tenê beşek dê were bicihkirin. Hemedê Kurd di vê vegotinê da behsa Dîyab wiha neqil dike:

...Go çiqra pîreka Qadî Bidêr⁹⁸ nan çêdikir keça wî (navê wê 'Alya bû) hesabê bavê xwe û tengayîkkê dikir wî heqa ard hilênê, wî piçek rûn hilênê, piçik ça hilênê. Digo xelakkê ê da serê bavê mi di nav xelkê da newê tewandin. Digo mêhvanê bavê mi jî wê ên bila bavê mi jî ne kêmtî Mala Sultan Hesen û Mala Abûzêd wa bê. Weke go bê Wele sibe Binîhelalî wê rabin çin vêca Sultan Hesen û Abûzêd bi rex bavê wê ketine, wê êne malê. Vêca ew çiqas e nan nexwarîyê Qadî Bidêr, dilê wî ji nêza têşêhê û ji fêhtîya dibê ya rebbî ti rihê mi bistênê. Xela ye nîn e ez bixwim û ev paşa bi rex min ketine! [E]z ê çilo çêkim! Têne malê û vêca keça wî wilo nanekî sêlê ji wa ra çêkirîye û xwarineke wilo weke ya ma' mûra paqij û çakke wilo delal... [Qadî Bidêr] nizanê tiştê heye. Hat go keça wî wilo jê ra kirîye, hek û sed carî bavo! Wilo şoq bû û ma 'ecêbmayî. Go yabo mi zanîbû rojekê tê kevê tengayîkka halo da, mi go da serê te di nav xelkê da newê tewandin. Vêca hingî kêfa wî ji keça wî ra hat 'eyasa⁹⁹ bi serê keça xwe da kir û keça xwe li devihê siwar kir vêca Binîhelalî wê rabin çin. Û devih hêç nebû! Binîhelalî wê vir da çin devihê berê xwe da bi vir da¹⁰⁰ û keçik revand û bir. Vêca ma'lûm e hinga go êl rabû, Qadî Bidêr meyza keça xwe nedî. Go ew welatê xweş î ez herim û keça mi ne bi mi ra bê, go çi 'îşê mi li wî welatî heye! Hema çadira xwe go req danî. Û Binîhelalî dimeşin. Abûzêd go bi Xwidê e[z] jî [e]z ê li cem amê xwe bim. Wî jî çadira xwe di rex ya Qadî Bidêr da danî mecbûr îde Binîhelalî hemû mane sekinî. Vêca aha wî wextî Dîyab tê dikevê Tildîbê da. Navê tildîbê Til Dîyab e. Dîyab jî pêlewanekî Binîhelalîya ye, pêlewanekî bêbext e. Dîyab dikevê Tildîbê da û Qadî Bidêr jî di Tildîbê da ye, yanî cihê go çadira xwe lê deynayî Tildîb e. Hingî keça Qadî Bidêr; xwiha 'Alya dikevê kahnîya Tildîbê da dixeniqê. Ma'lûm e keça wî winda dibê hey ji tiştê namênê. Keça wî dixeniqê îde hingî [kahnîyê] dixetimênin. Dixetimênin aha vêca hingî kahnîyê di binê wê ra [di binê axê ra] deriqandîye. Bi deviha wa dixetimênin. Vêca bi wê axê tilek li wir çêdibê îde di binê wî tilî ra dideriqênê...

Vebêjer pêşdetir dîsa behsê dihîne ser Dîyab û bi berfirehî li ser vî lehengî disekine. Lê belê di vir da tenê beşa têkildarî navlêkirina gundî hat neqilîkirin.

Ev vegotin ji alîyê toponîmîk ve dibe mînakî komonîman ku cureyekî oykonîman e û navên gund, gundik û çewlikan îfade dike. Gundê Tildîbê ku navê xwe ji kesekî û taybetmendîyeka cografîk (her çend çêkirîbe jî) werdigire, bi awayê fermî heta demekê wek mezraya/taxa Xirabê Mişkê dihat qebûlîkirin. Lewma di gelek nexşeyan da cih nagire lê dîsa jî bi ya me mirov nikare wek mîkrotoponîmekê bihesibîne. Lewra îro ji wê statûyê derketîye û wek gundekî serbixwe dihê qebûlîkirin.

Ji ber ku ev vegotin beşek ji vegotina Binîhelalîyan e, di çarçoveya analîza vegotinê gelêrî da analîza wê nehatîye kirin. Lewra analîz di beşa Şêx Şerîf da hatîye kirin ku beşeka din a vê vegotinê ye û heman tişt bo vê beşê jî debasdar in.

3.13. XIRABÊ MIŞKÊ

Ev gund di sêgoşeya Cizir, Hezex û Nisêbînê da ye û gundê Hezexê ye. Şênîyên vî gundî jî ji eşîra Hemika ne ku girêdayî konfederasyona Hevêrkîyan dihê qebûlîkirin.

⁹⁸ Mezinê 'eskerîya Binîhelalîya ye. (Veb.)

⁹⁹ Weke çarşefê reş bûn bi serê pîreka da dikirin ji boy go kes wa nebînê. (Veb.)

¹⁰⁰ Çîrokbêj du hêlên dijberî hev dişan dide.

Welatê pêşiyên Hevêrkiyan Mala Osman, Çîyayê Şingalê û Çîyayê Şêx Evdilezîz e ku li başûrê Kurdistanê ne. Hevêrkî bi eslê xwe Êzîdî ne û teqrîben di sedsala 7-8. da ji ber artêşa îslamê koç dikin û xwe dispêrin sînorên Bîzansîyan anku bakurê Kurdistanê. Li Hezexê bi cih dibin ku piştê li ser vexwendina Îsevîyên vê herêmê derbasî gundê Mîzîzexê dibin û ev gund dibe navenda/paytexta Mala Osman (Cibo, 2010: 28).

Li gorî vê agahîyê, demên berê wek gundên din ên Hemikîyan şênîyên vî gundî jî êzîdî bûne lê îro misilmanê sunnî ne. Gundê ku li gorî daneyên 2020an serhejmara wî 808 kes in (TÜİK, 2020) 27 km'yan dûrî Hezexê ye (mesafe.hesaplama.net)¹⁰¹ û dikeve başûrrojawayê navçeyê da. Gundî bi sewalkarî, cotkarî û karkerîya însaatê ra mijûl dibin.

Der barê toponîmiya vî gundî da ji Hecî Şerîfê Mala Mişo vegotinek hatîye berhevkirin ku beşeka wê rasterast navlêkirina gundî vedibêje. Vegotîneka din jî ji vebêjer Hecî Sebrîyê Mala Eyşo hatîye berhevkirin. Vegotîna Hecî Sebrî rasterast ne li ser toponîmiya Xirabê Mişkê ye lê varyanteka din a vegotîna Hecî Şerîf e. Mebesta bicihkirina wê ya di vê xebatê da ew e ku her du tekst hev temam dikin û bi vî awayî çêjeka edebî didin.

3.13.1. Xirabê Mişkê

Vegotîna Hecî Şerîf ku beşeka wê rasterast awayê navlêkirina gundî vedibêje, bi giştî jî serpêhatîya wî kesî ye ku gund ava kirîye û nav lê danîye. Li gorî vegotinê bûyereka derasayî rû dide û têkildarî vê rûdanê li wir gundek dihe avakirin û nav lê dihe danîn. Hecî Şerîfê Mala Mişo vê behsê wiha neqil dike:

Pêşîyê me 'Emerê Ferec hatîye li vir coht dikir. Gayê xwe anîne, li vê dê girîkîk heye li nava gund heye hatîye serê wî girîkî. Li wê dê razahaye, wextekî dirabê ser xwe go mişkîkî zêra derdixê û li wê dê wa bela dikê wa didê tavê. Heta zêrê xwe xilas kirin, komek zêr çêkir go zêrê wî ziwa bûn başlamîş kir go wa bikişênê [hindirû] ew pê vê rabû. Wextê rahişte zêra dibê hema dûvê mişk re 'erî re 'erê go tep û li wê dê ket û mir. Dibê bi Xwidê mi halo zanîbana mi zêrê te nedibirin, gunihê te kete sukra mi da! Hingî mala 'Emerê Ferec li Delavê Qesrê bû, ew kavilê mala Şêx kavilê bavê wî Ferec bû. Rabû go bi Xwidê ez ê vî gundî ava kim! Hatîye ev der ava kirîye û ti dibînê ev mîlet timam ji 'Emer zêde bûye.

Vêca ['Emerê] Ferec zilamekî diz bû, dizekî wilo bû tişteki 'ecêb bû. Dibê ji vê derê rabûye carekê çûye dizîya va Mala 'Evdalkê. Ewqa zêr dîtibûn, zêrê wî zahf jî bûn [lê] 'îşê wî dizî bû. Dibê zêrê va Mala 'Evdalkê hene li Aznawirê.¹⁰² Dirabê hema dirajê tivinga xwe û diçê. Diçê, dikê û nakê derbê nabînê (qey qesra wa asê bû). Sêlmekê li wa da dibînê didê ber şibakekkê û di şibakê ra dikevê hindirû da. Nobeçî pê dihisihê, nobeçî jî dikujê. Lê didê tê, li dora Kinikê¹⁰³ wa lê dibê sibih. Hinek li wa da wî dibînin. Mala 'Evdalkê dibê bi Xwidê dizekî halo ketîye mala me da û xulamê me kuştîye, taqîb dikin. De li vê dê, de li dera hanayê, [hinek] dibê bi Xwidê vê sibihê, ro hilatibû û 'Emerê Ferec li dora Kinikê bû û ev zilam zilamekî diz e. (Û bavê wî Ferec û 'Evdalkê jî dostê hev in ha!) Mala 'Evdalkê dirabin tên dibêjine Ferec dibê hera bi Xwidê em dixwazin 'Emer îro werê cem me, dawetlî ye li cem me. Ew zanê çî kirîye, bavê wî dibê kurê'm here dibê yabo ebeden ez naçim! Bavê wî rû li dideynê, ['Emer] dirabê

¹⁰¹ <https://mesafe.hesaplama.net/hesaplama.do> (Dîroka gihiştinê: 15.06.2021).

¹⁰² Gundekî Nisêbînê ye ku di navbera Cizîr û Nisêbînê da ye.

¹⁰³ Gundekî Nisêbînê ye ku di navbera Cizîr û Nisêbînê da ye.

diçê. Diçê, li wê dê Mala 'Evdalkê wî digirin, qeyd dîkin û xwê didinê û avê nadinê da. 'Edeteka wî jî hebû êvara li ti dera nedima, go li kû dê bana êvara wî ê malê. Mêrikê diz bû, 'edeta wî nebû go bimênê [li dera]. Rabû cîya wîna go bi Xwidê 'Emer îşev nehatîye, belakik lê qewimîye! Go dîya wî rabû li wê derê lê da; ew Mala Şemas Steyfo li Hezexê a xort bûn xwe li wa girt. Xwe avête pişt dergûşa Şemas Steyfo. Şemas Steyfo rahişte çengê wê go rabe ne hewce ye, ti ji mi ra çi bêjê [ez ê wê kim]. Go bi Xwidê hal û meselê 'Emer ev e. Mala 'Evdalkê, 'Emer êsîr kirine û bi Xwidê xwê didinê û avê nadinê da. Rabû Şemas Steyfo bi şevqê ra girte ser Eznawirê. Sed siwar! Dora Eznawirê qalib da. Bû sibih axê bakirîyê da [bakire Şemas Steyfo]; Şemas Steyfo go ez nehatime taştêya te bixwim! De bi Xwidanê şev û rojê go 'Emer miribê, 'işîn ji 'Emer hatibin ez ê vê dê kime kolana hespa! Ê 'Emer anîn û serê te sax.

Di wê Varyantê da ku Hecî Sebrîyê Mala Eyşo neqil dike, wek navên lehengan kêmtir dihele guhertin. Navên ku her du vebêjer didin jî kesên rasteqîn in lewma zehmet e mirov vegotina yekî tenê referans bigire. Her çend Hecî Şerîf jî xirabê Mişkê be jî her du vebêjer jî van malbat û kesan nas dîkin çiku jî heman eşîrê ne û gundên wan cîranê hev in. Her wiha tişteki jî rêzê ye ku di neqilkirinê wiha da navên xelet werin bicihkirin yan jî kes li hev werin xelitandin. Hasilî nav werin guhertin jî bi xetên giştî behs li ser heman mijarê ye. Wiha vedibêje Hecî Sebrîyê Mala Eyşo:

Xelef Axa li Aznawirê axa bû. Go heft sala xercê Mîrê Bota neda (Mîrê Bota heta bi wa da jî xerc dista). Go rabû [mîr] şîyande jê ra go bila Xelef Axa werê. Xelef Axa bi xwe ve û çend qurmayê xwe ve çû. Çû û [mîr] go terq dest ser danî û avête hepsê. Xelef Axa gote qerdîyana go heyra! Go erê! Go heme ka bila sûcê mi bêjê bê çi ye da em sûcê xwe zanibin. Go Wele sûcê te, dibê ev heft sal e xercê Berîyê nedaye. Ê go ez ê dim. Ê go ma tê çilo dê? Go bila mi berdê [e]z ê çim ênim. Go ne divê qen'etek hebê. Go mi soz bê go ez çerxî nehêlim. Bila hesabê xwe bikê bê çiqas e ez ê ênim, lê Wele ez neçim nayê. Rabû soz jê sta[nd] go axir hevqa mecîdî ne (ma'lûm e perê hingî mecîdî bûn, dewra Siltan Mecîd bû. Barê dewara ye!) Go [Xelef Axa] lê da hat bi berîyê ket wilqa mecîdî dane hevdû. Ê pînsed mêrê şervanî [jî] da hevdû, mêrê ti bêjê ev ê bi kêrî şêr ê, neqandin.

Ji kevîya Banê Xanê¹⁰⁴ û heta destê xwe avêtine Qereçox bûne zincîr. [Xelef Axa] gote wa go zanê! Go erê! Go ez ê çim, hesab û kîtabê wî dime dîtin, go me xatir jev xwestin e[z] jî Cizîrê derketim (parola me filan tişt) go mi parola da we hûn ê lê xin. Tiştê ber qefa we ket; ker û hesp û kitik û se û golik, hûn naberdin win ê ênin. Go bila. Proxrama xwe wilo girêdan û çûn. Dibê wextê hesab û kîtabê wî kirin, go hesabê wî timam bû xatir jev xwestin, ji Cizîrê derket û parole da yê Banê Xanê û 'işaret dane hevdû û heta bi kevîya Qereçox, pê ra anîn, termik kirin. Gîska gurî di cihê Bota da nehiştin. Deng giha mîr go hawara mîrê mi Wele Xelef Axa tişteki di ser me da nehişt. Go [mîr] kenî go heyra kurê dêlê Wele 'ewda xwe vegera.

Dibê Xelef Axa li Aznawirê ev 'Erfatê Hesin yê ji Xirabê Mişkê li wê dê girt, ka çi dijminatîya wa hebû. Girt, rabû di serê gir da çand. (Xelef Axa 'Erfat çand). Ti gucê wa nîn e herine şerê Xelef Axa. Berî hingî jî dostanîya wa [Mala Hesin] û keşê Hezexê hebû, digo Şemas Steyfo [navê keşê]. Şemas Steyfo jî mîrekî ser xwe ra bû, erê filih bû lê mîrekî ser xwe ra bû. Dibê pîreka wî [ya 'Erfatê Hesin] cêrek hingiv li piştê xwe kir û ka kî dî bi rex ket çûne cem Şema Steyfo. Go Şemas! Go ha! Go bi Xwidê zêdeyî qeweta me çêbûye em dixwazin ti werê bi me ve. (Ma'lûm e ji berê da ev rêz û berberî heye.) Şemas Steyfo go de herine mal û xwe kar kin, sibihî şevqê e[z] li cem we me û em ê çin. Go bila. Dibê êvarî ew hatine mal û Şema Steyf jî ka çiqas 'esker bi xwe ra rakir û hatin. Êvara dîtirê avêtine dora Aznawirê, dora wê kirne gustîlk. Şîyande ji Xelef ra, go ez Şemas Steyfo me, ez hatime go ti 'Erfet berdê. Go de werin taştê bixwim filan... [Şemas Steyfo] qasidê xwe vegera go Xelef! Go ha! Go bi 'Îsayê nûranî ez neh[a]time taştêya te, bi 'Îsayê nûranî go terqên bikevê tivinga we da go ez kevîrê Aznawirê li ser

¹⁰⁴ Taxeka Cizîrê ye.

hev nahêlim. Rabû Xelef berdan û hat. Xelef anîn gihandine wa [xwidîyê wî] û hatine mal. Heta mirin jî dostanîya wa hebû.

Heke em vegotina ku Hecî Şerîfê Mala Mişo neqil dike analîz bikin em dikarin bêjin ku bi taybetî beşa destpêkê der barê navlêkirina gundî da ye. Ji ber vê yekê di çarçoveya toponîmîyê da dibe mînaka komonînam ku cureyekî oykonîman e. Gund di encama bûyerekê da navê xwe digire lê nayê zanîn bê ka kesê ku zêran dibîne nav lê dike yan li ser vê rûdanê jixweber û bi awayekî xwezayî vî navî digire.

Her du vegotin jî der barê cih û kesên dîyar da ne û dem jî nêzîk e. Ev taybetmendîyên efsaneyan bin jî rastîya wan mijara nîqaşê ne, anku li ser navê bawerkirinê helwesteka yekta nîn e. Têkiliya zêr û mişkan wek hêmaneka efsaneyî derkeve pêş jî ev beş bêtir bi ser rengê çîrokan ve ye. Lê dema ku bi giştî werin nirxandin her du tekst jî rasterast mînakên şeran in. Lewra ew pêvçûna di navbera du alîyan (wek bavik yan jî eşîr) da vedibêjin. Di vir da kêmanî ew e ku di dema vegotinê da amûreka muzîkê nehatîye bikarînan lê ew jî girêdayî îcraker/vebêjer e. Mînak heke îcraker/vebêjer domek (mitirb) bûna şik jê nîn e ku weke gelek mînakên li vê herêmê dê ev jî li gel kemañçeyê neqil bikira.

ENCAM

Nav ew hêman e ku her tiştî dike xwedîyê wateyekê. Onomastîk jî wek zanistekê li gel vê wateyê ji her alîyê ve li ser navên taybet disekine û wan ji xwe ra dike mijar. Toponîmî jî binbeşeka vê zanistê ye ku mijara wê navên cih û waran e. Ev zanist, navan li gorî hin taybetmendîyên cihan kategorîze dike û li gorî vê kategorîzekirinê jî şax jê diçin. Anku navê her cihekî di bin sîwana şaxa eleqedar da dihe senifandin lê li ser van şaxan û çarçoveya wan konsensusek di navbera toponîmîstan da pêk nehatiye. Hin caran toponîmîstan li ser dîyarkirina van şaxan hev rexne kirine hin caran jî bi berfirehkirin û kûrkirina lêkolînê, xebatên xwe revîze kirine. Li gorî fikrê me dîsa jî ev qad hê nekemilîye ku karibe bibe bersiveka têrker. Mesela wek ku di berhevkarîya me da jî derketî holê navên mabedên olî yên wek dêr, mizgeft û kenîşteyan, bêtî ku mirov bide zorê nakevine kategorîyekê ji van da. Dîsa cureyekî oronîman gorodskoy horonîm navên zîyaretan îfade dike lê şertê aîdbûna bajaran derdixe pêş. Wek ku di mînakên me da jî xuya dike, dibe ku zîyaretek bi tena serê xwe li cihekî be û ne aîdî bajar yan jî gundekî be. Lewma li gorî fikrê me divê ev şax werin zêdekirin yan jî çarçoveya wan bi awayekî zelaltir were berfirehkirin. Li gel van probleman her mînaka ku me ji sehayê berhev kirîye me destnîşan kirîye bê têkildarî kîjan cureyê toponîman e. Li gorî vê kategorîzekirinê tabloyeka wiha derket holê:

Tablo 2: Kategorîzekirina minakên berhevkarî ji alîyê toponîmîyê ve

Oykonîm	Urbonîm	Oronîm	Hîdronîm	Dromonîm	Mîkrotoponîm
Elo Dîno	Şêx Şerîf	Gelîyê Piling	Kîzên/Kêzîn	Kîzên/Kêzîn	Kevirê Şîrîn
Bahremê Birim	Şikefta Şoxirdîn	‘Elî Alim (Êlim)			Keçîka Bikezî
Ebû Delav	Dêrmarok (Mor Evgîn)	Şikefta Şoxirdîn			Mextela Evlê Saro
Gundikê Hindo	Kelha Hêtim				Darê Hacî Bekirê
Dêrmarok (Mor Evgîn)	M. Selmanê Faris/Selmanê Pak				
M.Selmanê Faris/Selmanê Pak					
Qesirbelek					
Til Dîyab (Tildîb)					
Xirabê Mişkê					

Di vê tabloyê da hin mînak di bin du cureyan da hatine bicihkirin çiku ew ji du alîyan ve hatine nirxandin. Wek mînak Şikefta Şoxirdîn hem wek şikeftekê dihê zanîn ku ji vî alîyî ve mirov dikare wek oronîmekê qebûl bike hem wek zîyaretekê dihê zanîn ku ji vî alîyî ve jî mirov dikare wek urbonîmekê qebûl bike. Mînakên Kevirê Şîrîn, Keçika Bikezî, Mextela Evlê Saro û Darê Hacî Bekirê jî tenê wek mîkrotopnîman hatine destnîşankirin. Çiku ew niqteyên biçûk in ku di nexşeyan da cih nagirin û her çend ew zîyaret bin jî ji ber şertê aîdbûna bajar/gundan mirov nikare wan wek gorodskoy horonîm bihesibîne û bi vî awayî li derveyî urbonîman dimînin.

Heman problem ji bo cureyên vegotinên gelêrî jî derbasdar e. Di vê xebatê da me herî zêde di wê xalê da kêmanî hîs kir ku vebêjer li gel hinek îstîsnayan ji hemû cureyên vegotinan ra “mesele” yan jî “çîrok” dibêjin. Helbet asayî ye ku navlêkirina sehayî û ya teorîk hev nagirin lewra tiştekî ji rêzê ye ku haya vebêjeran ji teorîyê nebe. Li gorî çavdêriyên xwe, di vê xalê da em dikarin bêjin heke vebêjer wan tiştên ku vedibêje ji rastîyê qebûl bike wek “mesele” û heke ne ji rastîyê qebûl bike jî wek “çîrok” bi nav dike û ev binavkirin jî têra xwe berbelav e. Lewma li gorî fikrê me divê li vegotinên gelêrî “mesele” jî were zêdekirin û çarçoveya wê bi awayekî zelal were danîn.

Li gorî ku nav wateyê dide tiştan bêguman divê nav bixwe jî xwedîyê wateyekê be. Navlêkirin jî lêgerîna vê wateyê bixwe ye ku di çarçoveya disîplînekê da pêk dihê. Ev rê û rêçikên navlêkirinê ji bo gelek zanistên sosyo-çandî hem sehayekê vedikin hem daneyên girîng didin ku ev kevneşopî bixwe jî bi serê xwe çandek e. Çawa ku navlêkirina şexsan paralelî çand, bawerî, bîrdozî û nêrîtan e; navlêkirina cih û waran jî ji van lêgerînên mirov ne bêrî ye. Anku navê her cih û warekî jî ji bo şênîyên wî cihî (çi kevin çi nû) tiştekî/wateyekê îfade dike ku bi vî awayî aîdîyetek saz dibe. Ev wate carinan bi çend gotinan dihê îfadekirin carinan digihîje wê qebareyê ku vegotineka gelêrî jê derdikeve.

Navên cihan yan bi awayê xwezayî dibe ku li gorî taybetmendîyên cografîk e yan jî ji alîyên mirovan ve dihê danîn ku ew jî li gorî hin qaîdeyan e û xwe dispêrin sedemekê. Her çend bi halên xwe yê deformebyî gelek caran tiştekî îfade nekin jî li gorî bawerîya me, navê her cihekî çavkanîyeka xwe heye. Ev çavkanî carinan şexsek û carinan jî rûdanek e ku di encamê da navê cihî derketîye holê. Helbet carinan cihî navê xwe ji şexsî wergirtîye, carinan jî şexs bi cihî bi nav bûye. Anku “kes” û “navên cihan” du têgeh in ku têkilîyeka bi vî awayî di navbera wan da heye: Ji navên kesan navên cihan; ji navên cihan navên kesan çêdibin.

Heman tişt ji bo rûdan/bûyerê jî derbasdar e ku encama wê dibe çavkanîya vegotineka gelêrî. Yan jixwe vegotineka gelêrî heye û cih û war li gorî wê navê xwe girtîye yan jî navê cih û warî heye û vegotineka gelêrî li ser vî navî hatîye afirandin. Her du ihtîmal jî heman tiştî didin: Navê cih û waran çawalêhato çênebûne, her yek xwe dispêre wate û sedemeka maqûl.

Gelekî zehmet e mirov bikare tespît bike bê ka jixwe halê hazir vegotineka gelêrî heye û cih li gorî wê bi nav bûye yan vegotineka gelêrî li ser rûdanekê hatîye afirandin û di encamê da cihî navê xwe li gorî wê girtîye. Ji bo ku mirov ji vê yekê piştrast bibe yan divê kesên neqilker şahidên wê bûyerê bin yan jî şahidên serdema bûyerê bin. Ji mînakên ku me berhev kirine em karin li ser Kevirê Şîrîn û Mextela Evlê Saro vê tespîtê bikin ku bûyerekê rû daye û awayê neqilkirina vê bi demê ra ketîya forma vegotinên gelêrî da û di encamê da navên van cihên ku behs li ser e xuliqîne. Lewra ev ne rûdanên ji mêj in û hê di bîra neqilker û civaka vê herêmê da zindî ne.

Ji aliyê din ve ji bo mînakên di çarçoveya vê xebatê da em gihîştine wê encamê ku hin cihan navê xwe ji kesan, hin cihan navên xwe ji ajalan, hin cihan navê xwe ji alavan û hin cihan jî navê xwe ji bûyeran girtine ku di encamê da dîsa ji kesên lehengê bûyerê girtine. Heke em bi rêya tabloyekê nîşan bidin:

Tablo 3: Kategorîzekina awayê navên cihan

Cihên ku navê xwe ji kesan girtine	Cihên ku navê xwe ji bûyeran girtine (di encamê da ji kesan)	Cihên ku navê xwe ji ajalan girtine	Cihên ku navê xwe ji alavan girtine
Elo Dîno	Kevirê Şîrîn	Gelîyê Piling	Kîzên/Kêzîn
Bahremê Birim	Mextela Evlê Saro	Xirabê Mişkê	
Ebû Delav			
Şêx Şerîf			
Keçika Bikezî			
Gundikê Hindo			
Şikefta Şoxirdîn			
Dêrmarok (Mor Evgîn)			
Kelha Hêtim			
M.Selmanê Faris/Selmanê Pak			
Qesirbelek			
‘Elî Alim (Êlim)			
Darê Hacî Bekirê			
Til Dîyab (Tildîb)			

Navê hemû cihên di çarçoveya vê xebatê da ew nav in ku di nav civakê da dihên zanîn û ne vê dawîyê hatine çêkirin. Lewra li gel sedemên siyasî ji ber sedemên koçkirin, şer, karesatên xwezayî û hwd gelek caran navên cih û waran guherîne yan jî hatine guhertin. Guhertina navê cih û waran xaleka girîng e lewra ev guhertin li gel midaxeleya hafizeya kolektîf gelek caran têkilîya folklor û toponîmîyê dibire yan jî qels dike. Bi taybetî jî guhertina ji sedemên siyasî vê têkilîyê têk dibe çiku navên ku bi vê helwestê hatine çêkirin li ser kokekê rûnanin û bêtir îdeolojîk in. Anku gelek caran tiştekî îfade nakin û kokeka xwe ya watedar nîn in. Her wiha vegotinên gelêrî ku bi wan ra eleqedar in jî bi awayekî dikevîne valahîyekê da. Navên ku bi sedemên xwezayî, koçkirin û derbasbûna demê ra diguherin dîsa ne di vê astê da ne. Çiku gelek caran guherînên bi vî awayî bi xwe ra kokekê jî diafirînin.



ÇAVKANÎ

- Abozaid, B. A. (2018). *Rengvedana Edebê Folklorî Di Şîrên Mela Xelîl Mişextî Da*. Mêrdîn: Teza Lîsansa Bilind a Neçapkirî.
- Ağaoğlu, A., & Uzun, A. (2011). Şehirsel Toponimi (Hodonimi): Türkiye İçin Bir Tipoloji Denemesi. *Coğrafi Bilimler Dergisi*, 9(2), 123-133.
- Aktay, S. (2017). Sovyet İdeolojisinin Kazakistan Toponimlerine Yansıması. *İdil Sanat ve Dil Dergisi*, 6(38), 2685-2693.
- Alagöz, C. A. (1984). Türkiye Yer Adları Üzerine Bazı Düşünceler. *Türk Yer Adları Sempozyumu Bildirileri* (r. 11-23). Ankara: Başbakanlık Basımevi.
- Albayrak, R. (2004). *Toponim Teknikleri ve Kafkasya-Borçalı Yer Adları*. Ankara: Berikan Yayınevi.
- Alp, M. (2015). *Efsanelerden Masallara Mardin*. Mardin: Mardin Sürdürülebilir Turizm Projesi Teknik Yardım Hizmetleri.
- Altay, A. Ş. (2008). *Selmân-ı Fârisî Hayatı, Şahsiyeti ve İlk İslâm Toplumundaki Yeri*. Konya: Teza Lîsansa Bilind a Neçapkirî.
- Altunışık, İ. (2009). *Coğrafi Bakımdan Batman İli Yer Adları*. Ankara: Teza Lîsansa Bilind a Neçapkirî.
- Assmann, J. (2015). *Kültürel Bellek* (ç. 2). (Wer. A. Tekin) İstanbul: Ayrıntı Yayınları.
- Ataizi, D. E., & Sözer, B. (2016). Konya-Kadınhanı'ndan Memorat Örnekleri Ve Motifleri. *International Journal of Humanities and Education*, 378-396. Di 03/06/2020î da ji <https://dergipark.org.tr/en/download/article-file/566984> hatîye wergirtin
- Aytekin, A. (2017). Delâilü'n-nübüvve'ye Konu Teşkil Eden İki Sahabi: (Selmân-ı Farisî ve Abduullah b. Selâm). *Düzce Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, 1(1), 27-40.
- Balaban, T. (2015). Hz. Ali Merkezli Bir Ölüm Memoratına Dair Değerlendirmeler. *Türk Kültürü ve Hacı Bektaş Veli Araştırma Dergisi*(73), 89-103.

- Başkan, Ö. (1971). Türkiye Köy Adları Üzerine Bir Deneme. *Türk Dili Araştırmaları Yıllığı-Belleten*, 237-251.
- Bayat, F. (2005). *Mitolojiye Giriş*. Çorum: Karam Yayınları.
- Boratav, P. N. (1969). *100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*. İstanbul: Gerçek Yayınevi.
- Boratav, P. N. (1984). *Köroğlu Destanı*. İstanbul: Adam Yayıncılık.
- Boratav, P. N. (2011). *Halk Edebiyatı Dersleri* (ç. 2). İstanbul: Tarih Vakfı.
- Cegerxwîn. (2011). *Agir û Pirûsk* (ç. 6). Stembol: Avesta.
- Cibo, N. (2010). *Hevêrkan Sultanları* (Cild 1). İstanbul: Komal Basın-Yayım-Dağıtım.
- Cunbur, M. (1984). Evliya Çelebi Seyahatnamesi'nde Yer Adları. *Türk Yer Adları Sempozyumu Bildirileri* (r. 201-217). Ankara: Başbakanlık Basımevi.
- Çalıştıran, R. (2015). "Lîteraturek li ser Destanên Kurdî". Dnv. R. Pertev, *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî (Dîrok-Teorî-Rêbaz-Lîteratur-Berawirdî)-1* (r. 222) da. Stembol: Avesta.
- Çelik, C. (2006). Kültürel Sembol Sistemi Olarak İsimler: İsim Sosyolojisine Giriş. *Çukurova Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi (Çukurova University Journal of Faculty of Divinity)*, 6(2), 39-61.
- Çelik, C. (2007). Bir Kimlik Beyanı Olarak İsimler: Kişi İsimlerine Sosyolojik Bir Bakış. *Sosyoloji Araştırmaları Dergisi/Journal of Sociological Research*, 10(2), 5-21.
- Çetinkaya, F. (2013). Memorat (Halk İnançları Üzerine). *Academia.edu*. Di 13/11/2020î da ji academia.edu: https://www.academia.edu/7097249/Memorat_Fatih_%C3%87etinkaya_hatîye_wergirtin
- Dégh, L., & Vázsonyi, A. (2015). Memorat Ve Ön-Memorat (The Memorate and the Proto-Memorate). (Ed: A. B. Ekiz) *Millî Folklor*(105), 131-146.
- Dost, J. (2010). *Ehmedê Xanî Mem û Zîn Şîrove û Kurdîya Îro*. Stembol: Weşanên Avesta.
- Eco, U. (2018). *Tez Nasıl Yazılır?* (ç. 3). (Wer. B. Parlak) İstanbul: Can Yayınları.
- Eliade, M. (2001). *Mitlerin Özellikleri* (ç. 2). (Wer. S. Rifat) İstanbul: Om Yayınevi.

- Emiroğlu, K. & Aydın, S. (2003). *Antropoloji Sözlüğü*. Ankara: Bilim ve Sanat Yayınları.
- Emiroğlu, M. (1984). Bolu Yöresi Yer Adları. *Türk Yer Adları Sempozyumu Bildirileri* (r. 181-200). Ankara: Başbakanlık Basımevi.
- Eren, H. (2018). *Yer Adlarımızın Dili*. Ankara: Türk Dil Kurumu Yayınları.
- Erhat, A. (1996). *Mitoloji Sözlüğü* (ç. 6). İstanbul: Remzi Kitabevi.
- Ferhengvan. (1941). Ferhengok. *Hawar*(30), 759.
- Gül, A., & Özdemir, A. R. (2013). *Yer Adlarını İade Etmek Mi, "Kürdistana" Sınır Çizmek Mi?* Ankara: 21. Yüzyıl Türkiye Enstitüsü.
- Güleç, İ. (2007). Anonim Halk Edebiyatı'nın Tasnifine Dair Yeni Bir Öneri. *SAÜ Eğitim Fakültesi Dergisi*(14), 47-58.
- Gülensoy, T. (1998). Anadolu Yer Adlarına Genel Bir Bakış. D. Yıldırım içinde, *Prof. Dr. Dursun Yıldırım Armağanı* (r. 41-48). Ankara: Hacettepe Üniversitesi Edebiyat Fakültesi.
- Günel, V. (2012). Batman'da Cadde Adlandırmaları: Toplumsal Bellek Oluşturma Ve Şehirselleştirme Mekânı Hâkim Olma Çabaları . *Marmara Coğrafya Dergisi*(25), 171-197.
- Hallaç, A. T. (2018 a). Memorat Kavramının Tanımlarındaki Belirsizlik ve Bir Tanım Denemesi. *Akademik Dil ve Edebiyat Dergisi*, 2(2), 181-211.
- Hallaç, A. T. (2018 b). Memorat Türünde Sınıflandırmalar Ve Alt Kategoriler Üzerine. *Bayterek Uluslararası Akademik Araştırmalar Dergisi*, 1(2), 149-167.
- Işıkhan, T. (2008). *Gaziantep Yer Adlarının Halkbilimi Bakımından Değerlendirilmesi*. Ankara: Teza Lîsansa Bilind a Neçapkirî.
- Karaboran, H. H. (1984). Türkiye'de Mevki Adları Üzerine Bir Araştırma. *Türk Yer Adları Sempozyumu Bildirileri* (r. 97-148). Ankara: Başbakanlık Basımevi.
- Karadağ, M. (2004). *Türk Halk Edebiyatı Anlatı Türleri*. Ankara: Ürün Yayınları.

- Karaman, H. (2009). *Kur'ânı Kerîm ve Açıklamalı Meâli*. İstanbul: Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları.
- Keleş, D. (1996). *Türk Adbilimi Bibliyografyası*. Ankara: Teza Lîsansa Bilind a Neçapkirî.
- Keskin, N. (2015). Di Çarçoveya Teoriya Performansê de Nirxandina Vegotinên Gelêrî. *International Journal of Kurdish Studies*, 51-66.
- Keskin, N. (2018). *Roja Nû û Edebiyata Kurdî ya Gelêrî-1: Çîrok û Serpêhatî*. Stembol: Avesta.
- Keskin, N. (2019). *Folklor û Edebîyata Gelêrî*. Stenbol: Avesta.
- Kitêba Pîroz. (2008). (Wer. S. Dewrêş û R. Qereqoçanî) İstanbul: Gerçeğe Doğru Kitapları.
- Kızıloğlu, M. (2014). Tortum'da Derlenen Örnek Memorat Metinleri. *Bizim Ahıska*, 42-44.
- Kök, A., & Ünlü, S. (2016). Türkçe İlk Kur'an Çevirileri Tanıklığında Toponimi. *Türük Uluslararası Dil, Edebiyat ve Halkbilimi Araştırmaları Dergisi*(7), 42-103.
- Köylerimiz. (1968). Ankara: Başbakanlık Basımevi D.S.İ.
- Kurt, Y. (2008). "Diyarbakır Sancağı Yer Adları". Dnv. B. Yediyıldız, & K. Tomenendal (Ed.) *Osmanlı'dan Cumhuriyete Yer Adları-II* (r. 405-418) da. Ankara: Diyarbakır Valiliği ve Türk Kültürünü Araştırma Enstitüsü Yayınları.
- mesafe.hesaplama.net. (2021). hesaplama.net: <https://mesafe.hesaplama.net/hesaplama.do>
- Nişanyan, S. *Nişanyan Yeradları*. "nisanyanmap.com: <https://nisanyanmap.com/?y=&t=%C4%B0dil&u=1&ua=0>"
- NND Nedir Ne Demek. "www.nedirnedemek.com: <https://www.nedirnedemek.com/isogloss-ne-demek>"
- Oğuz, M. Ö. (2004). Destan Tanımı Ve Eski Türk Destanları. *Milli Folklor*(62), 5-7. Di 15/11/2021 da ji <http://www.millifolklor.com/PdfViewer.aspx?Sayi=62&Sayfa=2> hatîye wergirtin
- Oğuz, M. Ö. (2008). *Halk Hikâyeleri*. Ankara: T.C. Kültür Ve Turizm Bakanlığı Kütüphaneler Ve Yayımlar Genel Müdürlüğü.

- Omer, H. (2018). "Mesele û Metelok, Mamik, Dua û Nifir". Dnv. F. Timar, *Mesele û Metelokên Kurdî (Bîwêj û Gotinên Pêşîyan, Tiştanok, Dua û Nifir)* (r. 7) da. Ankara: Ar Yayınları & Weşanên Ar.
- Orcan, S. (1984). Toponominin Milli ve Milletlerarası Önemi. *Türk Yer Adları Sempozyumu Bildirileri* (r. 55-62). Ankara: Başbakanlık Basımevi.
- Öçal, S. (2016). *Awayê Lêkirina Navan Li Herêma Dêrikê (Lêkolîneke Onomastîk-Sosyolojîk)*. Mêrdîn: Teza Lîsansa Bilind a Neçapkirî.
- Önder, M. (1984). Anadolu Şehir Adları Üzerine Efsânelerin Oluşumu. *Türk Yeradları Sempozyumu Bildirileri* (r. 69-73). Ankara: Başbakanlık Basımevi.
- Örnek, S. V. (1975). Türk Folklorunda Ad Seçme ve Ad Koyma. *Boğaziçi Üniversitesi Halkbilim Yıllığı*, 101-112.
- Örnek, S. V. (2000). *Türk Halkbilimi* (ç. 2). Ankara: Kültür Bakanlığı.
- Pertev, R. (2018). *Folklor û Nasnameya Kurdî ya Neteweyî*. Stembol: Avesta.
- Poyraz, H. (2004). Adlandırmanın Doğası Ve Adların Nesnesine Uygunluğu Ekseninde Doğalcılık-Uzlaşmacılık Tartışması. *Sakarya Üniversitesi Eğitim Fakültesi Dergisi*(7), 226-242. Di 10/12/2020î da ji <https://dergipark.org.tr/tr/pub/sakaefd/issue/11208/133851> hatîye wergirtin
- rne.com.tr*. "Risale-i Nur Enstitüsü: <http://www.rne.com.tr/portreler/hatem-i-tai/>"
- Sakaoğlu, S. (1980). *Anadolu-Türk Efsanelerinde Taş Kesilme Motifi Ve Bu Efsanelerin Tip Kataloğu*. Ankara: Kültür Bakanlığı Milli Folklor Araştırma Dairesi Yayınları.
- Sakaoğlu, S. (1984). İnsan Adlarından Kaynaklanan Yer Adlarımız. *Türk Yer Adları Sempozyumu Bildirileri* (r. 259-264). Ankara: Başbakanlık Basımevi.
- Sakaoğlu, S. (2012). *Masal Araştırmaları* (ç. 5). Ankara: Akçağ Yayınları.
- Sakaoğlu, S. (2013). *Efsane Araştırmaları* (ç. 2). Konya: Kömen Yayınları.

- Sarpkaya, S. (2016). İzmir-Gaziemir İlçesinin İsmine Dair Efsaneler ve Aydınolu Gazi Umur Bey. *Türk Dnyası İncelemeleri Dergisi/Journal of Turkish World Studies*, 16(2), 145-154.
- Sevindik, A. (2017). Eski Ve Yeni Destan Arařtırmaları Üzerinden Türk Destan Arařtırmalarına Genel Bir Bakıř. *Uluslararası Türk Dili Ve Edebiyatı Arařtırmaları Dergisi*, 6(12), 90-99.
- Seydi, A., & Gewranî, A. (1985). *Ferhenga Kurdî Nujen Kurdî-Erebî*. Ammam: Sharikat al-Sharq al-Awsa.
- Smith, A. D. (2002). *Ulusların Etnik Kökeni*. (Wer. S. Bayramoğlu, & H. Kendir) Ankara: Dost Kitabevi.
- Şahin, İ. (2007). Türkçe Yer Adlarının Yapısı Üzerine. *A.Ü. Türkiyat Arařtırmaları Enstitüsü Dergisi*(32), 1-14.
- Şahin, İ. (2011). Yeradibilimi Arařtırmalarında Mikrotoponiminin Yeri, Önemi ve Arařtırma Yöntemi: Tırnak Köyü (İçel/Gülnar) Örneđi. *Turkish Studies-International Periodical For the Languages, Literature and History of Turkish or Turkic Volume*, 6(1), 1748-1770.
- Şahin, İ. (2013). Türkiye Yeradibiliminde Terim Ve Tür Sınıflandırması Sorunları. *Avrasya Terim Dergisi*, 1(1), 46-58.
- Şahin, İ. (2015). Bir Yerel Coğrafi Terim, Çok Sayıda Toponim: Türk Dili Coğrafyasında Eşme/Espe. *X. Uluslararası Büyük Türk Dili Kurultayı Bildirileri* (r. 184-187). Saraybosna: Bilkent Üviversitesi/Serayevo Üniversitesi.
- Şahin, İ. (2018). *Adbilim* (ç. 3). Ankara: Pegem Akademi.
- Şahin, İ., & Köse, S. (2014). Karaburun Silikyeradlarında (Mikrotoponimisinde) Görülen Coğrafi Terimler. *Dil Arařtırmaları*(14), 171-187.
- Tamtamış, H. K. (2019). Mardin'de Deđiřtiren Yer Adları Üzerine Bir Tasnif Denemesi. *TYB Akademi Dil Edebiyat ve Sosyal Bilimler Dergisi*, 9(25), 65-84.

- Tanhan, E. Y. (2005). *Kaniyek ji Mezopotamyayê Nisêbîn*. Stenbol: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- TDK. (2005). *Türkçe Sözlük*. Ankara: Türk Dil Kurumu.
- Tunçel, H. (2000). Türkiye'de İsmi Değiştirilen Köyler. *Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 10(2), 23-34.
- TÜİK. (2020). *31 Aralık 2020 Tarihli Adrese Dayalı Nüfus Kayıt Sistemi (ADNKS) İllere Göre İl/İlçe Merkezleri İle Belde/Köy Nüfusları*. Ankara: Türkiye İstatistik Kurumu.
- Tülücü, S. (1997). Hâtim et-Tâî. *TDV İslam Ansiklopedisi*, Cîld 16, 472-473.
- Valî, S. (2018). *Kurdên Yarsan*. (Wer. S. O. Reşitoğlu) Stenbol: Avesta.
- www.sarkisozlerihd.com. "www.sarkisozlerihd.com: <http://www.sarkisozlerihd.com/sarkisozu/kardes-turkuler-elo-dino/>"
- Yağmur, Ö. (2014). Höbek köyü Yer Adları Üzerine Bir İnceleme. *Türk Dili ve Edebiyatı Dergisi*, 49(49), 243-262.
- Yavuz, S., & Şenel, M. (2013). Yer Adları (Toponim) Terimler Sözlüğü. *Turkish Studies-International Periodical For the Languages, Literature and History of Turkish or Turkic Volume*(8/8), 2239-2254.
- Yediyıldız, B. (1984). Türkiye'de Yer Adı Verme Usulleri. *Türk Yer Adları Sempozyumu Bildirileri* (r. 25-41). Ankara: Başbakanlık Basımevi.
- Yıldırım, K., Pertev, R., & Aslan, M. (2013). *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*. İstanbul: Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü.
- Yıldırım, S. (2012). Kazak Türklerinin Toponomik Efsaneleri. *Turkish Studies - International Periodical For The Languages, Literature and History of Turkish or Turkic Volume*, 7(1), 2101-2121.
- Yusifov, Y., & Kerimov, S. (2017). *Toponiminin Esasları Üzerine Bir İnceleme* (ç. 2). (Wer. S. Yavuz) Ankara: Asos Yayınları.

Kesen Çavkanî

Hecî Sarîyê Mala Madê (85), Delavê Qesrê, (2016).

Hecî Sebrîyê Mala Eyşo (67), Delavê Qesrê, (2018).

Hecî Smayîlê Mihbo (74), Hacîkasan, (2018).

Hecî Şerîfê Mala Mişo (61), Xirabê Mişkê, (2018).

Hemedê Kurd (47), Delavê Qesrê, (2019).

Hemed Sedîqê Seyd Tahir (40), Evdika, (2018).

Osmanê Besikê (82), Girê Mîra, (2019).

Qasimê Smayîlê Xelîl (34), Rîzok, (2018).

Qudbedînê Emînê Hecî Tahir (39), Hezex, (2019).

Smayîlê Xelîl (78), Rîzok, (2018).

Ûsivê Emerokê (67), Hezex, (2019).

Xelîlê Mexso (81), Delavê Qesrê, (2019).

Zeyneba Mala Eyşo (63), Delavê Qesrê, (2018).

PÊVEK

KUNYENAMEYÊN VEBÊJERAN

Nav û Paşnav	: Qudbedînê Emînê Hecî Tahir
Perwerde	: Lîse
Pîşe	: Bazirgan
Navnîşan	: Hezex
Çavkaniyên Wî	: Deham Acar
Dîroka Berhevkirinê	: 22/01/2019

Nav û Paşnav	: Ûsivê Emerokê
Perwerde	: Dîbistana Seretayî
Pîşe	: Malnîşîn
Navnîşan	: Hezex
Çavkaniyên Wî	: Bav û Kal, Sofî Brahîmê Birho, Emerê Dîwanî, Mele Xelefê Bafeyî
Dîroka Berhevkirinê	: 22/01/2019

Nav û Paşnav	: Hecî Sebrîyê Mala Eyşo
Perwerde	: Dîbistana Seretayî
Pîşe	: Cotkar
Navnîşan	: Delavê Qesrê
Çavkaniyên Wî	: Bav û Kal
Dîroka Berhevkirinê	: 18/12/2018

Nav û Paşnav	: Hecî Sarîyê Mala Madê
Perwerde	: Dibistana Seretayî
Pîşe	: Cotkar
Navnîşan	: Delavê Qesrê
Çavkaniyên Wî	: Mele Mihemedê Mala Qudo
Dîroka Berhevkirinê	: 2016

Nav û Paşnav	: Hemedê Kurd
Perwerde	: Xwende
Pîşe	: Cotkar
Navnîşan	: Delavê Qesrê
Çavkaniyên Wî	: Bav û Kal
Dîroka Berhevkirinê	: 04/02/2019

Nav û Paşnav	: Xelîlê Mexso
Perwerde	: Xwende
Pîşe	: Malnîşîn
Navnîşan	: Delavê Qesrê
Çavkaniyên Wî	: Bav û Kal, Ew bixwe şahidê bûyerê ye (Şîrîn)
Dîroka Berhevkirinê	: 03/03/2019

Nav û Paşnav	: Zeyneba Mala Eyşo
Perwerde	: Nexwende
Pîşe	: Kebanî
Navnîşan	: Delavê Qesrê
Çavkaniyên Wî	: Helîma Evdo
Dîroka Berhevkirinê	: 22/11/2018

Nav û Paşnav	: Hemed Sedîqê Seyd Tahir
Perwerde	: Lîse
Pîşe	: Cotkar, Mele
Navnîşan	: Evdika
Çavkaniyên Wî	: Bav û Kal
Dîroka Berhevkirinê	: 28/12/2018

Nav û Paşnav	: Hecî Smayîlê Mihbo
Perwerde	: Xwende
Pîşe	: Cotkar
Navnîşan	: Hacîkasan
Çavkaniyên Wî	: Bav û Kal
Dîroka Berhevkirinê	: 03/12/2018

Nav û Paşnav	: Osmanê Besikê
Perwerde	: Nexwende
Pîşe	: Cotkar
Navnîşan	: Girê Mîra
Çavkaniyên Wî	: Bav û Kal
Dîroka Berhevkirinê	: 02/01/2019


Nav û Paşnav	: Smayîlê Xelîl
Perwerde	: Nexwende
Pîşe	: Malnişîn
Navnîşan	: Rîzok
Çavkaniyên Wî	: Bav û Kal
Dîroka Berhevkirinê	: 27/11/2018

Nav û Paşnav	: Qasimê Smayîlê Xelîl
Perwerde	: Xwende
Pîşe	: Cotkar
Navnîşan	: Rîzok
Çavkaniyên Wî	: Bixwe şahidê bûyerê ye
Dîroka Berhevkirinê	: 27/11/2018

Nav û Paşnav	: Hecî Şerîfê Mala Mişo
Perwerde	: Nexwende
Pîşe	: Cotkar
Navnîşan	: Xirabê Mişkê
Çavkaniyên Wî	: Bav û Kal
Dîroka Berhevkirinê	: 15/12/2018



WÊNE



Kelha Elo Dîno / Bafe



Barim



Delavê Qesrê



Şêx Şerîf û Girê Rîwanê



Keçika Bikezî / Evdika



Gelîyê Piling / Hacîkasan



Dêrmarok (Mor Evgîn) / Marîn



Kelha Hêtim / Mezra Seyîda



Mizgefta Selmanê Faris / Nisêbîn

(Piştî şerê 2016an ku li navenda Nisêbînê jî rû da, mekanê dîrokî hatîye hilweşandin û
li heman cihê ev avahî wek mizgeftê hatîye avakirin.)



Qesirbelek



Girê Êlim / Rîzok



Darê Hacî Bekirê (li jêr) û Zîyareta Êlim (li jor) / Rîzok-Girê Êlim



Tildîb



Xirabê Mişkê

Binîhelalî

Rahme li dê û bavê hazira. Dibê Şerîfê Mekihê hebû û dibê ev Şêx Şerîfê Rîwanê¹ Şerîfê Mekihê ye. Vêca ma'lûm e hingê hê nehatîye Rîwanê li Mekihê ye. Ew û Şêx Hadîrê go Şêhadîr² pê bi nav kirine tev da hatine va da di herba kafîra wa da şehîd ketine. Vêca dibê Melik Serkîs, Şerîfê Mekihê standibû, êla wî kiribû bin emrê xwe da. Weke niha tirk dibê îcra û kurmanç dibê hasil; hasila xwe dista. Di bin hikmîya wî da bû sîleh jî lê qedexe kiribûn. Melik Serkîs jî qewmekî cihûwa bû. Vêca dihat serê deh miha mihek ji Şerîfê Mekihê dista, serê deh bizina bizinek jê dista, serê deh deviha devihêk jê dista. Vêca dibê heft sala nehat. Şerîfê Mekihê go ev heft sal e nehatîye hasila xwe nestandîye belkî emrê wî ser me rabûwe. Sala heştî ma'mûrê wî hatin go em çend sala nehatin, em ê heft qet hasila xwe stênin û em ê kevine nav bajarê Mekihê da bê çi keçikê spehî hebin em ê wa jî ji xwe ra bin. Vêca ma'lûm e lev gihane hevdû, Şerîfê Mekihê jî go Wele heta niha malê dinyayê bi mi netêsheha vêca namûs zor e, namûs jî li ber pîya çû. Civîn çêkirin go ka ma em çi bikin. Gotin go hinek hene navê wa Binîhelalî ne. Go ha em ê çin xwe li Xwidê û bextê wa girin. Heke li ber barê me rabûn wê me ji bin emrê vî kafîrî derxin û heke nerabûn jî ne sîlehe me hene û ne qeweta me heye, wê weke xwe bi me ra kê. Hêdîka dibê ma kî yê çê kî naçê? Dibê hêdîka Şêx Şerîf û wezîrê xwe li hespê xwe siwar dibin û dipirsîn. Dibê miho bi pîrsa diçê qursa, dipirsîn diçîn. Binîhelalî li kû ne, Binîhelalî li kû ne ji camêra dipirsîn. Digihine garanek dewar, rokkê heta êvarî di nav wê garana dewêr ra dimeşin dibê ev garana kê ye, ev dewarê kû we? Dibê garana Binîhelalîya ye. Ew îjdeh roj bû meşîbûn, bû nozdeh roj. Bîst û yek rojê meşîne, roja ketine bîstê da ketine nav kerîk devih da. Rokkê heta êvarî di nav devihê ra meşîne. Gotine ma ev garana devihê ya kê ye? Gotine yê Binîhelalîya ne. Piştî go devih xilas kirine gihane kerîk pez, rokkê heta êvarî di nav wî kerîyê pêz ra meşîne. Ev pezê lê ye? Go pezê Binîhelalîya ye. Piştî pez xilas kirin ketne êlekê da, êleke mezin e ne serî ye ne binî ye. Diçîn dimeyênin go konekî mezin wî di nîvê êlê da veda ye. Dibê hebê nebê mezina wa li binê vî konî ne. Diçîn go xwarinxane ye, rojê çil insan diçê binê wê xwarinxanê xwarin dixwê û derdikevê û kes li kesî napîrsê. Go yaw ev çawa çêdikin! Şerîfê Mekihê diçê sofîkkî dibînê. Dibê selama'lêkim; 'elêkûmesselam. Dibê sofî! Dibê ho! Dibê Wele em hatine go hûn me xilas bikin, em ji ber zilmekê revîne, zilma Melik Serkîs. Lê kes li me napîrsê! [Sofî] dibê çil rojî hûn dibînê vî konî da xwarinê bixwin wê ji nûka kevine wê ferqîye go hûn xerîb in. Lê heke 'îşekî we yî lezgînî heye ji me ra bêjin em ê 'îşê we pêk ênin. Ez ê bi şexsê xwe çime cem Sultan Kazim (Sultan Kazim jî li binê kon e). Werhasil dibê Wele em ji Mekihê hatine, ez Şerîfê Mekihê me û ev jî wezîrê min e û 'îşê me gelekî lezgînî ye. Em dixwazin go rokkê berî rokkê hûn 'îşê me çêbikin, me pêk bînin û me li ser rêya me bişîyênin. Ya bê na ya bê herê. Sofî diçê cem Sultan Kazim, selama'lêk; 'elêkûmesselam. Dibê Wele Sultanê mi tişteki halo heye, ji Mekihê mêhvanê te hatine dibê e[z] Şerîfê Mekihê me û 'îşê wî lezgînî ye. (Dibê 'îşê lezgînî bê sê roj in, dîsa di wê sa'etê da çênabê.) Sê rojê wa çêbûn çûne cem Sultan Kazim. Selama'lêkim; 'elêkûmesselam. Hûn bi xêr hatin ya mêhvanê 'ezîz, ser serê mi ser ça'vê mi hatin. Mexseda xwe bêjin ji mi ra; Sultan Kazim dibêjê. Dibê e[z] Şerîfê Mekihê me û ev jî wezîrê min e. Em ji Mekihê hatine me xwe li Xwidê û derîyê te girtîye. Melik Serkîs heye, melikkî gawira ye, em standine û em di bin emrê wa da ne. Hersal tê hasilê ji me distênê, heft sala nehatîye niha dibê wê heftqet hasilê ji me stênê. Gotîye ez ê kevine nav êlê da çi keçikê spehî jî hebin ez ê ji xwe ra, ji ma'mûrê xwe ra bim. Vêca mala dinyayê erê lê bi Xwidê namûs bi mi têsêhê. Me xwe li Xwidê û derîyê te girtîye. Dibê wilo di rayê melkomot ji nava va herd[û] birhê wî sîx dibin, hingî diqêherê. [Sultan Kazim] delêlî diberdê nava êlê dibê insanê go bi kêrî darekî û kevirêkî û qetêke xencera û qetekî şûr û mertala werê, lazim e di şûxilê sê sa'eta da li vê dê bin.

Meydanake wilo mezin e, ma'lûm e delêlî berdaye nava êlê, ji hîrhîrê dewara û çingêçingê şûr û mertala û req û req û req û gurm û gurm û gurm êtimê dikin, xwe perwerde dikin. Yanî go xwelî hildêrabana ji siwara nedigiha 'erdê. Wî sofîyê hinga pêşî çûyîn jê pîrsîn go yaw win ê vîqa 'eskerî bine

¹⁰⁵ Teksta vê vegotinê 13 rûpel girtine lewma me di beşa sêyem da tenê cihên têkildar bi cî kirine. Me giştîyê tekstê di pêvekê da daye da ku herikbarî têk neçe û bigihîje ber destê lêkoleran.

¹ Ziyareta Şêx Şerîf e û di navbera Delavê Qesrê û Xirabê Mişkê da ye.

² Gundekî Hezêxê ye ku di navbera Nisêbîn û Cizîrê da ye.

Mekihê belkî sê heyva belkî salekê ev 'esker herbê bikê! Careke dî gote Sultan Kazim go ez dixwazim ti tiştêkî sivik bi wa ra bişîyênê. Belkî ji wa newê vîqa 'eskerî xwidî bikin. Wexta wilo got, go Sultan Kazim go hêêê! Herkesekê herine malê xwe û ti kes li vê derê nemênin. Siwar û pêlewana û filan, werhasil herkesekê çûne malê xwe, kes li wê dê nema. Hêdîka go çi ye, ne çi ye? Sultan Kazim go bakine Risk, Riskî Binhelalî. Pêlewana wa, şervanê mezin ew e. Yanî yê go 'eşîra safî dikê, yê go êla distênê, yê go dewleta ji wa ra safî dikê ew e. Bakirne Riskî Binhelalî, Risk hat. Gote Risk go zanê? Go ê! Go hal û meselê me û birayê me yê misirman ew e. Em dixwazin ti herê wa ji bin vê zilm û zorîyê [derxê], heta bi namûsa wa li ber pîya çûwe û ti wa ji bin desta derxê. Go ez qebûl dikim paaşa mi lê ez tiştêkî dixwazim, daxwazîkê mi jî heye. Go ma daxwazîya te çi ye? Go ez ê kevime nav êlê da ez ê di pêlewana neqênim. E[z] bi tenê nikarim herim, ez ê di pêlewana neqênim. Go ti serbest î. Kete nav êlê da, rokkê heta êvarî li nav êlê gereha yekî bi dilê xwe go ça 'vê wî jê tişî bibê nedî. Go şivan li kû ne, gavan li kû ne? Go şivan li wa dê ha ne. Go çû go yekî ji xwe ra kolikî çêkirîye û razahaye. Go çû pehînek li binê pîyê wî, go şaş nebû nas kir û go 'eynî weke 'eskerîyê silav jê ra veda. Go de bêje paşayê mi bê ma ti bi çi mexsedê û çi daxwazîya te heye ti hatîye. [Risk] dibê navê te bi xêr? Dibê navê mi Girik. Dibê ser sera, ser ça'va, ti ji mi ra lazim î. Dibê ma hevalna te hene? Dibê aha ev kolika ha kîlometreyek dowa sêya li vê da ha ye hevalekî mi [li wir] heye. Diçin. 'Eynî weke wî pehînekê li binê pîyê wî jî didê, ew jî 'eynî wilo dibêjê. Dibê ma navê te bi xêr? Dibê navê mi Binik. Dibê Girik û Benik ji mi ra lazim in Wele, tamam werin. Têne binê konê Sultan Kazim. Dibêjê Şerîfê Mekihê û wezîrê wî dibê em ê va bi we ra şîyênin. Wezîrê Şerîfê Mekihê dibêjîyê dibê yaw 'eskerê Melik Serkîs bi hezara ye, ev ê ên henekê xwe bi me kin! Ev her sê sêwîkê ha wê çi ji me ra kin? Go bi Xwidê heta ti îmze nekê û ti mohr jî nekê [qîma mi nayê], ji bo go wî wextî Melik Serkîs me bistênê ez bê Şerîfê Mekihê kirîye ne bi min e. Şerîfê Mekihê îmze kir û mohr jî kir. Dimeşin tîn û her sê bi wa ra ne. Tîn dimeyzênin ma'mûr wî di meclîsa Mekihê da hesaba dîkin. Pêz hesêb dîkin û pîreka hesêb dîkin û deviha hesêb dîkin û çêleka hesêb dîkin, yanî çiqasê ber bahra me kevê. Risk go yaw ev ditijbihê dewleta, va insana henekê xwe bi me kirîye! Evqa ma'mûrê wa filan bêhvanê wa, Welleh meselek di vê da heye. Go hêdîka devê xwe kire ber guhê Şerîfê Mekihê da go ma ev ma'mûrê kê ne? (Heke Şerîfê Mekihê gotibana ev ma'mûrê min in wî baz din.) Dibê Wele ew Melikê ez standim, ev ma'mûrê wa ne hatine hasilê. Hatine pîreka û hatine mêl û hatine zêra û hatine çêleka û hatine deviha û hatine pêz û... Dibê nabê? Dibê Welleh. Hinga wilo dibêjê dibê wilo siz dibin mûwê wî [Yê Risk] û carekê şûrê xwe dihildê û qîrekê didê. Dibê ez Riskî Binhelalî me! Ma we nizanîbû go rihê we wê bi destê mi ê standin, hûn hatine çi? Ê bi nav wa dikevê, pelq û pelq û pelq... Şûra li serê wa didê weke go ti darê xwe li serê serteşîka dê bîst û pênc metra serê wa difirê. Çil ma'mûr e sih û heşta dikujê dowa dihêlê. Dowa dihêlê, ça'vê yekî dipeqênê û pîyê yekî dişkênê û wî yê pîyê wî şikestî li wî yê bi ça'vekî siwar dikê dibê lazim e halo û bi vê temkêlê ew Melik Serkîs te bibînê. Bê Welleh Riskî Binhelalî hatîye 'emrê te nemaye heta sibe vî wextî wê serê te jê kê. Hûn tîn bi namûsa misirman dileyîzin!

Melik Serkîs jî li serê qesra xwe ye û bi dûrbênê dimeyzênê dibê Wele wê niha ên û wê çêleka ênin û wê pêz ênin û wê keçîka ênin û wê dansozcîya ênin û [e]z ê çime pêşîya wa û... Ji xwe ra diçênê nîskê wilo ji xwe ra xweş dikê. Halo dimeyzênê go do wî hevdû dihilgirin dibê hey namûsîzê namûsîz! Hingî çûne pez standine û hingî keçîk anîne har bûne, vexwarine wî serxweş bûne 'or'orê wa wî bi ser mi da tîn. Her[î]ne pêşîya va serê va jê kin xirabûne! Tîn, dimeyzênê, dibê ma çi ye, xêr e? Wilo lal bûne, ma'lûm e bi ça'vê xwe dîtine û bi guhê xwe his kirine. Wilo lal dibin dibê hhhhaaaa [e]m ê niha qûna te bînin, sssssibe qewlê te maye, RRRRRRRRRRiskê Binhelalî wê ssssserê te jê kê! Nabê? Dibê hal û mesele ew e. Dibê heta niha mi karîbû namûsa Şerîfê Mekihê jê bistênim, ev tiştê ha jî bi mi kir! Dibê delêlî berdana nava êla xwe go însanê go di mala xwe da bimênê, ji xey pîreka zilamê ser çardeh salî ra di mala xwe da bimênê, serê wî yê jê bê. Lazim e hê melê bang nedayî, bi fecrê ra dora Mekihê bibê [çember] çûk bixwe jî nikaribê bifirê! Heta bi zaroka ser pêçekê werê kuştin, 'efû nîn e. Hinga go ma'lûm e [Risk] her çil ma'mûr kuşt, Şerîfê Mekihê gote wezîrê xwe go te digo ev her sê sêwîk, te dît bê çi kirin? [Wezîr] go ma çi ne? Em ê sibe hevdû bînin! Şerîfê Mekihê go tamam em ê hevdû bînin.

Go hê fecrê nevedayî go dora Mekihê aha halo kirin³, kirne çeqûber, kirne xefk. Ji hîrehîrê dewara û ji şûra û vêca dîloka dibêjin, dikine toz însan di nav tozê ra xuya nakê. Dibê wezîr dirabê

³ Çîrokbêj bi destê xwe nîşan dide ku Mekihê dorpêç dîkin.

limêja sibihê halo dimeyzênê go wî bi wî mûcibî, carekê wezîr diçê cem Şêx Şerîf. Go rabe mêro! Te digo ev her sê sêwîya ha, de ka vêca rabe ji xwe ra li 'esker meyzêne. Bi Xwidê namûs jî çû û heta bi zaroka pêçekê serê wê yê ê jêkirin! Heqeten Şêx Şerîf çû meyzand, yanî bizdeha, gelekî tirseha. Çû gote Risk. Wele Risk rabû limêj kir, halo meyzî, aqilê Risk ne ji wî 'eskerî girt, ne ji qeweta wa girt. Wilo xwe beşîşand, kenî go qahwekka min a wilo giran çêbikin. Wele qahwekke wî ya giran çêkirin... Û hê wezîr dibê evna sêhrbazine, wê me di vî halî da hêlin û baz din. Go qahwa xwe vexwer û wilo efendî efendî rahişte şûrê xwe û çû pêşîya wê kûmata esker. Şûrê xwe go hih li 'erdê da wilo kir go sê bosta bi 'erdê da çû. Şûrê xwe çiqand û go ez ê tişteki ji we ra bêjim. Go de bêj e. Go ez naxwazim go xwîn birijihê û em qetli'amê bikin. Vêca heke hûn werine ser destê min û hûn bi dilekî xweş û geş misirman bibin Welleh ez ê we 'efû kim. Lê heke go hûn bê herb, ez ê bi hezara we kujim jî û dawîyê dîsa win ê êne ber destê min, hûn ê teslîmî mi bin çinkû mimkûn nîn e. Go sêwîkê çepel î heram! Em hatine çi, bê ti çi çîroka ji me ra dibêjê. Go Wele em ê pêlewana berdine hevdû. [Risk] bakire Benik go birazî xwe berde meydanê. Wele Benik xwe berda meydanê. Danê sibihî Benik çil pêlewana ji wa kuşt. Girik dibêjê Risk dibê amo em herin Benik wê bêjê mi, mi çil kuştîye û Girik tişteki nekirîye. Dora min e vêca mi jî berde meydanê. Dibê danê êvarî Girik heftê kuşt. Dîsa Risk dibakê wa dibê hûn dibînin, evna min bi xwe ra anîna weke tişteki go sebra mi bi wa tê. Nego yanî mi anîne qewetekê didine mi ya wê we kujin. Ev ne qewetek e, ev sebrek e mi bi xwe ra anîye vêca ez dixwazim go hûn wer[i]ne ser destê min, bibine însan, bibine misirman. Yaw teslîm bibin, ez ê tişteki ênime serê we go hê bê bi konê havînî nekirî. Ez ê kim go kur bavê nas nekê û bav weled nas nekê. Yê nemirî jî wê dîn bê. Dibê ti çi ji me ra dibêjê yaw sêwîkê çepel! [Risk] dibê hûn dixwazin em ê sibe [dewam] kin, [dixwazin niha]. Dibê em ê sibe kin. Risk dibê Wele xwidîyê sibe jî Xwida ye û xwidîyê niha jî Xwida ye, ser sera ser ça'va em ê sibe kin. (Ma'lûm e ew jî dibê heta sibe em ê qeweta xwe lev dine hevdû.)

Wele go roja dî rojê hilat Risk gote Girik û Benik go meyzênin go e[z] dikevime herbê da ez cîya xwe nas nakim, ez bavê xwe nas nakim û ez xalê xwe nas nakim; ez kesî nas nakim. Go ez tê da germ dibim şev nîvê şevê û ro bi nîro li ber mi yek e. Ez nizanîm çi dikim, vêca Xwidê nekê go hûn bikevine ber şûrê mi da ez ê we jî kujim. Vêca xwe tevlî nekin, herin li dereke bilind rûnihin û sadece li mi temaşê bikin. Herdik dibê temam. Hêdîka wexta go wilo ber bi hevdû diçin Girik û Benik dikevime soqaqê teng da nahêlin kes bifilitê. Girik dikevê derekê pêşîya wa da û Benik dikevê derekê da û hema wî 'eskerî weke mewcê avê bi ser [Risk] da lê didin û Risk bi şûrê xwe... Vêca yanî ji cenaza... [Risk] halo meyzî go yaw Welleh hew ûjdanê mi qebûl dikê, mi ev 'esker qela[nd], guneh e! Hicûm kir, di nîvê wa da serê Melik Serkîs jê kir û bi serê rimê ve kir. Serê wî halo di nav wa da hilda û go meyzênin ev serê Melik Serkîs e vêca teslîm bibin. Go îde hemûçik dirûnihin, sîlehê xwe dideynin û digirin û şahdandinê ténin dibê eşhedûenlailaheîlallahweêshedûennemuhemmedresûlillah. [Risk] dibê zanê! Dibê ê! Dibê ji îro pê da hûn ê di bin emrê Şêx Şerîf da bin. Go hêdîka Şêx Şerîf çû gote wezîrê xwe go te dît? Wezîr go Welleh mi nizanîbû halo ne ma mi'j kû zanîbû ev pêlewane halo ne! Mi bawer nedikir yê halo di dinyayê da hebin! Mi nedîtîbûn, mi his nekirîbûn! [Şêx Şerîf] go his bike û bibîne.

Ma'lûm e vêca Mekihê civînê xwe çêkirin (tişteki wilo ji wa ra kirine, zêdeyî qeweta însanî ye go xelefa wa li wa vegeerênê) go gelo ma em çi ji va ra bikin? Em zêr bidine wa zengîn in, em malê bidine wa nabin. Em çi ji va ra bikin? Hêdîka Şêx Şerîf diçê dibêjê Risk dibê birazî! Dibê ho. Dibê birazî ez ê pirsekê ji te kim. Dibê bêje amo. Dibê ma te jin anîye an te jin neanîye? Dibê Wele ez azib im. Dibê ez ê tişteki ji te ra bêjim go ti qebûl bikê. Dibê bêje amo. Dibê keçeke mi heye ez ê dime te, başqe e[z] nikarim xelefa we vegeerênim. (Ma'lûm e şahreza ye xwe bi mirhovatîyê jî bi wa ve girêdidê. Ji boy çi? Ji boy rojekê di tengayîkke dî da jî bi kêrî werin.) [Risk] dibê amo! Dibê ho. Dibê Welleh billeh tilleh, hê mi ça'vê xwe neberdaye însanî lê piştî go ti keça xwe layîqî mi dibîne, mi nedîtî qebûl kir. Dibê ser sera, ser ça'va. Wele diçê li keçikê dimeyzênê, bawer ke weke libeke tîrî a go di nava dirihêkê da ne derba însana lê werê û ne derba moza lê werê ew liba tîrî bi dilê xwe bigihê. Ew keçik wilo spehî bû. Navê wê Xedra bû. Risk ça'v lê kir wilo ne bi dilekî bi hezar dilî dilê wî ketîyê da. Heta hingî wî însanî li keçika nemeyzandibû. Û ma'lûm e keçikê bi ça'vê serê xwe dît bê pêlewaneke çawa ye, çi pêlewaneke bi serketî ye û çi pêlewaneke jêhatî ye. Hê di herbê da keçikê ça'vê xwe berdabûyê da. Vêca go birazî ma te qebûl kir, wilo kenî go amo mi qebûl kir. Go vêca birazî bila Girik û Benik bikevine nav Mekihê da harekê yeke xwe bineqênin. Go amo haşa em nehatine wilo, heta te bivê keçikê Binîhelalîya hene, bila Girik û Benik belkî harekê ji xwe ra yek dîtine jî. Bi Xwidê mi nehişt Girik û Benik bikevine nav êlê

da û ji xwe ra bineqênin. Go temam. Go vêca birazî daxwazîkke mi'j te heye. Go de bêje amo. Go heçî zerîyê me ne go kurik [ji wa ra] çêdibin a reş e hebeşî ne û go keçîk in tavêjine dîyê xwe. Go keçîkte jî çêbibin wê 'eynî weke cîya xwe spehî bin û go kurik çêbibin li mi meyzê, wê avêjê kalîkê xwe naavêjê we (heqeten jî dibê Şêx Şerîf jî reş î hebeşî bû). Vêca [e]z ê kaxezekê yaskim vê kaxezê bide Sultan Kazim. Ji boy go wî wextî haşa haşa hinek bê cîya wî jî xweşik e û bavê wî jî xweşik e, ev kurîkê reş î hebeşî ne ji bavê xwe ye. Ji boy go xebera wa jê hebê Şêx Şerîf îmze kirîye û mohra xwe jî lê daye. Go ser serê mi, ser ça'vê mi û bi rê dikevin tên. Ma'lûm e hingî wilo keçîkke spehî ya delal e û hingî ew pêlewaneî wilo we, di nav wê 'eşqa xwe da ew kaxeza xwe ji bîr kirin. Kaxez winda bû çû. Kaxezê nadine dest Sultan Kazim.

Salek heke salek û niv tê ve diçê Xwidê keçîkkê didê wa. Keçîk jî weke cîya xwe spehî ye. Hinga go zarowê mezinê wa çêdibûn, dibirne binê konê Sultan Kazim, Sultan Kazim ew zarok xelat dikir û nav li wa dikir. Sultan Kazim navê keçîkê kire Malya. Heke sala wê tê ve çû Xwidê Ti'eala kurek da wa, yekî reş î hebeşî. Ji nûka bi wa da ket li kaxezê gerehan. Na bavo! Kaxez winda bû çû, di sal sê sal e, ka şewitîye, li derna ketîye kî zanê. Go bi dilekî kul î perixî çarîkke reş bi ser rûkê wî kurkî da kirin go da hema kes nebîne heta em bibine cem Sultan Kazim. Bi rê da sofîkkî çarîka wî ser riwê wî hilda go reş î hebeşî, go aaaa'ew ev î çîqa reş e, Wele ti dibê qey ji Berekê e.⁴ Dilê wî ji pîreka wî sar bû û ji bebeka wî sar bû. Ê zanê pîreka wî çîqa temîz e çîqa paqîj e, keça kê ye. Yanî Şêx Şerîf ew kaxez nedabana wa wî pîreka xwe kujê, wî bê ne ji min e ev kur. Go bi Xwidê vî got wê niha bela bê, hê nav derneketî... Hêdîka vegerehan, negihane binê kon. Bakire di xulamê xwe herin bi destê Xedra bigirin bibine mala bavê wê û piştî ça'vê Xedra jî mehra jina li mi heram bê. Hêdîka Xedra birin. Sê roja meşîn Xedra gote wa tiştêkî ji we ra bêjim? Go de bêje. Go ez keça filankes im, wê ji bavê mi ra bê kêmayî, xelkê bê ma gelo Xedra dizî kirîye ya qehbîrî kirîye. Serê bavê min ê ew tewandin di nav mîletê wî da. Vêca ez dixwazim go hûn herin hûn bêjin me bir û Xwidê ji mi ra jî mezin e. Kurîkê wê jî heştrojî ye pê ra ye û devihkike û çadîrkîk li ser piştê devihê ye dera go lê rûnê wê çadîrka xwe lê vedê. Xulam jî vegerehan, xwe dehpazdeh roja sêwixandin yanî vêca em çûne Mekîhê. Çûn go Wele me bir. [Risk] go emanet emanet, ev xebera ha ji devê we bifîlîte ez ê serê we jê kim.

Xedra jî diçê xwe li êleke misirmanî digirê, hinekî jê dûr çadîrka xwe vedaye. Mela jî dimeyzênê go çadîreke li wê dê. Mela mezinê wê êlê ye. Ma'lûm e wî wextî xela hebû xelkê diçûn der teftîş dikirin herb dibirne ser wa. Xwe li derê xweş digirtin. [Melê] go va ha çadîreke herin ma ew kî ye. Diçin go pîreke tenê ye, bebekî pê ra ye û digirî hêstirê wê weke baranê têne xwarê. Dibê xweham ti çi kesek î, ti ji kû wî? Dibê e[z] ji vir im. Dibê ma ti keça kê yî? Dibê ez keça gelê vir im. Hema wilo dibêjê. Careke dî divegerihin diçin ji melê ra dibêjin. Dibê bi Xwidê halo dibêjê. Dibê herin bînine cem min. Diçin Xedra tînine cem melê. Dibê keçam ti çi kesek î, ti ji kû wî? Dibê ji vir im. Dibê ti keça kê yî? Dibê ez keça te me. Hinga go dobê ez keça te me wilo kezaba wî şewîtî, Xwidê avête dilê wî weke go rastî keça wî. Go wexta ti dibêjê ez ji vir im û ez keça te me, keça mi be û li vir be. Aha ev dayra ha ji te ra û ti keça min, ser sera û ser ça'va. Vêca wextê dikevine nav wê êlê da Xwidê ji cem xwe hema bi hişkere bereketê tavêjê nav wê êlê. Robiro mîlet zengîn dibê, robiro perê wa çêdibin, pezê wa mê tînin, çêlek mê tînin, dexla wa çîltohvî dibê. Hinga go wî sofî negotî ti dibê qey ji Berekê e, wê êlê navê wî bebekî dîsa nekirine Berekat! Yanî bereket li ber pîyê wî hat.

Hêdîka go em ê çi kin em ê çi nakin? Melê çû dereke bilind bakir: Go îsal heywana mê bê; pez, çêlek, devih, bizin, çi mê bê ji Berekê ra. Xelkê go yaw ev pîrek ji kû hatîye bûwe keça wî em nîzanin, hevaltîya keça xwe dikê. Wê salê haşa heta bi kitika û dêlika mê anî. Bitûnê pêz, çeleka, deviha, golika hemû danê da. Sala dî dîsa [melê] bakir: Go îsal tiştê nêr bê hemû ji Berekê ra. Wê salê her tiştî nêr anî. Ê bû çi? Bû zengînê wê êlê ew.

Vêca [Berekat] dixwend, xwendevan bû. Wî û kurê melê tev da di zanîngehekê da dixwendin. Bela xwe li kurê melê dida digo em tiştêkî ji vê xwendinê fêhm nakin, em ê ji xwe ra çîne nêçîrê. Li kurê melê dida bi xwe ra dibire çîyê diçûne nêçîrê. Bi darê xwe û bi kevira wê hero sê-çar xizala kujê û li hespê xwe kê û ênê malê. Rokkê ew û nêçîrvan ketne qarşê hev da. Meyzand go ewê dî sîleh bi wa ra ne, şûr û mertalê wa filan bêhvanê wa. Qîr dane hev meyza go bi Xwidê em destevala ne û sîlehê va, wê me

⁴ Weke go niha miho bê qirdik, yekî wilo mekroh bû. (Çîrokbêj)

kujin! Xwe kêmi wa kir. Hate mal go yadê bi Xwidê hal û meselê me ev e, hinekê me kujin. Gelo çima sîlehê hemû kesî hene û ye mê nîn in. (Weke Şerîfê Mekihê, Melik Rabî ew êl standibû xistibû bin emrê xwe da. Sîleh li wa qedexê bûn ji boy go li ber wa nerabin. Cîya wî zanîbû lê jê ra nedigo.) Cîya wî go kurê'm [e]z ê çime cem bavê xwe ez ê ji we ra sîlehna xwazim. Wela Xedra diçê cem melê dibê yabo ez hatime daxwazîkke mi heye. Dibê bêje keça'm, çi ye? Dibê ev zarokê me diçine va çîya, yaw dahbennê wa xwin, gurnê wa xwin, hirçnê wa xwin. Hema tiştêkî go xwe pê bihevîzênin... Bê ma ti naçê iznê naxwazê ji Melik Rabî... Dibê keça'm bi Xwidê heta niha mi xwe bi xêra wî nekiribû lê ji bona vê çika te ez ê çim xwe bi xêra wî kim. Wele diçê. Diçê cem Melik Rabî, li dirîzana⁵ wî dirûnihê. [Melik Rabî] dibê ma xêr e? dibê hal û meselê kurkê me ev e, Welehî hirçnê wa xwin! Hingî ji nêçîrê hez dîkin [nîza] çilo ji devê hirça fîlîtîne. Vêca ez dexîlê te û Xwidê me, (dergûşeke wa heye) e[z] di bextê vê dergûşê da me bê ma ti hema harekê tiştîkkî sivik [nadê wa] go hema xwe pê bihevîzênin. [Melik Rabî] dibê melê bibîne cephanelikê, çi dineqênê bila bineqênê. Wele melê dibîne cephanelikê, sîlehê spehî kîjan in, yê go karin pê xwe bihevîzênin, yê go pê karin herbê bikin, wa dibê. Wa ji wa ra dibê û didê Bereket û kurê xwe.

Go roja Berekat derdikete nav êlê serê çardeh zarokê hevalê xwe dişka. Wilqasî belaloyî bû, mêr bû. Vêca digo hema bi bela wî bi heywana kevê ne bin însana kevê, diberna bi çîyê da, digo bila bi çîyê da herê. Rojekê hat bi rê da giha talenekî, heke silaf da neda hate mal. Cîya wî go kurê'm ma bi rê da ti negihayî tiştêkî? Go yadê gihome talenekî, ne wa ji mi pîrsî ne mi ji wa pîrsî. Go kurê'm, Melik Rabî heye hal û mesele ev e, Wele bavê te standîye. Heta niha mi nedigot vêca heta ti piçîkkî mezin bûyî. Êla bavê te standîye, wa cirm dikê, tê hasilê, pêz distênê, nizam çi distênê... Aha yê te jî di nav wî talanî da ne. Dibê yadê ma heta niha çima we ji mi ra nedigot? Li hespê xwe siwar dibê û diçê. Talan digihê go biqulibê herê û talên divegerênê. ([Yê go talan birin] dibê mitirb hene da'wa tiştîkkî ji xwe ra dîkin) dibê ma ti da'wa çi dikê law? Dibê ka sed wereqeyî. Dibê yaw ka sed wereqeyî bidînê belawî li nav guhê wî xin! [Berekat] dibê e[z] sedî nabim, ka disedî. Disedî jî didînê, dibê disedî nabim ka çarsedî. Her sêqet-çarqet dikê. Dibê sêwîyê çepel î heram! Rajine şûrekî li qahfê serê wî din! Carekê dikevê nav wa da. Dikevê nav wa da kerê wa di korê wa ve tîne. Çil e, do difilitin. Weke tîra ji devê kevên derkevê, toz bi ser serê wa dikevê û dibezin. Bi ça'vê xwe dîtin bê çawa çêkir, li serê wa dida dîkir go bîst û pênc metra serê wa difirî. Melik Rabî li serê qesrê ye dibê haaaaw! Hingî talan anîne wî har bûne. Bezî pêşîya wa go xêr e, çî bû, çima win halo dîkin? Go bi Xwidê yekî di nav wa da ye dibê Berekat... Bi Xwidê hikmê me nema, mez[i]natîya me çû! Mi nedîtîye ne kesî ev teknîka herbê kirîye û mi ne pêlewane halo dîtine. Kes xwe li ber nagirê, go ne Xwidê bidê 'erdê kes nikarê bidê 'erdê.

Hinga go talan vegereha melê çû gote Xedra go keça'm, kurê te 'ecêb çêkir! Welleh namûs li ber pîya çû! Ev çi bela bû mi'j xwe ra çêkir. Êvarî xew nekete ça'vê melê da ji tîrsa. Bi fecrê ra dora êla melê kirne çeqûber nehiştin go çûk bifirê. Yanî nêhta wa go hema bi rohilat ra tiştêkî nehêlin. Carekê melê hat gote Xedra, go keça'm ka vêca rabê dey li vî ke. Ma vî çi 'ecêb rakir. Wela Xedra dey li kurê xwe kir go kurê'm rabe, te kir vêca safî ke! Te xirakirîye lazim e tê çê jî kê. Wele rabû limêja xwe kir û 'eynî weke bavê xwe, go yadê çakke mi l'êgir ke. Ebeden jê ra ne derd e. Bawer ke ji tîrsa mîz jî nema xwe di melê da digirê... Xwe berda pêşîya wa. Go zanê! Go ê. Go ez bi Xwidê kim go navê xwe li kesî nekirî, go ez ê tiştêkî ênime serê we go zarok ji tîrsa di zîkê cîya xwe da nemênê, pîrek berê xwe bavêjê! Destê xwe li singa xwe da go ez Berekat im û dest bi zirta kir. Go bê sêwîkkî çawa ye... Ê carekê bi nav wa ket wilo kir go insan nikarbin ji cenaza pîyê xwe bavêjin. Hicûm kir û serê Melik Rabî jê kir. Eynî weke bavê xwe serê Melik Rabî bi rimê ve kir go teslîm bibin. Heta nîro xwe negirtin teslîm bûn, ketne bin destê wî da.

Mela çû go Xedra wî firavîna wî çêkirîye, bezî go keça'm Xwidê ev ji kû ve ji mi ra şîyandîye! (Heta hingî digo win bûne bela serê mi.) Ev na'met, ev Berekat... Go îro ez karim bi dinyayê ra şêr bikim, go qeweta mi gihaye qeweteke gelekî mezin. Xwidê ev qewet ji kû ve ji mi ra şîya[nd]! Wilo kêfxweş e, ev çend sal e di bin wê zîlm û zorîyê da ye û wilo bi carekê ra kete ferehayîkke xweş. Go yabo! Go ho! Go e[z] zanim bê kurê kê ye, ji kê ye.

⁵ Weke go ti bê dîwana wî. (Çîrokbêj)

Rokkê [Berekat] hat go yadê, îro ji vî alîyê bakur zêde zêde xizal dihatin bi ser me da. Cîya wî fêhm kir go li nav Binîhelalîya xela rabûwe û xizal ji ber Binîhelalîya direvin. Ma 'lûm e birçî ne wa dikujin bi ser wa da tîn. Cîya wî behsa Binîhelalîya ne kir, go kurê'm belkî di derna da beledin hene xela dirabê, heywan jî xwe li beledê xweş digirin. Ew ji ber wilo tîn. Roja dî go yadê ma çîqa îro gur û rovî û ew dihatin! Dîsa cîya wî wilo jê ra got. (Te dî heta miho neçê ser kêroşkê, kêroşk narabê, xewgiran e.) [Rojê dî] go yadê ma çîqa îro kêroşk dihatin! Cîya wî fêhm kir go Binîhelalî nêzîkî wa bûne lê dîsa wilo gotîyê da. Roja dî halo meyzandin go va êleke wilo mezin, çar cara li êla wa, di tihêla êla wa da danîye. Ne bi mino ne bi tewo! Bereket go ma hinek hene go pîyê xwe li binê pîyê mi din û werine miqabilê min! Go ez kesî ser xwe ra hesêb nakim ji Xwidê pê ve! Risk nizanîbû go hê şevqê Berekat wê ê herba wa. Risk diçê nêçîrê wa, Berekat tê pêşîya wa. Dibê hûn çî kesek in? Dibê em Binîhelalî ne. Hûn da 'wa çî dikin? Ev herem herema min e, ev welat mi standîye! Hûn bi çî riwî hatine, hûn hatine çî? Vêca ez dixwazim bê xwîn û hê me hevdû neêşandî û bi dilekî xweş ne bi çî 'vekî bihêstir hûn vegerihin! Hûn ê weledê xwe dine kuştin û bê Wele cinazê weledê me man. Vegerin! Dibê çîqa qure ye, bê çî sêwîkkî bi kû ve ye! Ê bezîne hevdû. [Berekat] çardeh pêlewana ji wa dikujê, her pêlewanê neqandî. Hate malê go yadê hal û meselê me ev e. cîya wî go kurê'm wa qûnrimî ke. Go yadê ma qûnrim çî ye? (Ma 'lûm e mala bavê wê ne. Jê ra nabêjê lê ew zanê. Naxwazê wa bikujê.) Go go te qûna rimê gihande aha vê da wa îde ew çî 'vtirsandî dibin nikarin bi ser te da werin. Bila rima te li laşê wa bikevê lê wa nekuje (yanî mi karîbû te bikujim lê ez te nakujim, mesele ew e). Danê êvarî go yadê îro mi çardeh qûnrim jî kirin. Go 'aferim kurê'm, Welleh ti ji min î, ti kurê min î. Êvarî Risk hat bi girî çûne pêşîya Risk. Go bawer ke pêlewanekî dî vir da ye em poşman bûn hatine vir. Bawer ke ev pêlewan wê me safî kê. Yekî reş e, dibê Berekat. Ne însan xwe li ber digirin... Tiştêk xwe li ber nagirê. Bi Xwidê hal û mesele ev e.

Wele bû roja dî ew Risk çûne hevdû. Heta êvarî li ber hevdû dan. Hate malê go yadê! Go ho! Go bawer ke mi pêlewan dîtine ne weke vî pêlewanî! Go heqeten jî behsa Binîhelalîya dikirin digo pêlewanê halo di nav wa da hene mi bawer nedikir. E[z] dikim û nakim, ez derbê lê nabînim ez bikjuim. Cîya wî go kurê'm ez tiştêkî ji te ra bêjim tê bi ya mi kê? Go a! Go wî pêlewanî bi dest bigire, bêne ji mi ra. Ez ê xwê dimê ez avê nadimê. Go e[z] cîya te bim, şîrê mi l'te heram go ti bi dest negirê! Go yadê soz ez ê wî pêlewanî bi dest girim, bi soza Xwidê û li ber destê te. Roja dî çûnehevdû heta êvarî. Ew karê Risk bikujê lê Risk nikarê wî bikujê. Hema çî 'vê xwe berda girtina Risk. Rokkê heta êvarî çûne hevdû, Risk fêhm kir go çî 'vê xwe berdaye girtina wî. Hêdîka Risk hate nav Binîhelalîya go gelî Binîhelalîno! Heta niha mi dewlet, 'eşîr, êl safî dikirin, tiştêkî xwe li ber mi nedigirt. Evna, bi Xwidê çî 'vê vî lê ye go mi bi dest bigirê, wê mi bi îşkencekke pîs kujê. Mi jê fêhm kirîye, ka vêca em çarekkê bikin. Em çî bikin? Go herin bêjine Keçelê Mala Rayê, go şîretekkê li me nekê 'îşê me zor e. (Keçelê Mala Rayê şêwirmendê wa ye.) Hê neçûne cem Keçel, roja dî melê go e[z] jî yê çime herbê weke kurê xwe. Ji dêla Berekat mela çû herba Risk. Risk meyza go palêsek e, di heyata xwe da nerahîştîye şûr, şûr neşixulandîye. Risk henekê xwe pê kir, wilo xiştêk do li filîlê qûna melê dan mela birîndar kir. Melê baz da. Berekat jî qihêrî ye dibê bavê mi birîndar kirîye. Çûne cem Keçelê Mala Rayê go wî li hewşê ye, kerik nan pê ra ye nanê xwe dixwê û go wî di ser gû da ye gûwê xwe dikê û spiha ji serê xwe dikujê (da qene dilê wa pê bişewitê wilo dikir). Selama 'lêkim, 'elêkûmesselam. Keçel, em hatine cem te. Go heta li we Mala Sultan Kazim û Mala Risk neqewimê, ka Keçel birçî ye, têr e, ji nêza mirîye... Heta li we teng nebê hûn nabê ka Keçel di çî halî da ye. Vêca go li we teng dibê ji nûka Keçel tê bîra we. Welleh ez nayê! Herin bakine Risk û Sultan Kazim bila ew werine cem min. Çûn gotine Risk û Sultan Kazim go bi Xwidê hal û meselê Keçel ev e. Go herin bi koteka rakîn, doxîna şerwalê wî lê bijdênin, bavêjine ser piştê hespekê û bînine cem me. Çûn bi koteka rakirin, doxîna şerwalê wî lê jidandin, avêtine ser piştê hespekê û anîn li cem wa danîn. Keçel 'eynî wilo ji wa ra jî got. Go Wele Keçel hal û mesele ev e. Yekî reş e dibê Berekat, bi Xwidê karê Risk bikujê lê çî 'vê xwe berdaye girtina wî. Keçel go rêkke tenê li ber me heye: Go heke ev pêlewan bêkar e ez ê kim go ji niha heta sibe werê kuştin; heke î bi jin e çî mi nagihîyê da. Pirsîn, go bêkar e. [Keçel] go pê-şêş keçîkê xweşîk ji nav Binîhelalîya bineqênin bila weke va dansozcîya, şa 'ircîya jê ra bêjin. Wê li wa meyzênê, go meyza îde bila Risk rima xwe li qahfê serê wî dê. Pê-şêş keçîk, heta bi xwiha wî Malya birin, çûne dereke wilo bilind jê ra şa'r digotin û Risk û Berekat diçûne hevdû. Hinga wilo 'esir teng dibê go [e]z ê li wa meyzênim ka bê ma ev keçîk çî dibêjin. Go hinga kar bikê go meyzênê û go carekkê bavê wî kir rima xwe bavêjîyê da. Xwîn tevîzî û şîr kelî, xwiha wî bakirîyê da: go axweey, derba bavê hate te bi bêbextî! Halo meyza, hey! Hûn ev bêbextê ha ne? We ev keçîk ji boy halo anîne?

Wele [e]z ê ha di vê da bavê te da mîzim.⁶ Ti ev bêbextê ha yî, tê bi bêbextî mi kujê? Risk go bi Xwidê keça mi ça 'v li vê pêlewantiya wî kir dilketîyê da. Şixwe ez ê çim keça xwe kujim, ez ê hestûwê wê jî hûr kim. Keça mi bi zanîn ez dame kuştin! (Hinga go ma 'lûm e bext ji hevdû ra dideynîn dibê em ê çin firavîn xwin yan şîv xwin yan wextê xewê ye...) Bext ji hevdû ra danîn û Risk çû û rahişte şûrê xwe ji kuştina keçe ra. Gote keçe go ti dilketîyê da keçe? Go yabo haşa! Stexfara xwe bêne, ev kurê te ye! Go heraketê te ne, ev ji kû dê bê ji te ye! Birayê min e, haşa ez ê dilkevime birayê xwe da. Tê kurê xwe kujê! Go heraketê wî, meyzandina wî, herba wî ya te ye lê hema ji te pêlewantiyê e. Jetonê wî ket go ha Wele bi navê Xwidê hebê nebê kurê Xedra ye. Şûrê xwe di ber xwe ra berda û sê cara go keça'm li mi bibûre. Hêdika roja dî [Risk] di xulamê xwe şiyandine Mekihê. Go hûn ê çine Mekihê, heke Xedra li Mekihê ye û kurê wê pê ra ye nebê em Binîhelalî ne; heke ne li wir e bê em Binîhelalî ne wê berana ji we ra gurênin.

Xulam çûne cem mala Şêx Şerîf, selama'lêkim, 'elêkûmesselam. Hûn ji kû ne, hûn ji kû ve hatine? Meyzandin go Xedra ne li wir e go Wele em Binîhelalî ne. Wexta go em Binîhelalî ne do bûn, harekê beranek ji wa ra gurandin û serê berana êvarî anîne ser sifriyê. Go ka 'îşe we çi ye û 'îşê Mala Risk çi ye û 'îşê Mala Sultan Kazim çi ye? [Xulama] go bi Xwidê keçikik û kurikkî Xedra hene... Go keçikik û kurikkî tenê ne? Go a. Go navê kurik Berekat e û navê keçikê Malya ye. Vêca bû bi ro, go Wele em ê çin. Wele hatin [Risk] go we çi fêhm kir? Go hera bi Xwidê ne li mal in. Behs nekirine û negotine hatiye vir jî. [Risk] go aha bi heqê la îlahe îlallah ev kurê min e, keça'm rast gotîye!

Wele roja dî çûne hevdû. Risk bakire Berekat go ez bavê te me. Berekat go ancix ez bavê te me! Go kuro ti dîn î, Welleh ez bavê te me. Heqeten jetonê Berekat jî ket. Hate mal gote cîya xwe go yadê! Go ho. Go bavê mi ki ye? Go mela ye. Go ma bavê te ye, bavê min e jî! Go kurê'm bavê te ye jî bavê min e jî. Aha ev li serê wî nese kinî, nekete serê wî da. Ma 'lûm e Risk jî zanîbû go wê êvarî ji cîya xwe ra bêjê. [Roja dî Risk] go ma şevê dî te çi ji cîya xwe ra got? Go ma mela bavê te ye bavê cîya te ye jî. Hêdika bakire Risk. Go xelkê go ez nas nekim û nizanibim ji kû hatine û ji kû memleketî ne, hesanî ez wa bikime bavê xwe! Go bi Xwidê heta dawîyê ez fêhm nekim go ti bavê min î, di dinyayê da jî ez te nakime bavê xwe. Bext ji hevdû ra danîn, sekinîn. Ji dewarê xwe peya bûn, Risk go zanê! Go ê! Go ancix cîya te vî tiştî bêjê, ancix cîya te şikere bikê. Vêca ez ê rimekê ser serê te ra avêjim û ez ê bê mi Berekat kuşt, îde bê ma cîya te wê ê ser te çi ji te ra bêjê. Go tamam. Wele çûne hevdû Risk rimek ser Berekat ra avêt. Berekat xwe ji dewara xwe da avêt, dilê xwe eşa[nd]... Wele êla melê pê hisaha, keçika kezîyê xwe qusandin, zilama xwelî bi xwe da kirin, go Wela Berekat şehîd ket. Cîya wî go rahma Xwidê li dê û bavê we bê kes li ser cinazê kurkê mi nemênin, hema ez ê êm pênc deqe tenê "dilo" li ser bêjim û ji nûka rakin. Cîya wî çû ser go kurê'm go hinga go te go xizal hatin û hinga go te go niza çi hatin ma hingî te nizanîbû mala bavê te ne? Hinga go te diçû te di kuştin mi digo kurê'm wa qûnrim ke ma te nizanîbû mala bavê te ne? Hinga te go [e]z ê vî pêlewani kujim mi go kurê'm wî bi dest bigire ji mi ra bêne, ma te nizanîbû bavê te ye? [Berekat] go hah! Bi Xwidê hate ser rastîya rastî. Go demek kî camer ne vir kirîye, Welleh bavê min e! Rabû go yadê Wele dilê mi'j ber mi çûbû. Cîya wî dengkî lîliya. Vêca wê êlê [Berekat] danîne ser serê xwe û bi 'eşq, kêfek kirin...

Wele hatine malê, go yadê mi sozek ji te ra daye, ya ez ê xwe dime kuştin ya [e]z ê vî pêlewani bi dest girim. Wele roja dî çûne hevdû, [Risk] go ma cîya te çi'j te ra got? Go Welleh rast e, ti bavê min î, ez înkâr nakim lê ka te çi ji mi ra kirîye? (Bi hemû tiştî hisaha ye, melê wa jê ra gotîye hê ti heştrojî cîya te hatiye vir.) Hê ez heştrojî te cîya mi kirîye der, te koçber kirîye. Çi sîcê cîya mi heye, cîya mi diz e, qehb e? Ji boy çi te cîya mi kirîye der? Bi Xwidê bi Xwidê, ez ê te bi dest girim, ez ê xwê dime te ez avê nadime te! Bi bavîti te qebûl nakim, te tişteki ji mi ra nekirîye. Heqê te di sukra mi da nîn e. [Risk] go bi Xwidê çû ji mi da, mi go qey mi tişteki baş kirîye lê mi ne baş kirîye. Bezîne hevdû. Wê rojê zêde zêde Risk diwestênê. Giranîkî kirîye ser piştê wî da û rihê wî anîye ser bêhvila wî. Dibê ber roava û carekê [Berekat] ji ser piştê hespa xwe dibê virrrr hih, xwe tavêjê ser piştê hespa wî, aha destê wî halo dikê.⁷ Dibê ma tê vî rihê şîrîn bi kû ve xilas kê? Wele bi benikkî dest û piyê wî jidandin heta karîbû û bi ûrkî li ser piştê hespa li pişt xwe kir û rast berê xwe da malê. Go laaap avêt go yadê mi beranek ji te ra anîye, aha va ye. Go mi soza xwe anî cih. Wele cîya wî dengkî lîliya, go kurê'm ma hineka bavê xwe

⁶ Çîrokbêj enîya xwe nîşan dide.

⁷ Çîrokbêj nîşan dide ku destê wî danîne ser hev û şidandine.

kuştîye? Wele bavê te ye û qederek bû hate serê me. Vêca mi zanîbû go tê li bavê xwe zêde kê kurê'm. Ji niha û pê da navê te bû Abûzêd, yanî te li bavê xwe zêde kir.

Qamçîkik di destê melê da ye dibezê dibê Wele kurê mi ew pêlewan girtîye, ez ê çim hêfa xwe lê hilênim. Dibezê tê go ça yî li ber wa ye, tiqetîqa kenê wa ye... Halo teqepaş dibê, dibêjê Xedra keça'm ev çi ye? Dibê yabo bi Xwidê hal û mesele ev e. [Mela] dibê hey şape di mala bavê te ketê! Va pêlewanê halo, ma te nego hema yek ji wa derbekê li yekî dê. Ev heft roj û heft şevê wa ya herbê dîkin! [Xedra] dibê mi zanîbû go kurê mi wê li bavê xwe zêde kê. Mi zanîbû go kurê mi nayê kultin û wê wî bi dest girê û da bavê wî jî zanibê go kêmi me ye. Bila serê xwe ji me ra bitewênê, kêmi me ye û me karîbû em bikujin go Binîhelalî cenazê wî jî nebînin. Wele bavê wî [yanî Risk] lêborîna xwe dixwazê.

Ew nehîte êla gihane hev, bûne yek ka vêca wê çawa çêbê. Sultan Kazim û Risk emrê Xwidê dîkin. Navê kurê Sultan Kazim, Sultan Hesen e. Sultan Hesen û Abûzêd dibine mezinê wa. Çendekkê meyzandin go wilo di nav êlê da qîrîz hat, feqîrî hat, xela hat, Sultan Hesen û Abûzêd go bi Xwidê em ê teftîşekê kin di nav êlê da bê ma ka çi heye çi nîn e. Wele di nav êlê da çûn û hatin go şivanin wî hestûwa dihêrin û dixwin. Go wa şivanno qewet bê ji we ra. Go erê. Go ma qey mezinê we nîn in çarekkê ji we ra bikin? [Şivana] go hefte weke we û bavê we bi qurbana Abûzêd û Sultan Hesen bin, Wele rojê sed seyê weke we diçe binê konê wa lê Wele em dîr in em nagihin. Wilo kirin go kezeba wa şewitî. Hatne malê hêdîka Sultan Hesen gote Abûzêd go Abûzêdo li te qewimî! Lazim e ti çarekkê ji me ra bikê, Binîhelalî ji nêza mirin. Go ser serê min, ser ça've min lê Wele go ti kurê xwe; ti Ênîz û Mer'ê bi mi ra bişîyênê ez ê çim, ti neşîyênê nikarim. (Vêca yê go bi Abûzêd ra derdikevin navegerihin. Ewna pêlewan e xwe xilas dikê û yê dî nayên.) Wê çin gerihin bê kîjan beled arzanî ye, xweşî tê da ye, xela tê da nîn e. Herbê dibine ser û wî welatî ji xwe ra distênin, mesele ev e. Hêdîka [Sultan Hesen] go ser sera, ser ça'va. Ne bi dilê wî bû lê wilo çêbû.

Dibakine Keçelê Mala Rayê dibêjinê şîreteke li me ke. Keçelê Mala Rayê dibê zanin! Dibê ê. Dibê çar deviha girêbidin; yekê bidine bakur, yekê bidine başur û yekê bidine rojhilat û yekê bidine rojava. Ê îde sibihî meyzênin bê kîjan devih ma'dê wê kirî ye, nakayê û wilo weke nexweşa bê bi wî alî da xela ye. Kîjan di ser cê da bê û bikayê win zanibin go ew alî xweşî ye. Go vêca meyzandin go deviha go berê xwe bi vî alî da kirî wî dikayê. Keçelê Mala Rayê go bi vî alî da arzanî ye.

Ênîz û Mer'ê bi xwe ra birin û aha bi vî milî da çûn.⁸ Êvarî bi şev gihane ava Bêlecûkê.⁹ Wilo ro li ber ava ye nikarin li avê dîn dibê em ê xeniqîn. Vêca ji Abûzêd ra jî biwe 'inyad, gotîye piştî gotine [yê pê ra] navegerihin ez nahêlim tiştê ji Ênîz û Mer'ê werê, ez ê nobeçîyê wa bim. Lihêfka xwe li ber avê dideynin dibê îşev em ê li vir razihin. Abûzêd nobetê li Ênîz û Mer'ê digirê. Dimeyzênê go gurek ji rexê dî yê avê dizûrê. Dibê ev der xweş e, ev der arzanî ye, xela li vî alî nîn e, ji kerîyê pêz... Gurekî ji alîyê wî [Alîyê ku Abûzêd lê ye] go hawar e! Ev alîyê avê xela ye, heywan nemane, e[z] ji nêza mirim. (Vêca Abûzêd bitunê zimanê heywana zanîbû, ji wa fêhm dikir.) Go gurê rexê avê yî wî yalî go heval ha di vir ve were. [Yê dî] go heval ez newêrim. Carekê go heval ez ê em, pey mi ra were. Go Abûzêd li pey wa çû û li wê dera wilo tenik kêlk çêkirin da sibihî di wir ra derbas bibin. Sibihî Ênîz û Mer'ê rabûn go amo em ê di kû ra çin? Go birazî werin mi rê dît. Di wir ra derbas bûn çûn. Çûn, digo welatê Xelef Zinat. Welatê Xelef Zinat 'Intab e. ('Ereb dibêjine 'Intabê Xelef Zinat û kurmanc dibê Dîlok.) Diçin go heqeten bajar xweş e, arzanî ye, her tişt li bajêr heye. Bajêr teftîş dîkin, Xelef Zinat dimeyzênê dibê bi Xwidê weke go ev hatine teftîşê! Dibê wê ha sê siwar in herine bakine wa. Dibakine wa. [Xelef Zinat] dibê hûn çi tişt in? Abûzêd [berî hingî] dibêjê Ênîz û Mer'ê dibê heke hineka ji me pirsî em ê bê em mitirb in. Vêca dibê Abûzêd li sazekê dida dibê her telîkke wî awakik digot û Ênîz û Mer'ê jî reqsek dikirin, kes ne ji reqsa wa têr dibû, ne kesî karîbû wî miqamê wa, wê reqsa wa bileyzin. Wele hatin go ma win çi tişt in? Go em mitirb in. Go ma win mitirb in? Go a. Go de ka bêjin. Heqeten vêca Abûzêd li sazê dida û bi dengê wilo xweş digot 'ereb dibê tiştêkî foqil'edet û vêca Ênîz û Mer'ê reqeseke wilo dikirin însan dimana 'ecêbmayî. Go hii! Rast e mitirb in. Go vêca heftîkkê ji wa ra digotin û herkesekê

⁸ Çîrokbêj alîyê rojava nîşan dide.

⁹ Bêlecûk navçeyeke Rihayê ye ku Çemê Fîradê tê ra derbas dibe.

êvara diçine seyra wa. Go vêca hinga keça Xelef Zinat ça'v li Ûniz û Mer'ê kir ne bi dilekî bi hezar dilî dilketa wa da, xortê weke wa spehî di dinyayê da nebûn. Dilkete herdika da.

Go di sonê da Xelef Zinat go ka rast e mitirb in yan ne mitirb in, hinga go wê vegerihin golikke wilo girik a lewîfî hebû go ha di nav vê ava ha ra herin. Vêca Abûzêd li nav avê da, Ûniz û Mer'ê go Wele cilê me xweşik in vê virikê em ê lewitin, li nav nedan. Go Wele evê ha mitirb e lê Wele ev herdik ne mitirb in wa bênin. Hêdîka go anîn ya wê omir boyû hepsê dê wa yan wê serê wa jê kê, bê ka mahkema wa wê çi qerarê dê. Go keça wî [ya Xelef Zinat] hat go yabo! Go ho. Go daxwazîkke mi'j te heye. Go ti bi qasî mi ji va herdika ne 'adiz î, ti bi qasî mi ne dijminê va yî, vêca va herdika bide mi ez ê cizayê wa dime wa. Go keça'm ser serê mi, ser ça'vê mi. Hêdîka keça Xelef Zinat birin û harekê kirne mezelekê da. Vêca go digo [e]z ê çim yekî ji wa ji xwe raneqênim. Go wî çê li Ûniz meyzênê wî bê ooox! Hema bi Xwidê [e]z ê vî kim, ma heqa xweşik e! Go wî çê li Mer'ê meyzênê wî bê yaw bi Xwidê ev ji yê dî xweşıktir e. Çîqa ev î xweşik e yaw! Go vêca dikir nedikir dilê wê li ser yekî nedirûnişt. Go vêca Abûzêd bi ro Dîlok teftîş dikir û bi êvara dihat li jinikê dibû mêhvan (ne bi neqencî haşa). Vêca digo bi Xwidê jîyana wa ne di xeterê da ye û heta ev jinik sax e jî xwe safî nakê, yekî jî naneqênê. En dera xweş ev tê da ne û en xwarina xweş û en tiştê lezetlî lû kû dê bana jinikê ji herdika ra tanî. Û ji bavê wê we ye kuştine. Abûzêd go bi Xwidê heta em werin ev ê jîyana xwe halo derbas kin tiştêk ji wa nayê, jinik jî ne ji kesî ra dibêjê ne şikere dikê. Hêdîka roja dî Abûzêd vegereha.

Konê Sultan Hesen di nav deviha da ye. Hinga go Abûzêd dikete nav êlê da devih dikayîn. Go wextekî [Sultan Hesen] meyza go xirmxirmê deviha yê go wî dikayîn. Go Wele bi Xwidê Abûzêd hatîye, 'eceba Ûniz û Mer'ê bi xwe ra anîne yan neanîne! Wele Sultan Hesen rabû çû meyza go Abûzêd wî di nav êlê da ye û Ûniz û Mer'ê ne pê ra ne. Ma'lûm e kezeb zor e, wilo terqên bi dilê wî ket. Go bi Xwidê xelkê ji mi ra got go însanê pê ra diçê navegerihê. Nego ti bi xêr hatî. [Abûzêd] go amo ma miho wilo dikê? Te nego birazî ti bi xêr hatî ka çawa yî, te kurê xwe nedane bi êlekê. Ma miho halo dikê? [Sultan Hesen] lêborîna xwe xwest, go birazî xêr e? go amo! Go ho. Go ev tiştê ha di neqebîna min û te de. Mît û xebercî zahf in. Ev tiştê ha ji vê êlê derkevê wê li wê dê pê hisihin kurê te yê êne kuştin. Go bi Xwidê jîyana wa di bin tiştêkî wilo de ye heta deh sala jî tiştêk ji wa nayê lê bila jina te jî pê nehisihê. Go tamam. Wele dilê Sultan Hesen xweş kir lê jina wî go ma kanîn [zarokê mi]. Go kurê te jî weke te ne, ma ez keflê wa me li kû mane (go da bela xwe ji mi vekê), bila wa jî weke mi xwe xilas kiribana, nizanîm (Abûzêd gote pîreka Sultan Hesen).

Go çîqa pîreka Qadî Bidêr¹⁰ nan çêdikir keça wî (navê wê 'Alya bû) hesabê bavê xwe û tengayîkkê dikir wî heqa ard hilênê, wî piçek rûn hilênê, piçik ça hilênê. Digo xelakkê ê da serê bavê mi di nav xelkê da newê tewandin. Digo mêhvanê bavê mi jî wê ên bila bavê mi jî ne kêmtî Mala Sultan Hesen û Mala Abûzêd wa bê. Weke go bê Wele sibe Binîhelalî wê rabin çin vêca Sultan Hesen û Abûzêd bi rex bavê wê ketine wê êne malê. Vêca ew çîqas e nan nexwarîyê Qadî Bidêr, dilê wî ji nêza têşêhê û jî fêhtîya dibê ya rebbî ti rihê mi bîstênê. Xela ye, nîn e ez bixwim û ev paşa bi rex min ketine! [E]z ê çîlo çêkim! Têne malê û vêca keça wî wilo nanekî sêlê ji wa ra çêkirîye û xwarineke wilo weke ya ma'mûra paqij û çakke wilo delal... [Qadî Bidêr] nizanê tiştêk heye. Hat go keça wî wilo jê ra kirîye, hek û sed carî bavo! Wilo şoq bû û ma 'ecêbmayî. Go yabo mi zanîbû rojekê tê kevê tengayîkka halo da, mi go da serê te di nav xelkê da newê tewandin. Vêca hingî kêfa wî ji keça wî ra hat 'eyasa¹¹ bi serê keça xwe da kir û keça xwe li devihê siwar kir vêca Binîhelalî wê rabin çin. Û devih hêç nebû! Binîhelalî wê vir da çin devihê berê xwe da bi vir da¹² û keçik revand û bir. Vêca ma'lûm e hinga go êl rabû, Qadî Bidêr meyza keça xwe nedî. Go ew welatê xweş î ez herim û keça mi ne bi mi ra bê, go çi 'îşê mi li wî welatî heye! Hema çadira xwe go req danî. Û Binîhelalî dimeşin. Abûzêd go bi Xwidê [e]z jî [e]z ê li cem amê xwe bim. Wî jî çadira xwe di rex ya Qadî Bidêr da danî mecbûr îde Binîhelalî hemû mane sekinî. Vêca aha wî wextî Dîyab tê dikevê Tildîbê¹³ da. Navê tildîbê Til Dîyab e. Dîyab jî pêlewaneke Binîhelalîya ye, pêlewaneke bêbext e. Dîyab dikevê Tildîbê da û Qadî Bidêr jî di Tildîbê da ye, yanî cihê go çadira xwe lê deynayî Tildîb e. Hingî keça Qadî Bidêr; xwiha 'Alya dikevê kahnîya Tildîbê da

¹⁰ Mezinê 'eskerîya Binîhelalîya ye. (Çîrokbêj)

¹¹ Weke çarşefê reş bûn bi serê pîreka da dikirin ji boy go kes wa nebîne. (Çîrokbêj)

¹² Çîrokbêj du hêlên dijberî hev dişan dide.

¹³ Tildîb gundekî Hezexê ye ku di navbera Cizîr û Nisêbînê da ye.

dixeniqê. Ma'lûm e keça wî winda dibê hey ji tişteki namênê. Keça wî dixeniqê îde hingî [kahnîyê] dixetimênin. Dixetimênin aha vêca hingî kahnîyê di binê wê ra [di binê axê ra] deriqandîye. Bi devîha wa dixetimênin vêca bi wê axê tilek li wir çêdibê îde di binê wî tilî ra dideriqênê. Piştî go Binîhelalî çadirê xwe li wir dideynin dibê li kê qewimî li kê neqewimî? Dibê bi Xwidê dîsa li Abûzêd qewimî, lazim e Abûzêd vî tiştî pêk bênê, herê 'Alya bibînê. Vêca Abûzêd xwe dikê 'etarek, kerikkî boz ji xwe ra peyde dikê û li 'Alya digerihe. Ma'lûm e dibê miho bi pîrsa diçê qursa, dipîrsê dibê "devîhek pîrekik lê siwar bû û heyasekik lê bû aha bi vir da çû", li pey şopa wê diçê. Li pey tajowê diçê Mûsilê. Gumgam di Mûsilê da bû. Mûsil jî hemûçik cihû ne, ne misirman in. Vêca Gumgam 'Alya zemt kirîye. Dibê 'Alya her şev keçik e, îsanê birîndar bê herine nivîna 'Alya rihet dibûn, dermanê birîndara bû, dermanê nexweşa bû. Abûzêd li pey şopa wê diçê Mûsilê. Halo dibê ber roava keçikke wilo heft-heşt salî digirî dibê yadê vî bazinê ha ji mi ra bikire. Ê perê bazin bi cîya wê ra nîn in, cîya wê dibê kera di nîza çî te kutay ma destê te destê 'Alya Binhelalîya ne ez ê ji te ra kirim! [Abûzêd] dibê hah! Bi Xwidê di vir da ye. Dirajê hevqa¹⁴ bazin dibê xirrr, dikê destê keçikê da, dibê ma gelekî 'Alya Binîhelalî ji birazîya mi çêtir e! Aha ev layîwê birazîya min in. Dibê bi Xwidê e'j cem vî xanî nalebitim, 'Alya di kû da bê ev malik zanê! Xwe disêwixênê li wa da, êvarî malik wî dikê mêhvan. Wilo xwe dikire weke dîna, xwe dikire şibhetê behla da. Ji xwe ra êvarî şitexilîn, pîrsî go ma ev bajar çî ne? Go cihû ne, elhemdülillah em misirman in, em deh malê misirmana di vî bajarî da ne. [Abûzêd] go Xwidê kî mi'j jinama xwe tişteki fêhm nekir; digo 'Alya Binhelalî. Ev 'Alya kî ye 'ecêba? Go keko hal û meselê 'Alya keça Qadî Bidêr ev in, devîhê revandîye û Gumgam ji xwe ra zemt kirîye. Go pîrekê go dibê Abûzêd heyê, ji xêra Xwidê ra ji mîrê mirada ra serê Abûzêd dabana derê! Zilam dibê Wele go me karîbana em î bakinê lê vêca dîr in, ka li kû ne Binîhelalî! Abûzêd wî heqê vî kafîrî dîyê da ma vêca em bê çî! [Abûzêd] xwe kena. Go çima ti dikenê keko? [Abûzêd] go Xwidê kî rastî win misirman in û win halo ji Gumgam ditirsîn! Go bi Xwidê em newêrin xwe did destê wî da tev din û lazim e em her şev jî herine civata wî, bi Xwidê îşev wê bakê wê bê çima hû[n] nehatine civata mi. Go Wele ez Abûzêd im. Go nabê! Go Welleh. Go Welleh hal û mesele ev in, mi xwe kirîye 'etarek mi go hema heta e[z] şopa 'Alya derxim. Vêca êvarî civat lê giha hevê go zanê! Go ê. Go wê şevêkî dî zirta li we kê wê bê çima hû[n] nehtine civata mi. Vêca bê mêhvankî me yî teredînkî hebû vêca serê kêlîkkê xwe zer dikire me digo ez Abûzêdê Binhelalî me vêca em ji xwe ra pê dikenîn me xwe pê ji bîr dikir. Go wilo bêjin da tişteki neçê ber dilê wî [yê Gumgam]. Go hinga go 'Alya hat ez ê bê ez Abûzêdê Binhelalî me ez ê xwe zer kimê da. Îde hingî her deh zîlamê misirman mi zemt bikin bavêjine çalê û şûrê mi bikine destê mi da. Îde ez ê vî bajarî ji we ra safî kim, we kime mezin û 'Alya bi xwe ra bim û çim. Go ma go ti tişteki wilo ji me ra bikê! Welleh vî em qelandine, tiştê go tîne serê me...

Êvara dî Gumgam bakire wa go ma çî bela we bû şevê dî wi[n] nehatin? go weke go win bûne tişteki ha! (Wilo zirt li wa kirin.) Go bi Xwidê mêhvanekî me hebû, yekî wilo peledînkî bû, xwe zer dikire me em li wa hêta didan digo ez Abûzêdê Binhelalî me, me xwe pê ji bîr dikir. [Gumgam] go şixwe ev der cihê zîlamê wilo we, yê wilo go em pê bikenin û em pê tinaza bikin. Çima we neanî? Go bi Xwidê wî li cem mala me ye. Go bilezê bakinê da. Abûzêd birne civata Gumgam, 'Alya ji Gumgam ra anîne û vêca şerabê tînine berê û meznatîkke wilo dikê! Hinga go 'Alya hat û Abûzêd ça'v lê kir go ez Abûzêdê Binhelalî me. Wilo rahişte Gumgam û go vîir avêt li hêt da û çengê wî ji cih bir. [Gumgam] go a'eeew! Vî yê dîn bigirin Wele vî ez kuştim bavo! Her deh zîlamê misirmana xwe zer kirnê û zemt kirin û çûn go hih kirne çalê da û şûrê wî danê da. Ê ew bi binê çalê dikevê; xurp û xurp û xurp û xurp... Bi hawirdorê çalê dikevê çalç dixetimênê û derdikevê. Ma'lûm e çîqa şûrê xwe lê dixê ax dikevîyê dixetimê û derdikevê. Dibakê dibê ez Abûzêd im. Wa safî dikê û Gumgam dikujê û wa dikê bin emrê wa malê misirmana da û wa misirman dikê û 'Alya li pişt xwe siwar dikê û diçê.

Sultan Hesên jî dibê ev 'Alya çûye haşa ber xelkê û [Abûzêd] ji bin xelkê derxistîye anîye. Vêca ma'lûm e heta hingî Qadî Bidêr 'Alya nedabû Abûzêd, dergistîya wî bû. Vêca Sultan Hesên go bi Xwidê ji mi ra çikûçik ket, keça wî nagirê wê keça mi girê. Go bitûnê keçikê Binîhelalîya rêz kirin û gotne Abûzêd go wê di ber te ra ên vêca yeke xwe bineqênê. Vêca çîqa wê ên [Abûzêd] wî bê fût, çîqa wê ên wê bê fût. Sultan Hesên keça xwe hiştibû li paşîya timama da keça wî bigirê. Go hinga giha keça Sultan Hesên go fût û fûteyn; yanî go na û ji binî na. Sultan Hesên go Xwidê wekîl e 'îşê me zor çêbû, keça mi

¹⁴ Çîrokbêj pencekê anku çend bazinan qest dike.

negirt, wê çilo çêbê! Îde Qadî Bidêr ‘Alya li Abûzêd mehr kir go nema bi kêrî kesî tê, yanî li hevdu meyzandine guneh e. Sultan Hesên ta’n dane ‘Alya, go ewa go çûye ji bin Gumgam derxistîye û anîye ne li derba birazîyê min e (da keça wî bigirê). Keçik nexeyîdî! Keçik xeyîdî çû bi vî milê nav ‘ereba da. Diçê Bêrûdê. Vêca êsîrê Abûzêd wê çi kê! Hêdîka vê neqlê xwarzêyê xwe ‘Evdil’ezîz kire ser piştê keçikê da. Vêca dîsa li wê dê [li Bêrûdê] melikkî filiha (ez navê wî nizamim) ‘Alya digirê. Mehîna ‘Evdil’ezîz kihêl e, dibê serê mehîna kihêl mirad e, bi Xwidê herê kîjan malê ez navegerênim. Mehîna diçê malekê, pîrekke pîr tê da ye. Dibê ma ti ji kû yî? Dibê Wele ez misirman in û bi Xwidê hal û meselê ‘Alya ev in. [Pîrek dibê] ‘Alya hatîye û vî yê gawir girtîye û Binîhelalî hene ma ka gelo li kû ne, xwizî hatibana! Dibê ez ‘Evdil’ezîz im û ez xwarzîyê Abûzêd im, hatime pey. Ka em çi bikin? Dibê zanê! Dibê ê. Dibê êvarî daweta kurê wî ye, ez ê te bi xwe ra bîm û cilne pîreka a wilo pîsik li te kim, ez ê bê bûka mî teredînkî ye, cinoyî ye. Ez ê xwe gihênime ‘Alya ez ê jê ra bêjim û îde tê pîf kê lempê, ez ê bê dîn e wîîî lempê mira! Îde wî wextî ‘Alya wê cilê te li xwe kê, tê yê wê li xwe kê û ez ê ‘Alya bi xwe ra derxim û tê di cihê ‘Alya da mênê. Dibê ma go ti tişteş halo ji mi ra bikê! Êvarî cilikne wilo qetehayî li ‘Evdil’ezîz dikê û bi xwe ra dibê. Dibê xukê/[xwehkê] bi Xwidê em hatine go [bûkê] xelat kin lê bûkke mi heye a peledînkî ye, lempa dîmirênê û nîza çawa çêdikê û... Pîf dikê lempê, heta li lempê dipirsîn û êgir tînin û filan û bêhvan, ma ‘lûm e ji ‘Alya ra gotîye, ‘Alya cilê wî li xwe dikê û ew yê ‘Alya li xwe dikê û di cihê wê da dimênê. Yanî bûk e, gelinlik bi serê wê da ye û îşev kurê melik wê ê cem ‘Alya. Hînga go êvarî hat ‘Evdil’ezîz xwe zer kirîyê da dest û pîyê wî li ser hevdû girêdan, avête wir û kete ser yataxê xwe da razaha heta bû sibîh. Bû bi ro go ma te çi kir, te tişteş nekir? Go no! Fihê kir bêjê ez ev pîpîvê ha û vê pîrekê ez girêdam avêtime vê da ha. Şeva dî dîsa ‘eynî. Go hera bi Xwidê hal û mesele ev e mî girêdidê û qeweta zilama jî ne wilo we. Hêdîka gotinê go hera zanê, tê di dirêjika bi xwe ra bê (zemanê berê digotîne derzîya dirêjik), yeke bê û yeke jehrê. Tê pêşîka ya bê lê dê, heke pîrek e, pîrek bêkezeb e xwe diveciniqênê ti ya jahrê lê nadê; heke xwe neveciniqa ti zanibê go zilam e îde ya jehrê di pey da lê de. Dibê herê herê. Êvarî di dirêjika bi xwe ra dibê, ya bê lê didê xwe naveciniqênê dibê bi navê Xwidê ev zilam e! ya jehrê di pey da lê didê dibê “aaayy Wele te ez kuştîm!” Îde Wele ‘Evdil’ezîz jî kurê melik dikujê. Dikujê lê [ew] birîndar e derzîya jehrê lê daye, baz da hat giha xalê xwe Abûzêd. Go xalo Wele hal û mesele ev e. Go xwarzê gidî here nivîna jinxala xwe! (‘Alya hatîye di wê navberê da.) Nivîna jinxala te dermanê birîndara ye, dermanê nexweşa ye. Go ji xêra Xwidê ra ji mîrê mirada ra xalo, bi rê da mî emrê Xwidm kiribana ez negihaban şitexalîya te! ‘Evdil’ezîz emrê Xwidê dikê îde dimeşîn.

Binîhelalî dimeşîn tînin, ev Hêtimê Teyî¹⁵ dikevê pêşîya wa da. Dibê lazîm e win heqê ‘erda mî (yanî win ê di ‘erda mî ra derbas bî) bidîne mî ji nûka win herin. Dibê ha vêca heqê ‘erdê ji me kê mî! Feqîr in, nan nîn e bixwin... Hêdîka Abûzêd û Hêtimê Teyî dibêdine hevdû Abûzêd Hêtimê Teyî birîndar dikê. Hêtimê Teyî dikevê kelha xwe da. Kelha Hêtimê Teyî jî şopek diçîyê da, kes nikarê herîyê. Hêtimê Teyî dibakê Binîhelalîya dibê heta ez tendurîstîya xwe bikim bila Binîhelalî neçîn. Go ez rihet bûm dîsa ez ê ême herba we. Ê Abûzêd dibê ev seba belkî şeş miha heft miha belkî salekê rihet nebê yaw ma em ê li hêvîya wî bin! Hêdîka Abûzêd xwe dikê bijîşk. Diçê devê qela Hêtimê Teyî dibê ez bijîşk im, mî bihîstîye go Hêtimê Teyî birîndar bûwe, e’j dereke dûr hatime tendurîstîya wî. Heçî em bijîşk in em li heqê xwe digerihi, wê heqê mî dê mî, zengîn e wê perekê mî jî bi dilê mî dê mî û [e]z jî [e]z ê tendurîstîya wî bi dilê xwe kim. Dibê Wellehî em li bijîşkkî digerehan vêca tî hatîye. Dibê heyra şirtekî mî jî heye. Dibê çi ye? Dibê go ça’v li mî bikê wê bê Abûzêd e, win ê mî kujîn! Dibê çunkî em zanîn yê go ew birîndar kirî dewamlî tîrsa wî di dilê wî da ye, weke go dewamlî gur li bîra mîhê bê. Dibê yaw wilo bêjê jî em tişteşî nakin. Dibê hera Welleh ez newêrim (xwe qawîm dikê). Dibê hera Welleh em tişteşî ji te nakin.

Hînga go Hêtimê Teyî ça’v lê kir dibê hera Abûzêd e, ez çûme şerê wî, wê mî kujê! Dibê hera textorek e wî ji nîzam kû hatîye... A’eeew te bi xwe da rî mala te nevirîtî! Hînga wilo dibêjê ber xwe dikevê. [Hêtim] dibê Wele weke mî n e lê bila gotina we bê. Çend rokkî Abûzêd dibêdine ser dilê wî da, derman mermanê wî lê didê, li xweşîya wî tê lê ça’v lê dikê Abûzêd e! Hêdîka rokkê bi serê te yî ‘ezîz î delal Hêtimê Teyî didê ber singowa dikujê. Dibê ma [e]m ê li hêvîya te bin kûçikê kurê kûçîka! Baz didê. Kurê Hêtimê Teyî dikevîne ser piştê wî da Abûzêd tê dikevê Aşê Qolîka da.¹⁶ (Aşê Qolîka jî aşê avê bû,

¹⁵ Hêtim kesekî bi merdîya xwe navdar e ku li gorî çavkanîyan ereb e. Her wiha li Çîyayê Bagokê bi navê “Kelha Hêtim” kelehek heye ku behsa çîrokbêj li wî cihî ye.

¹⁶ Navê gundekî kaviyê e ku li wê derdorê ye.

bi avê digereha.) Halo dimeyzênê go cilne bi qirêj wî li qerêş in go te takik ji şalê wî kişandibana heft rîqa wî jê da kevin. [Abûzêd gote qerêş] go niha ti nayê em ê bazarekê kin? Dîbê çi ye? Dîbê ez ê cilê xwe dime te, ti cilê xwe bide mi. Ma 'lûm e cilê paşa li Abûzêd in, [qeraş] dibê yaw va cilê xweşik filan bêhvan... Bi Xwidê ev î dîn e (Qeraş dibêjê)! Wele qeraş cilê wî li xwe dikê û ew cilê qerêş li xwe dikê û [Abûzêd] diçê ber dêwla êş pencek ard jî bi serê xwe da dikê, xwe dikê 'eynî weke qeraşa. Wele halo meyza go heft kurê Hêtim li dewara siwar in û şûrê wa di destê wa da ne, hema dîtî û ketne êş da. Abûzêd xwe berda xwarê, yanî hate pêşîya wa go ma ka arvanê we li kû ne? Go Wele arvanê me nîn in em hatine qisasê bavê xwe, vîyê ha bavê me kuştîye (digotîne qerêş). Hevsarê hespê danê Abûzêd, Wele [Abûzêd] go hih li hespê siwar bû go ker kurê kera wî çima kuşt Wele Abûzêd ez im. Go wey! Go Wele ez niha karim weke bavê we we jî bikujim lê vêca destûra me bidin em ê derbas bin lê [e]z ê we jî kujim. [Abûzêd] tê nav Binîhelalîya û Binîhelalî dirabin diçin.

Binîhelalî dirabin diçin, diçine Darayê.¹⁷ Berdewîl¹⁸ tê pêşîya wa. Weke Hêtimê Teyî ew jî da 'wa perenna dikê. Berdewîl dibê şerê mi bi şev e ne bi rojê ye. Vêca Dîyab dibê e[z] ji Abûzêd mêtir im divê jî niha û pê da hûn mi berdine pêlewana, ez ê êla safî kim. Yanî vêca dora Dîyab e. Vêca Sultan Hesên Abûzêd qeyd kirîye dibê xwe nagirê wê çê şerê Berdewîl. Yanî Dîyab diceribênin wî didine pêş. Hêdîka Abûzêd dibêjê keça Sultan Hesên dibê birazî here ma ti mifta qeydê ji bavê xwe nadizê. Keçik diçê miftê tîne, Abûzêd pîyê xwe divekê, qeyda pîyê xwe dideynê wê dê û diçê. Şev e, diçê go Berdewîl wî bi tena derpêkurtkî spî ye û tazî ye û jîna wî derketîye fanosê bi jîna wî ra ye. 'Îşareta wî û jîna wî ew derpêkurtkî e, bi wî derpêkurtkî wî nas dikê. Hêdîka Berdewîl û Abûzêd lev dan. Vêca hinga go Berdewîl derbê ji xelkê distênê bi fanosê jê ra dikê rahnîk. Go ew derbê ji Berdewîl distênin fanosê dikê pişt xwe da dikê reş da Berdewîl nekujin. Aha Berdewîl bi wa fena xelkê dikujê. Abûzêd fêhm kir go Wellehî fê'lê va ev in! Ma 'lûm e Abûzêd pêlewanekî ser xwe ra ye û Berdewîlê pîsik î çepel î heram... Abûzêd derb ji Berdewîl sta[nd], jînikê fanos kire pişt xwe da. Hinga kire reş hema Abûzêd jî cilê xwe ji xwe kirin û xwe bi tena derpêkurtkî kir. Abûzêd derb ji Berdewîl sta[nd], piştî wî lê bû ji wê ye go Berdewîl e go bi Xwidê mîrê mi derb jê standîye fanos jê ra hilda. Abûzêd şûr li serê wî da serê wî weke yê kûçikkî pekkî vê da ha. Hêdîka Abûzêd guhê Berdewîl û zimanê wî jê kirin û kirne berîka xwe da go ev ê ji mi ra lazim bin.

Û vêca Dîyab razahaye ji nûka dirabê sa'et dibê dozdehê şevê ji nûka Dîyab ê çê herbê! Abûzêd jî serê Berdewîl danîye ber serê wî, ber cinazê wî. Dîyab diçê dimeyzênê go serê wî jêkirî, jê ra hazir! Go Xwidê ji mi ra lev anî. Dirajê serê Berdewîl û tîne go êvarî civata Binîhelalîya wî gerandîye û ma 'lûm e dîsa Abûzêd xwe qeyd kirîye sankî hê ji cihê xwe nelebitîye û tiştek nekirîye. Wele pîyê Abûzêd vekirin û Abûzêd hat. Hat go vêca Dîyab wî dibê mi halo kir û mi halo kir û mi halo kuşt û mi kir go serê wî bîst û pênc metra firî. Abûzêd dey nakê, dibê bila va derûwê xwe bikê. Wele gote wê keçika Sultan Hesên go birazî ka here ma zimanê vî serî pê ve ye yan ne pê ve ye. Keçik diçê dimeyzênê û dibêjê Sultan Hesên dibê yabo ev serîkkî bêziman e! Dibê Dîyab ka zimanê wî? Dibê kuri mi zimanê wî bi saxîti jê kir mi avêt! [Keçik] dibê yabo guhê wî jî nîn in! [Dîyab] dibê mi guh jî jê kirin. Û vêca tiqetiqê Dîyab... Dîyab dibê mi paşatî ji wa sta[nd], Abûzêd nema. Hêdîka Abûzêd ji berîka xwe zimên û guh derdixê dibê mi di werselê nizam çend sed bavî te kutawo! Kûçikê pîs! Ti çi tişt î? Wî didê ber pehîna rep rep rep û derxistin. Bû tiqetiqê wa protesto kirin go kuro vî pîsikê çepel î heram, wesfê xwe didê bi deriwa! Dîyab pîs bû. Ew jî bû vir...

Çûne bajarê Dîlokê. Ma 'lûm e Abûzêd rê jî teftîş kirîye (te dî[t] hinga go gura bakirî hevdû). 'Eynî weke mesela Berdewîl dîsa Abûzêd î qeydkirî ye. Dîyab berdane Xelef Zinat. Xelef Zinat ne pêlewan bû, ji binî herb nekiribû, paşakik bû li ser kursîyê xwe. Dîyab Xelef Zinat kuşt. Xelef Zinat kuşt û rima xwe halo da ser di derikê teng û go lazim e Binîhelalî hemû di bin rima mi ra derbas bibin. Abûzêd li pey sultan Hesên e, heta bi Sultan Hesên di bin rima wî ra derbas bû. [Abûzêd] halo meyza, go Dîyab î koro ev çi rim e (Dîyab î kor bû)? Go mi di werselê sed bavî te da mîsto! Mi niza çiqas êl û niza çiqas 'eşîr û niza çiqas dewlet safî kirine hê mi neanîye ser zimanê xwe! Hema go rima xwe go pelq li nîvê rima wî da û go heta ti sax bê hêsin li te heram û ti gavanê Binîhelalîya yî! Ti li derba gavantîyê yî ne li derba paşatîyê yî! Kirne ber dewêr da û hêsin lê heram kirin. Di ber wî dewarî da spiha girte

¹⁷ Bajarekî kevnare ye ku li binîya Mêrdînê ye.

¹⁸ Mezinê Darayê ye.

Dîyab û Dîyab pîs bû, bêmirêş bû. Hêdîka Dîyab go va însana ez halo pîs kirim niza [e]z ê çîlo heyfa xwe li wa hilênim. Li tola xwe digerihê. Go bi Xwidê ez ê çim bêjime Sultan Hesen û Abûzêd bê bila hedad şûjineke mi çêkin û go çûme cem hedêd ez ê bi dilê xwe kim. Hêdîka êvarî çû mala Sultan Hesen go pismam (vêca pîreka Sultan Hesen xuha Dîyab bû) e[z] di bextê xuha xwe da me hema bêjine hedada bila şûjineke ji mi ra çêkin ez ê cilkê xwe pê dirûm, li va çola û li va çîya cilkê mi diqetihin. [Sultan Hesen] go bila şûjineke te çêkin xem nîn e. Hêdîka çû gote hedad go doqikkî min î hêsînî çêkin. [Hedad] go yaw hêsîn li te heram e Xwidê ji te razî! Go heyra emrê Sultan Hesen û Abûzêd herdika ye. Hê wilo hisa wa [ya Abûzêd û Sultan Hesen] hat. Go wa amo ne çênakin! (Nego doqik!) Go na na bila çêkin. Doqikkî hêsînî jê ra çêkirin û serê doqik hemû bizmar! Kîre bin qapûtê xwe da û çû ber dewêr. Êvarî ji ber dewêr hat, dimeyzênê go hêrhêra zilama ye wî ji zîyaretê tên. Xwe li wa digirê dibê ma xêr e çi bûwe? Dibê Wele Sultan Hesen emrê Xwidê kirîye. Tirba Sultan Hesen dikolin, hinek jê dibê tirb kin e hinek jê dibê dirêj e. Abûzêd dibê qama mi û qama amê mi bi qasî hev e, xwe diberdê tirbê. Dîyab tê ser devê tirbê ma 'lûm e Abûzêd bin ra ye û dibê hêsîn lê heram e [jê natirsîn] hema Dîyab doqik dibê hih! Li qahfê serê Abûzêd didê dibê bila ev tirb ji te ra bê em ê yeke amê te jî kolin. Abûzêd dikujê û îde ma 'lûm e di nav Binîhelalîya da kesî go bê em qebûl nakin nîn e. [Dîyab] xwe dikê mezinê wa û zarokê Abûzêd û yê Sultan Hesen ji nav êlê dikê derê.

Diçin di qarşê êlê da gundikkî xwe çêdikin. Pîreka Abûzêd jî emrê Xwidê kirîye lê pîreka Sultan Hesen sax e. Heft kurê Sultan Hesen û keçeke wî hene û kurekî Abûzêd û heft keçe wî hene. Jina Sultan Hesen (xuha Dîyab e) wa dibê, êtîmekê didê ber wa zaroka weke vayê 'eskerîyê. Yanî hazirîya herbê dikê da wextekî herin heyfa xwe hilênin. Hêdîka rojekê dibê ma ka bi kêrî herbê hatine an nehatine, dibêjê kehrwênê xwe dibê bikine hawar bê hineka kehrê me birin. Hineka şûr û mertalê xwe birine û hineka nebirine, [pîrekê] gotîye hê bi kêrî herbê nehatine. Sala dî dîsa wilo dikê, hinek derdikevin hinek dernakevin. Sal sêya her heşt (heft kurê wê û kurê Abûzêd) tam wilo tevlî tezîzatê xwe derdikevin. Yanî amade ne ji herbê ra. Pîrek dibê ha bi Xwidê bi kêrî herbê hatin. Hêdîka her heft keçe Abûzêd li her heft kurê xwe mahr dikê û keça xwe jî li kurê Abûzêd mahr dikê. Êvarî dibêjê her heft keçe Abûzêd dibê (haşa) telîya xwe bidine derê qûna wa¹⁹ bê herin heyfa amê xwe hilênin û dibêjê keça xwe jî dibê telîya bide derê qûna kurê Abûzêd bê here heyfa bavê xwe hilênê ji bûka were nivîna mi. Hînga wilo dikin yek ji kurê Sultan Hesen nazewicê, piştî xwe didine keçamê xwe heta dibê sibih. Kurê Abûzêd jî dibê çîlo ez kurê Abûzêd û (haşa) te telîya xwe da derê qûna mi! Telîya wê jî jê dikê û êvarî diçê cem jî. Jinik dibê bi Xwidê dîsa namûsê kevê alîyê Mala Abûzêd da! Dîyab jî gotîye lazîm e kes di qarşê mi da agira nekin (weke vê newrozê). Pîrek [jina Sultan Hesen] hêdîka bizmarekî nalê li binê pîyê hespê kurê Abûzêd didê wilo xwînî dikê, hesp kulek dikê. (Ji boy çi? Ji boy go hesp bikulê, kurê wê Dîyab bikujin. Dixwest go namûs bikevê alîyê kurê wê da nekevê alîyê kurê Abûzêd da. Herkes dixwazê go zarwo wa qenc bin!) Hêdîka porê hespa qusandin kirne weke cahnûka û çûne qahfê gir agirekî wilo kirin go rimîya wî çû mişka azmên. Dîyab go hek! Bi Xwidê ev zarowê dêlê wê li qarşê mi bine tişteke, wî di riwê mi da êgir dikin! Êvarî Dîyab çû wa. Halo meyzaa go porîkê hespa qusandî, go hemû cahnûk in, nezan in, ne'elm in. Bi Xwidê ez ê timama kujim, bezî wa çû wa. Dîyab bezî wa çû wa, go her heft kurê Sultan Hesen çûne ser serê Dîyab û doqikê xwe hildan go "ene xalek" yanî xalê me ye. Doqikê her hefta ser serê wî ra ye nakujin. Go vêca kurê Abûzêd wilo diqehere û hespa wî kulek e wilo bi kerkulî, bi kerkulî, bi kerkulî... Hema digihîyê da û doqik li qahfê serê wî didê dibê "ene xalek lê ene heyfek!" Dîyab gindir dikê wê derê. Hêdîka pîreka Sultan Hesen dibê bi Xwidê erê em Sultanê wa ne lê bi Xwidê em nikarin pêlewantîyê jî ji Mala Abûzêd bistênin. Dîsa namûs kete bara Mala Abûzêd da û çîroka mi xilas û ti sax bê.

¹⁹ Tê wateya pîskirinê ku wek biwêjekê jî tê bikarînan.



T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

SÖZLÜ ANLATIM BİÇİMLERİNDE TOPONİMİ

(İdil ve Nusaybin Yörelerinde)

Cahit BENEK

(17711012)

Danışman

Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK

Mardin 2021